



K.T.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê
Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

**CENGNAMEYEKE HEZRETÎ ELÎ:
“GEZWETU HUNEYN” A MELA YASÎNÊ
ALIKÎ
(Metn û Lêkolîn)**

Seher BÎŞAROĞLU
19711003

Şewirmend
Doç. Dr. Hayrullah ACAR

Mêrdîn-2022



K.T.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê
Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

**CENGNAMEYEKE HEZRETÎ ELÎ:
“GEZWETU HUNEYN” A MELA YASÎNÊ
ALIKÎ
(Metn û Lêkolîn)**

Seher BÎŞAROĞLU
19711003

Şêwirmend
Doç. Dr. Hayrullah ACAR

Mêrdîn-2022

| | | |
|---|-------------------------------|--|
| T.C. MARDİN ARTUKLU ÜNİVERSİTESİ TÜRKİYE'DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ | |  ÜNİVERSİTESİ |
| Dok. No: MAU-FRM-04-ENSTİTÜ/07 | TEZ ONAY SAYFASI FORMU | |
| İlk Düz. Tar.: 02/01/2020 | | |
| Rev. No/Tar.: 00/... | | |
| Sayfa: 1/1 | | |

TEZ ONAYI

Seher BİŞAROĞLU tarafından hazırlanan Tezin “**Cengnameyeke Hezretî Elî: “Ğezwetü Huneyn”a Mela Yasînê Alikî (Metn û Lêkolîn)**” Adı adındaki çalışma, Savunma Sınavı 04.07.2022 tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ Anabilim Dalı’da **YÜKSEK LİSANS TEZİ** olarak oybirliği ile kabul edilmiştir.

| | |
|-------------------------------------|------|
| Danışman Doç. Dr. Hayrullah ACAR | İmza |
| Üye Prof . Dr. Abdürrahman ADAK | İmza |
| Üye Doç. Dr. Osman ASLANOĞLU | İmza |

ONAY:

Bu tezin kabulü, Enstitü Yönetim Kurulu’nun/...../20.... tarih ve/..... sayılı kararı ile onaylanmıştır.

...../...../20...

Enstitü Müdürü

| | | |
|---------------------------------------|--|--|
| Hazırlayan: Birim Kalite Komisyonu | Kontrol Eden: Üniversite Kalite Komisyonu | Onaylayan: Üniversite Kalite Komisyon Başkanı |
|---------------------------------------|--|--|

TAAHHÜTNAME

TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ

MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum **“Cengnameyeke Hezretî Elî: “Ğezwetu Huneyn”a Mela Yasînê Alîkî (Metn û Lêkolîn)”** adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin/projemin kâğıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- Tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- Tezim sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.

X Tezimin 5 yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.

04.07.2022

Öğrencinin Adı Soyadı

Seher BİŞAROĞLU

PÊŞGOTIN

Bi saya xebat û lêkolînên ku di van salên dawî de têne kirin edebîyata Kurdî bi pêşve diçe û kelûpelên wê ji mirinê rizgar dibin. Her çi qas heta niha çendîn xebatên hêja hatibin kirin jî gelek malzemeyên edebîyata Kurdî li benda xebat û lêkolînên akademîk in. Mela Yasînê Alikî yek ji wan helbestvanên sedsala 20em ku heta niha nehatiye naskirin û tevî berhemên xwe di tarîtiyê de maye. Bi vê xebata xwe em dê hewil bidin ku Mela Yasînê Alikî û berhemên wî bidin naskirin û cihê wî yê di edebîyata de Kurdî destnîşan bikin.

Berî ku em derbasî agahiyên derheqê Mela Yasîn bibin ez dixwazim hinekî behsa pêvajoya vê xebatê bikim. Cara ewil bi saya birêz Abdurrahman Adak em ji vê berhemê haydar bûn. Piştê bi agahiyên ku me ji wî wergirt em gihastin xwediyê nusxeya Yusif Yaşar (NYY), li gor agahiyên ku me ji xwediyê nusxeyê wergirtin ev berhem a kalê wî Yusif Yaşar bû. Bi malbata Yusifê Yaşar re em ketin têkilîyê û em çûn serdana wan me derheqê berhem û nivîskar de ji malbatê malûmat berhev kirin. Piştê piştî hin lêkolînên ku me li ser berhemê kirin, me dît ku ev berhem ne ya Yusif Yaşar e û ya kesekî bi navê Yasîn e. Dema me berhem latîniye kir, cihên ku mexlesa “Yasîn” lê hatibû nivîsandin jê biribûn û li şûna wê Yusif hatibû nivîsandin. Piştî ku em gihastin qeçeta ku ev berhem a bi navê kesekî Yasîn e, careke din em ketin lêkolîneke kûr ji bo ku em bizanibin ev Yasîn kî ye. Piştî lêkolînan em gihastin navê Mela Yasînê Alikî.

Demekê malbata Mela Yasîn û Yusif Yaşar cînarê hevbûne û piştê di navbera her du malbatan de hisûmet û pêvçûn pêk hatiye. Di encama vê pêvçûnê de malbata Mela Yasînê Alikî koçî navenda Panosê kiriye. Hemû alav û malên xwe di gund de hiştine. Îhtîmal e ku ev berhem li gund mabe û bi vî awayî ketibe destê malbata Yusif Yaşar.

Demê em ketin pey şopa vê berhema bi navê *Gezwetu Huneyn* û nivîskarê wê em hay ji du nusxeyên din jî çêbûn. Me nusxeya duyem li cem keça Mela Yasînê Alikî Husna Atasevenê peyda kir û nusxeya sêyem jî me li ba nevîyê Feqe Reşîdê Alikî Nezîf Katılmış peyda kir û li gorî malbata Feqe Reşîd ev berhem ya Feqe Reşîdê Alikî

bû. Di vir de jî alozîyeke dinê hebû lewra di temeta nusxeya duyem de berhem weke ya Mela Yasînê Alikî hatibû nivîsîn. Herwiha dîsa di vê nusxeyê de mexlesa “Yasîn û Yasînê Alikî” jî derbas dibûn. Lê di nusxeya sêyem de ne di temeta wê de ne jî di rûpelên nusxeyê ku li ber destên me ne, derbarê Feqe Reşîdê Alikî de ti agahî li ser tune bû.

Gelo ev berhem ya kê bû? Em bi her du malbatan re jî ketin têkilîyê, malbata Feqe Reşîd ev berhemê weke ya Feqe Reşîd dihesiband û li gorî malbata Mela Yasîn jî ev berhema Mela Yasînê Alikî bû. Gava em bi çavekî objektîf li ser her sê nusxeyan rawestîyan li gorî daneyên temetê û mexlesên di berhemê de derket holê ku ev berhem ya Mela Yasînê Alikî ye û ne ya kesekî dinê ye. Çunkî di nusxeya duyem (NME) de bi awayekî aşkere navê Yasîn hebû û di nusxeya yekem (NYY)ê de jî navê Yasîn jê hatibû birin û ji dêvla navê Yasîn navê Yusif lê hatibû zêdekirin. Yanî texrîbat di nusxeyê de pêk hatibû.

Herwiha li gorî agahîyên em gihaştinê di nusxeya sêyem (MHB) de jî di cihê mexlesa Yasîn de dîsa mîna vê texrîbatê navê Feqe Reşîd lê hatibû zêdekirin û navê Yasîn jî jê hatibû birin. Herwiha di temeta vê nusxeyê de jî ti agahiyek ku em bibêjin ev berhem ya Feqe Reşîd e tune bû û herwiha ji bo kurê Mela Yasînê Alikî jî îfadeya “Ya Rebbî tu xelas ke Ebdulhekîmê Alikî” hatibû nivîsîn.

Li gorî van agahî û daneyan me biryar da ku ev berhem ya Mela Yasînê Alikî ye. Piştî ku me nivîskarê vê berhemê li gor agahîyên heyî tesbît kir me dest bi lêkolîna jîyan û berhemên Mela Yasînê Alikî kir.

Mela Yasînê Alikî di sedsala 20em de li Panosa Agirî hatiye dinyayê, li gor agahîyên li ber destê me wî li cem gelek kesan xwendîye û îcazeya ilmî û tesewûfî wergirtiye. Mela Yasînê Alikî li dû xwe çendîn berhem hiştine, lê heta niha em gihaştin berhema wî ya bi navê *Gezwetu Huneyn* û çend helbestên wî yên ku bi rêya bandên teyîbê hatibûn tomarkirin. Xebata me ya vê tezê li dor berhema wî ya bi navê *Gezwetu Huneynê* ye lê em dê bi kurtasî behsa helbestên wî jî bikin.

Berhema Mela Yasînê Alikî ji gelek alîyên xwe ve berhemeke girîng e, lewra dema em li berhemên edebî yên Kurdî mêze dikin tê dîtin berhemên ku mijara wan

ceng in, kê m hatine xebitandin ango berhem bi xwe kê m in. Ji ber vê hindê ev berhem bi me dide nîşan ku di edebîyata Kurdî ya klasîk de jî berhemên ku mijara wan ceng û şer in hatine nivîsîn.

Di amedekirina vê xebatê de alîkarîya gelek kesan gihastîye min. Di serî de spasîyên xwe pêşkêşî şewirmendê xwe Doç. Dr. Hayrullah Acar dikim ku di amedekirina vê xebatê de rê nîşanî min da. Herwiha ji Prof. Dr. Abdurrahman Adak re spasdar im ku ez ji cengnameya Mela Yasînê Alikî haydar kirim. Ji bo bidestxistina nusxeya Yusif Yaşar spasîyên xwe pêşkêşî Taha Halit Yaşar dikim. Herwiha ji bo bidestxistina nusxeya Mihemmed Emîn jî spasîyên xwe pêşkêşî Husna Atasevena keça Mela Yasînê Alikî dikim. Di pêvajoya amedekirina vê xebatê de malbata Mela Yasînê Alikî bi dilgermî alîkarîya min kir û malûmatên derheqê bav û kalên xwe de bi min re parve kirin. Ji bo alîkarîya wan bi taybetî ez ji Abdulbari Çelebi, Abdurrakip Çelebî, Abdulvahip Çelebi, Abdullah Akbaş, Esat Yıldız û ji Fesih Yıldız re spasdarim. Di hemû merheleyên teze de divê alîkarîya hevjinê min Zana neyê jibîrkin, ji wî re jî spasîyên xwe pêşkêş dikim. Ji bo keda endamên jûrîyê Abdurrahman Adak û Osman Aslanoğlu re dubare spasdarim. Herwiha ji bo wergera îcazeya Erebi jî ji Mînoo Zadesafarî û İslam Cangîr re spasîyên xwe pêşkêş dikim.

Seher BIŞAROĞLU

Amed-2022

KURTE

Mela Yasînê Alikî helbestvanekî Kurd e û di navbera salên 1891/1901-1976an de li Panosa Agirî jîyaye. Navê bavê wî Ebdullah e û navê dîya wî Heyat e. Mela Yasînê Alikî ji eşîra Alikan û ji qebîleya Codikan e, eşîra Alikan eşîreke koçer e û ji herêma Cizîrê koçî wanê û ji wir jî koçî Panosê kirine. Mela Yasînê Alikî û Feqe Reşîdê Alikî nasên hev in. Mela Yasînê Alikî nevîyê apê Feqe Reşîdê Alikî ye ango kurê pismamê wî ye.

Mela Yasînê Alikî li cem gelek kesên weke: Feqe Reşîdê Alikî, Mela Zahirê Memanî, Mela Qasimê Pozreş, Şêx Nesîmê Kufrewî, Şêx Muhemmedê Erwasî û Mela Ehmedê Kurumzade xwendiyê.

Mela Yasîn li gundên cuda melatî û mideristî kiriye û gelek kesan di vê maweyê de jê dersên cuda girtine. Mela Yasînê Alikî kesên weke: Şêx Îsmâîlê Hezroyî, Muhemmed Emîn, Mela Muhmamed Yıldıırım û hwd. perwerde kiriye.

Mela Yasînê Alikî pêgirtîyê terîqeta Neqşebendî bûye, her çiqas di berhema wî ya bi navê *Gezwetu Huneyn* de em rastî şopên terîqeta wî neyên jî wî di helbestên xwe de li ser terîqet û şêxê xwe sekinîye, ew zikr kirine.

Mela Yasînê Alikî û berhema wî heta niha nehatiye naskiririn û qet nebûye mijara xebatekê. Li gor agahiyên ku me bi dest xistiye wî cengname û çend helbest nivîsîne. Ji ber ku xebata me bi cengnameya wî sînordar e em li ser helbestên wî hûr nebûn.

Menzûmeya *Gezwetu Huneyn* ya Mela Yasînê Alikî bi bendan hatiye nivîsîn û bi tevahî ji 373 bendan pêk hatiye. Berhem li ser Cenga Huneynê ye ku ev ceng di serdema Hz. Muhemmed de pêk hatiye. Mela Yasîn ev Cenga Huneynê bi Kurmancî weke cengnameyeke menzûm nivîsîye.

Heta niha sê nusxeyên vê cengnameyê hatine tesbîtkirin, lê ji wan sê nusxeyan tenê du nusxe bi temamî li ber destê me ne û ji nusxeya sêyem jî rûpelên serî û yê dawî gihaştine ber destê me û me ew di vê xebatê de bi kar anîne. Me di vê xebatê de her du nusxeyên berdest berawird kirin û bi vî awayî me metna rexneyî amade kir. Me di vê xebatê de cengname ji aliyê naverok û rûxsarî ve analîz kir.

Peyvên Sereke: Mela Yasînê Alikî, Cengname, Herba Huneynê, Edebîyata Kurdî, *Gezwetu Huneyn*

ÖZET

Mela Yasinê Alikî, 1891 / 1901-1976 yılları arasında Ağrı'nın Patnos ilçesinde yaşamış Kürt bir şairdir. Babasının adı Abdullah, annesinin adı Hayat'tır. Mela Yasin Alîki, Alîkan aşiretinden ve Codîkan kabilesindedir. Alîkan aşireti Cizre bölgesinden Van'nın Erciş ilçesine göç edip oradan da Patnos'a göç eden göçmen bir aşirettir. Mela Yasinê Alikî ve Feqe Reşîdê Alikî akrabadırlar. Mela Yasinê Alikî, Feqe Reşîdê Alikî'nin amcasının torunudur.

Mela Yasinê Alikî, Feqe Reşîdê Alikî, Mela Zahirê Memanî, Mela Qasimê Pozreş, Şêx Nesîmê Kufrewî, Şêx Muhemmedê Arvasî ve Mela Ehmedê Kurumzade gibi âlimlerden eğitim almış.

Mela Yasin, çeşitli köylerde imamlık ve müderislik yapmış ve bu süre zarfında birçok kişiye eğitim vermiştir. Mela Yasin Alîki, Şeyh İsmail Hezroyi, Muhammed Emin, Mela Muhmamed Yıldırım ve birçok kişiye hocalık yapmıştır. Mela Yasin Alîki Nakşibendi tarikatına bağlı bir alim idi. *Ġezwetu Huneyn* adlı eserinde tarikatına dair izler görmesek de şiirlerinde tarikatı ve şeyhlerini zikretmiştir.

Mela Yasin Alîki ve *Ġezwetu Huneyn* adlı eseri henüz tanınmamış ve hiç bir çalışmaya konu olmamıştır. Şimdiye kadar elimizde 5 şiiri geçmiştir. Tez çalışmamız onun cengnamesi üzerine olduğu için şiirleri üzerinde ayrıntılı bir şekilde durmadık.

Mela Yasinê Alikî'nin manzum cengnamesi bendlerle yazılmış olup toplam 373 benten meydana gelmiştir. Eser, Hz. Muhammed'in döneminde meydana gelen Huneyn savaşını konu almaktadır. Mela Yasinê Alikî Huneyn Savaşını Kurmanci lehçesiyle bir cengname olarak yazmıştır.

Şimdiye kadar bu cengnamenin üç nüshasına ulaştık, ancak bu üç nüshalardan sadece ikisi tamamıyla elimizde. Elimizde olan nüshaları karşılaştırdık ve tashihli metnimizi eldeki iki nüshaya göre hazırladık. Cengnameyi muhteva ve şekil yönünden tahlil ettik.

Anahtar Kelimeler: Mela Yasinê Alikî, Cengname, Huneyn Savaşı, Kürt Edebiyatı, Ġezwetu Huneyn

ABSTRACT

Mela Yasine Alikî is a Kurdish poet who lived in Patnos district of Ağrı between 1891 / 1901-1976. His father's name is Abdullah, his mother's name is Hayat. Mela Yasin Alikî is from the Alıkan tribe and the Codıkan tribe. The Alıkan tribe is an immigrant tribe that migrated from the Cizre region to the Erciş district of Van and then migrated to Patnos. Mela Yasine Alikî and Feqe Reşidê Alikî are related. Mela Yasine Alikî is the granddaughter of Feqe Reşidê Alikî.

He received training from scholars such as Mela Yasine Alikî, Feqe Reşidê Alikî, Mela Zahirê Memanî, Mela Qasimê Pozreş, Şêx Nesîmê Kufrewî, Şêx Muhammedê Arvasi and Mela Ehmedê Kurumzade.

Mela Yasin worked as an imam and teacher in various villages and trained many people during this time. He taught Mela Yasin Alikî, Sheikh İsmail Hezroyî, Muhammed Emin, Mela Muhmamed Yıldırım and many others. Mela Yasin Alikî was a scholar of the Naqshbandi sect. Although we do not see any traces of his sect in his work named Ğezwetu Hunayn, he mentioned his sect and its sheikhs in his poems.

Mela Yasin Alikî and Ğezwetu Huneyn has not been recognized yet and has not been the subject of any study. We only have five of his poems. Since our thesis is on his cengname, we did not dwell on his poems in detail.

Mela Yasine Alikî's verse cengname is written with bends and consists of a total of 373 stanzas. The work, St. It is about the Battle of Hunayn, which took place during the reign of Muhammad. Mela Yasine Alikî wrote the Battle of Hunayn as a battle in Kurmanji dialect.

So far we have found only three copies of this cengame, but only two of these three copies are fully in our possession. We compared the copies we have and prepared our corrected text according to the two copies we have. We analyzed the Cengname in terms of content and form.

Keywords: Mela Yasine Alikî, Cengname, Battle of Hunayn, Kurdish Literature, Ğezwetu Huneyn

NAVEROK

| | |
|------------------------------|------|
| PÊŞGOTIN | III |
| KURTE | VI |
| ÖZET..... | VII |
| ABSTRACT..... | VIII |
| NAVEROK | IX |
| KURTEBÊJE | XVI |
| LÎSTEYA TABLO Û PÊVEKAN..... | XVII |

DESTPÊK

| | |
|--|----|
| I. METODOLOJÎ | 1 |
| A. Mijar, Giringî û Armanca Tezê..... | 1 |
| B. Çarçove û Rêbaza Tezê..... | 2 |
| II. METNÊN DÎNÎ Û DESTANÎ | 2 |
| A. Destan | 5 |
| B. Xezaname..... | 6 |
| B.1. Dîroka Xezanameyan | 7 |
| C. Sîyer | 10 |
| C.1. Dîroka Sîyeran..... | 11 |
| D. Cengname | 12 |
| D.1. Cudahî û Wekhevîyên Cûreyên Xezaname û Cengnameyan..... | 13 |
| D.2. Dîroka Cengnameyan..... | 15 |
| D.1.1. Di Edebîyata Kurdî de Cengname | 16 |
| D.1.1.1. Borê Qer (Qewlê Hespê Reş)..... | 20 |
| D.1.1.2. Qewlê Newala Sîsebanê..... | 21 |
| D.1.1.3. Ğezwetu Huneyna Mela Yasînê Alikî | 23 |
| D.1.1.3.1. Aîdîyeta “Ğezwetu Huneyn”ê..... | 24 |

BEŞA YEKEM

JÎYAN, BERHEM Û KESAYETÎYA EDEBÎ YA MELA YASÎNÊ ALIKÎ 26

| | | |
|------------|---|----|
| 1.1. | JÎYANA MELA YASÎNÊ ALIKÎ | 26 |
| 1.1.1. | Jidayîkbûn û Zarokatîya Wî..... | 26 |
| 1.1.2. | Nav û Mexlesa Wî..... | 26 |
| 1.1.3. | Zewaca Wî | 28 |
| 1.1.4. | Wefata Wî | 28 |
| 1.1.5. | Eşîra Wî..... | 28 |
| 1.1.6. | Binemala Wî..... | 30 |
| 1.1.6.1. | Mela Ebdullah | 34 |
| 1.1.6.2. | Mela Ebdulquddus | 34 |
| 1.1.6.3. | Mela Ebdulezîz..... | 35 |
| 1.1.7. | Xwendin û Seydayên Wî..... | 35 |
| 1.1.7.1. | Xwendina Wî..... | 35 |
| 1.1.7.2. | Seydayên Wî..... | 36 |
| 1.1.7.2.1. | Feqe Reşîdê Alikî | 39 |
| 1.1.7.2.2. | Mela Zahirê Tendurekî (Memanî)..... | 40 |
| 1.1.7.2.3. | Mela Qasim (Melayê Pozreş)..... | 40 |
| 1.1.7.2.4. | Şêx Ebdulhekîmê Bilwanîsî-Huseynî..... | 41 |
| 1.1.7.2.5. | Mela Ehmedê Kurumzade | 42 |
| 1.1.7.2.6. | Şêx Nesîmê Kufrewî | 42 |
| 1.1.7.2.7. | Şêx Muhemmedê Hafîd (Erwasî) | 43 |
| 1.1.8. | Melatî û Muderîstîya Wî..... | 44 |
| 1.1.8.1. | Talebeyên Mela Yasîne Alikî..... | 45 |
| 1.1.8.1.1. | Şêx Îsmâîlê Hezroyî (Îsmâîl Çetîn)..... | 46 |
| 1.1.8.1.2. | Mela Muhemmed Yıldırım | 48 |
| 1.1.8.1.3. | Muhemmed Emînê Kurê Xelîfe Hecî Ehmed..... | 48 |
| 1.1.9. | Terîqeta Wî..... | 48 |
| 1.2. | BERHEMÊN MELA YASÎNÊ ALIKÎ | 48 |
| 1.2.1. | Ġzewetu Huneynê (Cengnameya Hz. Elî)..... | 49 |
| 1.2.2. | Helbestên Wî..... | 49 |
| 1.3. | KESAYETÎYA WÎ YA EDEBÎ Û DÎNÎ-TESEWÛFÎ..... | 51 |
| 1.3.1. | Edîbên ku Tesîr li Alikî Kirine..... | 53 |

BEŞA DUYEM

| | |
|--|-----------|
| VEKOLÎNA “ĞEZWETU HUNEYN” Ê | 61 |
| 2.1. ĞEZWETU HUNEYN Û CÛREYA WÊ..... | 61 |
| 2.1.1. Navê Berhema Mela Yasînê Alikî | 61 |
| 2.1.2. Cûreya “Ğezwetu Huneyn”ê..... | 62 |
| 2.2. ZIMANÊ ĞEZWETU HUNEYNÊ | 64 |
| 2.2.1. Di Cengnameyê de Taybetîyên Devokên Kurdî | 64 |
| 2.2.1.1. Devoka Serhedê | 65 |
| 2.2.1.2. Devoka Behdînan..... | 68 |
| 2.2.2. Unsûrên Zimanên Bîyanî | 69 |
| 2.2.2.1. Unsûrên Erebî | 69 |
| 2.2.2.2. Unsûrên Farisî..... | 70 |
| 2.2.2.3. Unsûrên Tirkî..... | 72 |
| 2.2.3. Biwêjin di Cengnameya Huneynê de..... | 74 |
| 2.2.4. Cotepeyvên di Cengnameya Huneynê de | 74 |
| 2.2.5. Di Cengnameya Huneynê de Teswîrên Cengê | 75 |
| 2.3. HUNERÊN EDEBÎ..... | 79 |
| 2.3.1. Teşbîh..... | 79 |
| 2.3.2. Telmîh..... | 80 |
| 2.3.3. Tezad..... | 80 |
| 2.3.4. Teraduf..... | 81 |
| 2.3.5. Mubalexe | 82 |
| 2.3.6. I’ade | 83 |
| 2.3.7. Tekrîr | 85 |
| 2.3.8. Alîterasyon..... | 85 |
| 2.3.9. Asonans..... | 86 |
| 2.3.10. Nîda..... | 87 |
| 2.3.11. Telmî’ | 88 |
| 2.3.12. Îstîfham | 88 |
| 2.3.13. Cînas | 89 |
| 2.3.14. Iştîqaq..... | 89 |
| 2.3.15. Iqtibas..... | 90 |
| 2.3.16. Tarîxdayîn..... | 90 |

| | | |
|--------------|--|-----|
| 2.4. | JI ALÎYÊ RÛXSARÎ VE ĞEZWETU HUNEYN | 91 |
| 2.4.1. | Teşeya “Ğezwetu Huneyn”ê | 91 |
| 2.4.1.1. | Teşeyên Nezmê yên Bipergal ên Serbest..... | 92 |
| 2.4.1.1.1. | Teşeyên Bipergal ên Wekhev | 92 |
| 2.4.1.1.2. | Teşeyên Bipergal ên Tevlîhev | 93 |
| 2.4.2. | Kêş, Serwa û Paşserwa..... | 95 |
| 2.4.2.1. | Kêş | 95 |
| 2.4.3.1.1. | Kêşa Xwemalî (Kêşa Birgeyî)..... | 96 |
| 2.4.3.1.2. | Kêşa ‘Erûzê | 98 |
| 2.4.2.2. | Serwa | 98 |
| 2.4.2.2.1. | Serwaya Mucerred | 98 |
| 2.4.2.2.2. | Serwaya Murekkeb | 99 |
| 2.4.2.2.2.1. | Serwaya Murdef | 99 |
| 2.4.2.2.2.2. | Serwaya Muqeyyed..... | 100 |
| 2.4.2.2.2.3. | Serwaya Muesses | 100 |
| 2.4.2.2.3. | Serwaya Cînas..... | 100 |
| 2.4.2.3. | Paşserwa..... | 101 |
| 2.4.2. | Tertîba “Ğezwetu Huneyn”ê | 101 |
| 2.4.2.1. | Dîbace | 102 |
| 2.4.2.1.1. | Besmele | 103 |
| 2.4.2.1.2. | Tewhîd..... | 103 |
| 2.4.2.1.3. | Sebebê Te’lîfê..... | 105 |
| 2.4.2.1.4. | Dîroka Te’lîfê | 105 |
| 2.4.2.2. | Beşa Sereke | 106 |
| 2.4.2.3. | Beşa Xatîmeyê | 108 |
| 2.5. | JI ALÎYÊ NAVEROKÊ VE ĞEZWETU HUNEYN | 109 |
| 2.5.2. | Cenga Huneynê | 109 |
| 2.5.2.1. | Rewşa Berî Cenga Huneynê | 109 |
| 2.5.2.2. | Pêvajoya Cenga Huneynê | 114 |
| 2.6. | KESAYETÊN GIRÎNG ÊN ĞEZWETU HUNEYNÊ..... | 123 |
| 2.6.2. | Kesayetên Misilman ên Cengnameyê | 124 |
| 2.6.2.1. | Hz. Muhammed (s.x.l.) | 124 |
| 2.6.2.2. | Hz. Hemze | 125 |
| 2.6.2.3. | Hz. Ebûbekir | 126 |

| | | |
|--------------|--|-----|
| 2.6.2.4. | Hz. Omer..... | 127 |
| 2.6.2.5. | Hz. Osman | 128 |
| 2.6.2.6. | Hz. Elî | 129 |
| 2.6.2.7. | Zubeyrê Kurê Ewwam | 131 |
| 2.6.2.8. | Fazilê Kurê Ebbas | 132 |
| 2.6.2.9. | Ebbas..... | 133 |
| 2.6.2.10. | Ebbasê Kurê Mirdas..... | 134 |
| 2.6.2.11. | Se‘d Kurê ‘Ubade | 135 |
| 2.6.2.12. | Se‘d Kurê Ebû Weqqas..... | 136 |
| 2.6.2.13. | Ebû Sufyan..... | 137 |
| 2.6.2.14. | Ebû Sufyan el-Haşimî..... | 137 |
| 2.6.2.15. | Qetadê Kurê Nu‘man | 138 |
| 2.6.2.16. | Enesê Kurê Malik | 139 |
| 2.6.2.17. | Şeybe Kurê Osman | 140 |
| 2.6.2.18. | Xalidê Kurê Welîd | 141 |
| 2.6.2.19. | Mîqdadê Kurê ‘Ebdullah | 142 |
| 2.6.2.20. | Bilalê Hebeşî..... | 143 |
| 2.6.2.21. | Qeysê Kurê Se‘d | 143 |
| 2.6.2.22. | Eşter-Ejder | 144 |
| 2.6.3. | Kesayetên ku Paşê Bûne Misilman | 145 |
| 2.6.3.1. | Malikê Kurê ‘Ewf | 145 |
| 2.6.3.2. | ‘Urweyê Kurê Mes‘ud | 146 |
| 2.6.4. | Kesayetên ku Nebûne Misilman | 147 |
| 2.6.4.1. | Nacî..... | 147 |
| 2.6.4.2. | Sebî‘eyd | 148 |
| 2.7. | MOTÎFÊN SEREKE YÊN DI CENGNAMEYÊ DE..... | 148 |
| 2.7.2. | Unsûrên Dînî | 148 |
| 2.7.2.1. | Unsûrên Îslamî..... | 148 |
| 2.7.2.1.1. | Bawerîya bi Xwedê..... | 149 |
| 2.7.2.1.2. | Melek | 150 |
| 2.7.2.1.3. | Pirtûkên Pîroz | 151 |
| 2.7.2.1.4. | Pêxember | 152 |
| 2.7.2.1.4.1. | Hz. Muhemmed (s.x.l.) | 152 |
| 2.7.2.1.4.2. | Hz. Nuh | 153 |

| | | |
|------------|----------------------------|-----|
| 2.7.2.1.5. | Bawerîya Bi Axiretê | 154 |
| 2.7.2.1.6. | Îbadet | 155 |
| 2.7.2.1.7. | Ayet û Hedîs | 155 |
| 2.7.2.2. | Unsûrên Bawerîyên Din..... | 157 |
| 2.7.3. | Unsûrên Menqîbewî | 158 |
| 2.7.3.1. | Mu'cîze | 158 |
| 2.7.3.2. | Dirûvguherîn..... | 160 |
| 2.7.3.3. | Sihir..... | 161 |
| 2.7.4. | Usûrên Efsanewî | 162 |
| 2.7.4.1. | Hûrî | 162 |
| 2.7.4.2. | Şeytan..... | 163 |
| 2.7.4.3. | Cin..... | 164 |
| 2.7.4.4. | Ejderha..... | 165 |
| 2.7.4.5. | Dêw | 166 |
| 2.7.5. | Heywan | 167 |
| 2.7.5.1. | Mar..... | 167 |
| 2.7.5.2. | Masî | 167 |
| 2.7.5.3. | Hesp | 168 |
| 2.7.5.4. | Şêr | 169 |
| 2.7.5.5. | Hêştir..... | 169 |
| 2.7.5.6. | Gurg | 170 |
| 2.7.6. | Amûrên Cengê | 170 |
| 2.7.6.1. | Şûr..... | 171 |
| 2.7.6.2. | Gurz | 171 |
| 2.7.6.3. | Ahên..... | 172 |
| 2.7.6.4. | Cewşen..... | 172 |
| 2.7.6.5. | Super/Merţal | 173 |
| 2.7.6.6. | Rim..... | 174 |
| 2.7.6.7. | Zergan | 174 |
| 2.7.6.8. | Çomağ..... | 175 |
| 2.7.6.9. | Xencer | 175 |
| 2.7.6.10. | Sindan | 175 |
| 2.7.6.11. | Alem-Senceq..... | 176 |
| 2.7.7. | Amûrên Muzîkê | 177 |

| | | |
|----------|-------------|-----|
| 2.7.7.1. | Def | 177 |
| 2.7.7.2. | Zirne..... | 178 |
| 2.7.7.3. | Ney..... | 178 |
| 2.7.7.4. | Bilûr | 179 |

BEŞA SÊYEM

| | | |
|---|---|-----|
| DANASÎNA NUSXEYÊN CENGNAMEYA MELA YASÎNÊ ALIKÎ | 180 | |
| 3.1. | Nusxeya Yusif Yaşar (NYY)..... | 181 |
| 3.1.1. | Taybetîyên Nusxeya Yusif Yaşar..... | 182 |
| 3.2. | Nusxeya Muhemmed Emîn (NME)..... | 184 |
| 3.2.1. | Taybetîyên Nusxeya Muhemmed Emîn..... | 185 |
| 3.3. | Nusxeya Mela Huseynê Botî (NMH) | 187 |
| 3.3.1. | Taybetîyên Nusxeya Mela Huseynê Botî..... | 188 |
| 3.4. | Taybetîyên Îmlaya Nusxeyan | 189 |
| 3.4.1. | Îmlaya Nusxeya Yusif Yaşar | 189 |
| 3.4.2. | Îmlaya Nusxeya Muhemmed Emîn..... | 201 |
| 3.4.3. | Îmlaya Nusxeya Mela Huseynê Botî..... | 206 |
| 3.4.4. | Ferqên Di Navbera Nusxeya NYY û NMEê de | 207 |
| 3.5. | Amadekirina Metna Rexneyî | 210 |
| 3.5.1. | Rê û Rêbazên Amadekirina Metna Rexneyî | 210 |
| 3.5.2. | Alfabeya Transkrîpsiyonê | 210 |
| 3.5.3. | Latînîzekirin û Rêbaza Amadekirina Metna Ğezwetu Huneynê..... | 211 |
| 3.5.4. | Rastnivîs û Xalbendî | 214 |
| 3.5.5. | Ferhengoka Ğezwetu Huneynê | 216 |
| 3.6. | METNA REXNEYÎ YA ĞEZWETU HUNEYNÊ | 217 |
| ENCAM..... | 290 | |
| ÇAVKANÎ..... | 292 | |
| PÊVEK..... | 300 | |

KURTEBÊJE

| | |
|--------|-------------------|
| amd. | :amadekar |
| bnr. | :binêrin |
| bnb. | :berhema nav borî |
| c. | :cild |
| ç. | :çêbûn |
| edt. | :edîtor |
| h. | :hicrî |
| hej. | :hejmar |
| hwd. | :her wekî din |
| Hz. | :hezretî |
| m. | :miladî |
| n.r. | :navbera rûpelan |
| r. | :rûpel |
| s.x.l. | :slava Xwedê lêbe |
| s.s. | :sedsal |
| w. | :wefat |
| wer. | :werger |
| weş. | :weşanxane |

LÎSTEYA TABLO Û PÊVEKAN

Pêvek

| | |
|--|-----|
| Pêvek 1: Ferhengoka Ğezwetu Huneynê..... | 300 |
| Pêvek 2: Sê Helbestên Mela Yasînê Alikî..... | 306 |
| Pêvek 3: Hemû Rûpelên Nusxeya Yusif Yaşar..... | 315 |
| Pêvek 4: Rûpela Yekem a Nusxeya Muhemmed Emîn..... | 346 |
| Pêvek 5: Rûpela Dawî ya Nusxeya Muhemmed Emîn..... | 347 |
| Pêvek 6: Rûpela Yekem a Nusxeya Mela Huseynê Botî..... | 349 |
| Pêvek 7: Rûpela Dawî ya Nusxeya Mela Huseynê Botî..... | 350 |
| Pêvek 8: Hemû Îcazeyâ Hasan Tevfîk Marulcuyê zavê Şêx Îsmâil Çetîn..... | 352 |
| Pêvek 9: Wêneyê Mela Yasîn û kurê wî Mela Ebdulquddus..... | 360 |
| Pêvek 10: Wêneyê Mela Yasînê Alikî..... | 360 |
| Pêvek 11: Wêneyê Mela Yasîn û malbata wî..... | 361 |
| Pêvek 12: Gora Mela Yasînê Alikî û ya jina wî Hemîde Çelebî..... | 362 |
| Pêvek 13: Kêlê gora Mela Yasînê Alikî..... | 362 |

Tablo

| | |
|---|-----|
| Tablo 1: Şecereya binemala Mela Yasînê Alikî..... | 31 |
| Tablo 2: Şecereya binemala Mela Yasînê Alikî..... | 32 |
| Tablo 3: Şecereya binemala Mela Yasînê Alikî..... | 33 |
| Tablo 4: Hevşibîna Hin qismên Cengnameya Mela Yasînê Alikî û ya Muhemmed Efendî..... | 58 |
| Tablo 5: Tabloya herfên transkrîpsiyonê..... | 211 |

DESTPÊK

I. METODOLOJÎ

Di vê xebatê de metod, rê û rêbazên ku hatine bikaranîn di bin van sernavên jêr de hatine destnîşankirin.

A. Mijar, Giringî û Armanca Tezê

Edebîyata klasîk ya Kurdî di nav çanda Îslamê de şax daye û di bin bandora dînê Îslamê de gelek berhemên Kurdî hatine wucûdê. Mijara vê xebata me *Ĝezwetu Huneyn* a Mela Yasînê Alikî û jîyana Mela Yasînê Alikî ye. Ev berhema ku bûye mijara vê xebata me mehsûleke vê çandê ye û berhemeke menzûm a dînî-edebî ye.

Mela Yasînê Alikî alimekî dewra xwe bûye û pêgirtîyê terîqeta Neqşebendîyê bûye. Herwiha helbestvanekî sedsala 20em e û li gor daneyên li ber destê me li ser Cenga Huneynê ya ku di dewra Hz. Muhemmed (s.x.l.) de pêk hatiye berhema xwe ya bi navê *Ĝezwetu Huneyn* nivîsîye. Ev xebata me dê li ser jîyan û berhema Mela Yasînê Alikî ya bi navê *Ĝezwetu Huneynê* be. Ji ber ku di edebîyata Kurdî de berhemên bi cûreya cengnameyê kêmtir in, ji vî alîyê ve ev berhema Mela Yasînê Alikî girîng e û ev berhem bi hindikî be jî dê vê valahîyê kêmtir bike.

Mela Yasînê Alikî heta niha nehatiye naskirin û haya ti kesî ji wî û ji berhemên wî çênebûye. Li ser wî û berhemên wî ti xebatên akademîk nehatine kirin û ev berhema wî nehatiye çapkirin. Bi vê xebata me dê Mela Yasînê Alikî û berhema wî ya bi navê *Ĝezwetu Huneynm* werin naskirin û dê cihên xwe yê di nav edebîyata Kurdî de bigirin. Bi vê xebatê em dê vê berhemê ji bo xwêner û hezkirîyên edebîyata Kurdî bidin naskirin û bi vî awayî dê ev berhem ji têkeve xizmeta ziman û edebîyata Kurdî.

B. Çarçove û Rêbaza Tezê

Çarçove û sînorên vê xebata me jîyan, berhem û analîza *Ġezwetu Huneyn* a Mela Yasînê Alikî ye. Ev xebata me ji destpêk, sê beş, encam û ji pêvekan pêk hatiye. Di destpêkê de armanc, giringî û rêbaza xebatê hatine destnîşankirin. Herwiha pênase û danesîna cûreyên dînî-edebî û destanî hatin kirin. Di beşa yekem de jîyan, malbat û berhemên Mela Yasînê Alikî hate dayîn. Di beşa duyem de analîza *Ġezwetu Huneynê* hate kirin. Di beşa sêyem de danasîna nusxeyên li ber dest hate kirin û taybetiyên îmlaya destxatan hat destnîşankirin û herwiha metna rexneyî ya *Ġezwetu Huneynê* hate derxistin. Herî dawî bi encam û pêvekan dawî li vê xebatê hate dayîn.

Di metna Cengnameya Huneynê ya Mela Yasînê Alikî de “*Ġezwetu Huneyn*”ê weke navê berhemê hatiye nivîsîn. Lêbelê ji ber ku ev berhema menzûm ji aliyê cûreya xwe ve Cengnameyeke Îmamê Elî ye me di nav metnê de navê “*Cengnameya Huneyn*”ê jî bi kar anî û ji vî navî jî qesda me dîsa berhema Mela Yasînê Alikî ya bi navê “*Ġezwetu Huneyn*”ê ye.

II. METNÊN DÎNÎ Û DESTANÎ

Metnên dînî û destanî ew metn in ku di xwe de hêmayên dînî û destanî vedihewînin. Em dikarin hin metnên menzûm yê weke destan, xezaname, sîyer û cengnameyan di nav metnên dînî û destanî de bihesibînin. Lewra di nav van cûre berhemên de hem aliyên wan yê dînî hene hem jî yê destanî hene. Di vê beşê de derbarê destan, xezaname, sîyer û cengnameyan û cihên wan yê di edebiyata Kurdî de panoramayekê li ber çavan bê raxistin. Çunkî metna ku bûye mijara vê xebatê ji hin alîyan ve dişibe van cûreyên navborî û hewceyî bi behsa van cûreyan heye.

Edebîyata Kurdî ji ber gelek sedemên cuda ji gelek alîyan ve nehatiye naskirin û tesnîfkirin. Gelek berhemên Kurdî yan bi awayekî akademîk nehatine naskirin yan jî nehatine dîtin ku bikevin nav lîteratura Kurdî. Herwiha edebîyata Kurdî ji aliyê metnên dînî û destanî ve bi awayekî birêkûpêk nehatiye tesnîfkirin û polînkirin. Ji ber vê yekê di edebiyata Kurdî de di vê mijarê de pêwîstî bi tesnîfeke akademîk heye.

Metna ku bûye mijara vê xebata me metneke piralî ye, ji ber vê hindê tesbîtkirina cûreya wê ne hêsan e. Em dê hewl bidin ku cûreya metna xwe dîyar bikin. Metna me ji hin alîyan ve dişibe xezanameyê, ji hin alîyan ve dişibe cengnameyê û ji hin alîyan ve jî dişibe destanê. Di edebîyata Kurdî de sedema vê alozî û tevlihevîyê ji ber nebûna tesnîfeke bi rêkûpêk e. Lewra destan, efsane, xezaname, cengname, zafername, fetihname, û hwd. metnên menzûm-mensûr û edebî ne. Her çiqas bi awayê menzûm-mensûr hatibin nivîsandin jî ji hin alîyan ve ji hev vediqetin. Ev metnên dînî yê navborî axlebî bi cûreya mesnewîyê hatine nivîsîn û kêşa wan a erûzê ne saxlem e û ji ber vê yekê ev metn bi kêşa birgeyî bîn qebûlkerin dê durusttir be¹.

Abdurrahman Adak mesnewî ji aliyê naverok û cûreyê edebî ve di bin çar serenavan de weha dabeş kiriye:²

1. Mesnewîyên Lîrik: a) Mesnewîyên Evînî. b) Mesnewîyê Dînî: Munacat, Mewlûdname, Şemaîl, Mî'racîye.
2. Menewîyên Dîdaktîk: a) Mesnewîyên Exlaqî. (Pendanme). b) Zanistên Îslamî. c) Tarîx.
3. Mesnewîyên Epîk/Hemasî.
4. Mesnewîyên Civakî/Çandî/Xwecihî.

Zeynep Koyuncu di gotara xwe de li gorî naverokê cih daye tesnîfa berhemên destan, efsane, xezaname, cengname, zafername, fetihname, û hwd. Tesnîfa Koyuncu jî li ser çar koman hatiye dabeşkirin. Ew kom bi vî awayî ne:

Koma ewil: Ev mesnewî ji bo dayîna agahîyan hatine nivîsîn û armanca wan perwerdekirina kesên xwendevan e. Mesnewîyên dînî, mesnewîyên tesewûfî, mesnewîyên exlaqî û mesnewîyên ansîklopedîk dikevin nav vê komê.

Di edebîyata Kurdî weke nimûne: *Nûbihara Biçûkan* a Ehmedê Xanî (1651-1707), *Nehcu'l-Enama Mela Xelîlê Sêrtî* (1750-1843) dikevin nav vê komê.

¹ İsmet Çetin, *Türk Edebiyatında Hz. Alî Cenknâmeleri*, T.C. Kültür Bakanlığı Yayınları, Ankara 1997, n.r. 97-98.

² Ji bo nîmûne û agahîyên berfirehtir bnr.: Adak, 2019, n.r. 324-345.

Koma Duyem: Ew mesnewîyên ku li ser lehengîyê ne û ew xîtabê hestên mirov dikin. Mesnewîyên ku mijara xwe ji menqîbe û mesnewîyên ku mijarên xwe ji dîrokê digirin dikevin nav vê komê.

Di edebîyata Kurdî de berhemên weke: *Kela Dimdimê* ya Feqîyê Teyran (w.1632), *Rustemê Zal*, *Qewlê Newala Sîsebanê*, *Borê Qer* û herwiha *Ġezwetu Huneyn* a Mela Yasînê Alikî dikevin nav vê komê.

Koma Sêyem: Ew mesnewîyên ku di wan de huner li pêş e û li ser mijarên weke evîn û serpêhatîyan têne nivîsîn.

Di edebîyata Kurdî de berhemên weke: *Mem û Zîn*, *Leyla û Mecnûn*, *Yûsif û Zelîxa* û *Zembilfiroş* dikevin nav vê komê.

Koma Çarem: Ew mesnewîyên ku behsa dîtinên nivîskar, bûyerên ku bi serê wî de derbas bûne dikin. Ew mesnewîyên ku behsa hin beşên jîyana civakê; kesan, dawet û teswîrên hin herêman dikin.³

Di edebîyata Kurdî de *Beyana Xwarinan û Zewqên Wan (Simatîye)* ya Şêx Muhyeddînê Hênî (w.1899) dikarin di nav vê komê de were hesabandin.

Dema em li edebîyata Kurdî mêze dikin di her çar koman de berhem hatine dayîn. Em dikarin *Qewlê Newala Sîsebanê*, *Borê Qer*, *Destana Kela Dimdimê* û *Ġezwetu Huneynê* weke metnên dînî-destanî bisenifînin. *Qewlê Newala Sîsebanê*, *Borê Qer* û *Ġezwetu Huneyn* dikevin nav kategorîya metnên dînî-destanî, *Destana Kela Dimdimê* jî dikeve nav kategorîya metnên destanî.

Metna ku bûye mijara vê xebatê ji ber ku alîyên wê yên destanî, xezaname, sîyer û cengnameyê hene em dê li jêr van her çar cûreyên navborî rave bikin. Herwiha em dê hewl bidin cûreya menzûmeya *Ġezwetu Huneynê* jî dîyar bikin.

³ Zeynep Koyuncu, "Edebî Türlerden Cenk-name/Gazavat-name karşılaştırması ve Muhammed Hanefî- Tabut Cengi'nin Yeni Bir Nüshası," *Alevilik-Bektaşilik Araştırmaları Dergisi*, hej. 21, 2020, r. 137-138.

A. Destan

Destan, cureyek ji vegotinên gelêrî ye ku hem motîfên mîtolojîk û hem jî yên efsanewî vedihewîne. Wek cûreyên din rûdana destanan jî têkildarî pêdiviyên civakî û çandî ye û belkî ji wan cûreyên din bêhtir hest û ramanên gelekî an jî civakekê vedihewînin; lewra ji alîyekî ve dîroka neteweyê, komê an jî civakê vedibêjin.⁴ Ji bo ku destan derbikevin holê divê bûyereke girîng pêk were û ev bûyer li civatê jî tesîr bike. Bûyerên weke şer û cengan çawa ku dikarin bibin mijarên destanan herwiha dikarin bibin mijarên cengname û xezanameyan jî. Bi hin nuansan ev cûre ji hev vediqetin. Her çiqas di destanan de şer hebin jî bi gelemperî ev şer, şerên neteweyekî ne û bûyer li derdora wî neteweyî diqewime. Destan li gor pêdivîya demê ji bo avakirina neteweyekî bûye amûreke kêmpayda.⁵ Çend destanên Kurdî ev in: Memê Alan, Kela Dimdimê, Siyabend û Xecê, Zembîlfiroş, Kerr û Kulîk û hwd.

Gel, hêmayên weke destan û mîtan ji xwe re dikin bingeh û neteweya xwe li ser wan ava dikin. Lê dema em li cengname û xezanameyan mêze dikin hêmayên netewetîyê ne li pêş in û di van metnan de armanca sereke teblîxkirina dîn e. Di cengnameyan de şopên adet û kevneşopîyên gelekî hebin jî ev yek ne ji bo avakirina neteweyekî ye. Ji ber vê yekê cûreya destan û cûreyên xezaname û cengnameyan jî hev vediqetin. Em dikarin bibêjin ku *Ĝezwetu Huneynê* ji ber ku ne malê neteweyekî ye û armanca wê ya sereke teblîxkirina dînê Îslamê ye nakeve nav cûreya destanê. Lewra di vê berhemê de Hz. Elî weke serleheng derdikeve hemberî me û mijara berhemê jî Cenga Huneynê ye ku di serdema Hz. Muhemmed (s.x.l.) de bi mişrîkan re hatiye kirin. Armanca sereke ya vê cengê jî belavkirina dînê Îslamê ye.

⁴ Necat Keskin, **Foklor û Edebîyata Gelêrî**, Weşanên Avesta, Istanbul 2019, r. 177.

⁵ Mehmet Şirin Filiz, “**Xebatek li Ser Destana Dewrêşê Evdî**”, (Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî), Mêrdîn 2014, r. 20.

B. Xezaname

Bêjeya “Xeza”yê di Erebi de ji koka “غزو-ğzw” ê tê.⁶ Xezawat jî pirjimarîya bêjeya xezayê ye û tê maneya êrîş, çûyîna cengê, cengkirin û şerên ji bo dîn.⁷ Herwiha piştîre bi bêjeya cîhadê re jî hemwate hatiye bikaranîn û cîhad jî tê maneya cenga ku bi dijminê dîn re tê kirin.⁸ Xezaname bêjeyeke hevedudanî ye û ji bêjeyên xeza û nameyê pêk hatiye. Xeza tê maneya cengên ji bo dîn û name jî tê maneya nivîsê, yê nivîsandî, pirtûka biçûk. Xezawetname jî ew metnên menzûm an jî mensur in ku behsa lehengî û herbên fermanarekî mezin dikin.⁹ Ji ber vê hindê ji wan metnên ku tê de behsa herbê tê kirin weke xezaname-xezawetname hatine binavkirin.

Çi bi leşkerên zêde çî jî kêr; çî ji bo cengê an jî ji bo armanceke din, tê de pevçûn hebe an jî tunebe ji wan hemû seferên ku Hz. Muhammed (s.x.l.) beşdar bûye re “xezwe” hatiye gotin. Li gor dîroknasên Îslamê di bin rêvebirî û fermanariya Hz. Muhammed (s.x.l.) de 27 xezwe pêk hatine.¹⁰ Ji ber vê yekê ew metnên ku behsa cengên bi xeyrîmuslîman re hatine kirin weke xezaname an jî xezawetname hatine binavkirin. Di xezanameyan de bi piranî behsa cengekê tê kirin û di xezawetnameyan de jî behsa çendîn cengan tê kirin.¹¹ Di xezanameyan de fetihkirin tune ye û tenê herb heye.¹²

Mînakên ewil ên xezanameyan di edebîyata Erebi de tene dîtin û weke “meğazî” hatine binavkirin. Mexzat tê maneya cihê herbê, herb û çîrokên herbê, mexazî piranîya bêjeya “meğzat”ê ye. Bêjeya mexzatê ji bo xeza, serîyeyên pêxember û ji bo pirtûkên ku li ser vê mijarê hatine nivîsîn, hatiye bikaranîn. Herwiha bêjeya mexazî weke hemwateya bêjeya sîyerê hatiye bikaranîn hem bi tena serê xwe hem jî

⁶ Dema Gihandinê: (01.08.2021), (<https://www.etimolojiturkce.com/kelime/gaza>)

⁷ Agâh Sirri Levend, **Gazavatnameler ve Mihaloğlu Ali Beyin Gazavatnamesi**, Türk Tarihi Kurumu, 2. Baskı, Ankara 2000, r. 1.; Ferit Devellioğlu, “Gazaname”, **Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Lügat**, Aydın Kitabevi, Ankara 2017, Çap 33, r. 326. ; Mustafa Erkan, “Gazavatname”, **DİA**, İstanbul 1996, c. 13, n.r. 439-440.

⁸ Erkan, 1996, r. 439-440.;

⁹ Develioğlu, 2017, r. 326.

¹⁰ İbrahim Sarıçam, **H. Muhammed ve Evrensel Mesajı**, DİB Yayınları, Ankara 2011, r. 150-151.

¹¹ Mustafa Erkan, “Gazavatname”, **DİA**, c. 13, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 1996, n.r. 439-440.

¹² Levend, 2000, r. 1.

bi bêjeja sîyerê re hatiye bikaranîn.¹³ Ev cûre berhem ji bo berhemên dînî-destanî bûne destpêk. Piştî vê cûreyê, cûreyên dîtir jî hatine nivîsîn. *Kîtabu'l-Mexazî* yek ji wan pirtûkên navdar yê cûreya mexazî ye.¹⁴

Xezaname ji ber ku tenê behsa herbekê dikin gelek bi hûrgilî ne û bêtir li derdora wî kesê ku herbê dike têne nivîsîn. Agâh Sırrı Levend ji alîyên mijarên xwe ve xezaname kirine sê cûre:

1. Xezanameyên ku teswîr û şayesandina xezayên padîshahekî dikin. Ev cûre di Tirkî de weke Selîmname û Suleymanname hatine binavkirin.
2. Xezanameyên ku behsa xezayên femandarekî an jî wezîrekî navdar dikin. Weke: Barbaros Hayreddîn, Köprülü Fazıl Ahmed û hwd.
3. Xezanameyên ku behsa bidestxistina keleşekê an jî cihekî dikin.¹⁵ Weke: Fetha Kelaya Nova.

Di nav edebîyata Rojhilatî de ji bilî xezanameyan em rastî cûreyên weke; Cengname, Hemzaname û Muslîmnameyan tên. Herwiha di edebîyata Tirkî de em ji keynî cûreyên navborî rastî Battalname, Danîşmendname, Cengîzname, Xizirname, Salname, Antername û hwd. tên.¹⁶ Di Kurdî de jî em rastî cûreya cengname û xezanameyan tên.

B.1. Dîroka Xezanameyan

Mînakên ewil ên xezanameyan di edebîyata Erebî de derketine holê û weke “meğazî” hatine binavkirin û di mexazîyan de serê ewil tenê behsa herbên pêxember hatine kirin. Di edebîyata Erebî de kesên weke; Ebû Muhammed b. Saîd b. el-Mûseyyeb el-Mehzûmî (w. 94/ 713), Ebû Fadala Ubeydûllah b. Kab. Malik el-Ensarî (w. 97/715), ‘Emr b. Şarahîl eş-Şa‘bî (w. 103/722), Kurê Hz. Osman Eban b. Osman b. Affan (w. 96/714), Urwe b. ez- Zubeyr el-Ewwam el-Esedî (w. 94/712), Şurahbîl

¹³ Mustafa Fayda, “Sîyer ve Megazî”, **DİA**, c. 37, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 2009, n.r. 319-324.

¹⁴ Erkan, 1996, n.r. 439-440.

¹⁵ Levend, 2000, r. 4.

¹⁶ M. Özcal Oğuz, **Türk Halk Edebiyatı El Kitabı**, Grafiker Yayıncılık, Ankara 2008, n.r. 114-115. Mehmet Gümüşkılıç, “Bir Gazavat-Nâme Etrafında Hz. Ali’nin Halk Muhayyilesindeki Yeri”, **The Journal of Academic Social Science Studies**, c. 5, r. 145-155.; İsmet Çetin, **Türk Edebiyatında Hz. Ali Cenknameleri**, Kültür Bakanlığı Yayınları, Ankara 1997, r. XXXV.

b. Sa'd (w. 123/731), Wehb b. Mûnebbih (w. 110/728) di cûreyên sîyer û mexazîyan de berhem dane.¹⁷

Piştî edebîyata Erebi em di nav edebîyata Farisî de jî rastî cûreya xezanameyê tîn. Kesên weke; Hemdullahê Mustawî, Ehmedê Tebrîzî, Seyfî, Xoce Ebdulmelîk Îsamî, Şerefeddîn Elî Yezdî, Azerîyê Tûsî¹⁸ bi Farisî xezaname nivîsîne.

Di edebîyata Tirkî de nimûneyên ewil yê xezanameyan di sedsala 15em û pê ve tîne dîtin û di sedsala 16em de berfirehtir dibe.¹⁹ Di edebîyata Tirkî de xezaname bêtir weke menzûm û bi cûreya mesnewîyê hatine nivîsîn. Xezaname ji alîyê mijarên xwe ve dişibin Zafername û Fetihnameyan. Di edebîyata Tirkî de heta niha ji 250 hebî zêdetir xezaname hatine tesbîtkirin. Çend mînakên edebîyata Tirkî ev in: Xezawetnameya Sûzî Çelebîyê Prîzenî, *Xezaweta Sultan Murat*, *Xezaweta Heyreddîn Paşa* ya Seyyîd Murad, *Xezewata Sultan Suleymanê Kanûnî* û hwd.²⁰

Di edebîyata Kurdî de jî em rastî cûreya xezanameyê tîn, lê mînakên ku heta niha hatine tesbîtkirin ne zêde ne. Me li jor anîbû ziman ku edebîyata Kurdî ji ber ku bi awayekî birêkûpêk nehatiye tesnîfkirin ev mijara tesnîfê şolî ye û tê de gelekî tevlîhevî heye. Ev tevlîhevî di nav berhemên ku di cûreya xezaname û cengnameyê de hatine nivîsîn jî tê dîtin. Herwiha ev tevlîhevî di edebîyata Tirkî de jî tê dîtin. Ji ber ku ev her du cûre jî gelek alîyan ve dişibin hev jihevveqetîna wan jî ne hêsan e. Ji ber vê yekê di edebîyata Kurdî de ji berhemên weke: “*Qewlê Newala Sîsebanê*” û “*Borê Qer*” re hem xezaname hatiye gotin û hem jî cengname. Herwiha ji bilî berhemên navborî Ayhan Yıldız di pirtûka xwe de berhemên weke *Şerê Bulxar û Yûnanan*, *Şerê Êrus*, *Şerê Kopê*, *Çekameya Şoreşa Bedlîsê*, *Huseynê Kurdîşah* û *Xezaya Muazê Cebelî*²¹ jî di nav cûreya xezanameyê de hesabandiye.

¹⁷ Kürşat Şamil Şahin, “*Gazavatnamelerde Edebi Savaş Tasvirleri*”, (Yayımlanmamış Doktora Tezi, Kırıkkale Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Türk Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı), Kırıkkale 2015, r. 44.

¹⁸ Şahin, 2015, r. 46.

¹⁹ Levend, 2000, r. 4.

²⁰ Erkan, 1996, n.r. 439-440.

²¹ Ayhan Yıldız, *Qewlê Hespê Reş Lêkolîn û Metn*, Weşanên Peywend, Wan 2021, n.r. 44-54. Berhemên bi navê *Şerê Bulxar û Yûnanan*, *Şerê Êrus* û *Şerê Kopê* ne nivîskî ne û ji alîyê denbêjan ve weke kilam hatine gotin.

Di edebîyata Soranî de jî metnên dînî, edebî-destanî hene. Hêmin Umer Xoşnaw behsa van du metnên bi navê *Re'su'l-Xul* û *Behnesa* dike û dibêje muelîfên wan nayê zanîn. Herwiha li gor Xoşnaw ev metn ji pexşana Erebi hatine wergerandin û di Kurdî bi awayê menzûm hatine nivîsîn. Ev metn li gorî Xoşnaw xezaname ne. Lewra li ser şerê serdema pêxember in û ev şer di navbera muslîm û xeyrîmuslîman de derbas dibe. Li jêr em dê ji her du berheman mînanan bidin.

Hin bend ji serî û ji dawîya berhema bi navê “Re’su’l-Xul”ê weha ne:

Ewwel delêm ya Subhan

Xalîqî erz û asiman

Xalî le ‘eyb û nuqsan

Bê şerîk û la-mekan

Sahêbî ‘ilm û hîkmet²²

Yên dawî jî weha ne:

Be nesibîş bikey

Zîyaretî şefî‘et

Ber şefa‘etî bêxî

Be eltafî qedîmet²³

Hin bend ji serî û ji dawîya berhema bi navê *Behnesa* weha ne:

Ewwel be namî to Rebbena

Layiq te hemd û sena

Kar û bazarit dana

Ke ‘alemit kird bîna²⁴

²² Hêmin Umer Xoşnaw, **Re’su’l-Xul**, Weşanên Grafik, Diyarbekir 2017, r. 19.

²³ H.b. Xoşnaw, 2017, r. 418.

²⁴ Hêmin Umer Xoşnaw, **Behnesa**, Weşanên Grafik, Diyarbekir 2017, r. 41.

Yên dawî jî weha ne:

Ya Rebbî le katibîş xoş bî

Bo xatirî seyyîdî enwarit

Selat û selam bê hed bin

Le ser Mihemed hem al û eshab

Xuda ew kese bikey 'alî meratib

Bika du 'ay xêr bo yar û ehbab²⁵

Her çiqas fokûsa berhemên cûreya cengname û xezanameyan ne jîyana cenabê pêxember be jî em di wan de rastî beşên jîyana cenabê pêxember jî tên. Ji ber ku xezaname heta radeyekî weke sîyer dikarin bên hesabandin em dê li jêr bi kurtahî behsa sîyerê bikin.

C. Sîyer

Sîyer di ferhengê de tê maneya hal, rewş, tevger, îdare, rê, liv û meşînê. Sîyer pirjimara bêjeya “Sîret”ê ye. Di Qur’anê de di maneya “rewş”ê de hatiye bikaranîn.²⁶ Sîyer û Sîret ji bo berhemên ku qala jîyana pêxember dikin û herwiha ji bo beşa ku li ser jîyana cenabê pêxember dixebite tê gotin.²⁷ Ji ber ku “Sîyer” bêtir ji bo jîyana cenabê pêxember hatiye bikaranîn di nav gel de weha bi cî bûye. Lê ji bo kesên dîtir jî sîyer hatine nivîsîn. Weke; Sîret’l-Huseyn, Sîreta ‘Omer b. ‘Ebdil‘ezîz û Sîreta Ehmed b. Hanbel.²⁸ Herwiha ji bîlî van, berhemên ku behsa qewmekî jî dikin weke sîyer hatine binavkirin. *Sîyera Ekradan* ya Ebdulqadîrê Baban ji vê yekê re dibe nimûne.²⁹ Di nav Ereb, Fars û Tirkan de nivîsîna sîyeran berbelav e û em di Kurdî de jî rastî sîyeran tên.

²⁵ Hêmin Umer Xoşnaw, *Behnesa*, Weşanên Grafik, Diyarbekir 2017, r. 531.

²⁶ Ahmet Yaman, “Sîyer”, *DİA*, c. 37, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 2009, n.r. 316-319.

²⁷ Ahmet Ermurat, “*Muhammed’in Manzum Sîyer-i Nebî’si (İnceleme-Metin)*,” (Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi, Erciyes Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü İslam Tarihi ve Sanatları Anabilim Dalı Türk İslam Edebiyatı Bilim Dalı), Kayseri 2019, r. 3.

²⁸ Ermurat, 2019, r. 3.

²⁹ Esra Ceylan, “*Sîyerü’l-Ekrad Adlı Yazma Eserin Çevirisi ve Değerlendirmesi*,” (Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi, Mardin Artuklu Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Tarih Ana Bilim Dalı), Mardin 2017, r. 9.

C.1. Dîroka Sîyeran

Di nav Ereban de bi kesên weke Îbnî Îshak û Îbnî Hîşam nivîsîna sîyeran dest pê kiriye. *Kîtaba Sîreta Resûlellah* ya Ibnî Hîşam, *es-Sîretu'n-Nebevîyye* ya Ebu'l-Hesen Ehmed b. Ebdillah el-Bekrî (w.1295), *el-Munteka fî Mevlîdî'l-Mustafa* ya Saduddîn Muhemmed b. Mesud el- Kazerûnî (w. 1357), *Nazmu's-Sîyer* a Îbrahîm b. Mustafa el-Medarî el- Halebî (w. 1777) hin ji sîyerên Erebi ne.³⁰

Di nav Farisan de nivîsîna sîyeran bi tercumeyên sîyerên Erebi dest pê kiriye. Hin ji wan berhemana ev in; *Tercumeya Sîyerî Nebî* berhemeke anonîm e, *Durcu'd-Durer fî Beyanî Milad Seyyîdî'l-Beşer* ya Emir Seyyîd Esîluddîn Ebî'l-Mefaxîr Ebdullah b. Ebdurrahman el- Huseynî eş-Şîrazî (w. 1478).³¹

Di nav Tirkan de nivîsîna sîyerê bi Mustafa Darîrê Erziromî dest pê kiriye. Darîr di sedsala 14an de berhema xwe ya bi navê *Sîretu'n-Nebî* nivîsîye. Darîr ev berhema xwe bi rêya tercumekirina berhemên Erebi û Farisî amade kiriye. Hin sîyerên Tirkî ev in: *Tercumeya Şevahîdu'n-Nubuwwa* ya Lamiî Çelebîyê Bursayî (w.1532), *Sîretu'n-Nebî* ya Muhemmed Efendî (s.s. 15an), *Sîyera Weysîyê Zeylî* ya Newî'zade 'Ataullah (w. 1634), *Sîyera Nebî* ya Munîr Memed Çelebîyê Amasyayî (s.s.16an) û hwd.³²

Di nav edebîyata Kurdî de jî em rastî cûreya sîyerê tîn, hin sîyerên bi Kurdî ev in: *El-Hemâilû Fîş Şemâilî* û *El-Cewahîru'r-Reşadîye Fî Sîretî'n-Nebewîyye* ya Mela Nûrûllahê Godîşkî (w. 2003), *Gulzara Şêx Tahîrê Şoşî* (1917-1962), *Mewlûda Sîyer* a 'Ebdurrehmanê Xerxurî el-Perwarî (?) û hwd.³³

³⁰ Yıldırım Kaplan, "Erzurumlu Kadı Mustafa Darîr'in Kitâb-ı Sîyer-i Nebî'si", (Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi, Ankara Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü İslâm Tarihi ve Sanatları (İslâm Tarihi) Anabilim Dalı), Ankara 2006, n.r. 20-21.

³¹ Kaplan, 2006, r. 22.

³² Ermurat, 2019, n.r. 8-10.

³³ Fahrî Titiz, "El-Cewahîru'r Reşadîye fî Sîretî'n-Nebewîyye ya Mela Nûrûllahê Godîşkî (Metn û Lêkolîn û Ferheng)", (Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Bîngolê Enstîtuya Zimanên Jîndar Makezanista Ziman û Edebîyata Kurdî), Bingol 2020, n.r. 27-31.

D. Cengname

Cengname ji du bêjeyan pêk hatiye. “Ceng” tê maneya herb, şer û lihevixistinê, “name” jî tê maneya nivîs û pirtûkçeyê. Cengname jî ew pirtûkên ku behsa çîrokên şer dikin.³⁴ Li gorî Jean-Louis Mattei jî cengname ew cûreya edebî ye ku bi awayekî mibalexe û mucîzewî qala bûyerên ku dê ti carî neqewimin dikin. Herwiha Mattei dibêje ku ew bûyer di navbera misilman, xiristîyan û wan kesan de ku bawerî bi dîn neanîne derbas dibin. Bûyerên cengnameyan axlebî li derdora Hz. Elî, Hz. Muhemmed (s.x.l.), eshabî û kesên ku ji aliyê muelîfan ve hatine afirandin, derbas dibin. Cengname ew berhem in ku bûyerên dîrokî di xeyalên nivîskaran de dirûv girtine û çêkirî ne. Ji ber vê yekê cengname ne weke bûyerên dîrokî rastîn in.³⁵

Li gor Îsmet Çetin: Cengnameyên Hz. Elî ew metn in ku li derdora qehremanî, mêrxasî, pehlewaniyê û egîdîya Hz. Elî hatine saz kirin. Ji sedsala 13em û pê ve li seheya Enadolê bi rêya tercume, adapte an jî bi rêya te’lîfê cengnameyên Hz. Elî hatine nivîsîn. Destanên ku berîya Îslamîyetê li derdora kesê “Egîd” hatibûn hûnandin bi unsûrên dînî hatine tijekirin. Ev lehengê Egîd bi avêtina xisûsîyetên maddî û bi derxistina pêş ya xisûsîyetên manewî û bi wergirtina hin xisûsîyetên lehengên Welî jî, ev leheng vegeşîyaye ser kesayeta “Xazî” û ji ber vê yekê ev metn destanên dînî ne.³⁶

Di cengnameyan de di serî de Hz. Elî û lehengên din, kesên ku li ser soza xwe ne, comerd in, dest nadin tiştên ku heq nekirine, dest nadin ew kesên ku nanên wan xwarine û li hemberî zaliman mezlûm parastine. Bûyerên cengnameyan li derdora Hz. Muhemmed (s.x.l.), Hz. Elî û zarokên Hz. Elî diqewimin.³⁷ Cengnameyên Hz. Elî li ser wêrekî û şervaniya Hz. Elî ne, di cengnameyan de Hz. Elî lehengekî bêqiyas e û kesek li hemberî wî nikare bisekine. Heta Hz. Elî ne li meydanê be rewşa misilmanan xerab e, lê piştî ku Hz. Elî derdikeve meydanê misilman bi ser dikevin û dijmin têk diçin.

³⁴ Develioğlu, 2017, r. 150.

³⁵ Jean-Louis Mattei, **H. Ali Cenknâmelerî**, Kitabevi Yayınları, İstanbul 2004, r. 18.

³⁶ İsmet Çetin, **Türk Edebiyatında Hz. Ali Cenknâmeleri**, T.C. Kültür Bakanlığı Yayınları, Ankara 1997, r. XXX.

³⁷ Toprak, 2016, r. 9.

Cengnameyên Hz. Elî ew berhem in ku ji bo teblîxkirin û belavkirina dîne Îslamê hatine nivîsîn. Serlehengên van cengnameyan Hz. Elî û rêhevalên wî ne ku ji bo rizaya Xwedê bi dijminên dîn re şer dikin.³⁸ Hz. Elî kesayetekî girîng yê serdema belavbûna Îslamê ye. Ji ber vê yekê li dor wî gelek berhemên qehremanî hatine nivîsîn û bi gelemperî di van berhemên de Hz. Elî weke belavkarê dîne Îslamê tev digere û ji bo vê yekê şer dike.

Dema em ji alîyê ziman ve li cengnameyan mêze dikin zimanekî xwerû û zimanê gel derdikeve hemberî me. Cengname ji ber ku ji bo gel tene nivîsîn, nivîskaran zimanekî sade di cengnameyan de tercih kirine da ku gel bi hêsanî jê fêhm bike.³⁹ Di nav zimanê cengnameyan de taybetîyên dewrên ku tê de hatine nivîsîn hene. Herwiha ji ber ku metnên li ser herbên e bêje û peyvên ku bi herbê re têkildar in tê de pir in. Herwiha ji ber ku berhemên dîni ne em di wan de rastî gelek têgehên dîni jî tên.⁴⁰

D.1. Cudahî û Wekhevîyên Cûreyên Xezaname û

Cengnameyan

Heta niha gelek xebat li ser cûreyên xezaname û cengnameyan hatine kirin û ji gelek alîyan ve ev cûre hatine vekolîn. Lê di kêma çavkanîyan de em rastî ferq û hevparîyên van cûreyan tên.

Me li jor pênasîyên her du cûreyan destnîşan kiribû: bêjeya xezayê tê maneya şer, cengên dîni û xezaname jî ew berhemên li ser şer in. Bêjeya cengê tê maneya şer, şerkirin, cengname jî ew berhên ku behsa şer û cengê dikin. Lê di cengnameyan de tenê ne şer heye herwiha bûyer, hedîse, hêma û unsûrên derasayî jî hene û leheng li hember van bûyer û hêmayên derasayî jî têdikoşe. Ji vê taybetîya xwe xezaname û cengnamê ji hev vediqetin. Di cengnameyan de bûyer bi unsûrên derasayî weke; cin,

³⁸ Ji bo agahîyên berfirehtir bnr.: Çetin, 1997, r. 327.; Eda Bülbül, “**Hazret-i Ali Cenklere Üzerine Bir Tektik (İnceleme-Metin)**”, (Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi, Cumhuriyet Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Lisansüstü Eğitim, Öğretim ve Sınav Yönetmeliğinin Türk Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı), Sivas 2008, r. 9.; Rugeş Demir, “**Manzum Hz. Ali Cenklereinden Yemane Cengi Üzerine Bir İnceleme**”, (Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi, Kastamonu Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Türk Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı), Kastamonu 2019, r. 5.; Rugeş Demir, Hz. Ali Cenkâmelerinde “Yemâne Cengi”nin Yeni Bir Nüshası”, **İslam Medeniyeti Dergisi**, hej. 7, sal 2021, n.r. 50-64.

³⁹ Aldo Galotta, “Gazavât-ı Hareddîn Pâşâ”, **Bulleten Dergisi**, (Wer. Salih Akdemir), c. 47, n.r. 473-500.

⁴⁰ Atalan, 2011, r. 48.

cadû, dêw, ejderha û hwd⁴¹ hatine xemilandin û bi vî awayî ji rastîyê dûr ketine. Tevî vê cudahîyê jî xezaname û cengname ji ber ku metnên li ser herbê ne dişibin hev. Li gor Metin Akkuş cengname beşên xezanameyan in ku xweserîya xwe bi dest xistine û dişibin xezanameyan.⁴² Li gor Îsmet Çetin jî cengname çavkanîyên xezanameyan in.⁴³ Ji ber ku her du cûre gelek caran ji dêvla hev hatine bikaranîn û têkelî hev bûne. Weke encam cûreyên cengname û xezanemeyê pir dişibin hevûdu. Em dikarin bibêjin ku xezaname ewil beşeke cengnameyan bûne, lê bi demê re ji cengnameyan veqetiyane û bûne berhemên serbixwe. Çunkî şer û ceng her tim hebûne, berîya dîne Îslamê jî cengname hebûne, lêbelê xezaname bêtir termeke bi dîn re eleqedar e û pêkan e ku tenê bi dîne Îslamê re derketibe holê. Ji ber vê yekê em nikarin sînorekî teqez di nav her du cûreyan de daynin.

Her du cûre jî li ser şer hatine avakirin, lê di navbera her du cûreyan de hin ferqên biçûk hene.

- Xezaname piştî xwe didin bûyerên rasteqîn û ji dîrokê re dikarin bibin çavkanî. Lê di cengnameyan de rewş hinekî cuda ye. Her çiqas di cengnameyan de behsa bûyereke dîrokî bê kirin jî ji ber ku tiştên derasayî û bûyerên ku neqewimîne têkelî hev bûne ji rastîyê dûr ketine.

- Di xezanameyan de em rastî hêmayên derasayî nayên, lê di cengnameyan de em rastî hebûnên weke; dêw, ejderha, cin, alîkarîya dersiruştî, dirûvguherîn û hwd. tên.

Cengname hem bi zimanekî sade hatine nivîsîn û hem jî ji ber ku di xwe de bûyerên derasayî hewandine ji alîyê gel ve bêtir hatine hezkirin. Ev yek bûye sedem ku cengname û xezaname ji hev veqetin û bibin berhemên xweser.

Li gor agahîyên li jor em dikarin bibêjin ku ev berhemên edebîyata Kurdî; *Borê Qer*, *Qewlê Newala Sîsebanê* û *Gezwetu Huneynê* her çiqas bişibin xezanameyan jî ne xezaname ne û ev berhem cengname ne. Lewra di her sê berhemên de jî em rastî

⁴¹ Mehmet Atalan, "Türk Kültüründe Hz. Ali Cenknemeleri", **e-Makalat Mezhep Araştırmaları Dergisi**, c. 1, hej. 2, r. 17.

⁴² Metin Akkuş, **Klasik Türk Şiirinin Anlam Dünyası**, Femomen Yayınları, Erzurum 2007, r. 45.

⁴³ Koyuncu, 2020, r. 140.

bûyerên derasayî tèn û ev yek wan ji rastîyê dûr dixê û ji ber ku ji rastîyê dûr in dikevin nav cûreya cengnameyê.

D.2. Dîroka Cengnameyan

Çavkanîyên cengnameyan ji têkoşînên serdemên ewil yê Îslamîyetê, Qur'an, hedîs, dîroka Îslamê,⁴⁴ û ji pirtûkên dînî-exlaqî pêk tèn.⁴⁵ Em di çandên Ereb, Fars, Tirk⁴⁶ û Kurdan de rastî cûreya cengnameyê tèn. Herwiha ev cûre bi tesîra edebîyatên Ereb û Farisan derketiye holê⁴⁷ û piştî tevî nav edebîyatên Tirk û Kurdan jî bûye. Di edebîyata Farisî de ji bo cengnameyan navê "Hawarname"yê hatiye bikaranîn. Di Farisî de yekem Hawarname ji alîyê Ibnî Husam ve hatiye nivîsîn. Îbnî Husam di nivîsîna vê berhema xwe de ji berhemeke Erebî sûd wergirtiye û di sala 1426an de xelas kiriye.⁴⁸

Di edebîyata Tirkî de cûreya cengnameyê cihekî girîng digire û gelek nimûneyên vê cûreyê hatine dayîn. Di edebîyata Tirkî de ev cûre bêtir ber bi Hz. Elî ve hatiye nisbetkirin ango ew berhemên ku behsa egîdî, şervanî û pehlewaniya Hz. Elî dikin weke cengname hatine binavkirin.⁴⁹ Lê ev yek ji bo pênasikirina cengnameyê ne dirûst e, lewra ji bilî Hz. Elî li derdora kesayetên din jî bi cûreya cengnameyê berhem hatine dayîn. Wek mînak li derdora kurê Hz. Elî, Muhammed Henîfe jî cengname hatine nivîsîn.

Di edebîyata Tirkî de hin kesên ku cara ewil cengname nivîsîna ev in: Tursun Fakih, Şeyyad Îsâ, Kirdecî Ali, Maazoğlu Hasan û Meddah Yusuf. Di edebîyata Tirkî de çî menzûm çî jî mensûr û çî jî mensûr-menzûm têkelhev bin gelek cengname li ser

⁴⁴ Toprak, 2016, r. 8; Mehmet Atalan, "Anadolu'da Cenknâmelerin Toplumsal Yansımaları", **Kelam Araştırmaları**, c. 9,1, 2011, r. 46.

⁴⁵ Çetin, 1997, r. 86.

⁴⁶ Mehmet Gümüşkılıç, "Cumhur-name'de Hz. Ali'nin Özellikleri", **Uluslararası Sosyal Araştırmalar Dergisi The Journal of International Social Research**, c. 6, hej. 24, Kış 2013, r. 143; Rugeş Demir, "Manzum Hz. Ali Cenkerinden Yemane Cengi Üzerine Bir İnceleme", (Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi, Kastamonu Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Türk Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı), Kastamonu 2019, r. 1.

⁴⁷ Mattei, 2004, r. 11.; Demir, 2019, r. 6.

⁴⁸ Ertuğrul Ertekin, İbn Hüsam'ın Haverannamesi, (Dema weşanê; 25.09.2014), (Dema gihandinê; 25.08.2021. <http://siilikarastirmalari.blogspot.com/2014/09/cenkname-ibn-husam-n-haverannamesi.html>)

⁴⁹ Toprak, 2016, r. 9.

Hiz. Elî hatine nivîsîn.⁵⁰ Hin ji wan cengnameyan ev in: *Kıssa-ı Kahkaha Gazavat-ı ‘Alî Kerremullahu Veche, Gazavât-ı ‘Aremrem Bin Mûsallat Cengidür Zeyd’in Göne Kaplandığıdır, Gazavât-ı Kıssa-ı Mukaffa’ Hazret-i ‘Alî Keremullah Veche Cengidür, Kıssa-ı Hayber ‘Alî Murtazâ, Gazavât-ı Hazret-i Alî, Gazavât-ı Hazret-i ‘Alî (Kıssa-ı ‘Ummân Cengidür), Kıssa-ı Seyiddü’l-Murselin Huneyn Gazası ve Şâhı Merdân’in Cengidür, Kıssa-ı Mülzelzil Bin Menaf Olan Şâh-ı Merdân’in Cengidür, Kıssa-ı Kal’a-ı Selâsil ve Şâh-ı Merdân’in Cengidür, Kıssa-ı Hazret-i Resûl Rûm ve Şam Sultanlarıyla olan Cengidür, Hazâ Kitâb-ı Gazavât-ı ‘Alî Raziyaallahu Anha, Gazavât-ı İmâm ‘Alî (Mikdâd), Zikr-i Gazavât-ı Hüzeyl Kal’ası’nın Alındığıdır, Gazavât-ı Emirü’l- Mü’minin ‘Alî Keremullahu Veche Memleket-i Sind Ba Mukâtilin, Cenâdil Kal’ası Manzumesi, Dâsitân-ı Gazavât-ı İmâm ‘Alî, Dâsitân-ı Kesik Baş, Hâverân’in Hikâyetidir, Berber Kal’asında Olan Zümür Ateş-perest Hikâyesidir û Ceng-i Hazret-i ‘Alî Keremallahu Veche ye.*⁵¹

Di nav van cengnameyên navborî de ya ku herî zêde dişibe *Gezwetu Huneynê* ya Mela Yasînê Alikî “*Kıssa-ı Seyiddü’l-Murselin Huneyn Gazası ve Şâhı Merdân’in Cengidür*”e. Dibe ku ev cengname tesîrek li ser Alikî hiştibe. Ji ber vê yekê em dê di beşa Kesayeta Edebî ya Mela Yasînê Alikî de bi hûrgilî li ser vê cengnameyê rawestin.

D.1.1. Di Edebîyata Kurdî de Cengname

Di edebîyata Kurdî de li gor daneyên li ber dest cûreya cengnameyê cara ewil bi *Borê Qer (Qewlê Hespê Reş)* û bi *Qewlê Newala Sîsebanê* derdikevin hemberî me û herwiha ji bilî van berhemên navborî em rastî çend navên din jî tên.

Ji ber ku berhem û malzemeyên edebîyata Kurdî bi awayekî tekûz û kamil nehatine tesbîtkirin û dîyarkirin ji aliyê tesnîf û senifandinê ve em rastî gelek zahmetî û aloziyan hatin. Ji ber vê yekê heman berhem ji aliyê gelek kesan ve di nav cûreyên cuda de hatine tesnîfkirin û senifandin. Ev alozî di nav berhemên cengname, xezaname û destanan de jî derdikevin hemberî me.

⁵⁰ Çetin, 1997, r. 56 û 90.

⁵¹ Ji bo agahiyên berfirehtir bnr; Çetin, 1997, n.r. 1-6.

Abdurrahman Adak ji bo *Qewlê Newala Sîsebanê* gotiye cengname,⁵² lê Ayhan Yıldız di pirtûka xwe de ji bo *Qewlê Newala Sîsebanê* gotiye xezanameû herwiha di cihekî de ji bo *Qewlê Hespê Reş* jî gotiye bi awayekî tam û tekûz dikeve bin banê cengnameyê û di cihekî de ji bo *Qewlê Hespê Reş* hem gotiye xezanameyê hem jî gotiye alîyê wê yê efsane, destan û cengnameyî jî heye.⁵³ Yaşar Kaplan jî di pirtûka xwe de ji bo *Qewlê Hespê Reş* gotiye destana dînî. Herwiha Kaplan dibêje em van berhemên dînî dikarin di nav cûreyên menaqibname, xezawetname, cengname û bettalnameyan de jî bidin nasîn.⁵⁴ Herwiha Kaplan berhemên ku behsa Hz. Elî, Hz. Umer, Hesên û Huseyn, Muhemmed Henefîye, Rustemê Zal, Hetem û Silêmanê Sindî dikin û herwiha *Beyta Kekemîrê* û *Beyta Sîsebanê* jî weke cengname hesabandîye.⁵⁵

Cengnameyên Hz. Elî ji bo teblîxkirina dînê Îslamê têne nivîsîn ango armanca wan teblîxkirina dînê Îslamê ye. Lê dema em li Rustemê Zal û Silêmanê Sindî⁵⁶ mêze dikin di wan de teblîxkirina dînê Îslamê tune ye, lê dîsa jî ji alîyê mijarên xwe ve ev berhemên navborî jî dikevin nav kategorîya cengnameyê.

Di nav edebîyata Kurdî de em rastî çend destanan tên ku mijara wan şer û pevçûn in. Weke *Destana Kela Dimdimê* û *Derwêşê Evdî*, *Destana Rustemê Zal*, *Heft Xanê Rustem* û hwd. Her çiqas destana *Kela Dimdimê* li ser şer hatibe hûnadin jî em nikarin wê di nav cengnameyan de bihesibînin. Lewra di cengnameyan de serlehengê heye û şer li derdora wî serlehengî derbas dibe. Ew serleheng bi cengawerî û bi hêza xwe dijmin têk dibe. Dema em li destana *Kela Dimdimê* mêze dikin em rastî têkoşîna ji bo kelehê tên, her çiqas şervanên Kurd bi cengawerî li hemberî Sefewîyan şer dikin jî di dawîyê de têk diçin û hemû dimirin. Lê di cengnameyan de serleheng birîndar bibe jî namire û dawîyê de bi her awayî dijmin têk dibe. Ji xwe ji ber ku fokûsa cengnameyan bihêzkirina hêza ceng û cengawerîye ye nabe ku serleheng bimire û li hember dijminan têk biçe. Herwiha ji bilî *Kela Dimdimê* em di destana *Dewrêşê Evdî* de jî rastî ceng û cengawerîyê tên, lê dîsa di vê destanê de jî berhem ne li derdora şer

⁵² Abdurrahman Adak, **Destpêka Edebîyata Kurdî ya Klasîk**, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2015, r. 302.

⁵³ Yıldız, 2021, n.r. 31-38-39.

⁵⁴ Yaşar Kaplan, **Beyt û Destanên Kurdî**, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2019, r. 213.

⁵⁵ Bnb.: Kaplan, 2019, r. 309.

⁵⁶ Li gor malûmatên ku me ji Yaşar Kaplan wergirtin bûyera Beyta Kekemîr di navbera misilman û xeyrîmuslîman de diqewime. Serlehengê berhemê Hz. Elî ye. Hevpeyvîna bi Yaşar Kaplan re. (Dema hevpeyvînê: 30.05. 2022).

hatiye avakirin û di dawîyê de serlehengê destanê ji alîyê dijmin ve tê kuştin. Ji ber vê hindê destana *Dewrêşê Evdî* jî nakeve nav cûreya cengnameyê.

Dema em li *Heft Xanê Rustem* û *Destana Rustemê Zal*⁵⁷ mêze dikin tê dîtin ku ji alîyê vegotin û şêwazê ve dişibin cengnameyê, lê ji cengnameyên Hz. Elî vediqetin, lewra di cengnameyên Hz. Elî de teblîxkirina dînê Îslamê xala sereke ye ango cengnameyên ku li dor şervanîya Hz. Elî tene hûnandin ji bo teblîxkirin û belavkirina dînê Îslamê tene nivîsîn.

Li gor ku Cegerxwîn di helbesteke xwe de dîyar dike Melayê Xasî (1866-1951) jî cengnameyek nivîsiye. Xasî “*Cengnameya Kurd û Ermenan*” nivîsiye, lê ji bilî helbesta Cegerxwîn em di ti cihî de rastî behsa vê cengnameyê nehatin.⁵⁸

Di edebîyata Goranî (Hewramî) de jî cûreya cengnameyê hatine tesbîtkirin. Em di edebîyata Goranî de heta niha rastî navê sê cengnameyên Goranî hatin. *Cengnameya Elî Mîrzayê Kerendî* bi Goranî hatiye nivîsîn. Ev cengname di sala 1246ê Hicrî (1831ê Mîladî) de ji bo fermandarê leşkerên Goran Mehdî Xanê kurê Melîk Nîyazî hatiye nivîsîn. Mustensîxê wê kesekî bi navê Mela Elî ye. *Cengnameya Elî Mîrzayê Kerendî* bi teşeya mesnewîyê hatiye nivîsîn û ji 355 malikan pêk tê û li ser şeş serenavan hatiye dabeşkirin. Ev cengname li ser şerê Qecer û Osmanîyan ango Îran û Osmanîyan radiweste. Di vê cengnameyê de Kurdên Goran ên ku bawerîya wan Yarisaniye di şer de alîyê dewleta Îranê digirin. Di vê cengnameyê de bêtir şerê di navbera mezhebên Şîî û Sunnîyan derdikeve pêş.⁵⁹ Hin malikên vê cengnameyê weha ne:

Keftin ne serim vê bê zivanî

Bivaçum Cengnameyê Îran û Osmanî

Burişt der zivanim Padişayê Keremdar

Biderum tevfiq çenî ve ne î kar

⁵⁷ Ji bo metnên van her du berheman û agahîyên berfirehtir bnr: Shahab Vali, **Şahnameya Kurdî Rustemê Zal û Heft Xana Wî**, Weşanên Avesta, Stenbol 2011; Rojbîr Çalışır, “**Destana Rustemê Zal**”, (Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtûya Zimanên Zindî Yên li Tirkîyeyê Beşa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî) Mêrdîn 2019.

⁵⁸ Cegerxwîn, **Sewra Azadî**, Weşanên Avesta, Stenbol 2014, n.r. 151-153.

⁵⁹ Ji bo agahîyên berfirehtir derheqê Cengnameya Mîrzayê Kerendî de bnr., İbrahim Özcoşar & Shahab Vali (edt.), **Osmanlı Devleti ve Kürtler**, Kitapyayınevi, İstanbul 2017, n. r. 269-271.

Hucreyê tarikê zêynim ruşen ker
*Bivaçum tarîfê şehzadeye Qecer*⁶⁰

Di edebîyata Goranî de du cengname jî li ser cengên serdema Hz. Muhemmed in (s.x.l.). Ev cengname yek jê bi navê *Fetha Xeyber* e û ya din jî bi navê *Xezewata Bedir û Huneynê* ye. Nivîskarên van her du berhemana jî ne dîyar in, ji van berhemana katibê *Fetha Xeyberê* Seyîd Nûrî îbnî Şêx Abdurrehmanê Azebanî ye û di sala 1366ê Qemerî (1946 Mîladî) de hatiye nivîsîn û di Pirtûkxaneyê Meclîsa Îranê de bi hejmarên 5046-10 hatiye tomarkirin. *Xezewata Bedir û Huneynê* di sedsala 14ê Qemerî (sedsala 19ê Mîladî) de hatiye nivîsîn û di Pirtûkxaneyê Meclîsa Îranê de bi hejmarên 5047-10 hatiye tomarkirin.⁶¹ Li jêr em dê malikên destpêkê û yê dawîya van berhemana bidin.

Malika ewil û ya dawî yê cengnameya *Fetha Xeyberê* weha ne:

Xezwatê fethe'l-Xeyber Bismillah

Ibtida bi namê Xudawendê kul
Egadarê sirrê xiyalanê dil

Hezret û fetwayê aye Qur'anî
Pey sulhê yaranê qer'e nihani

Malika ewil û ya dawî yê cengnameya *Xezewata Bedir û Huneynê* weha ne:

Bismilleh xezayê Bedir û Huneyn

Be nawî Xuda'ê Xaliqê Kewneyn
Enûsim basî'ê Bedir û Huneyn

Be miqdarî erd û berzî semawat
Be didarê pak Muhemmed selewat

⁶⁰ Özcoşar & Vali, 2017, n.r. 272-273.

⁶¹ Hevpeyvîna bi Shahab Vali re. (Dema hevpeyvînê: 05. 06. 2022).

Hezaran dirûd û hezaran selam

Zi ma ber Muhemmed 'aleyhisselam

Li gor encama lêkolînê em gihastin wê qenaetê ku *Borê Qer*, *Qewlê Newala Sîsebanê* û *Ĝezwetu Huneynê* ji ber ku di xwe de bûyerên derasayî û cengawerîyê dihewînin dikevin nav cûreya cengnameyê. Em ê li jêrê bi kurtasî behsa cengnameya *Borê Qer*, *Qewlê Newala Sîsebanê* û *Ĝezwetu Huneynê* bikin.

D.1.1.1. Borê Qer (Qewlê Hespê Reş)

Li gor ku Abdurrahman Adak dibêje gelek versiyonên *Borê Qer* hene yek ji van versiyonan ji aliyê Elîyê Herîrî ve hatiye nivîsîn. Elîyê Herîrî helbestvanekî sedsala 16em e,⁶²em dikarin bibêjin ku li gor daneyan yekem cengnameya Kurdî di sedsala 16em de hatiye nivîsîn.

Di pirtûka Celîlê Celîl ya bi navê *Keşkûla Kurmancî* de ev versiyon weke *Qewlê Hespê Reş* derbas dibe. Di vê pirtûkê de ev mezûme weke sed bendî derbas dibe, lê hemû bend ne weke hev in. Hin ji wan bendan sêyîne, hin ji wan bendan çarîne û carinan ji pêncîne ne. Herwiha ji aliyê weznê ve jî ne bi rêkûpêk e ango metn ne li gor weznê hatiye nivîsîn û ji aliyê latînezekirinê ve jî di xwe de gelek xeletîyan dihewîne. Bendên destpêk û dawîya berhema *Borê Qer* ya ku di *Keşkûla Kurmancî* de derbas dibe weha ne:

Mecal ew mecal bû

Kafîrek dîn betal bû

Hespek çê li bal bû

...

Ewrekî reşî tarî

Baranek jê dibarî

Sond nekeve li 'Umer û Elî

Ji şihîdêt deşta Bedr û Huneynê⁶³

Di vê versiyonê de çîrok weha derbas dibe: Hespeke misilman heye û li cem mîrekî kafir e, pêxember jî dihese û dibêje biçin wê hespê bînin. Li ser vê yekê Hz.

⁶² Bnb.: Adak, 2015, n. r. 202-207.

⁶³ Celîlê Celîl, *Keşkûla Kurmancî*, Weşanên Doğa, Wîen 2004, n. r. 232-245.

Omer dikeve rê da ku biçê wê hespê bîne. Hz. Omer tê mala keşeyekî ku ev keşe birayê mîr e, keçeke wî keşeyî bi navê Leymûn heye. Keşe û Hz. Omer diçine cem mîr ji bo hespê. Lendehoyê ji mîr re dibêje ku keşe û yekî qureysî ji bo kirîna hespê hatine, lê mîr dibêje wan bikujin. Lendeho jê re dibêje mîrê min wiha nabe, ji xwe hespa te dijwar e û gelek kes kuştîye. Dema hespa te wan bibîne dê wan jî bikuje û zêr û mal ji me re bimînin. Li ser vê gotinê mîr qebl dike. Mîr dibêje herin bibêjin ger diwêre bila were zînê li hespê bike ger newêre dê celad ji bo wî hazir be. Hz. Omer radibe diçe ber bi *Borê Qer* ve û Yasîne dixwîne û pê re diaxive. Hz. Omer ji hespê re dibêje çavê Hz. Muhemmed (s.x.l.) li rêya me ye. Paşê zîna zer li hespê dike û wî bi ser sûran de difirîne. Paşê Hz. Omer bi wan re şer dike û tê li ber derê dêrekê û bangî kesên di dêrê de dike da ku derî lê vekin, lê derî venakin. Hz. Omer dia dike û derîyê dêrê vedibe, piştî ku Hz. Omer dikeve hindirê dêrê çil kesên ku di dêrê de ne dikuje. Leşkerên dijmin dora dêrê dorpêç dikin. Xeber diçe Medîneyê eshabî ji bo alîkarîya Hz. Omer dikevin rê. Misilman û kafir şerî dikin.⁶⁴

Di versiyona ku di *Keşkula Kurmancî* de cih digire bi vî awayî diqede. Lê di versiyonên din de aliyê misilman di vî şerî de bi ser dikevin û hespê reş dibin diçin Medîneyê.⁶⁵

D.1.1.2. Qewlê Newala Sîsebanê

Di edebîyata Kurdî de çendîn versiyonên cengnameya *Qewlê Newala Sîsebanê* hene. Her versiyoneke vê cengnameyê ji aliyê kesên cuda ve hatine nivîsîn an jî ber bi kesê cuda ve hatine nisbetkirin. Hin ji wan kesan ev in: Ehmedê Xanî, Feqîyê Teyran, Şêx Xalid Zêbarîyê Yekem, Mela Bekir, nusxeyeke gelêrî ku nivîskarê wê ne dîyar e⁶⁶ û Ehmedê Hekkarî. Heta niha nusxeyên ku ber bi Ehmedê Xanî û Feqîyê Teyran ve hatine nisbetkirin, nehatine dîtin.⁶⁷

Nusxeya ku ji aliyê Şêx Xalidê Zêbarîyê Yekem ve hatiye nivîsîn ji 453 risteyan pêk hatiye û di nusxeyê de navê Şêx Xalidê Zêbarî derbas dibe. Nusxeya Mela Bekir ji 504 risteyan pêk hatiye û di nava berhemê de navê Mela Bekir derbas dibe.

⁶⁴ Bnb.: Celîl, 2004, n.r. 232-245.

⁶⁵ Bnb.: Yıldız, 2021, r. 204-205.

⁶⁶ Ahmet Demir, *Qewlê Newala Sîsebanê*, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2012, n. r. 7-10.

⁶⁷ Bnb.: Demir, 2012, r. 9.

Nusxeya gelêrî bi tevahî ji 348 malikan pêk hatiye û tê de nav û mexles derbas nabe.⁶⁸ Herwiha ji bilî van nusxeyan, versiyoneke din a vê cengnameyê di nav pirtûka Celîlê Celîl ya bi navê *Keşkula Kurmancî* de weke *Beyta Sîsebanê* derbas dibe. Ev cengname di pirtûka *Keşkula Kurmancî* de di navbera rûpelên 246-256an de cih digire û di nusxeyê de mexlesa Ehmedê Hekkarî derbas dibe.⁶⁹ Ev berhem ne li gor pergalekî hatiye nivîsîn lewra hin cih malik in, hin sêyîne, hin çarîne û hin cih jî pêncîne ne. Berhem bi tevahî ji 322 risteyan pêk hatiye. Bendên ewil û yê dawî yên berhemê wiha ne:

Haza Beyta Sîseban Bi Cenewîzan Ceng Kiriye

Guh bidne hikayetê şerê Cenewîzan qissetê

Gelo yar û ehaban ji seyyidê sadatan

Wan û çendî esheban di rîya dîn kirin xebatê

Zehmet nayête hisaban nakeve ji kêf ewqatê

Cenawêz ehlê 'ezaban

...

Îslam dûr bû vê carê, kafîr dimane mehzûn

*Ew **Ehmedê Hekkarî** gotê kilamê mewzûn*

Hêvî dikim tu Barî nefsa xirabê me 'dûm

Aza bibin ji narî, ji cumle fi 'lê meh 'zûn

Gelî xelqê civatê Sellî 'ela Muhemmed

Bibînin hûn qatê(?) bibe şefî ' Muhemmed

Biçîne 'eresatê bibe her ber Muhemmed

⁶⁸ Demir, 2012, n. r. 9-11.

⁶⁹ Bnb.: Celîl, 2004, n. r. 246-256.

Ya Reb bidî necatê wechê hebîb bibîn

Fikra biçîne cennatê heta ebed bimîn

Ji ber meken ewqatê destê xe hûn hilîn

*Her gav û her sa 'etê fatîhan ji wan ra bixûn.*⁷⁰

Rojekê Cebraîl tê cem Hz. Muhemmed (s.x.l.) û dibêje Xwedê gotiye bila biçin Newala Sîsebanê û li hemberî kafiran şer bikin. Ev şer li hemberî Cenewîziyan tê kirin. Li ser vê yekê pêxember û eshabî xwe amade dikin ji bo şer, lê Hz. Elî ne di nav wan de ye ji ber ku ew çûye bajarê Medîneyê. Eshabiyên weke: Hz. Omer, Ebûbekir, Mîqdad, Xalid bîn Welîd û hwd. dikevîne rê. Pêxember ji Hz. Fatma re dibêje tu Hesên û Huseyn li vê derê bimîn em dê biçin. Paşê ji nav wan eshabîyan Hz. Omer diçe Newala Sîsebanê. Dema Hz. Omer çav bi newalê dikeve ecêb mayî dîmîne, lewra newaleke wisa nedîtiye, ev newal dişibe cennetê. Tê de gelek cûreyên kulîlk û fêkîyan cih digirin. Di newalê de eskerê dijmin cihê xwe girtine. Hz. Omer vedigere û ji wan re dibêje ku Newala Sîsebanê ji aliyê dijmin ve hatiye girtin. Li ser vê yekê dikevin rê û tînen newalê û şer di navbera wan de dest pê dike. Li newalê şerekî dijwar dest pê dike, Hz. Omer û eshabiyên din bi cengawerî li hemberî dijmin şer dikin. Kafir û misilman li wê newalê du roj û du şevan şer dikin. Lê dijmin misilmanan tîk dibin. Hz. Muhemmed dia dike û ba jî dengê wî dibe digihîjîne Hz. Elî, li ser vê xeberê Hz. Elî sibehê zû dikeve rê. Hz. Elî tî ji Hz. Fatma dipirse pêxember li ku ye, Hz. Fatma dibêje Cebraîl hat got "herin Newala Sîsebanê dijmin li wir e, bi wan re şer bikin". Hz. Elî dikeve rê diçe Newala Sîsebanê. Hz. Elî dema digihîje Sîsebanê dikeve şer û bi hezaran kafir dikuje. Piştî ku yê kafir tîk diçin tînen cem Hz. Muhemmed û dibin Misilman. Piştî ku Misilman bi ser dikevin vedigerin Medîne.

D.1.1.3. Ğezwetu Huneyna Mela Yasîne Alikî

Ğezwetu Huneyna Mela Yasîne Alikî ku bûye mijara vê xebatê di navbera cûreyên xezaname û cengnameyê de maye. Lê ji ber ku bêtir dişibe cûreya cengnameyê me ev berhem weke cengname bi nav kir û ew nirxand.

⁷⁰ Di latînzekirina metnê de gelek xeletî hatine kirin. Me li gor xwe ji nû ve latînzê kir. Bnb.; Celîl, 2004, n.r. 246-256. Herwiha ji bo destxetê bnb.; Celîl, 2004, n.r. 269-301.

Ev berhem beşek ji heyata pêxember e û li dor mêrxasî û cengawerîya Hz. Elî weke menzûmeyekê hatiye nivîsîn. Bingeha xwe ji dîroka Îslamê wergirtiye. *Gezwetu Huneyn* a Mela Yasînê Alikî ji 373 bendan pêk hatiye. Ji ber ku xebata me bi giştî li ser vê berhema Mela Yasînê Alikî ye em dê di beşên din de bi berfirehî li ser vê berhemê bisekinin.

D.1.1.3.1. Aîdîyeta “Gezwetu Huneyn”ê

Cara ewil bi saya Abdurrahman Adak em ji vê berhemê haydar bûn. Piştêre bi agahîyên ku Adak dan em gihaştin xwedîyê nusxeya Yusif Yaşar (NYY) Taha Yaşar, li gor agahîyên ku me ji xwedîyê nusxeyê wergirtin ev berhem a kalê wî Yusif Yaşar bû. Bi malbata Yusif Yaşar re em ketin irtîbatê û em çûn serdana wan me derheqê berhem û nivîskar de ji malbatê malûmat berhev kirin. Piştêre piştî hin lêkolînên ku me li ser berhemê kirin, me dît ku ev berhem ne ya Yusif Yaşar e û ya kesekî bi navê Yasîn e. Dema me berhem latînzê kir, cihên ku mexlesa “Yasîn” lê hatibû nivîsandin jê biribûn û ji dêvla wê Yusif hatibû nivîsîn. Piştî ku em gihaştin qeneata ku ev berhem a bi navê kesekî Yasîn e, ji nû ve em ketin lêkolînê ku em bizanibin ev Yasîn kî ye. Piştî lêkolînan em gihaştin navê Mela Yasînê Alikî.

Maweyekê malbata Mela Yasîn û Yusif Yaşar cînarê hevûne û piştêre di navbera her du malbatan de hisûmet çêbûye. Di encama vê hisûmetê de malbata Mela Yasînê Alikî koçî navenda Panosê kiriye. Hemû alav û malên xwe li gundê Kirakomê hiştine. Îhtîmal e ku berhema bi navê *Gezwetu Huneynê* li gundê Kirakomê mabe û bi vî awayî ketibe destê malbata Yusif Yaşar.

Di encama lêkolînê de em gihaştin du nusxeyên din jî. Nusxeya duyem (NME) li cem keça Mela Yasînê Alikî Husna Atasevenê bû û nusxeya sêyem (MHB) jî li cem nevîyê Feqe Reşîdê Alikî, Nezîf Katılmış bû û li gorî malbata Feqe Reşîd ev berhem ya Feqe Reşîdê Alikî bû. Di temeta nusxeya duyem (NME) de berhem weke ya Mela Yasînê Alikî hatibû nivîsîn û di vê nusxeyê de mexlesa “Yasîn û Yasînê Alikî” jî derbas dibûn. Lê di nusxeya sêyem (MHB) de ne di temeta wê de ne jî di rûpelên nusxeyê yê ku li ber destên me ne, derbarê aîdîyeta Feqe Reşîdê Alikî de ti agahî li ser tune bû.

Em bi her du malbatan re jî ketin têkiliyê, malbata Feqe Reşîd *Ġezwetu Huneynê* weke ya Feqe Reşîd qebûl dikirin û li gorî malbata Mela Yasîn jî ev berhem a Mela Yasînê Alikî bû. Gava em bi çavekî objektîf li ser her sê nusxeyan rawestîyan li gorî daneyên temetê û mexlesên di berhemê de derket holê ku ev berhem a Mela Yasînê Alikî ye û ne ya kesekî dinê ye. Çunkî di nusxeya duyem (NME) de bi awayekî aşkere navê Yasîn hebû û di nusxeya yekem (NYY)ê de jî navê Yasîn jê hatibû birin û ji dêvla navê Yasîn navê Yusif lê hatibû zêdekirin. Yanî texrîbat di nusxeyê de pêk hatibû.

Li gorî agahiyên ku em gihastinê di nusxeya sêyem (MHB) de jî di cihê mexlesa “Yasîn” de dîsa mîna vê texrîbatê navê “Reşîd” lê hatibû zêdekirin û navê Yasîn jî jê hatibû birin. Di temeta vê nusxeyê de jî ti agahiyek ku em bibêjin ev berhem ya Feqe Reşîd e tune bû û herwiha ji bo kurê Mela Yasînê Alikî jî îfadeya “Ya Rebbî tu xelas ke Ebdulhekîmê Alikî” hatibû nivîsîn. Li gorî van agahî û daneyan me biryar da ku ev berhem a Mela Yasînê Alikî ye.

Ahmet Gemî di xebata xwe de ev berhema menzûm a bi navê *Ġezwetu Huneyn* di nav berhemên Feqe Reşîdê Alikî de bi navê Huneynîye daye nîşandan û ji bo berhemê gotiye ev xezawetname berhemek ji berhemên Feqe Reşîdê Alikî ye.⁷¹Lê çawa ku me li jor jî vê yekê îzeh kir, ev berhem a Mela Yasînê Alikî ye lewra dane û delîlên li ber dest vê yekê didin nîşan.

⁷¹ Feqe Reşîd, *Sirru'l Mehşer*, (amd. Ahmet Gemi û Nezif Katılmış), Weşanxaneya Peywend, Wan 2020, r. 20.

BEŞA YEKEM

JÎYAN, BERHEM Û KESAYETÎYA EDEBÎ YA MELA YASÎNÊ ALIKÎ

1.1. JÎYANA MELA YASÎNÊ ALIKÎ

1.1.1. Jidayîkbûn û Zarokatîya Wî

Agahîyên derheqê jîyana Mela Yasînê Alikî (Yasin Çelebi) li ber destê me ne zêde ne.⁷² Navê bavê wî Hecî Mela Ebdullah (1864-?) û navê dîya wî jî Heyat (1897-?) bûye. Li ser dîroka çêbûna wî jî li ber destê me du tarîx hene. Li ser kevirê gora Mela Yasîn dîroka çêbûna wî weke 1901 hatiye nivîsîn.⁷³ Lê dema em li kutuka malbatê ya fermî mêze dikin dîroka çêbûna wî weke 1891ê hatiye nîşandan. Ji ber ku kesên malbatê jî agahîyên derheqê çêbûna Mela Yasîn de baş nizanîbûn em ne gihaştin tarîxeke teqez. Her çiças ne teqez be jî li gor ku Kutbettin Yılmaz⁷⁴ digot îhtîmal e ku Mela Yasîn li gundê Zomika⁷⁵ hatibe dinyayê. Malûmatên derheqê zarokatîya wî de zêde nînin. Lê li gor ku Yılmaz digot wî zarokatîya xwe li gundê Pîromerê⁷⁶ derbas kiriye. Di serdema zarokatîya Mela Yasîn de ev gund girêdayî Erdîşa Wanê bûye.⁷⁷

1.1.2. Nav û Mexlesa Wî

Navê fermî yê Seyda Mela Yasîn, Yasin Çelebi ye. Lê di nav gel de weke Seyda Mela Yasîn hatiye naskirin. Ji ber ku çûye hecê jê re Hecî Mela Yasîn jî hatiye gotin. Wî di berhema xwe ya bi navê *Gezwetu Huneyn* de xwe weke Yasînê Alikî daye naskirin. Herwiha feqîyê wî Muhemmed Emîn di dawîya nusxeya xwe de Mela Yasîn

⁷² Ji bo wêneyên Mela Yasînê Alikî bnr.: Pêvek: 9, 10 û 11.

⁷³ Ji bo kêlên gora wî bnr. Pêvek: 12-13.

⁷⁴ Kutbettin Yılmaz, neviyê Feqe Reşîd e. Feqe Reşîd jî kurê apê bavê Mela Yasînê Alikî ye. Kutbettin Yılmaz niha li heyatê ye û li Panosê dijî.

⁷⁵ Navê vî gundî bi Tirkî “Yukarı Göçmez” e.

⁷⁶ Navê vî gundî bi Tirkî “Pirömer” e.

⁷⁷ Hevdîtina bi Kutbettin Yılmaz re (Dema hevdişinê 28.06.2021).

weha daye naskirin: “Yasîn bîn Mola Ebdullah el-Alikî el-Xalidî el- Neqşî”. Em ji vê îbareyê fêm dikin ku ew ji eşîra Alikan e û pêgirtiyê terîqeta Neqşebendîyê bûye.

Mela Yasîn di helbestên xwe û berhema xwe ya bi navê *Ġezwetu Huneynê* de navê xwe weke mexles bi kar anîye. Ji helbest û ji berhema wî ya cengnameyê çend nimûneyên mexlesa wî weha ne:

Navê Ellah xweş şêrîn e

Ew birînan dikewîne

*Dibîne halê **Yasîn** e*

Ahîn ku tê bila ‘eded

...

‘E‘urûnî be.... ullah

Ricaullah ‘ibadullah

Ya Qutbellah ya Resulellah

*Qelbê **Yasîn** tebarek kir*

...

Eger Kurmancî mewzûn bû

We nîne bê hedîs ayat

***Yasîn** perwanê narê bû*

Beyan kir hal û ehwalat

(9)

Herwiha Mela Yasîn di berhema xwe ya bi navê *Ġezwetu Huneyn* de navê xwe û navê eşîra xwe weke mexles tenê di ciyekî de weha bi kar anîye:

Ya Ilahî umeta Eħmed

Temamen şa bikî

Hem digel wan da û baban hem

Yasînê Alikî

(271)

1.1.3. Zewaca Wî

Mela Yasîn carekê zewicîye navê jina wî Hemîde (1901-1990)⁷⁸ bûye. Li gor Kutbbetin Yılmaz ew di navbera salên 1914 û 1920an de zewicî ye.⁷⁹ Li gor agahîyên li ber destên me heft zarokên Mela Yasîn hebûne çar kur û sê jî keç in. Navên zarokên wî ev in: Mela Ebdurehîm (1337/1918-1989), Mela Ebdulhekîm (1340/1921-1996), Mela Ebdulezîz (1930-2011), Mela Ebdulquddus (1931-1992), Husna (ç. 1933-), Mûmîne (ç. 1934) û Esmâ (1940-1989).⁸⁰ Li gor agahîyên ku Kutbbetin Yılmaz dane me tenê kurên wî Mela Ebdulezîz û Mela Ebdulquddus melatî kirine, lê li gor ku keça Mela Yasîn Husna Atasevenê her çar birayên wê jî xwende û alim bûne.

Li gor keça Mela Yasîn, Husnayê Mela Yasîn leşkerî nekiriye. Lê li gorî Kubettin Yılmaz miheqeq wî leşkerî kiriye. Lewra di wê serdemê de leşkerî ji bo Huseyîn Paşayê Kor (w. 1930) dihat kirin, maweya ku li vir paşatî dikir serleşkerê artêşê bû û dema ku wî bangî xelkê dikir ji bo kirina leşkerîyê xelk mecbûr diman ku biçîne ji bo wî leşkerîyê bikin.

1.1.4. Wefata Wî

Mela Yasîn di nav civakê de hatiye hezkirin û di nav xelkê de jê re îhtiram hatiye kirin. Di nav xelkê de weke zana, alim bûye û di cemeatan de qedrê wî hebûye û nesîhetên wî baş bûne.⁸¹

Piştî jîyaneke ku di nav ilm û zanînê de derbas kiriye Seyda Mela Yasînê Alikî di sala 1976an de li Panosa Agirîyê wefat kiriye, gora wî jî niha li Panosê ye.⁸²

1.1.5. Eşîra Wî

Mela Yasîn ji eşîra Alikan e û wî ev agahî di berhema xwe de anîye ziman. Eşîra Alikan eşîreke koçber e. Li gor ku İsmail Beşikçi di pirtûka xwe ya bi navê *Doğu'da Değişim ve Yapısal Sorunlar Göçebe Alikan Aşireti* de behs dike agahîyên

⁷⁸ Li gorî kêla gora wê dîroka çêbûn û wefata wê weha ne: 1317-1989.

⁷⁹ Hevdîtina bi Kutbbetin Yılmaz re (Dema hevdîtînê: 28.06.2021).

⁸⁰ Hevdîtina bi keça Mela Yasîn, Husna Ataseven re (Dema hevdîtînê: 28.06.2021).

⁸¹ Hevdîtina bi Mela Kutbbetin Uygur re (Dema hevdîtînê 06.04.2020).

⁸² Ji bo kêlên gora Mela Yasîn bnr: Pêvek: 12-13.

ewil yê derheqê eşîra Alikan de di serdema Siltan Ebdulhemîd de bi avakirina alayên Hemîdiye dikevin destên me. Li gor ku Beşikçi dîyar dîke eşîra Alikan ne yek ji wan alayên ku di wê serdemê de pêkhatibe jî di pevçûnên di wê serdemê de roleke çalakger listîye.⁸³

Eşîra Alikan ji qebîleyan pêk hatiye û navên qebîleyên eşîra Alikan weha ne: Cudîgan, Çengoven, Ozîgan, Necîman, Mehman, Bîrîvan, Şehîdan û Şehevan.⁸⁴

Li gor Seyda Mela Omerê Didêrî (Ömer Nas) eşîra Alikan yek ji pênc eşîrên Çoqsorê yê Botanê ne. Alikan yek ji şaxeke vê eşîrê ye. Şaxên din jî ev in: Didêra, Alikan, Mîran, Garisan û Soran. Ji van eşîran re dibêjin pênc eşîrên Çoqsor ên koçer ên Botanê.⁸⁵

Eşîra Alikan, eşîreke koçber bûye û debara xwe bi ajeldarîyê kirine ji ber vê yekê havînan li zozanan zivistanan jî li gundan bi cih bûne. Eşîra Alikan havînan li derdora gola Wanê bi cih bûne û zivistanan jî li bajar û navçeyên weke: Sîlwan, Batman, Bişêrîyê, Cizîrê, Xerzan û li Sêrtê bi cih bûne.⁸⁶

Mela Yasîn ji eşîra Alikan e, wî ev yek di berhama xwe de jî anîye ziman û herwiha di beşa temetê ya nusxeya NME de jî navê eşîra wî weke Alikan hatiye nivîsîn.⁸⁷

Ya Ilahî umeta Ehmed

Temamen şa bikî

Hem digel wan da û baban hem

Yasîne Alikî

(271)

⁸³ İsmail Beşikçi, **Doğu'da Değişim ve Yapısal Sorunlar Göçebe Alikan Aşireti**, İsmail Beşikçi Vakfı, İstanbul 2014, r. 109.

⁸⁴ Beşikçi, 2014, r. 97.

⁸⁵ Seyda Mela Omerê Didêrî yê Biçûk di sala sala 1960î de hatiye dinyayê. Niha li Şîrnexê weke mamosteyê Kurşa Qur'anê dixebite. (Dema hevpeyvînê: 01.08.2022)

⁸⁶ Beşikçi, 2014, n.r. 82-85.

⁸⁷ Bnr.: Pêvek: 5.

Li gorî agahîyên li ber destê me Feqe Reşîdê Alikî kurê apê bavê Mela Yasînê Alikî ye. Li gor ku Kutbettin Yılmaz jî Feqe Reşîd û Mela Yasîn ji eşîra Alikan in û ji qebîleya Codikan in û bi eslê xwe koçer in, koçerên Cizîrê ne.⁸⁸ Herwiha Feqe Reşîd jî di berhema xwe ya bi navê *Sirru'l Mehşerê* de ev yek weha anîye ziman.

Namê eşîra wî Alikan bû

*Emma qebîle ji Codikan bû*⁸⁹

Li gor vê agahîyê Mela Yasîn jî ji eşîra Alikan e û ji qebîleya Codikan e.

1.1.6. Binemala Wî

Feqe Reşîdê Alikî ku pismamê bavê Mela Yasînê Alikî ye di berhema xwe ya bi navê *Sirru'l Mehşerê* de weha behsa binemala xwe dike.

Bavê wî 'Elî bû Ibnî Şe'ban

Eslê wî ji koçerên di Bohtan

Namê 'eşîra wî Alikan bû

Emma qebîle ji Codikan bû

Weqtê ji Bohtan îrtihal kir

*Qelbê wî li Zomikê meyal kir*⁹⁰

Li gorî Mela Nezîf Katılmış⁹¹ û Kutbettin Yılmaz jî Mela Yasîn û Feqe Reşîdê Alikî ji heman malbatê ne, malbata wan di sala 1882yan de ji Werîs⁹²a ku gundekî

⁸⁸ Hevdîtina bi Kutbettin Yılmaz re (Dema hevdîtînê: 28.06.2021).

⁸⁹ Feqe Reşîd, **Sirru'l Mehşer**, (amd. Ahmet Gemi û Nezîf Katılmış), Weşanxaneya Peywend, Wan 2020, r. 27.

⁹⁰ Reşîd, 2020, r. 27.


⁹¹ Nezîf Katılmış kurê Mela Huseynê Botîyê mustensîxê nusxeya MHByê ye û herwiha neviyê Kamîlê kurê Feqe Reşîdê Alikî ye. Mela Nezîf Katılmış di sala 1965an de li Panosê hatiye dinyayê, melatî kiriye û teqawid bûye û niha li Panosê bi karê bazirganîyê re mijûl dibe.

⁹² Li gor Seyda Mela Omerê Didêrî gundekî bi navê Bîlwerîs di navbera çemê Botan û Bereşet de ye. Gundê Bîlwerîs niha di bin çemê Bereşat de maye. Nêzîkî deh kîlometreyan ji bajarê Sêrtê dûr e. Minteqeya gund girêdayî navenda Sêrtê ye. (Dema hevpeyvînê: 01.08.2022). Herwiha mezrayeke bi navçê Werîs (Gündoğan-Baltacık) mezraya gundê Serserê (Güngören)ê ye û ew jî bi ser Hîzana Bidlîsî ve ye. Li vê mezrayê koçerî tê kirin û li mintiqeya Hîşetê (Kolludere) di navbera Hîzan û Miksê de ye. Li gorî me ya maqûl ev gund, dê gundê yê bi ser Sêrtê ve ye, yanî gundê Bîlwerîs e.

Cizîrî ye koçî gundê Zomika ya Panosê kirine. Bavê Feqe Reşîd û kalê Mela Yasîn, bi hev re koç kirine.

Li gorî Katılmış û Yılmaz şeceya malbatê bi vî rengî ye; Mela Ebdullahê bavê Mela Yasîn kurê Îbrahîm e, Feqe Reşîd jî kurê Elî ye. Elî û Îbrahîm du kurên Şe‘ban in û Şe‘ban jî kurê Şiblî ye. Li gorî agahîyên ku me ji her du kesên navborî wergirtin tabloyeke weha derdikeve holê:


Tablo 1: Şecereya binemala Mela Yasînê Alikî.⁹³



⁹³ Şecereya malbata Mela Yasînê Alikî ku ji alîyê Mela Nezîf Katılmış û Kutbettin Yılmaz ve hatiye neqilkin.

Ev şeceraya li jor li gorî Ebdullah Aytaç⁹⁴ ne dirûst e û li gorî neqla ku ji kurê birê Feqe Reşîd ji Mela Tacdîn wergirtiye divê şeceraya rast bi vî awayî be: Se'îdê kalê Mela Yasîn û Îbrahîmê bavê Feqe Reşîd birayê hev in û kurê Şe'ban in. Şe'ban kurê Muhammed e, Muhammed kurê Îbrahîm e û Îbrahîm jî kurê Zeydî ye. Se'îd û Îbrahîm di fermiyetê de bi navê Elî derbas dibin. Lewra her du malbat jî navê kalê xwe weke Elî dizanin û tevlihevî ji ber vê yekê derketiye holê. Li gorî van agahîyan tabloyeke weha derdikeve holê:

Tablo 2: Şeceraya binemala Mela Yasînê Alikî⁹⁵




⁹⁴ Ebdullah Aytaç nevîyê birê Feqe Reşîd e.

⁹⁵ Ev şeceraya binemala Mela Yasînê Alikî ji aliyê Ebdullah Aytaç ve hatiye dayîn.

Herwiha li gor malûmatên ku Abdulbarî Çelebiyê⁹⁶ kurê Ebdurrehman Çelebiyê birê Mela Yasîn dide me binemala malbatê weha ye: Qasim kurê Ebdulmutelîb e, Haşim kurê Qasim e, Mela Elî kurê Haşim e, Mela Ebdullah kurê Mela Elî ye û Mela Yasîn, Mela Tahir, Ebdurrehman, Ebdulkerîm û Ebdulhemît jî kurên Mela Ebdullah in. Li gorî van agahîyan tabloyeke weha derdikeve holê:

Tablo 3: Şecereya binemala Mela Yasînê Alikî.⁹⁷



Li gorî me jî şecereya ku Aytaç derxistiye ji yê n din dirûsttir e. Lewra dema me bi her du malbatan re jî hevpeyvîn kir navên kalê xwe weke Elî bi nav kirin. Di kutika malbata Mela Yasîn de jî Elî navê kalê Mela Yasîn e.⁹⁸

⁹⁶ Hevpeyvîna bi Ebdulbarî Çelebi re. Ebdulbarî kurê Ebdurrehman Çelebiyê birê Mela Yasîn e. (Dema hevpeyvînê: 31. 07. 2021.)

⁹⁷ Ev şecereya binemala Mela Yasînê Alikî ji aliyê biraziyê wî Ebdulbarî Çelebi ve hate dayîn.

⁹⁸ Ev agahîyên kutikê ku di “alt-üst soy”ê de ne, me ji neviyê Mela Yasînê Alikî, Abdullah Akbaş wergirtin.

Mela Ebdullah bavê Mela Yasîn e û ji Mela Ebdullah jî pênc kur çêbûne: Mela Yasîn, Mela Tahir Çelebi, Ebdurrehman Çelebi (w. 1992) Ebdulkerîm⁹⁹ û Ebdulhemîd (w. 2002). Ji Mela Yasîn jî heft zarok çêbûne ev jî ev in: Mela Ebdurrehîm, Mela Ebdulhekîm, Mela Ebdulquddus, Mela Ebdulezîz, Husna, Mûmîne û Esmâ. Ji malbata Mela Yasînê Alikî derbarê çend kesan de ev agahî jî weha ne:

1.1.6.1. Mela Ebdullah

Mela Ebdullah bavê Mela Yasînê Alikî ye. Mela Ebdullah di sala 1864an da li Erdîşê hatiye dinyayê û sala wefata wî nediyar e. Navê bavê wî Îbrahîm¹⁰⁰ e û navê dîya wî jî Eyşe ye. Navê jina Mela Ebdullah, Heyat (ç. 1897) bûye. Ji Mela Ebdullah pênc kur çêbûne ev jî ev in: Mela Yasîn, Mela Tahir, Ebdurrehman, Ebdulkerîm, Ebdulhemîd. Li gor ku malbatê digot Mela Ebdullah xwende bûye û wî jî dersên Qur'anê daye feqîyan.

1.1.6.2. Mela Ebdulquddus

Mela Ebdulquddus kurê Mela Yasîn e, Mela Ebdulquddus di sala 1931ê de hatiye dinyayê û di sala 1992yan de ji ber pençeşêrê li Mêrsînê wefat kiriye. Li gor agahîyên ku malbata Mela Yasînê Alikî neqil kir; Ebdulquddus jî helbestvan bûye û helbestên wî jî hebûne,¹⁰¹ lê me helbestên wî nedîtîn. Li gor daneyên li ber destên me em dizanin ku Mela Ebdulquddus aqîdenameya Şêx Fethullahê Werqanîsî ji bo xwe îstînsax kiriye. Ji bilî vê aqîdenameyê em rastî ti tiştêkî din nehatin. Ev aqîdename li ba malbatê ye.

⁹⁹ Ev kurê Mela Ebdullah di şerê di navbera malbata Mela Yasîn û Yusuf Yaşar de hatiye kuştin.

¹⁰⁰ Di üst-altsoy a e-dewletê de navê bavê Mela Ebdullah weke Elî hatiye nivîsîn. Lê dema me bi Mela Nezîf Katılmış û Kutbettin Yılmaz re axivî, navê bavê Mela Ebdullah weke Îbrahîm destnîşan kirin. Herwiha heman agahî di pirtûka *Sirru'l Mehşerê* de jî weke Îbrahîm hatiye nivîsîn. Lê keça Mela Yasîn Husna Ataseven jî dema behsa binemala malbatê kir navê kalê bavê weke Elî destnîşan kir. Li gor ku Ebdullah Aytaç digot Îbrahîm û Se'îd du bira ne û di fermiyetê de navê her duyan jî Elî ye. Ji ber vê yekê her du malbat jî navê kalê xwe weke Elî dizanin.

¹⁰¹ Hevpeyvîna bi nevîyê Mela Yasîn, Ebdullah Akbaş re. (Dema hevpeyvînê: 10. 07. 2021)

1.1.6.3. Mela Ebdulezîz

Mela Ebdulezîz kurê Mela Yasînê Alikî ye. Li gor ku kurê wî Ebdulwahîb Çelebî digot bavê wî jî helbest nivîsîne, lê ji ber ku di nav zarokên wî de kesî nexwendiyê aciz bûye û hemû berhem û pirtûkên mala xwe biriyê daye medreseya Atamanê ya Menzîlê. Ji ber vê yekê malbat nizane pirtûk û berhemên bavê wî çî ne û çend heb in.¹⁰²

1.1.7. Xwendin û Seydayên Wî

Agahîyên derheqê xwendin û talebeyên Mela Yasînê Alikî de ne teqez in, lewra malbata wî û kesên ku wî nas dikin di vê mijarê de ne xwedî agahîyên zêde bûn.

1.1.7.1. Xwendina Wî

Derheqê xwendina wî de agahîyên teqez li ber destê me tune ne, lê li gorî Kutbettin Yılmaz wî heta ciwanîya xwe li ber destê Feqe Reşîd xwendiyê. Piştî xwendina xwe ya dawî ji Mela Zahirê Memanî (Tendûrekî-1882-1966) wergirtiye û îcazeya xwe ya melatîyê ji wî standiyê.¹⁰³ Lêbelê gava em li îcazeya Hasan Tefîk Marulcuyê zavê Şêx Îsmâîlê Hezroyî (Çetin) dinêrin em tê de dibînin ku Mela Yasîn ji Mela Ehmedê Kurumzade îcazeya ilmê wergirtiye.¹⁰⁴ Li gor qeneata me jî dê îcazeya xwe ya ilmî ji Kurumzade wergirtibe. Ji ber ku agahîyên îcazeyan ji yên devkî bi ewletir in.

Li gorî keça Mela Yasîn Husna Ataseven û Mela Kutbettin Uygur jî Mela Yasîn çûye Norşîn û Oxînê û li wir di medreseyan de perwerde bûye. Li gor ku neviyê Mela Yasîn, Fesîh Yıldız ku ji diya xwe bihîstiyê Mela Yasîn li cem Mela Qasim jî xwendiyê. Mela Qasim di nav gel de weke Melayê Pozreş hatiye naskirin. Mela Qasim alimekî mezin bûye û wî mala xwe weke medrese bi kar anîye û gelek xwendekar perwerde kirine.¹⁰⁵ Herwiha li gor Îsmâîl Çetîn ku di berhema xwe de tîne ziman Mela Yasîn li cem Şêx Nesîmê Kufrewî û Şêx Muhemmedê Erwasî xwendiyê û ji her duyan

¹⁰² Hevpeyvîna bi kurê Abdolvahîp Çelebî re. Abdolvahîp kurê Mela Ebdulezîz e.

¹⁰³ Hevdîtina bi Kutbettin Uygur re. (Dema hevdtînê: 06.04.2020).

¹⁰⁴ Pêvek: 8.

¹⁰⁵ Hevpeyvîna bi neviyê Mela Yasîn, bi Fesîh Yıldız re. Dema hevpeyvînê (19. 07. 2021). Fesîh Yıldız kurê Esmâ Yıldız e, Esmâ Yıldız jî keça Mela Yasînê Alikî ye.

jî îcaze wergirtiye.¹⁰⁶ Li gorî îcazeyê Marulcu jî ji Şêx Nesîmê Kufrewî îcazeyê tesewûfî wergirtiye.¹⁰⁷ Çetîn di berhema xwe de weha behsa perwerde û xoceyên wî dike:

Yasin Hâce değil, ya insan-ı kâmil

Yasin'in müfessiri olursa muâdil

İlm-i tasavvufu almış Şeyh Nesim ve Hâfid'den

Birinci Küfrevî'den, ikinci Gavs-ı Hizânî'den

Birleşir silsile Seyyid Tâhâ ile

İlmi birleşir Ahmed "Kürümzâde" ile

Meşhur aileden asıl Bitlisî

Hâcesi Necmeddin Erciş yerlisi¹⁰⁸

Li gorî agahîyên ku di îcazeyê Hasan Tevfik Marulcuyê zavê Şêx Îsmâîlê Hezroyî (Çetin) de derbas dibin Mela Yasînê Alikî demekê li cem Şêx Ebdulhekîmê Bilwanîsî jî xwendîye.¹⁰⁹

1.1.7.2. Seydayên Wî

Çawa ku li jorê hate destnîşankirin Mela Yasîn li cem kesên weke: Feqe Reşîdê Alikî, Mela Zahirê Memanî, Mela Qasim (Melayê Pozreş), Şêx Nesîmê Kufrewî, Şêx Muhemmedê Erwasî, Şêx Ebdulhekîmê Bîlwanîsî û li cem Mela Ehmedê Kurumzade

¹⁰⁶ Şimdi: Hayatım, **Hicretim Şeyh İsmail Çetin Hazretleri**, (amd. Ahmed Mücteba Çetin), Dilara Yayınları, Isparta 2020, r. 111.

¹⁰⁷ Bnr. Pêvek: 8.

¹⁰⁸ **Şimdi: Hayatım, Hicretim Şeyh İsmail Çetin Hazretleri**, (amd. Ahmed Mücteba Çetin), Dilara Yayınları, Isparta 2020, n.r. 39-40.

¹⁰⁹ Ji bo îcazeyê bnr. Pêvek: 8.

xwendiyê. Em ê li jêrê hin ji seydayên wî bidin nasîn. Herwiha di şecereya Hasan Tevfik Marulcu de jî sîlsîleya perwerdeya Mela Yasînê Alikî dikare bê dîtin.

Sîlsîleya ilmî ya Mela Yasînê Alikî li gorî îcazeyaya Hasan Tevfik Marulcu weha ye:¹¹⁰

1. Hesên bîn Îbrahîm bîn Hesên Ispartowî el-Kilisî (Hasan Tevfik Marulcu)
2. El-Zebîhê Dîyarbekirî (Şêx Îsmâîlê Hezroyî- Îsmâîl Çetin)
3. Mela Yasînê Alikî yê Xalidî yê Neqşebendî
4. Şêx Nesîmê Kufrewî yê Bedlîsî
5. Mela Ehmedê Kurumzade yê Bedlîsî
6. Muhemmed Necmeddîn bîn Mela Huseynê Ercîşî
7. Şêx Derwîş Muhemmedê Fersafî
8. Xoce Teyîb Edîbê Xalidî yê Neqşî
9. Efendî Hesên
10. Mela Xelîl Efendîyê Sêrtî
11. Mela Mehmûdê Behdînî
12. Muhemmed Salihê Efendî yê Sefewî
13. Îsmâîl Efendîyê Sefewî
14. Îbrahîm bîn Heyder
15. Heyder bîn Ehmed
16. Ehmed bîn Heyder
17. Heyderê Ewwel
18. Zeyneddîn Kurdî yê Belatî
19. Şêx Taha Kurdî yê Qadirî
20. Ebdullahê Uşnewî
21. Mela Elî
22. Ebû Mela Elî
23. Zeyneddîn Kurdî yê Belatî
24. Nesrullahê Xelxalî
25. Mîrzacan

¹¹⁰ Ji bo sîlsîleya îcazeyaya ilmî ya Mela Yasînê Alikî bnr. Pêvek: 8.

26. Xoce Cemaleddînê Muhyîyê Şîrazî
27. Muhemmed bîn 'Esedê Siddiqê Dewwanî
28. Ehmed bîn Heyder
29. Muhemmed bîn Ebdurrehmanê Şerwî
30. Ehmedê Meheli
31. Mîrzayê Mexdûm
32. Mîrzacanê Şîrazî
33. Xoce Cemaleddînê Mehmûdê Şîrazî
34. Muheqqîqê Dewanî
35. Şêx Kurdîyê Uşnewî
36. Mîrzacanê Şîrazî
37. Xoce Cemaleddîn Mehmûd Şîrazî
38. 'Esed Siddiqê Dewwanî
39. Ellame Muheqqîqê Şîrazî yê Eliyê Curcanî
40. Taceddîn Mehmûdê Farûqî
41. Mehmûd bîn Ebû Fethê Servistanî
42. Lîsanuddînê Nuh El-Sînanî
43. Celaleddînê Mehmûdê Qezwînî
44. Necmeddîn Ebû Xeffarê Qezwînî
45. Ebû Qasim Rafî'î
46. Muhemmed bîn Muhemmed Cezerî
47. Mazharuddîn Muhemmedê Kazerûnî
48. Muheqqîq Eş-Şerîf
49. Mucduddînê Fîrûzabadî
50. Muhyeddînê Hedad
51. Muhyuddînê Newawî
52. Muhyi's-Sunne we'd-Dîn el- Kuşkkenarî
53. Seyîd Şerîfê Curcanî
54. Mubarek Şahê Bûxarî
55. Qudbeddînê Razi
56. 'Ellame Şîrazî
57. Katibê Qezwînî

58. Îmam Fexreddînê Razî
59. Muhemmed bîn Muhemmedê Xezalî
60. Ebu Elî Abdulmelîk bîn Abdullahê Cuweynî
61. Îmamu'l-Haremeynê Cuweynî
62. Ebû Talibê Mekkî
63. Ebû Osman Mexrîbî
64. Umerê Zucacî
65. Cuneydê Bexdadî
66. Ebû Hesenê Serîyê bîn Muflisê Seqatî
67. Me'rûfê Kerxî
68. Ebû Suleymî Taî
69. Hebîbê Ecemî
70. Hesenê Besrî
71. Elî bîn Ebû Talibê Qureyşî
72. Muhemmed Mustefa
73. Cebra'îl Aleyhîsselam
74. Allahu Te'ala

1.1.7.2.1. Feqe Reşîdê Alikî

Feqe Reşîd di sala 1300/1883an de li herêma Botan, li der û dora Erûhê li gundê Werîs ji dayîk bûye. Navê bavê wî Şeban e, Şeban jî kurê Şiblî ye. Paşnavê wî yê fermî Yılmaz e. Şeş zarokên Feqe Reşîd hebûne, ew jî ev in: Sidîq, Mîrze Mihemmed, Şamil, Kamil, Hubra, Dilşa û Gulistan. Malbata Feqe Reşîd ji 'eşîra Alikan û ji qebîleya Codikan bûne. Malbat paşê koçî gundê Zomika¹¹¹ kiriye ku ev gund girêdayî navçeya Panosa Agirîyê ye. Derheqê perwerdeya wî de tişt nayê zanîn. Li gor ku tê zanîn piştî ku tehsîla xwe xelas kiriye li gundê Qubikê dest bi melatî kiriye û herwiha muderîsê gund bûye. Di serdema êrîşên Êris de Feqe Reşîd ji bo kerwanekî koçberan weke rêber hatiye destnîşan kirin û koçî Sandiklîya Afyonê hatiye kirin. Agahîyên derheqê jîyana wî ya li Afyonê tiştekan nayên zanîn. Derheqê seydayên wî de ti agahî li ber destan tune ne. Heta niha sê berhemên wî hatine dîtin. *Sirrûl Mahşer, Huneynîye*¹¹² û *Cihanşah*.

¹¹¹ Navê vî gundî bi Tirkî Yukari Göçmez e.

¹¹² Li gor lêkolînên me ev berhem ne ya Feqe Reşîd e, lêbelê ya Mela Yasîne Alikî ye.

Mela Reşîd demekê ketiye hepsê piştî ku ji hepsê derketiye li gundê Pîromerê dest bi melatîyê kiriye. Wê demê li wî gundî Yusif Begê kurê Kor Huseyîn Paşa mezinê wî gundî bûye. Feqe Reşîd di sala 1932yan de wefat kiriye û gora wî li Pîromerê ye.¹¹³

1.1.7.2.2. Mela Zahirê Tendurekî (Memanî)

Mela Zahirê Tendurekî di sala 1882yan de li Milazgira Mûşê hatiye dinyayê. Navê wî yê rast Ebduzzahir e, navê bavê wî jî Nîmetullah. Mela Zahir ji gelek aliman perwerde wergirtiye û helbestvanekî girîng yê edebîyata Kurdî ye. Di heft salîya xwe de piranîya pirtûka *Xayetu'l-İktîsarê* ku li ser fîqhên Şafi'îyê bûye jiber kiriye. Di ciwanîya xwe de çûye Sîlwanê û ji Mela Hisênê Kiçik ders wergirtiye. Paşê çûye Norşînê û li cem Şêx Muhemmed Zîyauddîn ders wergirtiye. Şêx Muhemmed Zîyauddîn bandoreke mezin li ser Mela Zahirê Tendûrekî hiştiye.

Mela Zahirê Tendurekî li dû xwe Dîwanek hiştiye û di vê Dîwana wî de bi tevahî 105 helbest cih digirin û ev helbest bi zimanên Erebî, Farisî û Kurdî ne.

Mela Zahirê Tendûrekî ji eşîra Memanî ye û di sala 1966an de li Milazgirê wefat kiriye û gora wî niha li gundê Tendûrekê ye.¹¹⁴

Li gor Mela Kutbettin Uygur, Mela Yasîn di bin tesîra Mela Zahirê Memanî maye yê û jê gelekî hez kiriye.¹¹⁵

1.1.7.2.3. Mela Qasim (Melayê Pozreş)

Mela Qasim di sala 1879an de li Erdîşa wanê hatiye dinyayê û di sala 1967an de Panosa Agirîyê wefat kiriye. Navê bavê wî Hemze û navê dîya wî jî Selwî bûye. Mela Qasim alim û muderisekî herêmê bûye. Di nav gel de weke Melayê Pozreş jî hatiye nasîn. Li gor ku nevîyê wî Esad Yıldız neqil dikir wî gelek talebe perwerde kirine û Mela Yasînê Alikî jî yek ji talebeyê Mela Qasimê Pozreş bûye.¹¹⁶ Herwiha

¹¹³ Hevdîtina bi Mela Nezîf Katılmış û Kutbettin Yılmaz re (Dema hevdîtînê: 28.06.2021). Herwiha ji bo agahîyên berfirehtir bnr; Reşîd, 2020, n.r. 9-15.

¹¹⁴ Ayhan Tek, Şeyh-Mürît İletişiminin Yazma Geleneğine Katkısı: Mela Zahirê Tendûrekî'nin Dîwan'ı, *Nüşa Dergisi*, 2018, n.r. 83-108.

¹¹⁵ Hevdîtina bi Kutbettin Uygur re. (Dema hevpeyvînê: 06.04.2020).

¹¹⁶ Hevpeyvîna bi Esad Yıldız re. (Dema hevpeyvînê: 19. 07. 2021)

Mela Muhammed Yıldırım jî li cem Mela Qasim xwendîye û li gor ku wî jî digot Mela Qasim alimekî mezin bûye.¹¹⁷

Li gorî Fesîh Yıldız helbestên Mela Qasim jî hebûne, lê bi tu awayî em negihaştin helbestên wî.¹¹⁸

1.1.7.2.4. Şêx Ebdulhekîmê Bîlwanîsî-Huseynî

Şêx Ebdulhekîmê Bîlwanîsî weke Seyyîd Ebdulhakîmê Bîlwanîsî-Huseynî tê zanîn. Ji ber gundî wî jê re Bîlwanîsî hatiye gotin û ji ber ku ji binemala pêxember e jê re Seyyîd û Huseynî jî hatiye gotin. Di sala 1902yan de li gundê Kermetê ku girêdayî navçeya Xana Hawêla Sêrtê ye hatiye dinyayê. Kurê Seyyîd Muhammed Efendî ye û navê kalê wî Seyyîd Marûf Efendîye. Şêx Ebdulhekîmê Bîlwanîsî du caran zewicîye û ji van zewacan 13 zarokên wî çêbûne.¹¹⁹

Şêx Ebdulhekîmê Bîlwanîsî perwerdeya xwe ya ewil ji bavê xwe wergirtiye. Paşê li cem Şêx Muhammed Dîyauddîn (w. 1923) sê salan xwendîye. Piştê bi Dîyauddîn re çûye Norşînê û li wir heft salan xwedîye. Paşê du salan li cem Şêx Fethullahê Werqanîsî (w. 1899) xwendîye. Du salan li gundê Arbo/Erbo¹²⁰ li cem Şêx Muhammed Arbovî xwendîye û ji vir jî çûye binxetê li cem Şêx Ehmedê Xeznewî (w. 1950) perwerdeya xwe domandîye.¹²¹ Şêx Ebdulhekîmê Bîlwanîsî di sala 1939an de ji Şêx Ehmedê Xeznewî xilafet wergirtiye.¹²²

Herwiha wî li cem kesên weke Mela Muhammed Emîn (Melayê Mezin- w. 1933), Mela Zahir û Muhammed Selîmê Hîzanî (w. 1936) jî perwerde wergirtiye. Bîlwanîsî bi tevahî 26 salan bi perwerdeya ilmê re mijûl bûye.¹²³

¹¹⁷ Hevpeyvîna bi Mela Mihemed Yıldırım re. (Dema hevpeyvînê: 02.01.2022)

¹¹⁸ Hevpeyvîna bi Fesîh Yıldız re (Dema hevpeyvînê: 19. 07. 2021)

¹¹⁹ Ji bo agahiyên berfirehtir derheqê Şêx Ebdulhekîmê Bîlwanîsî de bnr.: Metin Taşkesen, **Seyyid Abdülhakîm el-Hüseynî'nin Hayatı ve Tasavvuf Anlayışı**, (Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi, Ankara Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Temel İslâm Bilimleri Tasavvuf Anabilimdalı), Ankara 2007, n.r. 13-19.; Kadri Yıldırım, **Kürt Medreseleri ve Alimleri: Tekkelere Bağlı Medreseler**, Cilt. 2, Avesta Yayınları, İstanbul 2018, r. 225.

¹²⁰ Bi Tirkî navê vî gundî "Yarımca" ye.

¹²¹ Taşkesen, 2007, r. 16.

¹²² Yıldırım, 2018, r. 225.

¹²³ Taşkesen, 2007, r. 17.

Piştî ku xîlafet werdigire li gundê Bîlwanîsê dest bi îrşadê dike paşê di sala 1950 de li gundê Xedîrê¹²⁴ ku girêdayî navçeya Hezoya Batmanê ye dest bi îrşadê dike. Paşê di sala 1970 de koçî navçeya Kolika Semsûrê dike. Şêx Ebdulhekîm heta sala wefata xwe li Kolikê îrşada xwe berdewam kiriye. Şêx Ebdulhekîmê Bîlwanîsî di sala 1972yan de li Kolika Semsûrê wefat dike.¹²⁵

1.1.7.2.5. Mela Ehmedê Kurumzade

Malumatên derheqê vî kesî de li ber destê me tune ne, lê em ji îcazeya Hasan Tevfîk Marulcuyê zavê Şêx Îsmâîlê Hezroyî (Çetin) û ji agahîyên ku ji pirtûka Şêx Îsmâîl Çetin derbas dibin em fêhm dikin ku Mela Yasînê Alikî li ba Mela Ehmedê Kurumzade ders standiye û jê îcazeya ilmî wergirtiye. Mela Ehmedê Kurumzade ji Bedlîsê ye.¹²⁶

1.1.7.2.6. Şêx Nesîmê Kufrewî

Şêx Nesîmê Kufrewî kurê mezin yê Şêx Ebdulbaqîyê Kufrewî ye. Perwerdeya xwe ya ilmî û tesewîfî ji tekyaya Kufrewî¹²⁷ wergirtiye. Postnişînê çarem yê tekyaya Kufrewî bûye û heta mirina xwe postnişînîya tekyaya Kufreyê kiriye.¹²⁸ Di sala 1950 de wefat kiriye û di nav tîrbeya kalê xwe Şêx Muhemmed Kufrewî de hatiye veşartin.

Li gor ku Îsmâîl Çetîn di helbesta xwe de dîyar kiriye, Mela Yasînê Alikî ji Şêx Nesîmê Kufrewî ‘ilmê tesewûfî wergirtiye. Di helbesta Îsmâîl Çetîn de ya ku me li jor daye ev agahî derbas dibin.

¹²⁴ Bi Tirkî navê vî gundî “Karaoğlak” e.

¹²⁵ Yıldırım, 2018, r. 225.

¹²⁶ Ji bo agahîyên berfirehtir bnr. Çetin, 2020, r. 40.; Eş-Şeyh İsmail Çetin Hazrovi (K.S.) (<https://www.biyografya.com/biyografi/9768>)(Dema gihandinê: 15.07.2022.); Ji bo îcazeyê bnr. Pêvek: 8.

¹²⁷ Kufre gundekî bi ser Şîrwana navçeya Sêrtê ve ye.

¹²⁸ İsmail Kıran, Aristokrat Kürt Aileler: Kufreviler, **Kovara Kurdîyat**, hej. 4, sal. 2021, n.r. 81-104.

1.1.7.2.7. Şêx Muhammedê Hafîd (Erwasî)

Şêx Muhammed Hafîd nevîyê Seyîd Sibxatullahê Erwasî ye. Piştî ku bavê wî wefat kiriye, li cem xalê xwe Seyîd Nûr Muhammed li Xeydayê maye. Li wir heta kitêba Camîyê xwendiyê. Di sala 1957an de li Erdîşê li gundê Karamelikê¹²⁹ wefat kiriye.¹³⁰

Ji van beytên Şêx Îsmâil Çetîn em fêhm dikin ku wî jî ders daye Mela Yasîne Alikî.

Yasin Hâce değil, ya insan-ı kâmil

Yasin'in müfessiri olursa muâdil

*İlm-i tasavvufu almış Şeyh Nesim ve **Hâfîd**'den*

Birinci Küfrevî'den, ikinci Gavs-ı Hizânî'den

Birleşir silsile Seyyid Tâhâ ile

İlmi birleşir Ahmed "Kürümzâde" ile

Meşhur aileden asıl Bitlisî

Hâcesi Necmeddin Erciş yerlisi

¹²⁹ Bi Tirkî navê vî gundî "Nişancı" ye.

¹³⁰ Dema gihandinê: (04.10.2021.)(http://arvasidernegi.com/biyografi_detay.aspx?biyog_id=45)

1.1.8. Melatî û Muderîstîya Wî

Mela Yasînê Alikî di jîyana xwe de bi melatî, mideristî û çandînîyê re mijûl bûye. Mela Yasîn li çend gundan Melatî kiriye û ev gund ev in: Şîwekar¹³¹ Xirindas¹³² û Hesendolî ye.¹³³ Li gor Kutbettin Uygur, Mela Yasîn li navenda Panosê jî mideristî kiriye.

Li gorî Mela Nezîf Katılmış, Mela Yasîn ji bilî melatîyê bi çandinîyê re jî mijûl bûye, lê piştî ku şer di navbera malbata Mela Yasîn û Yusif Yaşar¹³⁴ de qewimîyê jî gundê Kirakomê¹³⁵ koç kirine û hatine navenda Panosê û li wir tenê bi melatîyê re mijûl bûye.

Li gor Kutbettin Yılmaz û Mela Nezîf Katılmış, Seyda Mela Yasînê Alikî muderistî nekiriye wî tenê melatî kiriye,¹³⁶ lê keça wî Husna Ataseven û Kutbettin Uygur digotin ku wî muderistî jî kiriye herwiha li gor ku Uygur digot ew ne muderisekî di asta bilind de bûye. Wî tenê dersên pirtûkên destpêkê daye, dersên pirtûkên weke: *Şerhu-l-Muğ'ni, Ewwamil û Zurufê* daye.¹³⁷

Li gor Mela Muhammed Yıldırım, Mela Yasînê Alikî ne alimekî mezin bûye. Muderistîya wî jî ne di asteke bilind de bûye.¹³⁸

Li gor agahîyên ku me ji malbata wî wergirtin Mela Yasînê Alikî di xwendîngêhên fermî de nexwendîye û wî tenê perwerdeya medreseyê wergirtiye.

¹³¹ Bi Tirkî navê vî gundî “Ovapınar” e. Ev gund girêdayî navçeya Miradîyeya Wanê ye. Li gor ku nevîyê Mela Yasîn, Ebdullah Akbaş neqil dikir Mela Yasîn li vî gundî jî mideristî kiriye.

¹³² Bi Tirkî navê vî gundî “Meydandağı” ye. Ev gund girêdayî navçeya Erdîşa Wanê ye.

¹³³ Bi Tirkî navê vî gundî “Hasandolu” ye. Ev gund girêdayî navçeya Panosa Agirî ye. Li gor ku Kutbettin Yılmaz digot kurê Mela Yasîn Mela Ebdulqodus li vî gundî Melatî kiriye, ger Mela Yasîn li vî gundî melatî kiribe jî berî kurê xwe kiriye.

¹³⁴ Malbata Yusif Yaşar li gundê Kirakomê cînarê malbata Mela Yasîn bûne. Li ser erd di navbera her du malbatan de pevçûn çê bûye û di encama vê pevçûnê de ji her du malbatan jî kuştin çê bûye nusxeya NYYê ya *Gezwetu Huneyn* ji malbata Yusif Yaşar gihaşt ber destê me.

¹³⁵ Bi Tirkî navê vî gundî “Eskikonak” e.

¹³⁶ Mela Nezîf digot ez çûme gundê Şîwekarê û kesekî hevtemenê Mela Yasîn re min hevpeyvîn kir. Bi qasî ku min ji vî kesî fêm kir Mela Yasîn muderistî nekiriye.

¹³⁷ Hevdîtina bi Husna Ataseven re (Dema hevdîtînê 28.06.2021); Hevdîtina bi Kutbettin Uygur re. (Dema hevdîtînê: 06.04.2020).

¹³⁸ Hevpeyvîna bi Mela Muhammed Yıldırım re. (Dema hevpeyvînê: 02.01.2022).

Mela Yasîn mala xwe ya li gundê Şîwekarê weke medrese bi kar anîye, xwendekarên wî li cem wî xwendine.¹³⁹ Li gor keça Mela Yasîn gelek talebeyên wî hebûne, lê digot ez nizanim ew kî ne û çi kes in.¹⁴⁰ Herwiha li gor Mela Nezîf Katılmış û Kutbettin Yılmaz talebeyên wî hebûne, li cem Mela Yasîn Qur'an û Mewlûd xwendine, bi qasî ku em dizanin wî îcaze nedaye ti kesî.¹⁴¹ Lêbelê li gorî Şêx Îsmalê Hezroyî Mela Yasînê Alikî dersên gelek kitêban daye û alimekî mezin bûye.

1.1.8.1. Talebeyên Mela Yasînê Alikî

Mela Yasînê Alikî alimekî dewra xwe bûye, wî dersên weke mentiq, belaxat, îstîfare, vadi', adab, nîqaş, ilmên kelamê, fiqîha Şafi, tesewûf, minhac, fethu'n-nûnî, eqaîda nesefî, hedîs û tefsîrê dane.¹⁴²

Yek ji wan talebeyên wî yê bi nav û deng Îsmail Çetîn e. Li gor ku Îsmail Çetîn di pirtûka xwe de nivîsîye: Mela Yasîn di warê rîwayetkirina hedîsan, di warê ilmên weke felsefe, tesewûf û tefsîrê de pêşketî bûye. Îsmail Çetîn ji bo xoceyê xwe Mela Yasîn weha dibêje; “xoceyê ku herî zêde min ji ilmê wî sûd wergirtiye Mela Yasîn e”.¹⁴³ Herwiha li gor ku neviyê Mela Yasîn Ebdulwehab Çelebî ku ji dîya xwe neqil kir kesên weke: Seyîd Ebdulbaqî Erol, Seyîd Salih, Kemalê kurê Îbrahîmê Şewê, Seyîd Îzettîn û Feqe Mecîd ji Mela Yasîn ders wergirtine.¹⁴⁴ Herwiha ji nusxeya ku me ji keça Mela Yasîn wergirt em dizanin ku kesekî bi navê Muhemmed Emîn jî li cem Mela Yasîn ders wergirtiye.

¹³⁹ Hevpeyvîna bi neviyê Mela Yasîn, Emrah Erol re. Emrah Erol kurê Ebdurehîmê kurê Mela Yasîn e, niha li bajarê Aydinê dijî. (Dema hevpeyvînê: 07.08.2021)

¹⁴⁰ Hevdîtina bi Husna Ataseven re (Dema hevdîtînê 28.06.2021).

¹⁴¹ Hevdîtina bi Mela Nezîf Katılmış re (Dema hevdîtînê 28.06.2021).

¹⁴² Çetîn, 2020, r. 111.

¹⁴³ Ji bo agahiyên zêdetir bnr; Çetîn, 2020, r. 111. ; herwiha bnr; (<https://islamansiklopedisi.org.tr/cetin-ismail>, <http://kernal-ersozlu.net/medenidusuncetarihi/ismailcetin.htm>) (Dema gihandinê 19.07.2021)

¹⁴⁴ Hevpeyvîna bi Ebdulwehab Çelebîyê kurê Ebudlezîzê kurê Mela Yasîn re. (Dema hevpeyvînê; 13.09.2021)

1.1.8.1.1. Şêx Îsmâilê Hezroyî (Îsmâil Çetîn)

Îsmâil Çetîn di sala 1942yan de li Hezroya navçeya Diyarbekirê hatiye dinyayê. Navê bavê wî Mehfûz e û navê kalê wî jî Mela Silêman e. Navê dîya wî jî Rabîa ye.

Şêx Îsmâil Çetîn perwerdeya xwe li gundê Entaxê¹⁴⁵ dest pê kiriye. Ji Mela Derwîş û ji Mela Xalid ders wergirtiye. Li gundê Hudurê ji Xoce Muhemmed Sidiq nêzîkî salekê dersên xwe dubare kiriye. Li bajarên weke Heleb û Şamê ji aliman dersê qiraatê wergirtiye. Piştî vegeftiyaye Tirkîyê û li Diyarbekirê li gundê Xasê ji Mela Mehmûd ders wergirtiye. Li Patnosê ji Mela Seyda Yasîn dersên weke: mentiq, belaxat, îstîfare, wadi', adab, minazara, hin ilmên kelimê û hin pirtûkên felsefeyê xwendiyê. Çetîn di pirtûka xwe de dibêje ku min ji Mela Yasînê Alikî îcazeya ilmê wergirtiye. Paşê ji li gundê Balîvarê ya Agirî li cem Mela Hesen dersên mentik û tefsîrê wergirtiye. Paşê heşt mehan li Erziromê ji Sakip Efendî dersên kelimê wergirtiye. Li gundê Şîrwanê li cem Mela Muhemmed Qasim bi qasî şeş mehan ders wergirtiye û jê îcaze standiyê. Li Bîlmenê li cem Reîsê Dîyanetê Omerê Nasûhî pirtûka "*Muvazzah ilm-i Kelam*" xwendiyê. Li cem Mela Mihemedê Zivingî xwendiyê û jê îcazeya ilmî wergirtiye.¹⁴⁶

Dersa ewil a tesewûfê di heft salîya xwe de ji Şêx Me'şûq wergirtiye. Di ciwanîya xwe de intisabê Seyîd Ebdulhekîm Huseynî bûye û jê xelîfetî wergirtiye. Ji çendîn terîqetan xelîfetî wergirtiye. Li ser daxwaza Seyîd Ebdulhekîm Huseynî çûye bajarê Isparta û li gundê Gündürleyê (Harmanören) melatî kiriye.

Paşê ji karê melatîyê îstîfa kiriye û li Ispartayê bi cih bûye. Şêx Îsmâil Çetîn di sala 2011an de ji ber êşa Koahê li Ispartayê rehmet kiriye.¹⁴⁷ Şêx Îsmâil şeva ji gundê Bilwanisê¹⁴⁸ vediqete van her du helbestan dinivîse.

¹⁴⁵ Bi Tirki navê vî gundî "Kabakaya" ye.

¹⁴⁶ Ji bo agahîyên berfirehtir bnr; Çetîn, 2020, r. 111.

¹⁴⁷ Ji bo agahîyên berfirehtir bnr; Îsmâil Çetîn, **Edeble Varış Lütüfla Dönüş**, Dilara Yayınları, Isparta 2014, n.r. 5-6.

¹⁴⁸ Bilwanis (Ormanpınar), gundekî li ser Xana Hawêla Sêrtê ye.

1. *Di weqtî geşt û seyranê*

Me dî dilber li zozanê

Qelem rabû bi ceryanê

Riki' kir heta meydanê

...

7. *Rûreş im rû siyah im*

Ji wan rojan xeberdar im

Yetîmîm li ber dîwar im

Hewara min Xewsê Geylanî

1. *Di weqtê geşt û seyranê*

Me seh kir selwa li zozanê

Umrê nazik bi erzanî

Awir da'ê Xewsê Bilwanis

12. *Ey Îsma'îl tu feqîrî*

Curm û xeta urkeşîrî

Ji Xewsê helîm destegîrî

Umîd min ji lutfê Xewsê Bilwanîs¹⁴⁹

Şêx Îsmâîlê Hezroyî bi Kurdî helbest nivîsîne, em ji van helbestên wî tê derdixin ku ji bilî alîyê wî yê ilmî, alîyê wî yê edebî jî hebûye. Heta niha em gihastin du helbestên wî.

¹⁴⁹ Çetin, 2020, n. r. 48-49.

1.1.8.1.2. Mela Muhemmed Yıldırım

Mela Muhemmed Yıldırım di sala 1944an de li gundê Berdava¹⁵⁰ ku girêdayî navçeya Dutaxa Agirîyê ye hatiye dinyayê. Li gor Muhemmed Yıldırım wî li cem Mela Qasimê Pozreş û li cem Mela Yasînê Alikî xwendiyê. Yıldırım tenê çend rojan li cem Mela Yasînê Alikî xwendiyê û li ba wî dersên *Şerhu 'l-Muğnî* û *nehwê* xwendiyê. Mela Muhemmed Yıldırım niha li heyatê ye û ji melatîyê teqawid bûye.¹⁵¹

1.1.8.1.3. Muhemmed Emînê Kurê Xelîfe Hecî Ehmed

Agahîyên derheqê vî kesî de zêde li ber destê me tune ne. Li gor agahîyên ku me ji nusxeya ku wî îstînsax kiriye bi dest xistiye li gundê Şîwekarê li cem Mela Yasînê Alikî xwendiyê. Navê wî Muhemmed Emîn e û navê bavê wî jî Xelîfe Hecî Ehmed e. Berhema Mela Yasînê Alikî ya bi navê *Gezwetu Huneyn* îstînsax kiriye.

1.1.9. Terîqeta Wî

Seyda Mela Yasîn pêgirtîyê terîqeta Neqşebendîya Xalidî bûye, hevnasîna wî ya bi terîqetê re bi saya medreseyan çê bûye. Lewra wî li medreseyên terîqeta Neqşebendîyê xwendiyê. Hem li gorî agahîyên ku Şêx Îsmailê Hezroyî (Çetin) di pirtûka xwe de dide û hem jî li gorî îcazeyaya Hasan Tevfîk Marulcuyê zavê Şêx Îsmailê Hezroyî (Çetin) em fêm dikin ku Mela Yasînê Alikî perwerdeya tesewûfî standiyê.¹⁵² Mela Yasînê Alikî ji postnişînê tekyaya Kufreyê ji Şêx Nesîmê Kufrewî û ji Xeydayê jî ji Şêx Muhemmedê Hafîd (Erwasî) îcazeyaya xelîfetîyê wergirtiye.¹⁵³

1.2. BERHEMÊN MELA YASÎNÊ ALIKÎ

Mela Kutbettin Uygur dibêje ku helbestên Mela Yasîn yên bi Kurdî hebûne û wî li ser civakê jî berhem nivîsîne. Mela Kutbettin dibêje min bi xwe helbestên Mela Yasîn xwendine, lê niha ew helbest li ku ne ez nizanim.¹⁵⁴ Herwiha li gor Mela Nezîf Katılmış û Kubettin Yılmaz berhemên Mela Yasîn hebin jî ne xuya ne, wextekî

¹⁵⁰ Bi Tirkî navê vî gundî “Bintosun” e.

¹⁵¹ Hevpeyvîna bi Mela Muhemmed Yıldırım re (Dema hevpeyvînê: 02.01.2022).

¹⁵² Ji bo agahîyên berfirehtir bnr.: Çetin, 2020, r. 40/111; Herwiha bnr.: Pêvek: 8.

¹⁵³ Ji bo agahîyên berfirehtir bnr. Pêvek:8.

¹⁵⁴ Hevdîtina bi Kutbettin Uygur re (Dema hevpeyvînê: 06.04.2020).

helbesteke şûxane bal wî ve hatiye gotin, lê ew jî ne teqez e.¹⁵⁵ Herwiha li gor keça wî Husnayê jî gelek berhemên bavê wê hebûne, lê nizane li ku ne û çi bi wan bûye. Li gor keça wî Husnayê; Mela Yasîn zimanên weke Kurdî, Erebi, Farisî û Tirkî dizanîbûye.¹⁵⁶ Li gor Mela Kutbettin Uygur Erebi zanîna wî ne di asteke bilind de bûye ango weset bûye.¹⁵⁷

Heta niha me xwe gihandîye hin helbest û berhema wî ya bi navê *Ġezwetu Huneyn*. Em dê li jêr behsa berhema wî û helbestên wî bikin.

1.2.1. Ġezwetu Huneynê (Cengnameya Hz. Elî)

Berhema Mela Yasîn ya bi navê *Ġezwetu Huneyn* (Cengnameya Hz. Elî) li ser cenga Huneynê ye ku di dewra Hz. Muhemmed (s.x.l.) de pêk hatiye. Berhem bi awayekî menzûm hatiye nivîsîn û bi tevahî 61 wereqe ye. Berhem ji 373 bendan pêk hatiye û herwiha xezeleke neh malikî jî di nav menzûmeyê de cî digire. Berhem bi Kurdîya Kurmancî ye. Heta niha ti xebat li ser vê berhemê nehatiye kirin û ev xebata me bi berfirehî li ser vê berhema wî ye.

1.2.2. Helbestên Wî

Di helbestên Mela Yasînê Alikî de jîyana wî ya şexsî, kesên terîqeta Neqşebendî û bawerîya bi Xwedê tê dîtin.

Heta niha ji bilî xezela di nav menzûmeyê *Ġezwetu Huneynê* de em gihastin çar helbestên Mela Yasînê Alikî. Me sê helbest bi rêya bandê ku berî wefata Mela Yasîn hatibûn tomarkirin bidest xist. Li gorî Fesih Yıldız ev her sê helbestên di bandê de helbestên Mela Yasînê Alikî ne. Bandê ku ev helbest tê de cih digirin di sala 1976an de hatiye qeydkirin. Di nav bandê de weaz, banga azanê, helbestên Mela Yasîn û helbesteke Şêx Eleddînê (w. 1969) kurê Şêxê Xiznayê cih digirin.¹⁵⁸ Helbesteke Alikî jî me ji devê Mela Kutbettin Uygur girt û li vir nivîsî. Bi tevahî pênc helbestên Mela

¹⁵⁵ Hevdîtina bi Mela Nezîf Katılmış û bi Kutbettin Yılmaz re (Dema hevdîtînê 28.06.2021).

¹⁵⁶ Hevdîtina bi Husna Ataseven re (Dema hevdîtînê 28.06.2021).

¹⁵⁷ Hevdîtina bi Kutbettin Uygur re (Dema hevpeyvînê: 06.04.2020).

¹⁵⁸ Ev band niha li ba nevîyê Mela Yasîn, Fesih Yıldız e. Fesih Yıldız kopyeke band ji me re şand û me ew derbasî nivîsê kir. Ji bo her sê helbestên qeydên bandan bnr.: Pêvek: 2.

Yasîne Alikî ketin destên me. Di her pênc helbestên Mela Yasîn de jî mexlesa “Yasîn” hatiye bikaranîn.

Mela Yasîn helbesteke xwe li ser şikestina pîyê xwe nivîsiye. Li gor nevîyê wî Fesih Yıldız gava Mela Yasîn ji bo banga sibehê diçe ser minareyê dikeve û lingê xwe dişkîne. Xuyaye ji ber şikîna pîyê xwe gelek zehmetî kêşaye, lewra wî di vê helbesta xwe de ji Xwedê û ji şêxên terîqetê alîkarî xwestiye. Ev helbesta wî ya ku bi “Sersed sema’ê çaran” dest pê dike ji 24 çarîneyan pêk hatiye. Benda ewil û ya dawî weha ne:

1. Sersed sema’ê çaran

Da’im dike deweran

Çare dadan demeran

Teqdîra Rebbê deryan

24. Weqtê seher carî dikim

Cirm û xeta tev par dikim

Rewş û xopan îzhar dikim

Bêtir binal ya Rebb meded

Helbesta wî ya ku bi “Beram zadê derê qesrê” dest pê dike ji 23 çarîneyan pêk hatiye. Benda ewil û ya dawî weha ne:

1. Beram zadê derê qesrê

Lillahul hemd û el-ehwal

..... di îmamê

Bi serkêşî muala kir

23. ‘E’urûnî be.... ullah

Ricaullah ‘ibadullah

Ya Qutbellah ya Resulellah

Qelbê Yasîn tebarek kir

Helbesta wî ya ku bi “Eya ey dîlbera nazik hebîba ber dilê yarê” dest pê dike ji 12 malikan pêk hatiye. Malika ewil û ya dawî weha ne:

1. *Eya ey dîlbera nazik hebîba ber dilê yarê*
Te çil rojan li min şewtand wekî daxê li ser darê

12. *Gunehkar ew feqîr e lê bike îstîxfarê*
Ay mirin çêtir e ji halê wî dilêm

Herwiha li gor ku Mela Kutbettîn Uygur dibêje helbesteke şûxane jî bal Mela Yasîn ve hatiye nisbetkirin. Lê heta niha me ev helbest bi temamî bi dest nexistiye. Du beytên vê helbestê ku di bîra Mela Kutbettin Uygur de mabûn weha ne:

Erê Fatê belê Fatê

Qorik te hanî du qatê

*Cerhê **Yasîn** li ser cerhê te be*

***Yasîn** bi qurbana qorika te be*

Herwiha ji bilî van helbestan Mela Yasînê Alikî di nav berhema xwe ya menzûm a bi navê *Ġezwetu Huneynê* de jî cih daye xezeleke 9 malikî. Ev helbest bi kêşa erûzê hatiye nivîsîn û qalibê kêşê jî *Mefa 'ilun / Mefa 'ilun / Mefa 'ilun / Mefa 'ilun* e. Malika ewil û ya dawîya vê xezelê jî weha ne:

1. *Eya **Yasîn** bibe hişyar tu ketî l' benda dunya 'ê*
Bi zewq û hem şefaya wê nebe hevalê dunya 'ê

9. *Wiha dunya ku bêkêr e ji xeyrê 'ilm û Qur'anê*
***Yasîn** da'im bigir 'ibret ji dest vê qehbe dunya 'ê*

1.3. KESAYETÎYA WÎ YA EDEBÎ Û DÎNÎ-TESEWÛFÎ

Helbestvanê me Mela Yasînê Alikî jîyana xwe di nav atmosfereke ilmî û edebî de derbas kiriye. Li gor agahîyên ku Mela Nezîf Katılmış û Kutbettin Yılmaz bi me re parve kirine malbata Mela Yasîn û ya Feqe Reşîd demeke dirêj bi hev re jîyane. Weke ku tê zanîn Feqe Reşîd berhemên edebî-dînî dane, ders daye feqîyan û Mela Yasîn jî li ber destê wî xwendiyê. Ev yek jî bi me dide zanîn ku Mela Yasîn hêj di piçûkatîya xwe de di nav atmosfereke edebî de maye û jê sûd wergirtiye. Herwiha li gor

malumatên kesên navborî dane me bavê Mela Yasîn û birayên wî jî kesên xwende bûne û melatî kirine. Li gor keça wî Husna Atasevenê gelek berhemên bavê wê Mela Yasînê Alikî hebûne, lê em negihaştin hemû berhemên wî. Heta niha bi awayê nivîskî me berhema wî ya bi navê *Ġezwetu Huneyn* bi dest xistiye û bi saya bandên teyîbê jî em gihastin sê helbestên wî. Herwiha xezeleke wî jî di nav menzûmeya *Ġezwetu Huneynê* de heye.

Dema em li jîyan û helbestên wî mêze dikin tê dîtîn ku kesayetîya wî ya dînî-tesewûfî jî li pêş e. Mela Yasîn kesekî ehlê medreseyê bûye û herwiha mala xwe weke medrese bi kar anîye û feqî tê de perwerde kirine. Li gor agahîyên ku Îsmâil Çetîn daye em tê digihîjin ku Mela Yasîn ji Şêx Nesîmê Kufrewî û ji Muhemmed Hafid ilmê tesewûfê wergirtiye.¹⁵⁹ Lê li gor agahîyên ku malbata wî dane me, şêxîtiya Mela Yasînê Alikî tune bûye. Em di helbestên wî de rastî alîyê wî yê tesewûfî jî tên. Mela Yasîn di hin helbestên xwe de alîkarî ji şêxên Neqşebendî dixwaze û bawerîya xwe bi wan tîne. Dema em li helbestên wî mêze dikin tê dîtîn ku li ser terîq, tesewûf, murşîdên terîqetê, pêxember, Xweda û qudreta Xwedê hatine nivîsîn.

9. *Meded ya Şahê Bexda'ê*

Pê min bi ser hev da na'ê

Nalîn li min têne rayê

Tebîbê derdan el-meded

10. *Meded ya Xews birîndar im*

Qiyam li min bûye fu'ûd

Min dî eynek şaxek dar im

Me j' bîr nekî Rebbê sucûd¹⁶⁰

...

21. *Tu yî Seyîd wekî Taha*

Bi nisbet Xewsê Hîzanê

Bi neytê nisbeta Seyda

Li etrafan elem rakir

¹⁵⁹ Çetin, 2020, r. 40.

¹⁶⁰ Ji ber ku me jî qasetê deşîfre kir hin bêje tam nehatin famkirin û dibe ku xeletî tê de hebin.

22. *Mucedded wekî Fethullah*
Bi rewneq wek Zîyauddîn
Bi nisbet Şahê Xiznayê
Ew nisbeta tamam top kir

23. *E'urûnî be.....ullah*
Ricaullah 'ibadullah
Ya Qutbellah ya Resulellah
Qelbê Yasîn tebarek kir

1.3.1. Edîbên ku Tesîr li Alikî Kirine

Dema em li berhem û helbestên wî mêze dikin em rastî tesîra hin helbestvanên din hatin. Em dikarin bibêjin ku Mela Yasînê Alikî di jiyana xwe de di bin tesîra kesên weke; Feqe Reşîdê Alikî, Muhemmed Efendî û Melayê Senceqî de maye. Li jêr em dê vê yekê bi zelalî rave bikin.

Me li jor jî anîbû ziman Mela Yasînê Alikî û Feqe Reşîdê Alikî xizmên hev in û Mela Yasîn li ber destê Feqe Reşîd xwendiyê. Dema em li berhema Mela Yasînê Alikî ya bi navê *Ġezwetu Huneynê* mêze dikin tesîra *Sirru'l Mehşera* Feqe Reşîd bi awayekî zelal xwe dide nîşandan. Weke mînak:

Ji berhema Feqe Reşîdê Alikî

Fîlhalî me da ewan cewab e

Ev teklîf ji bo me ra sewab e¹⁶¹

Ji berhema Mela Yasînê Alikî

Wana da wî cewab e

Ev teklîfa şewab e

¹⁶¹ Reşîd, 2020, r. 29.

*Qurban be da û bab e
Rûhê me tev fida be*

(62)

Ji berhema Feqe Reşîdê Alikî

Kanê Adem kanê Îdrîs kanê 'ilm û kanê tedrîs

Kanê cin û can kanê Îblîs kanê hem ew Semûd û 'Ad

Kanê Harût û digel Marût kanê Talût û hem Calût

Wergirtin efsan û tabut di 'erdê da niha ecsad

Kanê Dehhak û Efrîdûn kanê Nemrûd û Eflatûn

Kanê Îbrahîm û Harûn kanê Îskender û Şeddad

Kanê Yûsuf Zuleyxa hem Qubad û Keyqubad û Cem

Kanê Keyxusrew û Rostem kanê Şîrîn û kanê Ferhad

...

Kanê ew Nebîyê Serwer Ebûbekir kanê 'Omer

Kanê 'Osman kanê Heyder ku Ew bû hasilê îcad¹⁶²

Ji berhema Mela Yasînê Alikî

Kanê 'Ebbas Ibnî Mirdas

Kan Zubeyr Ibnî 'Ewwam

Kanê Qeys û Se 'dê Weqqas

Ev mirin cumle tamam

Kanê ew Muğdad û Xalid

Kan 'Emmar Şufyan kiram

¹⁶² Reşîd, 2020, r. 62.

*Kanê ew pişt û penahê
'Eskerê te xaş û 'am*

*Kanê ew Şêrê Şikarî
'Elî Heyder ew bi nam
Ew kî ye were ku îro
Ez bikim ew î zimam*

(310-320-312)

Berhema wî ya bi navê *Ġezwetu Huneynê* berhemeke li ser şer e, tê de behsa şerê Huneynê yê ku di serdema Hz. Muhemmed (s.x.l.) de pêk hatibû tê kirin. Berhem bi cûreya cengnameyê hatiye nivîsîn û bi tevahî ji 373 bendan pêk tê. Di encama lêkolînê de em rastî berhemeke Tirkî ya ku weke “*Kıssa-ı Seyiddü'l-Murselin Huneyn Gazası ve Şâhı Merdân'ın Cengüdüür/ Bu Kissa Huneyn Gazasıdır ve Peygamberün Hevazin Begleriyle Ulu Cengidür*” hatiye binavkirin hatin. Dema em li ser vê berhemê hûr dibin tê dîtin ku *Ġezwetu Huneynê* bi gelek alîyan ve dişibe vê berhemê. Ev berhema navborî ya el-Bekrî (s.s. 13.) berhemeke Erebi ye ku ji bo Tirkî hatiye tercumekirin. Ji ber ku me ya bi Erebi bi dest nexist em nizanin Mela Yasîn di bin tesîra kîjanê de maye û berhema xwe nivîsiye. Lê ji bo ku tesîra vê berhemê bê xuyan em dê bûyera cengnameya navborî bi hûrgilî bidin û ji cengnameyê mînakên jî pêşkêş bikin.

Kıssa-ı Seyiddü'l-Murselin Huneyn Gazası ve Şâhı Merdân'ın Cengüdüür¹⁶³/ Bu Kissa Huneyn Gazasıdır ve Peygamberün Hevazin Begleriyle Ulu Cengidür

Di nav pirtûka *Sîretü'n Nebi* ya Muhemmed Efendî de ev cengname weke “*Bu Kissa Huneyn Gazasıdır ve Peygamberün Hevazin Begleriyle Ulu Cengidür*” derbas dibe. Di vê berhemê de ev cengname bi tevahî 781 malik e.¹⁶⁴ Ev berhema navborî ji

¹⁶³ Nuxxeke vê cengnameyê di Pirtûkxaneyaya Millî de di refa 06. Mil. Yz. B. 274an de cih digire. Di pirtûkxaneyaya Millî de ev cengname weke ya Mustafa Darîrê Erziromî (s.s. 14.) derbas dibe. Li gor ku İsmet Çetin neqil dike bi tevahî 1185 malik e. Ji bo agahîyan bnr.: İsmet Çetin, **Türk Edebiyatında Hz. Alî Cenknâmeleri**, T.C. Kültür Bakanlığı Yayınları, Ankara 1997, r. 3.

¹⁶⁴ Muhammed Efendi, **Sîretü'n-Nebi** (c. 2), (Amd. Bayram Özfırat), Türkiye Yazma Eserler Kurumu Başkanlığı, İstanbul 2019, r. 1321.

Erebî hatiye tercumekirin, Muhammed Efendî ji bo nivîsandina vê berhema xwe ji berhemên kesên weke: El-Bekrî, Kadi Mustafa Darîr, İbn İshak (w. 768) û İbnî Hişam (w. 833) sûd wergirtiye, lê di berhema xwe de tenê navê El-Bekrî anîye ziman.¹⁶⁵

Ev cengname li ser herba Huneynê ye ku di sala 630yê Mîladî de di navbera misilman, qebîleyên Hewazîn û Seqîfûnê de pêk hatiye. Di dawîya vê herbê de misilman bi ser dikevin û pût perestên qebîleyên Hewazîn û Seqîfûnê têk diçin.

Kurteya Cengnameya Navborî ya Tirkî:

Piştî ku Mekke ji alîyê misilmanan ve tê fetihkirin kesên qebîleya Qureyşê ji dibin misilman. Begê qebîleya Hewazînê Malikê kurê ‘Ewf vê xeberê dibihîse. Malik biryarê dide ku bi ser misilmanan ve derkeve seferê, ji ber vê yekê leşkeran berhev dike. Di wê maweyê de Şeytan tê û ji wan re dibêje ku pûtên wan yên bi navê Lat û ‘Uzze ji alîyê misilmanan ve hatine perçekirin. Malik ji wan re dibêje “ger em Hz. Muhammed û Hz. Elî bikujin dê navê me heta ebedîyetê were gotin”.

Leşkerên qebîleyên Hewazîn û Seqîfûnê tevî zarok, jin, mêr û hemû malên xwe berhev dibin. Dema artêşa misilmanan tê gelyê Huneynê rastî Dureyd¹⁶⁶ tên, Dureyd mizgînîya serkeftinê dide wan. Cebraîl tê cem wan û dibêje ku leşkerên mişrîkan hatine. Li navê Hz. Muhammed, li rastê Hz. Ebûbekir, li çepê Hz. Omer li paş Hz. Osman û li pêş jî Hz. Elî ketine rê.

Dema misilman tên di rê de rastî ejderhayekî tên, Hz. Elî dema ku dike wî ejderhayî bikuje, ejderha tê ziman û dibêje ez misilman im. Dibêje em ji asimanan hatine û em neh cin in. Em di dirûvê keçelok, mar û şêran de ne. Ev cin ji bo alîkarîya misilmanan hatine.

Fermandarê qebîleya Hewazînê Malik bi çavdêrîya xulamê xwe Naciye li misilman û cinnan mêze dike. Hz. Muhammed behsa fazîletên şehîdbûnê dike û misilmanan teşwîqî herbê dike. Eshabîyên weke: Ebbas, Ebbasê kurê Fazil, Ebbasê

¹⁶⁵ Muhammed Efendi, *Sîretü'n-Nebi* (c. 2), (Amd. Bayram Özfırat), Türkiye Yazma Eserler Kurumu Başkanlığı, İstanbul 2019, r. 125.

¹⁶⁶ Çetin, 1997, n.r. 40-42. Dureyd di *Gezwetu Huneynê* de bi navê Dureyd derbas nabe. Lê ji bûyerê em fêm dikin ku ew e. Helbestvanekî navdar yên mişrîkan e. Ji bo ku ji tecribeyên wî îstîfade bikin wî jî anîne herba Huneyê. Dureyd di maweya şer de kor e û temenê wî li ser sedî bûye. Ji bo agahîyên berfirehtir bnr; Ahmet Savran, “Düreyd b. Sımme”, *DİA*, c. 10, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 1994, r. 30.

kurê Mirdas, Zubeyr, Mîqdad, Ebû Sufyan, Se‘d, Xalid, Emmar û Hz. Elî êrîşî leşkerên Hewazînê dikan.

Di maweya herbê de Şeytan tê û dibêje Hz. Muhemmed wefat kiriye. Li ser vê xeberê artêşa misilmanan belav dibe. Ji artêşa misilmanan Hz. Muhemmed, Hz. Elî, Hz. Omer, Hz. Osman, Hz. Ebûbekir, Zubeyr, Zubeyrê kurê Ewam, Se‘d, Xalid, Mîqdad û sed leşkerên misilman mane. Hz. Muhemmed apê xwe Ebbas ji bo misilmanan berhev bike wezîfedar dike. Bi gazîkirina Ebbas misilman berhev dibin û ayetên 24-26 yê sûreya Tewbeyê nazil dibin.

Di maweya Herbê de kurê Şeybe ji bo ku heyfa bav û apê xwe ku di herba Ûhûdê de hatibûn kuştin, hilibide nêzîkî Hz. Muhemmed dibe. Lê di wê maweyê de çavên wî ji ber nûrê wî nabîbinin, paşê kurê Şeybe dibe misilman û li aliyê misilmanan dikeve şer.

Enesê kurê Malik bi awayekî bîrîndar tê û dibêje ez û Hz. Elî çûn ku avê bînin, lê leşkerê dijmin hatin pêşîya me. Ez û Hz. Elî birandar bûn û Hz. Elî hêj jî şer dike. Li ser vê yekê kurê Mirdas, Xalid û Zubeyr diçin Hz. Elî bi awayekî bîrîndar tînin cem Hz. Muhemmed (s.x.l.). Hz. Muhemmed bîrînen Hz. Elî baş dike. Di wê maweyê de Cebraîl tê û dibêje ku ji bo her dilopeke xwîna xazîyan melek îhsanê ji wan re dikan. Di vê herbê de kesekî kor bi saya mucîzeyê Hz. Muhemmed çavên wî baş dibin û herb heta êvarê berdewam dike.

Serê sibehê Cebraîl tevî melean tê alîkarîya misilmanan, herb serê pêşî yekoyeko dest pê dike, Hz. Muhemmed çengekî ax hildide û bi ser kafîran ve dike, bi vî awayî dijmin têk diçe. Herb bîst rojan berdewam dike û pişt re Malikê kurê ‘Ewf û ‘Urwe dibin misilman.

Cengnameya Muhemmed Efendî bi vî awayî diqede; Hz. Muhemmed xenîmetan parve dike. Lê hin kes ji bo vê yekê îtiraz dikan. Paşê Hz. Muhemmed misilmanan qayîl dike. Dema ku misilman vedigerin Medîneyê, Fazîlê kurê Ebbas diçe Basrayê û dibe hêsîrê Hebeşîyan. Cebraîl tê xeberê dide Hz. Elî. Hz. Elî tê Keleha

Xerabê û Fazil xelas dike. Dawîyê de Hz. Elî Sahit dikuje û misilman jî kelehê xera dikin.¹⁶⁷ Misilman tevî xenîmetan vedigerin Medîneyê.

Tablo 4: *Hevşibîna Hin qismên Cengnameya Mela Yasînê Alikî û ya Muhemmed Efendî.*

| Mela Yasînê Alikî | Muhemmed Efendî |
|---|--|
| Malik got ey 'Emra Jin û zaran hev ra Em biherin xo ra Kes nereve j' pa ra (51) | Pes dönüben 'Urveye didi ki biz Bile gelsün 'avret oğlan mälumuz ¹⁶⁸ |
| Tu bike beyan e Çend 'elemê wan e Kincê wan çewa ne Şef tîn yan bela ne (110) | Didi yâ mewlâyî gördüm bir çeri Niçe biñ irdi öñi yoq leşkeri |
| 'Ebd got ya Mewla'ê Şexşek bû numa'ê Nûrek birq veda'ê Ew nûr çû sema'ê (125) | Didi şaygıl kaç 'alem var yâ gulâm Her birinüñ rengini digil tamâm ... |
| Qûl got ya mewla'ê 'Ecêbek min diye Li nava sehra'ê Cenawer tijî ye (139) | Didi yâ mewlâyî gördüm bir çeri Beñzemez hîç âdeme şuretleri |
| Hindek şubhê şêran Dêlê ew hiltînin Hindek şubhê maran Xo l' hev dialînin | Kimi arslan kimi kaplan yılanlar Kimi kırtdur kimi ayu hep anlar |
| Hinek şubhê gurgan Pencan l' hev dixînin Hinek şubhê teyran Peran dihejînin | Kimi kuşlar gibi uçar havâda Gelürler töltole olmuş ovada ¹⁶⁹ ... |
| Hinek şubhê hûtan Agir dibarînin Dûman girtye deştan Êdî em nemînin (140-142) | Yüz çevürüp kaçduñuz durmaduñuz Ol Muhammed hâzretini qoduñuz |
| We Muhemmed Cî da hişt paş da revîn Me sekîne da Muhemmed Hem ewan Yarê Guzîn | Biz sekîne virbidük tã Muştafâ Durdı ol yârenler-ile ol şafâ |
| | Dağı gökden virbidük biz leşkeri Kim görünmez-idi size ol çeri |
| | Yardım itdi size açdı feth-i bâb Kılıç-ıla kâfire kıldı 'azâb ¹⁷⁰ |

¹⁶⁷ Ji bo ahagîyên berfirehtir bnr; Çetin, 1997, r. 18; Efendî, 2019, n.r. 1321-1387.

¹⁶⁸ Efendî, 2019, c. 2, n.r. 1332-1334.

¹⁶⁹ Efendî, 2019, c. 2, n.r. 1332-1334.

¹⁷⁰ Efendî, 2019, c. 2, n.r.1354.

| | |
|---|--|
| <p>Hem mela'ik me şihandin Bê hesab Şûr li kafiran hejandin vekirin wan Fethê bab (205-206)</p> | |
| <p>Nagah hat ji wê da Kurê Malik Enes Birîndar xûnê da Anceq dertê nefes</p> <p>Pêgember suwal kir Şahê Merdan kanê Enes hikayet kir Go bikim beyanê</p> <p>Weqta ku bû nivro 'Elî hat bi gar e Ġayet germ e îro Bînin ava sar e</p> <p>Pêgemberê mêj ke Jê ra bînin av e Wî hilda yek meşk e Em çûn gav bi gav e (230-233)</p> <p>'Ebas Xalid hem Zubeyr Wana kafir qir kirin Heta gehane Heyder Wana kafir las kirin Selam dike pêgember Ji bo te intizar in (247)</p> <p>Wî dît cewşen parepar Anîn ji [ser] derxistin Heftê du birîn hejmar Resûl ahên raştişin</p> <p>Du'a kir go ya 'Elî Fexr dikin bi te melek Nabin şubhê te welî Te'eccub bûye felek (253-254)</p> | <p>Pes Resûlu'llâh didi kim yâ Enes Hâk saña çok hayr virsûn her nefes</p> <p>Hîç bilûr misin 'amum oğlı 'Alî Hâli nedûr kanda ola ol velî</p> <p>Ya Resûlu'llâh bileydûm dir belî Çûnkim öyle ıssısı oldu 'Alî</p> <p>Baňa didi bugün ıssı oldu gün Şu gerekdür ol Resûlu'llâh için</p> <p>Tâ kim içe hem dağı âb-dest ala Bir tulum götürdi pes varduğ bile ...</p> <p>Hâlid u 'Abbâs Zübeyr ibn-i 'Avâm Gördiler kim yalunuz cengde imâm ...</p> <p>Didiler gönderdi Peygâmbere bizi Muntazirdur görmek ister ol sizi ...</p> <p>Gördi Peygâmbere dökilmiş cevşeni Kara kanlarla yapışmış kaftanı ...</p> <p>Gevdesinde yitmiş iki yarası Var kılıçdan oğdan açuğ arası ...</p> <p>Ki fahr ider sentûn-ile melekler çebâtuñda ta'accübde felekler¹⁷¹</p> |

¹⁷¹ Efendi, 2019, c. 2, n. r. 1358-1363.

Melayê Senceqî

Helbesta wî ya ku “Eya ey dîlbera nazik hebîba ber dilê yarê” dest pê dike nazîreyeke li ser helbesteke Melayê Senceqî ye. Ev helbesta Senceqî li ser medhê Elaeddînê Xeznewî hatiye nivîsîn. Helbesta Melayê Senceqî ji şeş bendan pêk hatiye û bi teşeya Terkîbbenda Muselles Digel Navbenda Dumisra hatiye nivîsîn.

*Ela ey dilbera nazik hebîba ber dilê xorta
Te cism û can hemî sotin bi van daxan bi ser sota
Bi qurbana te bin sed heb wekî Zîna li nav Bota*

*Çira naête insafê ela ey serwerê dilber
Te ‘alem tev ji hiş xistin kirin dîn û esîr û zer*

...

*Di piştî vê şeva tarî gelo rojê bibînim ez
Ji axa ber piyê dilber gelo çav kil dikim pê ez
Hezar caran şukir îro şeker-xendê vexwendim ez*

*Me zanî **Senceqî** can da ji bo vê mujdeya dilber
Hezar wek **Senceqî** îro bi qurbana te ser-leşker¹⁷²*

Mela Yasînê Alikî

1. *Eya ey dîlbera nazik hebîba ber dilê yarê*

Te çil rojan li min şewtand wekî daxê li ser darê

...

12. *Gunehkar ew feqîr e lê bike îstîxfarê*

Ay mirin çêtir e ji halê wî dilêm

¹⁷² Mela Ehmed Hilmî el-Koxî el- Diyarbekrî, **Dîwana Camî**, Weşanên Ihsan, Diyarbakir 2004, n. r. 401-402.

BEŞA DUYEM

VEKOLÎNA “ĞEZWETU HUNEYN” Ê

2.1. ĞEZWETU HUNEYN Û CÛREYA WÊ

2.1.1. Navê Berhema Mela Yasînê Alikî

Mela Yasînê Alikî rasterast di berhema xwe de navê berhemê neanîye ziman. Lêbelê di serê nusxeya NYYê de îfadeya “Ğezwetu Huneyn” hatiye nivîsîn û herwiha hin bêje û bend/malikên ku nav û naveroka berhemê bi bîr tînin hatine bikaranîn. Ji îfadeya “Ğezwetu Huneyn”ê em fêhm dikin ku navê vê berhema Alikî “Ğezwetu Huneyn” e. Alikî di nav berhema xwe de ji bo cengê îfadeyên weke “Cenga Huneynê, Huneyn, Roja Huneynê” bi kar anîne û ev îfade di van bendan de weha derbas dibin:

Ji hedîsan dikir ixrac

*Beyan kir **Cenga Huneynê***

Bi Kurmancî wî kir idrac

Ku du ‘an bo wî bixwînin

(8)

Eskerê Hewazîn

Begê Seqîfûnê

Ew tîn bi yeqînê

*Wê werne **Huneynê***

(59)

Bi zikrullahê ‘eynê

Ew çûn li wê mabeynê

Wan cundu’s-seqeleynê

*Bi hewar hatne **Huneynê***

(101)

*Hal ew roja **Huneynê***

We kir beyan

Bê hesab e 'eskerê

Me j' her weqtan

(203)

*Her terefan **ceng e***

Kes haj kesî nîne

Hayûhûy û deng e

Quwet kes tunîne

'Elî s'yarek şeng e

Kesek ha jê nîne

(229)

***Cengek** wisan 'ecêb e*

Serî hol bûn ber piyan

Xûnê girtî rikêb e

Buxarê xwe da çîyan

(358)

2.1.2. Cûreya “Gezwetu Huneyn”ê

Metna vê berhemê ku bûye mijara vê xebatê ji aliyê teşe û naveroka xwe ve dikeve çarçoveya menzûmeyê.

Metnên menzûm ên ku di dîwanan de cih nagirin bi awayekî serbixwe hatine nivîsîn wek menzûme tîn binavkirin. Dikare bê gotin di edebîyata klasîk de kurt be yan dirêj be, teşeya wê ya nezmê mesnewî be, yan tişteki dî be ferq nake hemû metnên edebî yên ku derveyî dîwan, dîwançe û mecmû'eyan dimînin dikevin kategorîya menzûmeyê.

Ji aliyê teşeyên nezmê ve menzûme li ser du kategorîyan dikare bê dabeşkirin: Yên ku bi teşeya mesnewîyê hatine nivîsîn û yên ku bi teşeyên dî hatine nivîsîn. Divê bê gotin di menzûmeyan de herî zêde teşeya mesnewîyê hatiye bikaranîn.

*Memzûme ne di mijarên lîrik de bi piranî di mijarên dînî, dîrokî, dîdaktîkî û exlaqî de tîn nivîsîn. Bi kurtî eger dîwan lîrik bin menzûme dîdaktîk in. Ev yek ji ferqa di navbera şî'r û nezmê de derdikeve meydanê. Di dîwanan de şêwaza şî'rê, lêbelê di menzûmeyan de şêwaza nezmê serdest e.*¹⁷³

Nêzîkbûna cûreyên edebî ya ji alîyê mijarê ve bûye sedem ku lêkolerên edebîyatê jî bi temkîn tevbigerin û têgehên giştî bi kar bînin. Ji bo tesnîfa cûreyeke edebî navê berhemê têr nake. Lewra tê dîtin ku di hin berheman de navên cûreyan ji dêvla hevûdu hatine bikaranîn. Ji ber vê yekê bi nêrîna li navê menzûmeyekê tesbîtkirina cûreya wê her tim encameke rast nade.¹⁷⁴ Di edebîyata klasîk de di mijara navdayînê de xezaname û cengname di nav wan cûreyan de ne ku tîne tevlihevkin.¹⁷⁵

Her çiqas Mela Yasînê Alikî di serê berhema xwe de bi mebesta navê berhemê îfadeya “Gezwetu Huneyn” bi kar anîbe jî ev berhem nabe xezanameyek. Ev berhema Mela Yasînê Alikî li ser Cenga Huneynê hatiye nivîsîn û şer û bûyer li derdora Hz. Muhemmed (s.x.l.) û Îmamê Elî diqewimin. Di edebîyata Tirkî de ev berhemên ku mêrxasîya Hz. Elî tînin ziman weke Cengnameyên Hz. Elî hatine binavkirin. Cûreya berhemê li gor naveroka wê tê dîyarkirin. Ji ber ku ev berhema menzûm jî li ser ceng û şervanîyê ye û di xwe de unsûrên derasayî vedihewîne dikeve nav cûreya cengnameyê. Bi taybetî di vê berhema Alikî de behsa şervanî, mêrxasî, pehlewani û lehengîya Îmamê Elî tê kirin û berhem bi unsûrên derasayî hatiye xemilandin. Ji ber van egerên li jor û ji naveroka berhemê derdikeve holê ku cûreya vê berhemê cengname ye û me jî ev berhem ji alîyê cûreyê ve weke “Cengnameyê Îmamê Elî” qebûl kir. Di berhemê de di çend cihan de bêje û peyvên weke ceng, Cenga Huneynê, şer û herb derbas dibin.

Ji hedîsan dikir ixrac

Beyan kir Cenga Huneynê

Bi Kurmancî wî kir idrac

Ku du'an bo wî bixwînin

(8)

¹⁷³ Abdurrahman Adak, *Teşeyên Nezmê di Edebîyata Kurdî ya Klasîk de*, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2019, n.r. 93-94.

¹⁷⁴ Mehmet Aça, Haluk Gökalp, İsa Kocakaplan, *Başlangıçtan Günümüze Türk Edebiyatında Tür ve Şekil Bilgisi*, Kesit Yayınları, İstanbul 2012, n.r. 293-294.

¹⁷⁵ Koyuncu, 2020, r. 137.

*Ji hay û hû mêran
Seh nekirin deng e
Şed heb ji dilêran
Tenê kirin **ceng e**
Wana kafir hêran
Bi gurzê xeleg e*

(178)

*Gote min ya Ibnî Şeybe
Tu here **cengê** heman
Sem 'e ta 'e got û min
Fîlhal ji wî ez bûm rewan*

(216)

*Kafir Islam carek
Ser û binê hev bûn
Navê Heq mubarek
Temam li hev qam bûn
Wan **şer kirin** qaşek
Serî l' 'erdê hol bûn*

(171)

2.2. ZIMANÊ GEZWETU HUNEYNÊ

Di *Gezwetu Huneynê* de zimanekî sade yê gel hatiye bikaranîn. Her çiqas tê de bêje, peyv û terkîb ji zimanên weke Erebî, Farisî û Tirkî hebin jî ev yek zimanê berhemê giran nekiriye û metna berhemê bi hêsanî tê fêmkirin. Em dê li jêr li ser hûrgilîyên zimanê *Gezwetu Huneynê* rawestin.

2.2.1. Di Cengnameyê de Taybetîyên Devokên Kurdî

Di *Cengnameya Huneynê* de hin xisûsiyetên devoka Serhedê û devoka Behdînan hene. Em dê li jêr behsa her du devokên Kurdî û bikaranîna wan ya di cengnameyê de bikin û nimûneyan pêşkêş bikin.

2.2.1.1. Devoka Serhedê

Mela Yasînê Alikî ji devera Serhedê ye ji ber vê yekê tesîra devoka Serhedê di berhemên wî de bi awayekî berbiçav xwe dide nîşandan. Serhed herêmeke Bakurê Kurdistanê ye û bajarên Çewlig, Erzirom, Mûş, Agirî û Qers li Bakurê Kurdistanê û herêma sersînori ya li parêzgeha Azerbaycana Rojava dikevin nav tixûbê vê herêmê.¹⁷⁶ Ev devok li bajarên weke: Mûş, Erzirom, Agirî, Bedlîs, Çewlig, Dîyarbekir û li hin deverên Wanê tê axaftin.¹⁷⁷ Ev devok hin taybetîyên herêmî di xwe de dihewîne. Mela Yasînê Alikî jî van taybetîyan di berhema xwe ya bi navê *Gezwetu Huneynê* de bi kar anîne.

Di devoka Serhedê de tîpa “w”yê zêde nayê bikaranîn, ango di gelek bêjeyan de ev tîp dikeve. Di *Cengnameya Huneynê* de bêjeya “daxwaz” weke “daxaz” bêjeya “duwazdeh” weke “dazdeh”, bêjeya “xwarê” weke “xarê”, bêjeya “xwîn” weke “xûn”, bêjeya “xwelî” weke “xalî” hatine nivîsîn.

Ji Xaliq wî dikir daxaz
Işareta Resûlullah
Wekî bilbil bike perwaz
Bi wan methê Hebibullah
(7)

Ez dikim hewar e
‘Elem min hejmar e
Tam dazdeh hezar e
Temam tèn bi gar e
(124)

Hûrî hatne xarê
Ji bona şehîdan

¹⁷⁶ Cihan Turan, “*Dîwana Fethî (Edîsyon, Metn, Krîfîk)*”, (Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Bîngolê Enstîtuya Zimanên Jîndar Makezanista Ziman û Edebiyata Kurdî), Bîngol 2017, r. 91.

¹⁷⁷ Mehmet Yonat, Di Devokên Kurdîya Kurmancî de Zayenda Rewşên Morfolojîk (Mînakên Devokên Bakur, Başûrê Rojhilat û Başûrê Rojavayê), *Mukaddime*, hej. 11 sal 2020, n.r. 410-445.

*Rûh bikin îsarê
Qetil kin pelîdan*

(150)

*Hirhir kenî ew kefer
Hukum dikî ji bo xwe
Tu cenetê ya Heyder
Dixazî hem ji bo xwe*

(335)

*Her nebîyek mu 'cîzatê
Wan di desta zahir e
Ew weqta lizûm **bixesta**
Wan dikirin şadir e*

(351)

Di devoka Serhedê de daçekên “ de, ve û re” weke “da, va û ra” tên bikaranîn.
Ev yek di metna cengnameyê de weha derbas dibe:

*Yek hatî ji der **da**
Di şiklê kalan **da**
Darek di destan **da**
Go gelî ewlada*

(33)

*Malik got ey 'Emra
Jin û zaran hev **ra**
Em biherin xo **ra**
Kes nereve j' pa **ra***

(51)

*Wan dî b' rê **va** newalek
Me 'mûr kiribû kalek
Tê de koşk û sera `ek
Derbaz kir 'bû dewranek*

(53)

Herwiha di berhemê de hin bêjeyên ku bêtir li herêma Serhedê tene bikaranîn cih digirin, weke: “Seh kin- seh bikin, vewestan- westîn, ciger- ceger, bira-bila”.

Bibin guhdar ku ez bêjim

Beyan kim ez hikayatê

Ji geman hûn bibin azad

*Ku **seh kin** vê îbaratê*

(1)

Rabûn istiqbal e

Vewestan li bal e

Bibêj çi ehwale

Çi kalek delal e

(36)

Rimmê di rimbazan

Ciger qul dikirin

Bi derbê çomağan

Serî hûr dikirin

(186)

Şewat bidin bira

Hûn xilaş bin nîranê

Li Muhemmed aşkera

Şefî` roja mîzanê

(38)

Di devoka Serhedê de zayend gelek caran tene tevlihevkin. Hin tiştên ku zayendên wan nêr bin weke mên tene bikaranîn yê mên jî weke nêr. Ji ber vê yekê di mijara zayendê de tevlihevî derdikeve holê. Di metna cengnameyê de jî em rastî ve tevlihevîyê hatin. Helbestvan jî dêvla zayenda “nêr” zayenda “mên” bi kar anîye. Weke:

*Ez hatim **piş da** sekinîm*

Dest avête xencerê

*Derbekê wisan ku lê xim
Ew şehîd be l' wê derê*

(212)

Herwiha ji dêvla zayenda “mê” jî zayande “nêr” bi kar anîye. Weke:

*Gazî min kir ez ku çûm
Çê bû li min xewf û xeter
Dest li **singê** min malandî
Kir di 'ayek mu 'teber*

(214)

2.2.1.2. Devoka Behdînan

Behdînan; Navê herêmekê ye ku li Kurdistana Iraqê ye, bi awayekî giştî ev herêm ji bajarên Dihok, Zaxo, Amedîyê, Aqrê û Şêxanê ve ku li bakurê Mûsilê dikevin pêk hatiye. Piraniya vê herêmê di nav sînorên bajarê Dihokê de dimîne.¹⁷⁸ Kurdên ku vê devokê diaxivin weke Behdînî hatine binavkirin.

Di nav berhema Mela Yasîne Alikî de em rastî hin bêje û peyvên devoka Behdînan hatin weke: biçin-biçîtin, bibin-bibit, nabe-nabit, xwe-xo.

*Te 'na xo beyan kir
Fesadî 'eyan kir
Kînek wisan kar kir
Qelbê wan wêran kir*

(44)

*Cinan ku bihîstin
Ji hev du ra gotin
Musulman ku **bêtin**
Em jî dê **biçitin***

(87)

¹⁷⁸ İbrahim S. Işık, **A'dan Z'ye Kürtler- Kişiler, Kavramlar**, Weşanên Nûbiharê, İstanbul 2017, r. 96.

*Resûl got ya Qetadet
Çavê bibit şehîd e
Yeqîn ke qelbê sade
Xêra wî pur mezîd e*

(264)

2.2.2. Unsûrên Zimanên Bîyanî

Zimanê dayîkê yê Mela Yasînê Alikî Kurmancî ye, lê wî di berhemên xwe de ji bilî zimanê Kurdî cih daye peyv û bêjeyên zimanên Erebî, Farisî û Tirkî jî. Mela Yasîn di berhema xwe ya bi navê *Cengnameya Huneynê* de hin serenavên berhemê bi Kurdî-Kurmancî, Erebî û bi Farisî nivîsiye. Ji ber vê yekê em ê li jêr unsûrên van zimanan dîyar bikin û mînakên wan pêşkêş bikin.

2.2.2.1. Unsûrên Erebî

Li gor Kutbettin Uygur Erebîzanîna Mela Yasînê Alikî ne di asteke bilind de bûye, lê em di berhema wî de rastî bikaranînên Erebî jî tên. Mela Yasînê Alikî di berhema xwe ya bi navê *Cengnameya Huneynê* de cih daye hevok, bêje û terkîbên Erebî. Herwiha hin serenavên beşên cengnameyê jî bi Erebî nivîsiye. Di cengnameyê de hin terkîb û bêjeyên Erebî ku derbas dibin ev in: ehsenê teqwîm, hemd, selewat, la'îq, Rehman, Hennan, Mennan, Xefûr, Setar, 'eyan, senem, îbn, be'îran, el-qisse, i'lam, Ellah Ekber, filhal, se'yû te'cîl, cundu's-seqeleyn, 'emm, sellû'ela, mel'ûn, serî'en, ehlê bey'et, Xetm'ul-Meurselîn, sirr'ul-beqer, ehlê 'urfan, la-yezal, mu'teber, sem'e ta'e, şu'le, Fexr'ul-umem, Fexrê 'alem, re'yet 'elem, şubh, seme'na, Zûl-Celal, sahib-qiran, mu'min, bil-'umum.

Bi zahir “ehsenê teqwîm”

Dihatne nava meclisa

Me nefsa xwe dikir teslîm

Di baîtin xab û hem desa

(4)

Ewwil bismillahî

Elhemdulillahî

La'iq Padişah î
Bê mesken û cah î

(11)

Ġeffûr û Ġeffar î
Rehîm û Settar î
Mudam tu hişyar î
Xudawend û mar î

(13)

Hûn werin ya ehlê Qur'an
Ĥamilê sirr'ul-Beqer
Bizvirin ya ehlê 'urfan
Bayi'ê tehtê şecer

(195)

*Rawiyî got **Ibnî** Mirdas*
*Hate cem **Fexru'l-umem***
*Jê suwal kir **Fexrê 'Alem***
*Kanê ew **ru'yet 'elem***

(221)

*Guh bidin wan **mu'cizatê***
*Wî Resûlê **Zu'l-celal***
Ev dibe carî ji tilyan
*Hem bi emrê **La-Yezal***

(268)

2.2.2.2. Unsûrên Farisî

Di *Cengnameya Huneynê* ya Mela Yasînê Alikî de unsûrên Farisî jî cih digirin. Ev unsûrên Farisî di hin cihan de weke bêje û peyv, di hin cihan de weke terkîb û di hin cihan de jî di serenavan de hatine bikaranîn. Di navbera zimanê Kurdî û Farisî de gelek bêjeyên hevpar hene ji ber vê yekê tesbîtkirina hemû bêjeyên Farisî ji ber vê yekê nepêkan e. Çend bêje û terkîbên ku di cengnameyê de hatine bikaranîn weha ne:

perwane, Xudawend, dana, Girdigar, pehlewana, ejderha, pur, cenawer, pelîd, polad, nabadîd, xendan, geda, nagihan, gofte, şadiman û penah.

Eger Kurmancî mewzûn bû

We nîne bê hedîs ayat

Yasîn perwanê narê bû

Beyan kir hal û ehwalat

(9)

Xudawend û mûr e

Xudawend û nûr e

Xudawend û tûr e

Ji kafîran dûr e

(14)

Xweş-kalek zana î

'Arif û dana î

Pût-latan tu da' î

Beyan ke de 'wa'ê

(37)

Pêgemberê kubar e

Wî gote Çarûyar e

Biçe herba kuffar e

*Bi emrê **Kirdigar** e*

(61)

Qûl got ya mewla'ê

'Ecêbek min dîye

Li nava sehra'ê

***Cenawer** tijî ye*

(139)

2.2.2.3. Unsûrên Tirkî

Di *Cengnameya Huneynê* de unsûrên zimanê Tirkî jî hatine bikaranîn. Ev unsûr bi pîranî weke bêje derbas dibin: yaniş, ortê, qûmandar, delge, eslanek, ordiyê, beyraq, şubhesîz, qûl, işiq, pûsî, qab, dûman, ayrî, izinde, dûz, bitûn, toz, dûrlû dûrlû, sewaş, çapik, buxarê û alt.

Wî gote wan kafiran

*Ya **begler** û emîran*

***Yaniş** we kirye dewran*

Zeman bi wî ra yar e

(54)

Li pêş 'Elî Heyder e

*Li **ortê** pêgember e*

Xaliş nûra Ekber e

Ji wechan nûr çû der e

(65)

*Ne heb **qûmandar** in*

Serdarê cinan in

Bi zîkr û Qur'an in

Meşgûlê dersan in

(85)

Bi rê ketî 'esker e

Meymen e hem meyser e

***Delgê** wan wekî behr e*

***Toz** û 'ucac û gebr e*

(100)

'Ebdê xo hilanî

*J' **ordiyê** deranî*

Çûne yek mekanî

Binhêr wek dizanî (106)

Rawiyan kirye riwayet
Tu bizanî ey 'ezîz
Mu'min û kafir bi carek
Hatne herbê şubhesîz

(216)

Ew Muğdadê 'Erebî
Beyraqdarê pêgember
Ji 'Elî ayrî nabê
Dike cewlan bi huner

(245)

'Ebas kurê Mirdas e
Wî gote Xalid Zubeyr
Dê em bikin sewaş e
Ji bo 'Eliyê Heyder
Nav l' me bibe pîroz e
Ger şa bikin pêgember

(241)

Şah gote wê da belê
*Min **alt** kirin serteser*
Cardin hucûm da 'Elî
Ew kafirê pur Qecer

(331)

2.2.3. Biwêjin di Cengnameya Huneynê de

Biwêj ew awayên vegotinê ne ku ji bo xurtkirina vegotinê hatine çêkirin. Di wan de daraz tune ne û bi piranî mecazî ne û rewşê dîyar dikin.¹⁷⁹ Mela Yasînê Alikî jî ji bo hêz û tesîra gotina xwe zêde bike serî li biwêjan daye û di berhema xwe de di çendîn cihan de cih daye biwêjan. Biwêjên ku di cengnameyê de derbas dibin ev in:

| | |
|-------------------------------|--------------------------------|
| - Şe'ê har (26) | - Ser û binê hev bûn (171) |
| - Wêran bû (32) | - Te d' got qiyamet e (172) |
| - Dilê min xûn kême (34) | - Dest li wana sar bû (176) |
| - Kulma l' singê xo da (45) | - Weke tavê baran (184) |
| - 'Eqlê wî bû şeyda (45) | - Şermesar in (198) |
| - Ber piyan be (46) | - Xaba gefletê (201) |
| - Ber pê kim (47) | - Dikim qurban (215) |
| - Rûhê me tev fida be (62) | - Fida kir rûh û can (217) |
| - Ji wechan nûr çû der (65) | - Birîndar e serteser (251) |
| - Şerqê ta gêrbê (88) | - Wana lez li pan kir (258) |
| - Xwelî li serî (108) | - Wek 'aşiqan cewlan kir (305) |
| - Çav dûrbîn (111) | - Pişt û penahê (311) |
| - Qamet wek çinarek (116) | - Can û ciger şotin (321) |
| - Mîna hîva çarda (122) | - Şewîfî can û ciger (329) |
| - Te dest li me sar kir (138) | - Bu qîl û qal (332) |
| - Nebe hevalê dunya'ê (1) | - Xuda hez ke (334) |
| - Şegê şor (165) | - Çê bû qiyamet (361) |

2.2.4. Cotepeyvên di Cengnameya Huneynê de

Ji bo ku vegotin bi derbtir û xurttir bibe du peyv tên bal hevdu û dibin cotepeyv.¹⁸⁰ Di axaftina rojane de ji bo ku axaftin bihêz be ev cûre peyv tên bikaranîn. Cotepeyv dikarin ji bêjeyên hemwate, dijwate, nêzwate pêk werin, herwiha dikarin bi alîkarîya gihanek û navbendan bikevin şiklên nû an jî carna di navbera herdu bêjeyan de bi xêzekekê jî ev bêje bînin bikaranîn û vegotinê bitesîr bikin.¹⁸¹ Dema em li *Cengnameya Huneynê* mêze dikin tê dîtin ku Mela Yasînê Alikî jî ji bo hêza vegotina xwe xurt bike gelek cotepeyv bi kar anîne. Ev cotepeyvên di berhemê de weha ne: mesken û cah, cewr û cefa, fewc û fewc, hay û hûy, çol û çolistan, derb û derbûstan,

¹⁷⁹ Bahoz Baran, *Rêzimana Kurmancî*, Weşanên Wardoz, Amed 2018, r. 39.

¹⁸⁰ Baran, 2018, r. 37.

¹⁸¹ M. Zahir Ertekin & Zafer Açar, Di Kurmancî de Cotepeyv û Cûreyên Wan, *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, sal 1., c. 1, 2015, n.r. 82-92.

cin û canan, sef bi sef, gûlgul, nar û nûr, şinge-şing, gûjje-gûj, şewt û seda, zarezar, gav bi gav, pêda pêda, serteser, parepar, da û baban, xerdexûr, qelb û cenah, celeb celeb, xalxal, dûrlû dûrlû, pişt û penah, qed û qamet, can û ciger, qîl û qal, hîr hîr, parepar, qal û qîl, kar û zar.

Şubhê ew suwar bûn
Bi gazî hewar bûn
Fewc û fewc rewan bûn
Çil hezar hejmar bûn

(49)

Çol û çolistan e
Derb û derbustan e
Mewc dan wek behran e
Ebas kir beyane

(67)

Şinge-şingê şûran
Tijî bû dunya`ê
Gujje-gujê tîran
Ji heddê qeş na`ê

(185)

2.2.5. Di Cengnameya Huneynê de Teswîrên Cengê

Di *Cengnameya Huneynê* ya Mela Yasînê Alikî de zimanekî sade yê gel hatiye tercîhkirin. Her çiqas tê de hin unsûrên zimanên weke: Erebi, Farisî û Tirkî hebin jî ev yek zimanê berhemê giran nekiriye û berhem bi hêsanî tê fêmkirin. Dema em li zimanê cûreya cengnameyê mêze dikin tê dîtin ku axlebî bi zimanekî sade, herikbar û hêsan hatine nivîsîn. Lewra di van berheman de armanc ne zimanekî edebî û uslûbeke giran e, armanca van berheman xweş-wext derbaskirin û balkişandin e û bi taybetî di cengnameyên Hz. Elî û Muhemmed Henîfe de teblîxkirina dînê Îslamê ye. Ji ber vê yekê ji bo ku gel bi hêsanî ji van berheman fêm bikin ev berhem bi zimanekî xwerû û hêsan tene nivîsîn.

Di cengnameyê de teswîrên maweya herbê bi awayekî zelal, herikbar û balkêş hatine vegotin. Helbestvan bi van teswîran bi mirov maweya herbê dide hîskirin û jîyandin. Bi neqilkirina helbestvan em xwe li nava herbê hîs dikin. Çend teswîrên ku di metnê de hatine kirin weha ne:

Bi rê ketî 'esker e
Meymen e hem meyser e
Rastê Şidîq Ekber e
Li çep 'Emîr 'Umer e

Li pêş 'Elî Heyder e
Li ortê pêgember e
Xaliş nûra Ekber e
Ji wechan nûr çû der e

Dengê zîkr û tehlîlan
Hayûhûyê emîran
Li deştê bûne leylan
Kişyane ser rezîlan

(64-65)

Lewra pur gedar bûn
Hindek şubhê mar bûn
Dirêj wek çinar bûn
Gayet ew dujwar bûn

Hinek şubhê gurgan
Pencê wan wek zergan
Ketne reqş û firgan
Diran wek qocigan

Hin hût û neheng in
Hin şêr û piling in

Şed heybet bi deng in

Hem bi perr û çeng in

(94-96)

Bi van teswîrên ku helbestvan kiriye em maweya herbê dijîn û xwe di nav wê herb û alozîyê de hîs dikin. Ji ber sadebûna zimanê nivîskar her kesê ku vê berhemê bixwîne dikare bikeve nava van hest û ramanan.

Gurzek l' Zubeyr bar kir

Wezna wî giran bû

Super wî îhzar kir

Di bin da punhan bû

Ew li Zubeyr bar kir

Şed û çil batman bû

Zubeyr şûr kişandî

Carek lê hewar kir

Serî hilfirandî

Ew lahiqê nar kir

(168-169)

Ji hay û hû mêran

Seh nekirin deng e

Şed heb ji dilêran

Tenê kirin ceng e

Wana kafir hêran

Bi gurzê xeleg e

(187)

Şinge-şingê şûran

Tijî bû dunya `ê

Gujje-gujê fîran

Ji heddê qeṭ na `ê

*Rimmê di rimbazan
Ciger qul dikirin
Bi derbê çomağan
Serî hûr dikirin*

*Herb e herb e herb e
Danîn hev du derb e
J' ber gurzê dilêran
L' kafran çê bû kerb e*

(185-187)

*Kafir revîn temamet
Çûne Kela Ta'îfê
Li wan çê bû qiyamet
Û hem çêbû ze'îfî*

*Hinek ji wan esîr bûn
Hinekan kir firar e
Hinek ji wan qetil bûn
Ew çûne nava nar e*

*Dora gelî girêdan
Bû gazî yû hewar e
Islamê ne're radan
Hal kafira firar e*

*Malik revî hişarê
Yehûdan ew xilas kir
Cardin hatne şirarê
Wan tehbîra xwe dikir*

(361-364)

2.3. HUNERÊN EDEBÎ

Hunerên edebî perçeyeke girîng ê berhemên edebî ne. Helbestvan û nivîskar bi bikaranîna hunerên edebî hêza vegotina xwe xurttir dikin û bi vî rengî çêjeke edebî tevî berhemên xwe dikin. Di *Cengnameya Huneynê* de jî hunerên edebî hatine bikaranîn. Di vê beşê de em dê hunerên edebî yên cengnameyê tesbît bikin û bi mînakên wan destnîşan bikin. Hin ji hunerên edebî yên ku di cengnameyê de derbas dibin ev in:

2.3.1. Teşbîh

Di nav du tiştên ku ji gelek alîyan ve di navbera wan de hevşibî hebe û ji hêla şibandinê ve yê qels ber bi yê bihêztir ve were şibandin jê re teşbîh tê gotin.¹⁸² Di cengnameyê de hunera teşbîhê weha derbas dibe:

Ji nasan wî dikir 'uzlet
*Dinalya ew **wekî bilbil***
Vebû ber wî gulistanek
Temamê wê gul û sunbil

(6)

*Hinek **şubhê gurgan***
*Pencê wan **wek zergan***
Ketne reqş û firgan
*Diran **wek qocigan***

(95)

*Hindek **şubhê şêran***
Dêlê ew hiltînin
*Hindek **şubhê maran***
Xo l' hev dialînin

(140)

¹⁸² İsa Kocakaplan, *Açıklamalı Edebî Sanatlar*, Türk Edebiyatı Vakfı Yayınları, 9. Baskı, İstanbul 2017, r. 162.

2.3.2. Telmîh

Ji bibîrxistina rûdanek, çîrokek, kesek, pêkenokek, gotineke pêşîyan, mîzahek, metelokek, bawerîyeke dînî ku navdar be û ji alîyê gelek kesan ve were zanîn jê re telmih tê gotin.¹⁸³ Hunera telmîhê di nav berhemên edebî de gelek caran tê bikaranîn. Di *Cengnameya Huneynê* de jî weha derbas dibe:

Pêgember got ya 'em

Ev çi hezn û matem

Qewlê te got ev dem

*Şubhê tîra **Rustem***

(70)

*Çiqasa tu bikî **dewran bi 'umrê Nûh bi pey behrê***

Axir dê em bikin rişlet biborî tu ji dunya 'ê

(3)

2.3.3. Tezad

Du têgehên dijber ku alîyên wan ên hevpar hene, di maneya rast û mecaz de were bikaranîn hunera tezaadê derdikeve holê. Tezad hunereke heyecanî ye. Ev bibîrxistin bi awayekî dijber tiştêkî din bibîr dixê.¹⁸⁴ Di *cengnameyê* de tezaad weha derbas dibe:

Em hatin vê derbê

*Ji **şerqê ta ğerbê***

*Da em bikin **herbê***

*Şîfa bike **qelbê***

(88)

*Heman 'Umer **şa bû***

*Fîlhal ew **punhan bû***

¹⁸³ Ji bo agahîyên zêdetir bnr.; M. A. Yekta Saraç, **Klasik Edebiyat Bilgisi Belagat**, Gökkubbe Yayınları, 12. Baskı, İstanbul 2014, r. 282.

¹⁸⁴ Kocakaplan, 2017, r. 187.

*Sa`etek winda bû
Cardin hat `eyan bû*

(91)

2.3.4. Teraduf

Teraduf tê wê wateyê ku kesek di gotina xwe da du yan çend peyvên ku me`neya wan yek be bi kar bîne. Ev huner cuwanî û tesîreke taybet dide gotin û nivîsînê.¹⁸⁵

*Em taze **beyan** kin
Mexfiyan `eyan kin
Meclisê şadan kin
Pê def`a geman kin*

(19)

*Li Mekke`ê zor kir
`Elem lê zuhûr kir
Pût û şenem hûr kir
Ji Ke`be`ê dûr kir*

(22)

*Xweş-kalek **zana î**
`Arif **û dana î**
Pût-latan tu da` î
Beyan ke de`wa`ê*

(37)

*Kalê `**Ezazîl** bû
`Ekrût **û xebîs** bû
Muzawer **telbîs** bû
Tu nabê **Iblîs** bû*

(43)

¹⁸⁵ Perwîz Cîhanî, **Mem û Zîn Ehmedê Xanî bi Lêkolîn û Şîroveyeke Nû**, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2013, r. 48.

Heman 'Umer şa bû
*Fîlhal ew **punhan** bû*
*Sa 'etek **winda** bû*
Cardin hat 'eyan bû

(91)

Bû 'eca 'ib karûzar
***Hewar meded** ya Ellah*
Mêran kirin zarûzar
***Imdad** ya Resûlellah*

(357)

2.3.5. Mubalexe

Bi tesîra kelecane piçûkkirin an jî mezinkirina bûyerekê re mubalexe tê gotin.¹⁸⁶ Di metnên edebî de ji bo bandora gotinê were zêdekirin mubalexe tê kirin. Di metna cengnameyê de jî mubalexe weha derbas dibe:

Ejdihak me diye
Newal kir teji ye
Carek hû kiriye
Çiya lerîziye

(75)

*Hinek **şubhê gurgan***
Pencê wan wek zergan
Ketne reqş û firgan
Diran wek qocigan

(95)

Qelb jê dibin halik
Şubhê ejdiha 'ê

¹⁸⁶ Kocakaplan, 2017, r. 107.

Lakin nûr û işiq
Ji hedê weşf na`ê

(131)

Fezl û Zubeyr Şufyan
Hatin bi ala`ê
Dunya hejya j` ne`ran
Selewat veda`ê

(156)

Mîna hîva çarda
Nûra wî çû qafa
‘Ewran sîwan veda
Melek hatin şefa

(159)

Gurzek l` Zubeyr bar kir
Wezna wî giran bû
Super wî îhzar kir
Di bin da punhan bû
Ew li Zubeyr bar kir
Şed û çil batman bû

(168)

2.3.6. I`ade

Di helbestê de peyva dawî ya bendê ger di destpêka benda pişt re were bikaranîn hunera i`adeyê derdikeve holê.¹⁸⁷ Ev huner di *Cengnameya Huneynê* de weha derbas dibe:

Ji hedîsan dikir ixrac
Beyan kir Cenga Huneynê

¹⁸⁷ Kocakaplan, 2017, r. 50.

*Bi **Kurmancî** wî kir idrac
Ku du 'an bo wî bixwînin*

*Eger **Kurmancî** mewzûn bû
We nîne bê hedîs ayat
Yasîn perwanê narê bû
Beyan kir hal û ehwalat
(8-9)*

*Ji geyrê xerdexûr da
Temam şerekî kuffar
'Elî tekbrî vedida
Heta ku bûye **êvar***

***Êvar** li wan derbaz bû
Şefeq ku bû diyar e
Her du teref suwar bû
Şef girtin bû hewar e
(276-277)*

*Ġurab Kela Qureyze
Ew 'Umerê me 'd û kerb
Weke wan teyrê bazî
Te **alt kirin** ew 'Ereb*

*Şah gote wê da belê
Min **alt kirin** serteser
Cardin hucûm da 'Elî
Ew kafîrê pur Qecer
(330-331)*

2.3.7. Tekrîr

Hunereke girêdayî kelecane ye. Maneya tekrîrê dubarekirin e.¹⁸⁸ Di helbestê de ji tekrarkirina bêjeyekê an jî komobêjeyekê re tekrîr tê gotin. Li vê derê armanc ew e ku fêmkirin were xurtkirin û berhem tesîrtir bibe û wateya peyvê were xweşikkirin.¹⁸⁹ Di metnê de hunera tekrîrê weha derbas dibe:

Eşker şef bi şef bû
Bi zirna û def b û
Jin û zar jî tev bûn
Çend roja sefer bûn

(52)

Çol û çolistan e
Derb û derbustan e
Mewc dan wek behran e
Ebas kir beyane

(67)

Herb e herb e herb e
Danîn hev du derb e
J' ber gurzê dilêran
L' kafran çê bû kerb e

(187)

2.3.8. Alîterasyon

Di helbestê de dubarekirina dengên bêdeng/nedengdêr weke alîterasyon hatine binavkirin.¹⁹⁰ Di metna cengnameyê de jî em rastî alîterasyonê tên weke mînak:

Lewra ew Henan e
Hennan û Mennan e

¹⁸⁸ Kocakaplan, 2017, r. 145.

¹⁸⁹ İskender Pala, *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, Kapı Yayınları, İstanbul 2007, r. 447.

¹⁹⁰ Kocakaplan, 2017, r. 20.

Rehîm û Rehman e

Ġefûrê zenban e

(12)

Go gelî gulaman

Ĥazir kin te'aman

Wan meşkê şeraban

Hem şerbet û caman

(30)

Hetka wan pût-latan

Hetka wan şenatan

Qetla wan sadatan

Cewab çû welatan

(42)

2.3.9. Asonans

Di helbestê de dubarekirina dengên dengdêr weke asonans hatine binavkirin.¹⁹¹

Di mentna cengnameyê de hunera asonansê weha derbas dibe:

Lewra ew Ĥenan e

Ĥennan û Mennan e

Rehîm û Rehman e

Ġefûrê zenban e

(12)

Lewra ez hezîn im

Bi şîn û girînîm

¹⁹¹ Kocakaplan, 2017, r. 22.

‘Ecêban dibînîm

Bi ah û nalîn im

(35)

2.3.10. Nîda

Nîda tê maneya “gazîkirin, banglêkirin, hawar û qêrîn”ê. Di edebîyatê de ji bo dîyarkirina hestên wekî bextewarî, matmayîn, dilşewitîn û hêrsbûnê berzkirina deng û bangkirinê nîda hatiye gotin.¹⁹² Bi vê hunerê hest û kelecana pir bihêz tê vegotin.¹⁹³ Di cengnameyê de nîda wisa derbas dibe:

Yek hatî ji der da

Di şiklê kalan da

Darek di destan da

Go gelî ewlada

(33)

Wî gote wan kafiran

Ya begler û emîran

Yaniş we kirye dewran

Zeman bi wî ra yar e

(54)

Resûl got ey serwer

Navê te bû ‘Umer

Mizgîn de seranser

Bira bêne ev der

(90)

¹⁹² Pala, 2007, r. 358.

¹⁹³ Kocakaplan, 2017, r.113.

2.3.11. Telmî‘

Di helbestê de risteyeke an jî nîv riste bi zimanekî cuda were nivîsandin hunera telmî‘ê pêk tîne.¹⁹⁴ Di cengnameyê de em rastî riste û nîv risteyên bi vê rengî tên.

Wî digot ya ehlê Riđwan

Ehlê bey‘et hûn werin

Ez dikim qesem ji bo we

Sağ e Xetmu‘l-Mursefîn

(193)

“La feta îlla ‘Elî

La şeyfe îlla Zulfeqar”

Nabî wek wî şeca‘et

Ne kesekûn wek Zulfeqar

(350)

2.3.12. Îstîfham

Ger di mijareke ku helbestvan bersiva tiştêkî dizanibe û wî tiştî bi awayekî pirsê bipirse ew dibe hunera îstîfhamê. Helbestvan îfadeya xwe di şiklê pirsê de dike, lê ne li benda bersivekê ye.¹⁹⁵ Di metnê de hunera îstîfhamê wisa derbas dibe:

Kanî ew ‘Elî û Hemze di cengê da ku xûn-rêjin

Ji ne ‘rê wan dilerzîn dêw revîn tev çûn ji dunya‘ê

Kanî ew Nebîyê serwer Ebûbekr û kanî ‘Umer

Ku ew bûn hasilê îcad şerî‘et anî dunya‘ê

(6-7)

¹⁹⁴ Kocakaplan, 2017, r. 147.

¹⁹⁵ Kocakaplan, 2017, r. 79.

2.3.13. Cînas

Di metnekê de dema bêje û peyvên ku wateyên wan cihê, lêbelê ji aliyê nivîs û bilêvkirinê ve yek bin û nêzî hev bîn bikaranîn hunera cînasê derdikeve meydanê. Ev bêje û peyv; çi nav çi kiryar bin; çi qertaf girtibin an jî ti qertaf negirtibin dîsa jî rewş naguhere.¹⁹⁶Di metna *Ġezwetu Huneynê* de hunera cînasê wehe derbas dibe:

Rawî kir riwayet

Bi delîl û ayet

Yasîn kir hikayet

Ewha kir dirayet

(20)

Hat şahê merdane

Ne 're ji dil danê

Du 'elem hildane

Ew hate meydanê

(158)

2.3.14. Iştîqaq

Bi hev re bikaranîn bêjeyên ku ji yek kokekî hatine dariştin. Bêjeyên ku ji heman kokê ve pêk hatine di xwe de dengên hevpar dihewînin û ev yek jî ahengekê dide vegotinê.¹⁹⁷Di cengnameyê de ev huner wisa derbas dibe:

Kanî ew 'alimê e'lem ku meşhûr bûn di 'ilmê da

Bitûn Islam bi 'ilmê wan dikin 'emel di dunya'ê

(5)

¹⁹⁶ Saraç, 2014, r. 245.

¹⁹⁷ Kocakaplan, 2017, r. 84.

Bû 'eca'ib karûzar
Hewar meded ya Ellah
Mêran kirin zarûzar
Imdad ya Resûlellah

(357)

2.3.15. Iqtibas

Di nezm û peşanê de ji bo bihêzkirina wateyê jêgirtina ji ayet û hedîsan re iqtibas tê gotin. Di be ku hemû ayet û hedîs bi temamî neyê girtin.¹⁹⁸

Bi zahir "eşsenê teqwîm"
Dihatne nava meclisa
Me nefsa xwe dikir teslîm
Di baîin xab û hem desa

(4)

"La feta îlla 'Elî
La şeyfe îlla Zulfeqar"
Nabî wek wî şeca 'et
Ne kesekûn wek Zulfeqar

(350)

2.3.16. Tarîxdayîn

Helbesta ku bi herfên Erebi hatibe nivîsîn û di wê de dayîna tarîxa bûyerê bi hesabê ebcêde hebe, ji wê re danîna tarîxê tê gotin.¹⁹⁹ Alikî di vê bendê de tarîxa nivîsîna menzûmeya xwe daye.

Ji hîcreta Resûlê Heq
Hezar sê şed ku derbaz bû

¹⁹⁸ Kocakaplan, 2017, r. 59.

¹⁹⁹ M. Zana Karak, "Dîwançeya Şêx Îsmetullahê Karazî (Metn û Lêkolîn)", (Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî Yên li Tirkîyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî), Mêrdîn 2020, r. 125.

We pêncî & bikin lahiq
Ji bo vê nezmê tarîx bû

(2)

1353yê hicrî beranberî 1934ê miladî tê. Li gorî agahîya di vê bendê de em fêhm dikin ku ev metn di vê dîrokê de hatiye nivîsîn.

2.4. JI ALÎYÊ RÛXSARÎ VE ĞEZWETU HUNEYN

2.4.1. Teşeya “Ğezwetu Huneyn”ê

Di edebîyata Tirkî de çî menzûm çî jî mensûr û çî jî mensûr-menzûm têkelhev bin, gelek cengname li ser Hz. Elî hatine nivîsîn.²⁰⁰ Li gorî Îsmail Çetin Cengnameyên Îmamê Elî bi teşeya mesnewîyê ne û gava ku li gorî kêşa erûzê tene nîrxandin tê dîtin ku di wan de kêşeke xerab û ne tekûz heye. Ji ber vê yekê jî ev berhem li gor kêşa birgeyî ango kiteyî werin nîrxandin dê rasttir be. Bi qeate Çetin cengname bi kêşa birgeyî hatine nivîsîn.²⁰¹

Li gorî Çetin di tertîba van Cengnameyên Îmamê Elî de ku bi teşeya mesnewîyê ne di bin beşa destpêkê de bi piranî qismên tewhîd, munacat, ne‘t, mîr ‘ac, mu‘cîzat, medhê Çaryar, medh û sebebê te‘lîfê cih digirin û beşa mijara sereke û beşa encamê jî di van cengnameyan de hene.²⁰²

Berhema Mela Yasînê Alikî bi bendan hatiye nivîsîn. Ev menzûme bi tevahî ji 373 bendan pêk hatiye, ev bendên wê ji 346 çarîne û ji 27 şeşîneyan pêk hatiye. Berhema Mela Yasînê Alikî her çiqas bi bendan hatibe nivîsîn jî ev beş û qismên ku Çetin behs dike hin ji wan di berhema Alikî de jî hene. Ev berhem ji aliyê teşeya nezmê ve weha dikare bê nîrxandin.

²⁰⁰ Çetin, 1997, r. 90.

²⁰¹ Çetin, 1997, n.r. 97-98.

²⁰² Çetin, 1997, n.r. 98-117.

2.4.1.1. Teşeyên Nezmê yên Bipergal ên Serbest

Di edebîyata klasîk de li gorî tercihên helbestvanan gelek teşeyên cîyawaz derketine meydanê. Hejmara bendan, pîvan û şemaya serwayê li gorî terciha helbestvanan ji hev guherîne. Ev yek jî “Teşeyên Bipergal ên Wekhev” û “Teşeyên Bipergal ên Tevlîhev” derxistine holê.²⁰³ Dema em li cengnameya Mela Yasînê Alikî mêze dikin tê dîtîn ku cengnameya wî dikeve bin banê her du teşeyan jî. Em dê vê yekê li jêr bi berfirehî îzah bikin.

2.4.1.1.1. Teşeyên Bipergal ên Wekhev

Bendên vê beşê ji rêzên wekhev pêk hatine. Rêza serwayê ya van bendan wek hev in.²⁰⁴ Di cengnameya Alikî de hem çarîne hem jî şeşîneyên ku bi vî rengî hatine nivîsîn hene. Weke nimûne:

Ĝeffûr û Ĝeffar î (a)

Rehîm û Settar î (a)

Mudam tu hişyar î (a)

Xudawend û mar î (a)

Xudawend û mûr e (b)

Xudawend û nûr e (b)

Xudawend û tûr e (b)

Ji kafîran dûr e (b)

Ferdeki insanan (c)

Ĥebek ji heywanan (c)

Cin ger ji şeytanan (c)

Melek ji as'manan (c)

(13-15)

²⁰³ Aça, Gökalp, Kocakaplan, 2012, r. 132.

²⁰⁴ Aça, Gökalp, Kocakaplan, 2012, r. 132.

Dema em li van her sê bendên li jor mêze dikin tê dîtin ku hem ji alîyê hejmara risteyan ve hem jî ji alîyê serwayê ve bi rêkûpêk in û bi kêşa birgeyî ya 6 kiteyî hatine nivîsîn. Herwiha ev bend bi serwaya dûz hatine hûnandin.

Cardin ku rikêb kir (a)

Xwe l' nava kafir da (b)

Yek jî li wî hol kir (a)

Cardin hate paş da (b)

Xûna Malik coş kir (a)

Li kafiran hay da (b)

Kafir Islam carek (c)

Ser û binê hev bûn (d)

Navê Heq mubarek (c)

Temam li hev qam bûn (d)

Wan şer kirin qaşek (c)

Serî l' 'erdê hol bûn (d)

(170-171)

Çawa ku ji her du bendên li jor jî dîyar dibe her du bend ji alîyê kiteyên risteyên xwe ve wekhev in, bi serwaya çepûrast hatiye hûnandin û bi heman kêşa birgeyî ya 6 kiteyî hatine nivîsîn. Herwiha ev bend bi serwaya çepûrast hatine hûnandin.

2.4.1.1.2. Teşeyên Bipergal ên Tevlîhev

Di vê komê de du cûre teşeyên nezmê di bin du xalan de dê bê nirxandin. Teşeyên ku hejmara kite yan jî kêşa wan cûda ne xala ewil pêk tînin. Teşeyên ku hejmara bendên wan ji hev cûda ne xala duyem pêk tînin.²⁰⁵ Dema em li cengnameya Alikî mêze dikin taybetmediyên her du awayên navborî jî di xwe de dihevine. Weke nimûne:

²⁰⁵ Aça, Gökalp, Kocakaplan, 2012, r. 143.

*Me 'na ayetê ev e
Hûn guh bidin
Hem ji xaba gefletê
Hişyar bibin*

*Ye 'nî her mekana
Da ew Heq Te 'al
Nuşret da we her
Cenga da La-yezal*

*Hal ew roja Huneynê
We kir beyan
Bê hesab e 'eskerê
Me j ' her weqtan*

(201-203)

Dema em li van her sê bendên li jor mêze dikin tê dîtin ku ji aliyê kêşê ve ne wek hev in. Di bendan de hin riste 7 kiteyî ne, hin 6 kiteyî ne, hin 5 kiteyî ne û hin jî 4 kiteyî ne. Ji ber vê yekê ji aliyê kêşê ve di van bendan de wekhevîyek tune ye.

*Çar hezar kafrê dujwar
Temam li wî berhev bûn
Ne 're dida wek her car
Kafîrek bê hisab bûn*

*'Ebas kurê Mirdas e
Wî gote Xalid Zubeyr
Dê em bikin sewaş e
Ji bo 'Eliyê Heyder
Nav l ' me bibe pîroz e
Ger şa bikin pêgember*

*Haydanê wan bi hev ra
Her &ê ji wî rewan bûn
Kafir dane ber şûran
Ne 'rê 'Elî diyar bûn*

*Ew çûne pêda pêda
Wan dît ew Şahê Heyder
Du şûr hene destan da
Dibêj Ellahû ekber
Wan şûran kafir dida
Ev in şûrê pêgember*

(240-243)

Dema em li van bendên li jor mêze dikin tê dît ku hin bend ji çarîneyan pêk hatine û hin bend jî ji şeşîneyan. Ji ber vê yekê di cengnameya Alikî de ji aliyê hejmara risteyên bendan ve wekhevîyek tune ye. Lêbelê cengname bi piranî ji bendên çarîneyan pêk hatiye. Tê de 346 bendên çarîne û 27 jî şeşîne hene.

2.4.2. Kêş, Serwa û Paşserwa

2.4.2.1. Kêş

Di edebîyata Kurdî de sê cûre kêş hatine bikaranîn. Ev kêş ji kêşa xwemalî kêşa erûzê û ji kêşa serbestê pêk tên. Kêşa xwemalî bi piranî di edebîyata gelêrî de, ya erûzê di edebîyata klasîk de û ya serbest jî di ya modern de hatiye bikaranîn.²⁰⁶

Dema em li *Cengnameya Huneynê* ya Mela Yasîne Alikî mêze dikin em rastî kêşên erûzê û xwemalî tên. Kêşa erûzê tenê di xezeleke di nav metnê cengnameyê de hatiye bikaranîn û ev berhem bi piranî bi kêşa birgeyî hatiye nivîsîn.

²⁰⁶ Abdurrahman Adak, *Destpêka Edebîyata Kurdî ya Klasîk*, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2015, r. 365.

2.4.3.1.1. Kêşa Xwemalî (Kêşa Birgeyî)

Kêşa xwemalî, di risteyan de li gor pergalekî ji wekhevîya hejmara kiteyan pêk tê.²⁰⁷Ango di helbestekê de ger kiteyên risteyan wek hev bin, em dikarin bibêjin helbest bi kêşa birgeyî hatiye nivîsîn.

Kêşa xwemalî bêtir di berhemên gelêrî de hatiye bikaranîn. *Gezwetu Huneyn* ji ber ku ji hin alîyan ve dişibe berhemeke gelêrî em tê de bi piranî kêşa xwemalî dibînin ango divê berhemê de kêşa serdest kêşa birgeyî ye. Lêbelê di vê kêşa birgeyî de jî gelek qîsûr hene. Di metna vê cengnameyê de bi piranî kêşa 6, 7 û 8 kiteyî hatiye bikaranîn. Lêbelê di hin bendan de ew kombînyasyon xerabûye û bend di nav xwe de her risteyek bi kiteyeke cuda hatiye nivîsîn. Di hin bendên cengnameyê de ji alîyê kêşa birgeyî ve hevsengî di nav risteyên wê de tune ye, lê serwaya wê heye.

Ji bo bendên şeş kiteyî weke mînak:

(6 Kiteyî)

Ewwil bismillahî

Elhemdulillahî

La'iq Padişah î

Bê mesken û cah î

(11)

'Ebdê xo hilanî

J' ordiyê deranî

Çûne yek mekanî

Binhêr wek dizanî

(106)

Ji bo bendên heft kiteyî weke mînak:

Bi rê ketî 'esker e

Meymen e hem meyser e

²⁰⁷ Cem Dilçin, *Örneklerle Türk Şiir Bilgisi*, Türk Dili Kurumu Yayınları, Ankara 2013, r. 40.

Delgê wan wekî behr e
Toz û 'ucac û gebr e

(100)

Ji bo bendên heşt kiteyî weke mînak:

Bibin guhdar ku ez bêjim
Beyan kim ez hikayatê
Ji geman hûn bibin azad
Ku seh kin vê 'ibaratê

(1)

Bendên ku hemû risteyên wan ne bi heman kiteyî ye. Weke mînak:

Me 'na ayetê ev e (6 kiteyî)
Hûn guh bidin (5 kiteyî)
Hem ji xaba gefletê (6 kiteyî)
Hişyar bibin (5 kiteyî)

(209)

Gote 'Ebbas ya 'emê (7 kiteyî)
Rabe serî 'en vê demê (8 kiteyî)
Tu here serê çiya 'ê (7 kiteyî)
Def' bike narê gemê (8 kiteyî)

(191)

Me 'na ayetê ev e (7 kiteyî)
Hûn guh bidin (4 kiteyî)
Hem ji xaba gefletê (7 kiteyî)
Hişyar bibin (4 kiteyî)

(201)

Di hin bendên cengnameyê de ji aliyê kêşa birgeyî ve hevsengî di nav risteyên wê de tune ye, lê serwaya wê heye.

| | |
|--|------------|
| <i>Hem mela`ik me şihandin</i> | (8 kiteyî) |
| <i>Bê hisab</i> | (4 kiteyî) |
| <i>Şûr li kafiran hejandin vekirin wan</i> | (9 kiteyî) |
| <i>Fethê bab</i> | (4 kiteyî) |

(206)

2.4.3.1.2. Kêşa ‘Erûzê

Kêşa erûzê di berhemên klasîk de hatiye bikaranîn. Di cengnameyê de jî em rastî vê kêşê tên. Di nav metna cengnameyê de xezeleke neh malikî cî digire û ev xezel piştî benda 163yan tê. Xezel bi behra hezec-salim û bi qalibê Mefa‘îlun / Mefa‘îlun / Mefa‘îlun / Mefa‘îlunê hatiye nivîsîn.

*Eya Yasîn bibe hişyar tu ketî l`benda dunya`ê
Bi zewq û hem şefaya wê nebe hevalê dunya`ê*

*Wiha dunya ku bêkêr e ji xeyrê `ilm û Qur`anê
Yasîn da`im bigir `ibret ji dest vê qehbe dunya`ê*

(1-9)

2.4.2.2. Serwa

Serwa, herî kêr dubarekirina du dengên di dawîya risteyan de ne. Nivîsandina van dengan yek e, lê maneya wan ji hev cihê ne.²⁰⁸ Li gorî hevbeşîya xwe di navbera dengên di dawîya risteyan de sê cûreyên serwayê hene.²⁰⁹

2.4.2.2.1. Serwaya Mucerred

Serwaya ku tenê bi dubarekirina herfa rewîyê pêk tê serwaya mucerred e. Di vê cûreyê de herfa rewîyê bê hereke ye û berî wê herfeke bi hereke heye. Di çarçoveya alfabe ya latînî de dengdêr ne piştî herfa rewîyê, berî wê tê bikaranîn.²¹⁰

²⁰⁸ Pala, 2007, r. 249.

²⁰⁹ Adak, 2015, r. 397.

²¹⁰ Adak, 2015, r. 397.

Di metna cengnameyê de serwaya mucerred jî heye. Weke nimûne:

Kalê got ey serwer
‘Esker kir pêgember
Digel ‘Elî Heyder
Ji Medîne çûn der

(38)

2.4.2.2.2. Serwaya Murekkeb

Serwayên ku derveyî kombînasyona serwaya mucerred tên, serwayên murekkeb in. Sê cûreyên vê serwayê hene.²¹¹Sê cûreyên serwaya murekkeb ev in: Serwaya murdef, serwaya muqeyyed û serwaya muesses.

2.4.2.2.2.1. Serwaya Murdef

Ew serwa ye ku di xwe de herfa “rîdf”ê dihewîne. Herfên rîdfê jî “Elîf, Waw û Yê” ne. Eger yek ji van herfan bêyî ku herekeyek standibe, berîya rewîyê di serwayê de bê dubarekirin, ev dibe serwaya murdef.²¹²Weke nimûne:

Ewwil bismillahî
Elhemdulillahî
La’iq Padişah î
Bê mesken û cah î

(11)

Pêgemberê kubar e
Wî gote Çarûyar e
Biçne herba kuffar e
Bi emrê Kirdigar e

(61)

²¹¹ Adak, 2015, r. 397.

²¹² Adak, 2015, r. 397.

2.4.2.2.2. Serwaya Muqeyyed

Serwaya muqeyyed, berîya herfa rewîyê dubarekirina herfên hemcins ên ku bêhereke ne. Wekî; ...derd, ...merd, ...xedeng.²¹³Weke nimûne:

Hin hût û neheng in

Hin şêr û piling in

Şed heybet bi deng in

Hem bi perr û çeng in

(96)

2.4.2.2.3. Serwaya Muesses

Eger berî rewîyê herfeke bi hereke û berî wê jî “elîf”ek hebe “serwaya muesses” tê meydanê. Wekî “keramet/ îşaret.”²¹⁴Weke nimûne:

Ellah Ellah tebarek

Navê Xuda mubarek

Hûn bînin tev bi carek

Hazir bikin tedarek

(60)

2.4.2.2.3. Serwaya Cînas

Cînas ew peyvên ku ji alîyê deng ve yek in, lê ji alîyê wateyê ve cuda ne.²¹⁵Herwiha di heman demê de hunereke edebî ye jî. Di *Cengnameya Huneynê* de em rastî vê serwaya cînasê tên. Weke nimûne:

Rawî kir riwayet

Bi delîl û ayet

Yasîn kir hikayet

Ewha kir dirayet

(20)

²¹³ Adak, 2015, r. 398.

²¹⁴ Adak, 2015, r. 398.

²¹⁵ Pala, 2007, n.r. 92-93.

Hat şahê merdane
Ne 're ji dil danê
Du 'elem hildane
Ew hate meydanê

(158)

2.4.2.3. Paşserwa

Piştî serwayê, di dawîya risteyan de ji her cûre tekrarên ku têne kirin re paşserwa (redîf) tê gotin.²¹⁶ Di *Cengnameya Huneynê* de jî em rastî paşserwayê tîn. Weke nimûne:

Hin hût û neheng in
Hin şêr û piling in
Şed heybet bi deng in
Hem bi perr û çeng in

(96)

L' devekê suwar e
Nûra wî diyar e
Bi xo namudar e
Gayet keremkar e

(126)

2.4.2. Tertîba “Ġezwetu Huneyn”ê

Îsmet Çetin ji bo *Cengnameyên Hz. Elî yên ku bi teşeya mesnewîyê hatine nivîsîn* dibêje di bin beşa destpêkê de bi piranî qismên tewhîd, munacat, ne't, mîr'ac, mu'cizat, medhê Çaryar, medh û sebebê te'lîfê cih digirin û beşa mijara sereke û beşa encamê jî di van cengnameyan de hene.²¹⁷ Em dibînin di cengnameya Mela Yasînê Alikî de ku bi teşeya mesnewîyê nehatiye nivîsîn ev beş bi piranî cî digirin. Di vê menzûmeya Alikî de ev beşên cengnameyê weha ne:

²¹⁶ Adak, 2015, r. 399.

²¹⁷ Çetin, 1997, n.r. 98-117.

2.4.2.1. Dîbace

Di mesnewîyan de mesnewînûs bi beşa dîbaceyê dest bi berhema xwe dike û di vê beşê de berî her tiştî cih dide “besmele”yê ku destpêkirina bi navê Xwedê îfade dike. Di beşa dîbaceyê de çendîn mijar cih digirin, ev mijarên ku di beşên dîbaceyên mesnewîyan de cih digirin ev in: Tewhîd, munacaat, ne‘et, medhiye û sebebê te’lifê.²¹⁸

Mela Yasînê Alikî di beşa dîbaceyê de cih daye sê serenavan. Serenava ewil “Ya Ellahû Te‘ala Bismillahirreḥmanirreḥîm” e. Piştî vê seronavê ayetên sûreya Tewbeyê tîn. Piştî vê seronavê, serenava duyem “Ġezwetu Ḥuneyn *Bimennîhî Te‘ala*” ye. Ev seronav ji benda 1ê dest pê dike û heta benda 10an dewam kiriye. Helbestvan di bin vê seronavê de dest bi berhema xwe kiriye.

Serenava sêyem, “Ḥemd Şelewat Piştî Bismillahê” yê. Ev seronav ji benda 11an dest pê dike û heta benda 112an dewam dike. Di bin vê seronavê de hem dîbaceya cengnameyê cih digire hem jî hin bendên beşa sereke hene.

Nivîskarê *Cengnameya Huneynê* Mela Yasînê Alikî di beşa ewil a berhema xwe de behsa çavkanîyên ku jê sûd wergirtiye kiriye. Mela Yasînê Alikî tîne ziman ku wî berhema xwe bi agahîyên ku ji ayet, hedîs, delîl û rîwayetan hatiye wergirtin nivîsîye. Çavkanîyên xwe di dîbaceya berhemê de weha tîne ziman:

*Ji **hedîsan** dikir ixrac*

Beyan kir Cenga Ḥuneynê

Bi Kurmancî wî kir idrac

Ku du‘an bo wî bixwînin

Eger Kurmancî mewzûn bû

*We nîne bê **hedîs** ayat*

Yasîn perwanê narê bû

Beyan kir hal û eḫwalat

(8-9)

²¹⁸ Adak, 2019, r. 268.

Rawî kir riwayet
Bi delîl û ayet
Yasîn kir hikayet
Ewha kir dirayet

(20)

2.4.2.1.1. Besmele

“Besmele” navê kurt ê ayeta “Bismillahirrehmanirrehîm”ê ye ku tê wateya “Bi navê Xudayê ku Rehman û Rehîm e dest bi karê xwe dikim”. Wek taybetîyeke çanda Îslamê hemû karên girîng bi zikirkirina navê Xuda tên destpêkirin û ji bo vê jî berî wan karan besmele tê kişandin.²¹⁹ Di *Cengnameya Huneynê* de besmele du caran derbas dibe, lê ne weke beşeke serbixwe. Cara ewil besmele di serê berhemê de “Ya Ellahû Te‘ala Bismîllahîreḥmanirreḥîm” derbas dibe û paşê ayeta 25an ya sûreya Tewbeyê hatiye nivîsîn. Cara duyem jî besmele di bin serenava “*Hemd Selewat Piştî Bismillahê*” de derbas dibe. Di vê cengnameyê de di navbera her du besmeleyan de helbestvan sebebê telîfê anîye ziman. Benda ku tê de “Besmele” cih digire weha ye:

Ewwil bismillahî
Elḥemdulillahî
La`îq Padişah î
Bê mesken û cah î

(11)

2.4.2.1.2. Tewhîd

Di edebîyata klasîk de çî menzûm, çî pexşan hemû metnên edebî yên ku di wan de li ser yekîtiya Xudê, sifet û mezinahiya wî tê rawestan wek tewhîd hatine binavkirin. Tewhîd di dibaceyên mesnewîyan de bi teşeya mesnewîyê tînin nivîsîn.²²⁰ Di metna *Cengnameya Huneynê* de jî beşa tewhîdê heye û weha derbas dibe:

Ewwil bismillahî
Elḥemdulillahî

²¹⁹ Adak, 2019, n.r. 273-274.

²²⁰ Adak, 2019. r. 278.

*La'iq Padişah î
Bê mesken û cah î*

*Lewra ew Hênan e
Hennan û Mennan e
Rehîm û Rehman e
Gefûrê zenban e*

*Geffûr û Geffar î
Rehîm û Settar î
Mudam tu hişyar î
Xudawend û mar î*

*Xudawend û mûr e
Xudawend û nûr e
Xudawend û fûr e
Ji kafiran dûr e*

*Ferdeki ji insanan
Hêbek ji heywanan
Cin ger ji şeytanan
Melek ji as'manan*

*Hemû dê fena bin
Paşê dîsa rabin
Muhtacê Xuda bin
Li heşrê berhev bin*

*Wê herne dîwanê
Paş wezna mîzanê*

*Şa bin bi ihsanê
Li ehlê îmanê*

(11-17)

2.4.2.1.3. Sebebê Te'lifê

Di berhema Mela Yasînê Alikî de beşeke bi navê “Sebebê Te'lifê” weke serenav tune ye. Lê di destpêke de helbestvan sebebê nivîsandina xwe weha anîye ziman:

*Ji **hedîsan** dikir ixrac
Beyan kir Cenga Huneynê
Bi Kurmancî wî kir idrac
Ku du'an bo wî bixwînin*

*Eger Kurmancî mewzûn bû
We nîne bê **hedîs** ayat
Yasîn perwanê narê bû
Beyan kir hal û ehwalat*

*Bikin hemd û şena'ê Heq
Digel wî jî şelewatan
Bidin ser wî Reşûlê Heq
Bi 'ededê zerreyatan*

(8-10)

Em ji van bendan jî fêm dikin ku helbestvan xwestiye vê qisseya Cenga Huneynê bi Kurmancî jî were xwendin û loma ev berhema xwe nivîsîye.

2.4.2.1.4. Dîroka Te'lifê

Di nusxeya NYYê de bi hesabê ebcedê dîroka nivîsîna berhemê bi hicrî 1353 (1934 Miladî) weke menzûm hatiye nivîsîn. Lê eşkere nîne gelo di vê tarîxê de nivîskar dest pê kiriye an qedandiye. Herwiha di nusxeya NMEyê de di beşa temetê de dîroka nivîsandina berhemê weke 1349an (1930ê Miladî) hatiye nivîsîn û sala îstînsaxê jî

weke 1379an (1959ê Miladî) hatiye nivîsîn.²²¹ Ji ber ku di her du nusxeyan de du tarîxên cuda hatine nivîsîn bi awayekî zelal tarîxa nivîsandina vê berhemê nayê zanîn, lêbelê li gor qenaeta me ev berhem di salên 1930yî de ji aliyê Mela Yasîne Alikî ve hatiye nivîsîn. Benda ku tarîx tê de derbas dibe weha ye:

*Ji hicreta Resûlê Heq
Hezar sê şed ku derbaz bû
We pêncî & bikin lahiq
Ji bo vê nezmê tarîx bû*

(2)

2.4.2.2. Beşa Sereke

Beşa sereke, beşa herî berfireh a mesnewîyê ye ku tê de mijara bingehîn a mesnewîyê bi hûrgulî tê pêşkêşkirin. Di tertîba mesnewîyê de beşa sereke piştî dîbaceyê û berî xatîmeyê cih digire.²²²

Dema em li *Cengnameya Huneynê* mêze dikin ev beş di navbera bendên 20em û 369an de cih digire. Lê helbestvan beşa sereke di bin sêzdeh serenavan de dabeş kiriye. Serenavên di cengnameyê de bi zimanên Erebî, Farisî û Kurdî hatine nivîsîn. Dema em li van serenavan mêze dikin bi mijara naverokê re eleqedar in. Ango di wan bendan de qala çî dê bê kirin ji serenavan dîyar dibe. Serenavên beşa sereke ev in:

Serenava yekem a beşa sereke, “Weznehu Ela Derbeyne” ye. Ev serenav ji benda 113an dest pê kiriye û heta benda 162yan dewam kiriye.

Serenava duyem a beşa sereke, “Werne Serê Hikayetê” ye. Ev serenav ji bendaa 163yan dest pê kiriye heta benda 190an dewam kiriye.

Serenava sêyem, “Gazîya ‘Ebbas e ji bo Mu’minan” e. Ev serenav ji benda 191ê dest pê kiriye û heta benda 206an dewam kiriye.

²²¹ Di beşa temetê ya nusxeya NMEyê weha derbas dibe: “Tarîxu’n-nezmi fi sene 1349 (1930) nazime Yasîn Bîn Ebdullah el-Alikî. Ketebe Muhemmed Emîn Îbnî Xelîfe Hacı Mela Ehmed min eşîret Mîlanî ‘Erûsî sakinî qurîyet’. Herwiha bnr. Pêvek: 5.

²²² Adak, 2019, n.r. 310-311.

Serenava çarem, “Sû’ê Qeşda Kirî Şeybe ye li Hebîbê Xuda” ye. Ev serenav ji benda 207an dest pê kiriye heta benda 220an dewam kiriye.

Serenava pêncem, “Kafirê di Pûsîyê da Qir Dikin Cabê Didine Pêgember” e. Ev serenav ji benda 221ê dest pê kiriye û heta 226an dewam kiriye.

Serenava şeşem, “Fezil Binî ‘Ebas bi Be‘şe‘l-Nebî” ye. Ev serenav ji benda 227an dest pê kiriye û heta benda 267an dewam kiriye.

Serenava heftem, “Gofte‘ê Yasîn fi Heqî Mu‘cizati‘l-Muştefa” ye. Ev serenav ji benda 268an dest pê kiriye û heta benda 272yan dewam kiriye.

Serenava heştam, “Gotina Cebra‘îl ji Hebîbê Xuda ra Mizgîniya Hebê” ye. Ev serenav ji benda 273yan dest pê kiriye û heta benda 291ê dewam kiriye.

Serenava nehem, “Pêgember Tehrîs Dike Mu‘mînan li Cihadê bi Wesfê Cennetê Hûrîyan” e. Ev serenav ji benda 292yan dest pê kiriye û heta benda 309an dewam kiriye.

Serenava dehem, “Lafkirina Sebe‘e di Muqabilê Islamê û Hem Qetilkirina Wî” ye. Ev serenav ji benda 310an dest pê kiriye û heta benda 319an dewam kiriye.

Serenava yazdem, “Qetilkirina Sebî‘ed e” ye. Ev serenav ji benda 320an dest pê kiriye û heta benda 350yê dewam kiriye.

Serenava duwazdehem, “Wel-‘elîyu Kane Mu‘ciz‘en-Nebî Şallallahû ‘aleyhî We Sellem” e. Ev serenav ji benda 351ê dest pê kiriye û heta 354an dewam kiriye.

Serenava sêzdehem, “Xîtamû‘l-Herb we Gelebetu‘l-İslam ‘ele‘l-Kafir We‘s-Selam” e. Ev serenav ji benda 355an dest pê kiriye û heta benda 369an dewam kiriye.

Benda ewil û ya dawî yên beşa sereke ya *Cengnameya Huneynê* weha ne:

Rawî kir riwayet

Bi delîl û ayet

Yasîn kir hikayet

Ewha kir dirayet

(20)

Ku ew hatne îmanê

Temam şa bûn reqisîn

Berî dane Medîne

Yasîn tamam nivîsî[n]

(369)

2.4.2.3. Beşa Xatîmeyê

Beşa xatîmeyê ya mesnewîyan, beşa xilaskirin û dawîlêanîna mesnewîyê ye.²²³ Helbestvanê me di vê beşê de ji bo xwe û ji bo dê û bavê xwe efûkirin xwestiye û ji pêxember re jî selewat xwestine û bi vî awayî dawî li berhema xwe anîye.

Ya Reb ehlê îmanê

Bi cennetê şa bikî

Wan dûr bikî j' şeytanê

Cemalê neşîb bikî

Hem Yasîne gunehkar

Digel wî da û baban

Ger `efû kî ya Ğeffar

Rehma te nabit nuqşan

Şelewat bidin bira

Hûn xilaş bin nîranê

Li Muhammed aşkera

Şefî` roja mîzanê

²²³ Adak, 2019, r. 315.

Hem digel wî fatiħe
Ji şehabiyê kiram
Bi ezmanek feşîħe
Ji umetê ra tamam

(370-373)

2.5. JI ALÎYÊ NAVEROKÊ VE ĞEZWETU HUNEYN

Di vê sernavê de em li ser naveroka Cenga Huneynê sekinîn. Me di vir de ji çendîn çavkanîyan agahî wergirt û ligel nimûneyên ji metna *Ğezwetu Huneynê* bûyera Cenga Huneynê weke berîya cengê û dema cengê bi hûrgulî pêşkêş kir. Me ev mijar di bin van sernavan de zelal kir:

2.5.2. Cenga Huneynê

Cenga Huneynê yek ji wan herban e ku di Qur'anê de behsa wê tê kirin. Ev herb weke herba Huneynê, Hewazînê û Ewtasê hatiye binavkirin.²²⁴ Ev herb di 8ê hicreta pêxember de di meha Şewwalê de (27 Kanûna Paşîn 630) li gelîyê Huneynê diqewime. Navê herba Huneynê ji vî gelîyê tê.²²⁵ Gelîyê Huneynê li alîyê rojhilatê Mekkeyê ye û jê 30 kîlometre dûr e, di navbera Mekke û Taîfê de ye.²²⁶

2.5.2.1. Rewşa Berî Cenga Huneynê

Bi fetha Mekkêyê, hema bibêje tamamê endamên qebîleya Qureşîyan bûne misilman. Fetha Mekkê tesîreke mezin li ser qebîleyên derdor kiriye û bi vê yekê ew jî beşdarê dînî Îslamê bûne. Lê hêj jî qebîleyên ku nebûbûn misilman û li dijî misilmanan bûn hebûn, ev qebîle, qebîleyên Seqîf û Hewazînê bûn, Hewazîn yek ji wan qebîleyên mezintirîn ye Ereban bû. Ev her du qebîle ji mêj ve li dijî Îslam û pêxember bûn.²²⁷ Şaxeke qebîleya Hewazînê şaxa Benî Se'd bû dêşîra Hz. Muhammed

²²⁴ Kasım Şulul, *Ana Hatlarıyla Siyer-i Nebî*, Ensar Yayınları, İstanbul 2015, r. 572.

²²⁵ Nurgissa Duisenov, “*Sebep ve Sonuçlarıyla Huneyn Gazvesi*”, (Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi Selçuklu Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü İslam Tarihi ve Sanatları Anabilim Dalı İslam Tarihi Bilim Dalı), Konya 2011, r. 11.

²²⁶ Şulul, 2015, r. 572.

²²⁷ Salih Suruç, *Kâinatın Efendisi Peygamberimizin Hayatı*, Nesil Yayınları, İstanbul 2012, r. 702; Abdurrahim Zapsu, *Büyük İslam Tarihi Hz. Muhammed Dönemi*, Risale Yayınları, İstanbul 2006, r. 437.

(s.x.l.), Hz. Helîme ji vê qebîleyê bû. Hz. Muhammed berî herba Huneynê çend caran leşker şandibû ser wan. Wî di sala şeşemîn a hicretê de Hz. Elî, di sala heftemîn a hicretê de Hz. Omer û Hz. Ebûbekir, di sala heştamîn a hicretê de jî Şuca' b. Esed bi ser qebîleya Hewazînê ve rê kiribû, lê nebûbûn misilman.²²⁸ Piştî ku Mekke hate fetihkirin ev her du qebîle dizanîbûn ku dor hatiye ser wan û dê misilman êrişê wan jî bikin²²⁹, qebîleyên Hewazîn û Seqîf dema ku bihistin Hz. Muhammed bi artêşeke mezin ji Medîneyê derketiye wisa zen kirin ku dê bi ser wan de werin ji ber vê yekê dest bi amadehîya herbê kirin.²³⁰ Herwiha yekîneya keşfê ya misilmanan casûsekî mişrîkan digirin, ev casûs ji wan re dibêje ku qebîleya Hewazînê berhev bûye û rêvebirê wan jî Malik b. Ewf e.²³¹

Lê di metna *Cengnameya Huneynê* de yê ku tê xeberê dide mişrîkan Şeytan e. Şeytan di dirûvê kalekî de tê û dibêje ku Hz. Muhammed artêşek ava kiriye pût û senemên Mekkê xera kiriye û bi ser we ve tê. Ev bûyer di *Cengnameya Huneynê* de weha derbas dibe:

Cab çû Hewazînê

Şahê Hewazînê

Malik di wê hînê

Kir karê qêrînê

Cewab dane Çînê

Digel Seqîfûnê

Begler hatne kînê

Bo xêrata dînê

'Eskerê kuffar in

Peya û suwar in

²²⁸ Adem Apak, **Ana Hatlarıyla İslam Tarihi 1. Cild (Hz. Muhammed Dönemi)**, Ensar Yayınları, İstanbul 2020, n.r. 377-378.

²²⁹ Suruç, 2012, r. 702; Apak, 2020, r. 378; Şulul, 2015, r. 572.

²³⁰ Muhammed Hamidullah, "Huneyn", **DİA**, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 1998, c. 18, n.r. 376-377.

²³¹ Hamidullah, 1998, n.r. 376-377.

*Wekî şe'ê har in
Hatî bê şumar in*

(24-26)

*Mekke fetîh kirin
Şena metîh kirin
Ke'be paqij kirin
Ji pûtan dûr kirin*

*Muħemmed pur zor kir
Pût û şenem hûr kir
Çavê wan tev kor kir
Ji Ke'be'ê dûr kir*

*Hetikandin pût e
Bi agir bîzoğ e
Qelbê min disote
Ne aferîn j' bo te*

*Hetka wan pût-latan
Hetka wan şenatan
Qetla wan sadatan
Cewab çû welatan*

*Kalê 'Ezazîl bû
'Ekrût û xebîs bû
Muzawer telbîs bû
Tu nabê Iblîs bû*

*Te'na xo beyan kir
Fesadî 'eyan kir*

*Kînek wisan kar kir
Qelbê wan wêran kir*

*Malik ahîn rada
Kulma l' singê xo da
'Eqlê wî bû şeyda
Bihna xo girt berda*

(39-45)

Hz. Muhemmed (s.x.l.) ji bo agahîyan ji van qebîleyan berhev bike Ebdullah b. Ebî Hadred weke casûs û çavdêr dişîne nav qebîleya Hewazînê, ev sehabe çend rojan li nava mişrîkan dimîne û paşê vedigere û agahîyan dide pêxember.²³² Di metna cengnameyê de kesê ku xeberê dide pêxember û misilmanan Cebrâil e. Ev yek di metnê de weha derbas dibe:

*Bi emrê Celîl e
Nazil bû Cebrîl e
Hate cem Xelîl e
Bi se'y û te'cîl e*

*Gotê ya Imame
Xuda kir selam e
Hâzîr bin tamam e
Ez bikim i'lam e*

*Kafîr zor û ze'f in
Bê tîrs û bi xef in
Bi zirna û def in
Bi kîn û hem gef in*

²³² Duisenov, 2011, r. 17; Suruç, 2012, r. 703; Apak, 2020, r. 378.

Eşhaban hilîne
Ji Mekkê derîne
Xo pê ra bighîne
Nuşret ya wan nîne

Eskerê Hewazîn
Begê Seqîfûnê
Ew tèn bi yeqînê
Wê werne Huneynê

(55-59)

Li ser vê agahîyê Hz. Muhemmed (s.x.l.) jî dest bi amadehîya herbê dike û ji Sefwan b. Umeye el-Cumahî amûrên cengê bi deyn dixwaze, Sefwan wê serdemê hêj nebûye misilman û ji pêxember re dibêje: “*tu van sîlehan weke zordariyê dixwazî ya Muhemmed?*” Hz. Muhemmed jî li ser vê yekê bersiv didê û jê re dibêje; “*Na, ne bi zordarî, lê belkî heta ku ez radestî te bikim, ger kêmasî bikevê û bişkên ez dê saftî bikim*”. Li ser vê yekê Sefwan dibêje: “*nexwe zîyana wê tune ye*”. Sefwan 300 rim (mizraq)²³³ sed cewşen û têra wan sîleh dide wan.²³⁴

Qebîleyên ku beşdarî herba Huneynê bûne ev in: Qebîleya Benî Nasr û Benî Cûşem Muawîye b. Bekr b. ji qebîleya Hewazînê, Se’d b. Bekr b. Hewazîn, Benî Hîlal b. Amir b, Sa’sa b. Muawîye b. Bekr b. Hewazîn e. Li ser vê yekê Hz. Muhemmed jî ji deh hezaran zêdetir leşker berhev dike. Ji Ensaran 4000, ji Cuheynîyê 1000,²³⁵ ji Muzneynîyê 1000, ji Eslemê 1000, ji Gifaran 1000, ji Eşcanê 1000, ji Mihaciran û ji yên din 1000, bi tevahî 12000 leşker berhev kiriye.²³⁶ Herwiha tê gotin ku ji mişrîkan 70 kes jî li alîyê misilmanan beşdarî şer bûne, lewra ev kes nedixwestin ji Qureyşîyan veqetin.²³⁷ Di herba Huneynê de li alîyê misilmanan hin jin jî şer kirine. Ev jin ev in:

²³³ Zapsu, 2006, r. 437.

²³⁴ Suruç, 2012, r. 703; Şulul, 2015, r. 573.

²³⁵ Di çavkanîyan de ji bo hejmara Cuheynîyê 5000 hezar jî tê gotin. Ji bo agahîyên berfirehtir bnr; Zapsu, 2006, r. 437. Herwiha Zapsû dibêje ku du hezar jî ji xelkên Mekkê jî beşdarî vî şerî bûne.

²³⁶ Şulul, 2015, r. 572; Zapsu, 2006, r. 437.

²³⁷ Osman Keskinoglu, **Siyer-i Nebî (Hazret-i Peygamberin Hayatı)**, DİB Yayınları, Ankara 2017, r. 122.

Ummu Ūmare, Ummu'l-Haris û Ummu Suleym.²³⁸ Ji ber vê pirbûnê leşkerên misilmanan bi xwe pir bawerbûn, lewra cara ewil bû ku di bin fermanariya pêxember de artêşeke wisa mezin diçe herbê.²³⁹

Mişrîk di bin rêveberiya Malik b. Ewf û Dureyd b. Es-Simme el- Cuşemî ve berhev dibin. Malik rêberê Hewazînê bû, ji bo ku leşkerên wî ji herbê nerevin û ji bo bi wan bide zanîn ku ev herb herba mayîn û nemayînê ye. Jin, zarok û hemû mal û eşyayên wan jî bi wan re tîne cihê herbê²⁴⁰ û li Ewtasê qerargeha xwe ava dike.²⁴¹ Ev yek di metna *Cengnameya Huneynê* de weha derbas dibe:

Malik got ey 'Emra

Jin û zaran hev ra

Em biherin xo ra

Kes nereve j' pa ra

...

Eskerê Hewazîn

Begê Seqîfûnê

Ew tèn bi yeqînê

Wê werne Huneynê

(51-59)

Bi vî awayî şer di tarîxa 11ê Şewalê ya heştê Hicretê de serê sibehê dest pê dike.²⁴²

2.5.2.2. Pêvajoya Cenga Huneynê

Leşkerên misilman ji xwe bi awayekî bawer ji Mekkê derketin. Tîrkevanên Hewazînê ji berê ve hatibûn û li her du aliyên gelîyê Huneynê bi cih bûbûn û li benda misilmanan bûn.²⁴³ Leşkerên misilmanan jî heta berbangê sekînîn û di bin rêveberiya

²³⁸ Hamidullah, 1998, n.r. 376-377.

²³⁹ Apak, 2020, r. 378.

²⁴⁰ Suruç, 2012, r. 702; Apak, 2020, r. 378.

²⁴¹ Suruç, 2012, r. 703.

²⁴² Şulul, 2015, r. 573.

²⁴³ Apak, 2020, r. 379; Şulul, 2015, r. 573; Zapsu, 2006, r. 438.

Xalid b. Welîd de sed siwar bi rê ketin û hatin gelîyê Huneynê, lê ji ber ku tarîbû haya wan ji leşkerên mişrîkan tune bûn. Ji nişkeva tîrkevanên mişrîkan wan di bin barîna tîran de hiştin.²⁴⁴ Ji ber vê êrîşê leşkerên misilmanan belav bûn, her çiqas hejmara misilmanan zêdetir bû jî li hemberî mişrîkan têk çûn. Ev rewş di cengnameyê de weha hatiye behskirin:

Got em bê şimar in

Pêk ve namidar in

Temam pehlewan in

Genîmê kufar in

Tirsa me tûnîne

Minet bi kes nîne

Xelqê em pur dîne

Bi şûrê Mişrî ne

(68-69)

Li derdora Hz. Muhemmed (s.x.l.) nêzîkê sed kes tenê mabûn, hin ji wan ev bûn: Hz. Ebûbekir, Hz. Omer, Hz. Elî, Hz. Ebbas, Usamme b. Zeyd, Fazl b. Ebbas, Ebû Sufyan b. Haris b. Ebdulmuattalîb, Ummu Eymen b. Eymen, Qusem b. Ebbas, Rebîa b. el- Haris û Ummu Eymen.²⁴⁵ Piştî ku Hz. Muhemmed bi çendîn kesan re tenê dimîne ayetên 25 û 26 yê sûreyê Tewbeyê nazil dibin: “لَقَدْ نَصَرَكُمُ اللَّهُ فِي مَوَاطِنَ كَثِيرَةٍ وَيَوْمَ “*Sond be, حَتَّىٰ إِذْ أَعْجَبْتُمْ كَثْرَتَكُمْ فَلَمْ تُغْنِ عَنْكُمْ شَيْئاً وَضَاقَتْ عَلَيْكُمُ الْأَرْضُ بِمَا رَحُبَتْ ثُمَّ وَلَّيْتُم مُّدْبِرِينَ*” *Xwedê di gelek cihan de alîkarîya we kir. Roja Huneynê jî (alîkarîya we kir): wê dema piranîya we hûn germ kirin, vêca piranîya we tu feyde negihande we û tu tişt ji we neda paş. Erd digel firehîya xwe jî li we teng bû û paşê we piştî xwe da şer û hûn revîyan. Piştî reva we, Xwedê aramî û dilxweşîya xwe bi ser pêxember û bawermendan de anî û leşkerekî ku ji we nexuya (ji bo alîkarîya we) hinart û ew ên kafir bûne cezakirin.*”²⁴⁶ Ev rewş di metna cengnameyê de weha hatiye behskirin:

²⁴⁴ Şulul, 2015, r. 573.

²⁴⁵ Apak, 2020, r. 379; Şulul, 2015, r. 574; Zapsu, 2006, r. 438; Duisenov, 2011, r. 28.

²⁴⁶ M. Huseyn Êsî, M. Seîd Girdarî û M. Muhemmed Bêrkevanî (amd), **Qur’ana Pîroz û Wergera Wê Ser Zimanê Kurdî**, Weşanên Şura, Stenbol 2014, r. 189.

*Me`na ayetê ev e
Hûn guh bidin
Hem ji xaba gefletê
Hişyar bibin*

*Ye`nî her mekana
Da ew Heq Te`al
Nuşret da we her
Cenga da La-yezal*

*Hal ew roja Huneynê
We kir beyan
Bê hesab e `eskerê
Me j` her weqtan*

*Cardinê we dît ji me
Quwwet meded
Fa`ide nekir ji bo
We pur `eded*

*We Muhemmed
Cî da hişt paş da revîn
Me sekîne da Muhemmed
Hem ewan yarê guzîn*

*Hem mela`ik me şihandin
Bê hisab
Şûr li kafîran hejandin vekirin wan
Fethê bab*

(201-206)

Çawa ku ji van bendan jî dîyar dibe, misilman bi zêdebûna xwe qure dibin û xwe ji dijmin serdestir dibînin. Hejmara wan ya zêde ji wan re serkeftin neaniye û dîsa Xwedê alîkarî daye wan.

Piştî ku misilman belav dibin gote-got di nav misilmanan de belav dibe û tê gotin ku Hz. Muhemmed (s.x.l.) hatiye şehîdkirin. Li ser vê yekê pêxember bangî misilmanan dike da ku dîsa wan berhev bike. *“Ey mirovno! Hûn diçin kuderê? Ber bi min ve werin! Ez, Resûlê Xwedê me, Ez Muhemmedê kurê Ebdullah im.”*²⁴⁷ Lê ji ber ku li meydanê alozî û tevlîhevî çêbûbû deng neçû misilmanan ji ber vê yekê vê carê apê Hz. Muhemmed Ebbas bangî xelkê misilman kir²⁴⁸ û got: *“Ey ensarên ku di Eqebeyê de bîat kiribûn! Ey ew eshabên ku di bin dara Ridwanê de ji bo ku venegerin soz dabûn.”*²⁴⁹ Li ser bangkirina Ebbas deng diçe misilmanan û leşkerên misilman vedigerin. Di metna cengnameyê de ev rewş weha derbas dibe:

Pêgember neda kir

Ya ehlê Islamê

Bo çî we firar kir

Ez dikim i lamê

Şeytan iftira kir

Heqê La-yenamê

Ji hay û hû mêran

Seh nekirin deng e

Şed heb ji dilêran

Tenê kirin ceng e

Wana kafir hêran

Bi gurzê xeleg e

(177-178)

Gote ‘Ebbas ya ‘emê

Rabe serî‘en vê demê

²⁴⁷ Zapsu, 2006, r. 439; Suruç, 2012, r. 705; Şulul, 2015, r. 574.

²⁴⁸ Suruç, 2012, r. 705.

²⁴⁹ Zapsû, 2006, r. 439.

*Tu here serê çiya`ê
Def` bike narê gemê*

*`Ebas çû serê çiya`ê
Gazî kir wî kir nida
Xaliqê `alem çê kir j` wî
Şewtek bilind hem şeda*

*Wî digot ya ehlê Riđwan
Ehlê bey`et hûn werin
Ez dikim qesem ji bo we
Sag e Xetmu`l-Murselîn*

*Hûn werin ya ehlê Ye`rîb
Ehlê Xezrec bit-temam
Ez dikim qesem ji bo we
Îftira bû ev kelam*

*Hûn werin ya ehlê Qur`an
Hamilê sirr`ul-Beqer
Bizvirin ya ehlê `urfan
Bayi`ê tehtê şecer*

(191-195)

Çawa ku ji van bendan li jor jî dîyar dibe Ebbas bangî ehlê misilman dike da ku ji xeletîya xwe vegerin. Bangî wan kesa dike ku berî herbê soz dabûn pêxember ku ew dê ji şer nerevin. Ji ber ku li meydanê gote got peyda dibe û dibêjin pêxember wefat kiriye ew kesên ku soz dabûn pêxember direvin. Di metna cengnameyê de tê gotin ku ew gote got ji alîyê Şeytan ve hatiye gotin.

*Dengek bû `eyan e
Ew deng ji şeytanê*

Seh kir eşhaban e
Hatne ber îmanê
Wî got bi efğan e
Way Muḥemed kanê

Muḥemed şehîd bû
Gazî kir mel'ûn e
Islam nabadîd bû
Kafir bûn dev-xûn e
Dest li wana sar bû
Revîne çiya ne

(175-176)

Di nav misilmanan de kesên mişrîk û kesên ku nû bûbûn misilman jî hebûn, ew kes jî têkçûna misilmanan bextewar bûn, lewra hêj qelbê wan bi temamî li Îslamê germ nebûbû. Ebû Sufyan b. Harb li ser têkçûna misilmanan weha dibêje; “*Piştta vê têkçûn heta behrê jî nayê girtin!*”. Sefwan b. Ummeye ku di wê maweyê de hêj nebûbû misilman li ser gotina Sufyan weha dibêje; “*Devê te tije ax û kevir bibe!*”.²⁵⁰

Yek ji wan kesên ku hêj nebûbû misilman Şeybe b. Osman bû. Şeybe li hemberî misilmanan bi kîn bû, lewra di herba Uhudê (H. 625) de bavê wî hatibû kuştin. Li ser vê yekê wî jî dixwest heyfa xwe hilîne. Şeybe li pey firsendekê bû ku Hz. Muhemmed (s.x.l.) bikuje. Şeybe jî paş ve nêzîkê pêxember bûye û kiriye ku şûrê xwe derbixe û li pêxember bixe. Lê di navbera wan de agirek ango şûleyek peyde bûye. Li ser vê yekê Şeybe tirsîyaye û bi paşve kişiyaye. Dema ku bi paşve çûye Hz. Muhemmed gazî wî kiriye û gotiye Şeybe were cem min. Hz. Muhemmed destê xwe daye ser singa wî û gotiye “*Xwedayo ji wî weswese û desîsê Şeytan bistîni.*” Ji nişka ve Şeybe jî kîn û ji xwestina heyfhilandinê xelas bûye û hatiye îmanê.²⁵¹ Di metna cengnameyê de ev rewş wiha hatiye behskirin:

²⁵⁰ Suruç, 2012, r. 706.

²⁵¹ Suruç, 2012, r. 707.

*Ibnî Şeybe got tenê min
Dît Muḥemed şahê dîn
Bab û 'emmê min 'Elî
Hemze ku kuştin bûye kîn*

*Ez bistînim xûna wana
Ji Muḥemed bê ğuman
Dest avêtime xencerê
Hatim l' alyê rast heman*

*Min dî 'Ebas şûr di destan
Kafirana cellad dikir
Çepê wî Şufyan sekinye
Kafirana pur xûn dikir*

*Ez hatim piş da sekinîm
Dest avête xencerê
Derbekê wisan ku lê xim
Ew şehîd be l' wê derê*

*Şu 'leyek çêbû li puştê
Min yeqîn kir şewîfîm
Çavê min ku hate girtin
Heman ez paş da revîm*

*Gazî min kir ez ku çûm
Çê bû li min xewf û xeşer
Dest li singê min malandî
Kir di 'ayek mu 'teber*

Cezbeya 'iŝqê li min da
Ez kirim 'aŝiq li xwe
Ez dikim qurban ji bo wî
Bab û 'em hem rûhê xwe

Gote min ya Ibnî Şeybe
Tu here cengê heman
Sem 'e ta 'e got û min
Fîlhal ji wî ez bûm rewan

(209-216)

Piştî ku Şeybe dibe misilman pêxember jê re gotiye here şer bike, ew jî yekser ketiye şer û li dijî mişrîkan şer kiriye.

Li ser gazîkirina Ebbas leşkerên misilmanan careke din berhev dibin û di herba Huneynê de bi ser dikevin. Mişrîk belav dibin, hin ji wan diçin bi Malik b. Ewf ve xwe dispêrin Taîfê, hin ji wan diçin Ewtasê û hin ji wan jî diçin Nehleyê. Li ser vê yekê pêxember yekîneyekê dişîne Taîfê, yekîneyekê dişîne Ewtasê û yekîneyekê jî dişîne Nehleyê.²⁵² Piştî herba Huneynê Seqîfî xwe dispêrin Taîfê û derîyan digirin. Li ser vê yekê pêxember Taîfê dorpêç dike. Ev dorpêçkirin nêzîkê 20 rojan didome, lê ji ber ku dê mehên heram dest pê bikin Hz. Muhemmed dorpêçkirinê radike û tê herêma Cî'ranê.²⁵³ Ev yek di metna cengnameyê de weha hatiye neqilkirin:

Kafir revîn temamet
Çûne Kela Ta'îfê
Li wan çê bû qiyamet
Û hem çêbû ze'îfî

Hinek ji wan esîr bûn
Hinekan kir firar e

²⁵² Şulul, 2015, r. 575.

²⁵³ Şulul, 2015, n.r. 578-579; Suruç, 2012, r. 713.

*Hinek ji wan qetil bûn
Ew çûne nava nar e*

*Dora gelî girêdan
Bû gazî yû hewar e
Islamê ne `re radan
Hal kafira firar e*

*Malik revî hişarê
Yehûdan ew xilaş kir
Cardin hatne şîrarê
Wan tedbîra xwe dikir*

*Resûlallah emir da
Wana hucûm da kelê
Bi roj û şev karûzar
Ji herbê nabin belî*

(361-365)

Di metna cengnameyê de Taîf weke kelehekê hatiye nîşandan û niştecihên wê jî weke Yehûdî hatine bilêvkirin. Lê di rastîyê de niştecihên Taîfê jî mişrîk in û Taîf ne keleh e bajar e. Herwiha di cengnameyê de behsa maweya dorpeçkirinê nayê kirin. Her çiqas piştî dorpeçkirinê salek şûnde niştecihên kelehê bûbûn misilman jî di metnê de weke ku di wê maweyê de bûbûn misilman hatiye gotin.

Piştî ku Hz. Muhemmed (s.x.l.) dorpeçkirinê radike xeberê ji bo Malik rê dîke û dibêje ger ew were û bibe misilman ez ê endamê malbata wî, malê wî û bi ser de jî sed hêştir bidimê. Li ser vê yekê Malik tê hizûra pêxember û dibe misilman. Hz. Muhemmed jî mal û malbata wî dide wî û wî li ser kesên misilman yê qebîleya wî dîke walî.²⁵⁴ Ev yek di metna cengnameyê de weha hatiye ravekirin:

²⁵⁴ Suruç, 2012, r. 720.

*Musulmanan bi gulbeng
Şer dikin çar terefan
Malik girtin kirin bend
Himmeta pêgemberan*

*Pêgember gote Malik
Qebûl bike îmanê
Filhal ew bû[ye] salik
Musulman bû l' meydanê*

*Hem 'Urwe bû musulman
Digel qewmê xo carek
Teslîm kirin malê wan
Paşva kirin tedarek*

*Ku ew hatne îmanê
Temam şa bûn reqisîn
Berî dane Medîne
Yasîn tamam nivîsî[n]*

(366-369)

Di metna cengnameyê de Malik tê girtin û jê re tê gotin ku an ew dê bibe misilman an jî ew dê bê kuştin. Li ser vê yekê Malik û qewmê xwe dibin misilman. Bi vî awayî şer bi dawî dibe. Di metna cengnameyê de qet behsa piştî herbê û belavkirina xenîmetan nayê kirin.

2.6. KESAYETÊN GIRÎNG ÊN ĞEZWETU HUNEYNÊ

Di vê binbeşê de dê li ser rol û kesayetên ku di *Ğezwetu Huneynê* ya Mela Yasîne Alikî de navê wan derbas bûne hatine rawestîn. Hin ji van kesayetên misilman bûne, hin ji wan paşê bûne misilman û hin ji wan jî nebûne misilman. Ev hemû kesayet bi kurtasî hatine nasîn û ji bo mijar û qisse were fahmkirin rola wan ya di cengê de li

ber çavan hatiye raxistin. Bi tevahî di *Gezwetu Huneyn* a Mela Yasînê Alikî de li gor tesbîtên me 26 kesayet derbas dibin.

2.6.2. Kesayetên Misilman ên Cengnameyê

2.6.2.1. Hz. Muhemmed (s.x.l.)

Hz. Muhemmed di sala 571ê de li Mekkeyê hatiye dinyayê, navê bavê wî Ebdullah e û navê dîya wî jî Amîne ye. Navê kalê wî Ebdulmutalîb e. Ji ber ku ji nesla Hz. Îbrahîm e jê re weke Îsmailî jî hatiye gotin. Di 25 salîya xwe de bi Hz. Hatîce re zewicîye û ji vê zewacê heft zarokên wî çê bûne. Hz. Muhemmed di 40 salîya xwe de di sala 610an de bûye pêxember û dest bi belavkirina dînê Îslamê kiriye. Hz. Muhemmed ji bo belavkirina Îslamê beşdarî şerên weke: Bedir, Uhud, Zatu'r-Rika, Benî Nadîr, Xendek, Qureyza, Benî Mustalîq, Xeyber, Mute, Fetha Mekkê, Huneyn û Tebuk bûye. Hz. Muhemmed di sala 632yan de li Medînê wefat kiriye.²⁵⁵

Bûyera ku di cengnameyê de derbas dibe li dor Hz. Muhemmed hatiye hûnandin ji ber vê yekê di gelek cihan de nav û sîfatên ku ji bo Hz. Muhemmed hatine gotin derbas dibin. Nav û sîfatên ku ji bo Hz. Muhemmed hatine gotin ev in: Muhemmed, Muhemmed Mustafa, Ehmed, Pêxemberê Nûranî, Xalis Nûra Ekber, Nebî, Babê Fatma'ê, Nebiyê Serwer, Xetm'ul-Murselîn, Resûlê Kibirya, Şahê Cihan, Fexru'l-Umem, Fexrê 'Alem, Hezretê Resûl, Resûellah, Resûlê Girdigar, Pêgember, Resûlê Zûl-Celal, Resûlê Ins û Can, Hebîbûllah, Resûlê Nûranî û Resûlê Heq. Li jêr em dê çend bendan weke mînak bidin.

Muḥemmed Muştefa

'Esker kir bi şefa

Dîtin cewr û cefa

Çaryarê pur-wefa

(21)

²⁵⁵ Mustafa Fayda, "Hz. Muhammed," *DİA*, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 2005, c. 30, n. r. 408-423.

Wan ku dî şağ e şelamet
*Ew **Resûlê Kibriya***
Em nizanin em çi bêjin
Şermesar in bê riya

*Tu **Hebîbê Muste'an î***
*Ya **Resûlellah** meded*
Em dikin zarî ricakê
Tu ji Xaliq bê 'eded

(198-199)

Rawiyî got Ibnî Mirdas
*Hate cem **Fexru'l-umem***
*Jê suwal kir **Fexrê 'Alem***
Kanê ew ru'yet 'elem

Min 'elem têk kir li ser
*Serê çiya 'ê ya **Resûl***
Da ji bo qewmê nîşan be
Ew ku şer kin pur uşûl

(221-222)

2.6.2.2. Hz. Hemze

Hz. Hemze apê Hz. Muhammed e. Di sala 569-570an de hatiye dinyayê, navê dîya wî Hale ye. Ji ber ku ew û pêxember ji Suweybeyê şîr vexwarine şîrbirayê hev in. Hz. Hemze di sala şeşmîn a bî'setê de bûye misilman. Hz. Hemze piştî ku bûye misilman hêza misilmanan xurttir bûye. Hz. Hemze mirovekî xurt û cengawer bûye bi pêxember re beşdarî şerên weke Bedir û Uhudê bûye. Hz. Hemze di herba Uhudê gelek kesên girîng yên mişrîkan kuştiye. Di şerê Uhudê de ji alîyê xulamê Cubeyrê kurê Mut'im, Wahşî ve hatiye kuştin. Hz. Muhammed (s.x.l.) ji ber kuştina wî gelekî

xemgîn bûye û li ber wî ketiye. Nimêja wî ya cenazeyê Hz. Muhammed kiriye.²⁵⁶ Hz. Hemze bi cengawerîya xwe di nav gel de tê zanîn û ji ber vê cengawerîya wî li ser wî metnên cengê hatine nivîsîn. Di metna cengnameyê de jî Hz. Hemze weha derbas dibe:

Ibnî Şeybe got tenê min

Dît Muḥemed şahê dîn

Bab û 'emmê min 'Elî

***Hemze** ku kuştin bûye kîn*

(209)

2.6.2.3. Hz. Ebûbekir

Hz. Ebûbekir xelîfeyê yekem e û yek ji wan misilmanên ewil e. Navê bavê wî Ebû Kuhafe ye û navê dîya wî jî Ummu'l Xeyr e. Derheqê zayîna wî de tarîxeke teqez nîne, lê tê gotin ku ew sê sal piştî bûyera Fîlê hatiye dinyayê. Ji alîyê dîya wî ve leqaba wî “Çeleng” hatiye dayîn. Ji bilî vî leqabî bi navên weke: Ebdu'l-Ka'be, Zu'l-hîlal û Erwah jî hatiye binavkirin. Herwiha ji ber dilsozîya wî û ji ber rastîya wî leqaba “Sidiq” jî alîyê Hz. Muhammed (s.x.l.) ve ji bo wî hatiye dayîn. Ji ber ku piştî Hz. Muhammed karê xelîfetîyê meşandiye jê re weke: “Xelîfeyê Resûlellah” jî hatiye gotin. Ji ber ku Hz. Ebûbekir û Hz. Muhammed bi hev re li şikeftê mane jê re weke “Yarê garê” hatiye gotin. Bi saya Hz. Ebûbekir gelek kesên girîng yên wê serdemê bûne misilman, hin ji wan kesan ev in: Hz. Osman, Talha b. Ubeydullah, Se'd b. Weqqas, Zubeyr b. Awam, Abdurrahman b. Ewf, Bilalê Hebeş û hwd. Hz. Ebûbekir beşdarî çendîn herbên serdema Hz. Muhammed bûye ji van hin herban ev in: Uhud, Huneyn, Tebûk û beşdarî dopêçkirina Taîfê bûye. Hz. Ebûbekir di sala 634an de ji ber nexweşîya xwe rehmet kiriye.²⁵⁷ Di metnê de Hz. Ebûbekir weha derbas dibe:

Muḥammed Muştefa

'Esker kir bi şefa

²⁵⁶ Hüseyin Algül, “Hamza” **DİA**, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 1997, c. 15, n.r. 500-502.

²⁵⁷ Mustafa Fayda, “Ebûbekir”, **DİA**, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 1994, c. 10, n.r. 101-108.

Dîtin cewr û cefa
Çaryarê pur-wefa

(21)

Bilal Dundul kar kir
Pêgember suwar bû
Dema ku hemle kir
Melek lê ber hev bûn
*‘Umer **Ebûbekir***
Wan ‘elem hilda bûn

(181)

2.6.2.4. Hz. Omer

Derheqê zayîna wî de agahîyên teqez nînin, lê tê gotin ku sêzdeh sal piştî bûyera Fîlê hatiye dinyayê. Navê bavê wî Xettab e û navê dîya wî Hanteme ye. Li gor ku tê gotin Hz. Omer di destpêkê de li hemberî pêxember û misilmantîyê sekinîye û îşkence bi wan kiriye. Li ser misilmanbûyîna wî çendîn rîwayet tên gotin. Hz. Omer di sala şeşemîn a bi‘setê de bûye misilman. Piştî ku Hz. Omer bûye misilman hemû misilman li Ke‘bê nimêj kirine. Hz. Omer beşdarî hemû herbên ku Hz. Muhemmed (s.x.l.) femandarîya wan kiriye bûye. Hz. Muhemmed Hz. Omer weke femandar tayînê mufrezeya ku şandiye ser qebîleya Hewazîne kiriye. Bi saya Hz. Omer, Ebû Sûfyân bûye misilman. Roja ku Hz. Ebûbekir wefat kiriye li Mescîda Nebî Bîat xwestiye û dest bi xelîfetîyê kiriye. Hz. Omer piştî Hz. Ebûbekir xelîfeyê duyem e û wî deh salan xelîfetî kiriye. Hz. Omer piştî ku heca xwe xelas dîke û vegeîyaye Medîneyê xulamê wî Ebû Lu‘luê Fîrûz en-Nihavendî jê re gotiye ku xwedîyê wî gelekî jê pere distîne li ser vê yekê Hz. Omer jê re gotiye tu hesingerî, xeratî û neqqaşîyê dikî perê ku ji te tê xwestin ne zahf e. Li ser vê yekê xulamê wî aciz dibe û roja din di nimêja sibehê de bi xencerê Hz. Omer birîndar dîke û xwe jî dikuje. Hz. Omer jî ji ber bîrîna xwe sê roj paşê di sala 644an de wefat kiriye. Piştî wefata Hz. Omer, Hz. Osman

dibe xelîfe û serdema wî dest pê dike.²⁵⁸ Di metna cengnameyê de Hz. Omer weha derbas dibe:

*Pêgemberê kubar e
Wî gote Çarûyar e
Biçne herba kuffar e
Bi emrê Kirdigar e*

(61)

*Resûl got ey serwer
Navê te bû 'Umer
Mizgîn de seranser
Bira bêne ev der*

*Heman 'Umer şa bû
Fîlhal ew punhan bû
Sa 'etek winda bû
Cardin hat 'eyan bû*

(90-91)

2.6.2.5. Hz. Osman

Hz. Osman di sala 577an de li Taîfê hatiye dinyayê, bavê wî Affan di serdema cahilîyê de wefat kiriye. Dîya wî Erwa keça meta Hz. Muhemmed e (s.x.l.). Hz. Osman berî ku bibe misilman bazirganekî girîng ê Mekkeyê bûye. Bi saya Hz. Ebûbekir bûye misilman, misilmanbûna wî di nav Qureyşîyan de olan daye. Apê wî Hakem b. Ebû'l-As wî girêdide da ku ji dînê xwe vegere, lê Hz. Osman ji dîn venagere û dawîyê de wî vedike. Hz. Osman bi keçên Hz. Muhemmed Rûkîye û Ummu Gulsim re zewicîye. Hz. Osman di herbên Zaturrika' û Zûemerê de wekaletîya pêxember kiriye. Hz. Muhemmed wî weke elçî şandiye Mekkeyê ji bo peymanê Hudeybîyê. Hz. Osman di serdema ku Hz. Omer xelîfetîyê kiriye şewirmendîya wî kiriye. Piştî ku Hz. Omer wefat kiriye Hz. Osman li şûna wî bûye xelîfe, Hz. Osman bûye xelîfeyê sêyem piştî

²⁵⁸ Mustafa Fayda, "Ömer", **DİA**, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 2007, c. 34. n.r. 44-51.

Hz. Muhammed. Hz. Osman duwazdeh salan xelîfetî kiriye. Di serdema xelîfetîya xwe de gelek sefer kirine. Di serdema wî de êrîş li ser herêmên weke Hemedan, Esterabad û Kirman hatiye kirin. Hz. Osman ji ber ku xizm û nasên xwe di karên girîng de bi cih kiriye li hemberî wî mixalefetek jî pêk hatiye û di encama vê mixafeletê de di sala 656an de hatiye kuştin.²⁵⁹ Di metna cengnameyê de weha derbas dibe:

Muḥemmed Muştefa

‘Esker kir bi şefa

Dîtin cewr û cefa

Çaryarê pur-wefa

(21)

Se‘d û ‘Umer ‘Usman

Digel Ebûbekir

Hatin wekî şahan

Wana ‘elem vekir

(157)

‘Usman ‘Elî Heyder

Zubeyrê ‘Ewam e

Muğdad Xalid Ejder

Hatin bit-temam e

(182)

2.6.2.6. Hz. Elî

Îmamê Elî (Hz. Elî) li gor ku tê rîwayetkirin 22 salan berî hicretê li Mekkeyê hatiye dinyayê. Bavê wî apê Hz. Muhammed (s.x.l.), Ebû Talîb e û dîya wî jî Fatima ye. Ji ber xelayê ji pênc salîya xwe heta hicretê li cem Hz. Muhammed maye û yek ji wan kesên ewil e ku bawerî bi Hz. Muhammed anîye û di heman demê de zavê pêxember e. Di çavkanîyan de agahîyên derheqê jîyana wî ya berî hicretê de kêmin. Hz. Elî beşdarî gelek herban bûye û di van herban de sancakdarîya pêxember kiriye.

²⁵⁹ İsmail Yiğit, “Osman”, **DİA**, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 2007, c. 33. n.r. 438-443.

Her çiqas di herbên weke: Uhud û Huneynê de bîrîndar bûbe jî heta dawî Hz. Muhemmed parastiye. Hz. Elî katibîya pêxemeber kiriye û wahî nivîsîne. Hz. Elî di sala 556an de bûye xelîfe û heta sala 661an karê xelîfetîyê meşandîye. Hz. Elî piştî Hz. Osman dibe xelîfeyê çarem. Hz. Elî di sala 661ê de ji alîyê kesekî bi navê Ebdurehman Harîcîyê kurê Mulcem ve tê kuştin. Hz. Elî tevî cengawerîya xwe ve li ser Qur'an û hedîsan xwedî zanîneneke baş bûye. Hz. Ebûbekir û Hz. Omer ji ber vê zanîna wî gelek caran alîkarî jê xwestine.²⁶⁰

Di metna cengnameyê de Îmamê Elî roleke çalakger dilîze, di metnê de Îmamê Elî weke qehremanekî bê emsal derdikeve hemberî me. Kesekî miqabilê cengawerîya wî nîne, bi halê xwe yê bîrîndar jî dîsa li dijî neyaran şer dike. Ji ber vê lehengîya wî di edebîyatê de li ser wî cengname hatine nivîsîn. Piştî Hz. Muhemmed di cengnameyê de herî zêde qala Îmamê Elî tê kirin û cengawerîya wî derdikeve pêş. Ji ber vê hindê gelek sîfat û nav ji bo wî hatine bikaranîn. Nav û sîfatên ku ji bo Îmam Elî di metnê de derbas dibe ev in: Şêrê Ekber, Şah, Heyder, Heyderê Kerrar, Şahê Merdan, Elî Heyder, Imamê Heyder, Imam, Şahê Heyder, Elî Şêrê Xuda, Şêrê Muhemmed, Şahê Dîn, Şêrê Heq, Şêrê Şikarî û Sahîbqiran. Çend bendên ku qala Îmamê Elî dikin weha ne:

*Şande wî **Heyder** e*

*Ew **Şêrê Ekber** e*

B' emrê pêgember e

Hucûm kir li ser e

(76)

Pêgember suwal kir

***Şahê Merdan** kanê*

Enes hikayet kir

Go bikim beyanê

(231)

*Merheba ya **Şêrê Heq***

Ev çi herbek giran e

²⁶⁰ Ethem Ruhi Fıçlatlı, "Hz. Alî", **DİA**, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 1989, c. 2, n.r. 371, 374.

*'Elî gotê muheqeq
Izinde bim rewan e*

(250)

*Ez bimirim ya 'Elî
Halê min wê çewan be
Gote wî Şahê Welî
Dê cehnem û 'ezab be*

(333)

*Got hilde xwe vê derbê
Ji dest Heyderê Kerrar
Şah rabû ser rikêbê
Hewale kir Zulfeqar*

(346)

2.6.2.7. Zubeyrê Kurê Ewwam

Zubeyrê kurê Ewwam li gor ku tê gotin ya di sala 594an de yan jî di 595an de hatiye dinyayê. Navê bavê wî Ewwam e û navê dîya wî Safîye ye. Bavê wî birayê Hz. Hatîce ye û dîya wî jî meta Hz. Muhemmed e (s.x.l.). Zubeyr piranîya zarokatîya xwe bi zarokên Hz. Muhemmed re derbas kiriye. Zubeyr bi keça Hz. Ebûbekir Esma re zewicî ye û ji vê zewacê heşt zarokên wî çêbûne. Tê gotin ku Zubeyr ti carî bawerî bi pûtan neanîye û di şanzdeh salîya xwe de bi tesîra Hz. Ebûbekir bûye misilman. Zubeyr ji ber ku bûye misilman ji aliyê apê xwe Nevfelê kurê Huveylid ve hatiye îşkencekirin. Tê gotin ku yekem kes e li ser navê Îslamê şûr kişandiye. Zubeyr beşdarî şerên weke: Bedir, Uhud, Xendek, Xeyber, fetha Mekkê, Huneyn, Taîf, Tebûk û Yermûkê bûye. Zubeyr di van herban de di sefên pêşî de cih girtiye. Hz. Omer berî wefata xwe tevî pênc kesan wî jî weke xelîfe pêşniyaz kiriye. Zubeyr bi bazirganîyê re mijûl bûye û gelekî dewlemend bûye. Piştî ku Hz. Osman ji aliyê îsyankaran ve tê kuştin li dijî Hz. Elî li cem Hz. Ayşe û Talha cih girtiye. Piştî ku şer dest pê kiriye rastî Hz. Elî hatiye û ji şer derketiye, lê ji aliyê Merwanê kurê Hakem ve hatiye kuştin.²⁶¹ Di metna

²⁶¹ Mehemet Efendioğlu, "Zubeyr b. Ewwam", **DİA**, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 2013, c. 44, n.r. 522-524.

cengnameyê de gelek caran derbas dibe. Di metnê de Zubeyrê kurê Ewam bi cengawerîya xwe derdikeve pêş. Çend nimûne ji metnê weha ne:

*Wî gote gulam e
Ew suwarê heybet
Zubeyrê 'Ewam e
Kur-apê Muḥemmed*

(121)

***Zubeyr** got ey kafîr
Qebûl ke îmanê
Yan jî bibe ḥazîr
Qeṭ meke dewranê
Dê tu biçî agir
Bi ḥukmê Qur'anê

Gurzek l' **Zubeyr** bar kir
Wezna wî giran bû
Super wî îḥzar kir
Di bin da punhan bû
Ew li **Zubeyr** bar kir
Şed û çil baṭman bû*

(167-168)

2.6.2.8. Fazilê Kurê Ebbas

Navê bavê wî Ebbas e û navê dîya wî jî Lubabeya keça Haris e. Fazil bi Hz. Muhammed (s.x.l.) re di herba Huneynê de cih girtiye. Di vê herbê de dema misilman terka pêxember dikin ew li cem wî dimîne û pêxember diparêze. Ji ber ku di heca xatirxwestinê de li ser qorika hêştira pêxember çûye jê re weke “Ridfû Resûlallah” hatiye gotin. Fazil bi keça Mahmîyê Cez, bi Safîye re zewicîye. Ji vê zewacê keçeke wî bi navê Ummu Gulsim çê bûye. Derheqê mirina wî de agahîyên teqez tune ne, lê tê gotin ku ji ber webaya Amwasê di sala 634(?) an de li derdora Urdinê wefat kiriye.

Fazil ji Hz. Muhemmed 24 hedîs rîwayet kirine. Di metna cengnameyê de Fazil weha derbas dibe:

Fezîl û Zubeyr Şufyan

Hatin bi ala`ê

Dunya hejya j` ne`ran

Selewat veda`ê

(156)

Fezîl kir riwayet

Di nava herbê da

Bû germ û heraret

Êdî na`ê weş dan

(227)

2.6.2.9. Ebbas

Ebbas apê Hz. Muhemmed e (s.x.l.) û tê gotin di navbera wî û pêxember de du an jî sê sal heye. Ji ciwanîya xwe ve bi bazirganîyê ve mijûl bûye. Ji ber ku rewşa wî ya aborî baş bûye di serdema cahîliyê de wezîfeya belavkirina avê û zîyafetdayîna ji bo hecîyên Ke`beyê ji birayê xwe Ebû Talîb dewr standiye. Ji ber xelayê kurê Ebû Talîb Cafer xistiye bin hîmayeya xwe. Li ser misilmanbûna wî du rîwayet tên gotin, li gor rîwayeta ewil Ebbas di ciwanîya xwe de bûye misilman, lê xwe îfşa nekiriye û bi vî awayî xwestiye misilmanan biparêze. Li gor rîwayeta din jî Ebbas heta herba Bedirê nebûye misilman, lê dîsa jî birazîyê xwe li hemberî mişrîkan parastiye. Tê gotin ku li hemberî misilmanbûna jina xwe Ummu`l-Fazl Lubabe û kurê xwe Ebdullah nesekiniye û destûr daye wan. Di herba Bedir de mecbûr maye ku li alîyê mişrîkan bimîne û bûye bend. Fîdyeya xwe û yê xizmên xwe daye û vegeşîyaye Mekkê. Di serdema fetha Mekkê de misilmanbûyîna xwe aşkere kiriye. Di herba Huneynê de ku misilman serê pêşî hezîmet dibin biata wan ya Akabe û Ridwanê anîye bîra wan û bi dengê bilind bangî artêşa misilmanan kiriye. Bi vî awayî atêşa misilmanan careke

din berhev bûye û dijminên xwe têk birine. Ebbas di sala 653yan de wefat kiriye.²⁶² Di cengnameyê de Ebbas bi vî awayî derbas dibe.

*Rikêb kir 'Ebbas e
Ew 'emmê Resûl e
Her kes wî dinase
Kafir j' dest melûl e*

(151)

*Gote 'Ebbas ya 'emê
Rabe serî'en vê demê
Tu here serê çiya'ê
Def' bike narê gemê*

*'Ebas çû serê çiya'ê
Gazî kir wî kir nida
Xaliqê 'alem çê kir j' wî
Şewtek bilind hem şeda*

(191-192)

2.6.2.10. Ebbasê Kurê Mirdas

Agahîyên derheqê jîyana wî de zêde nînin. Bavê wî Mirdas pûtperest bûye û li gor rîwayetan piştî mirina bavê xwe di sala 629an de tevî hin kesên qebîleya xwe bûye misilman. Bi neh sed kesên ku ji qebîleya xwe civandiye beşdarî fetha Mekkeyê bûye. Di herbên weke Huneyn û Taîfê de cih girtiye. Ebbas kesekî “Muellefê Qulûb” bûye, Muellefê Qulûb jî tê maneya ew kesên ku bi mal û milkê li ser Îslamê mane û lê germ bûne. Ebbas piştî herba Huneynê li dijî dayîna xenîmetên zêde bo kesên ku nû beşdarî Îslamîyetê bûne derketiye. Li ser vê tevgera wî pêxember emir daye da ku sed hêştir ji bo wî bê dayîn. Ebas li ser dayîna xenîmetên zêde bo kesên ku nû bûne misilman helbest nivîsîye û tê gotin ku dîwaneke wî hebûye. Wî di serî de li ser herba Huneynê û şerên ku beşdar bûye helbestên qehremanîyê nivîsîye, lê hemû helbestên wî

²⁶² DÎA, “Ebbas”, DÎA, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 1988, c. 1, n.r. 16-17.

negihaştine roja me. Yehya el- Cubû 70 helbestên wî weke dîwan civandiye û bi navê *Dîwana Ebbasê Kurê Mirdas es Sulemî* çap kiriye. Ebbas ji pêxember çar hedîs rîwayet kirine. Tê zanîn ku di serdema xelîfetîya Hz. Omer de li Basrayê bi cih bûye, lê di hin çavkanîyan de tê gotin ku çûye Şamê.²⁶³ Ebbasê kurê Mirdas di *Cengnameya Huneynê* de weha derbas dibe:

Hewhewa 'Ebbas e
Ġayet pehlewana e
Ew kurê Mirdas e
'Elem ser milana e

(154)

Tebesum kir Resûlullah
Bi vê mizgîniyê şa bû
Du 'ayek kir Hebîbullah
Kurê Mirdas ku 'Ebas bû

(225)

'Ebas kurê Mirdas e
Wî gote Xalid Zubeyr
Dê em bikin sewaş e
Ji bo 'Eliyê Heyder
Nav l' me bibe pîroz e
Ger şa bikin pêgember

(241)

2.6.2.11. Se'd Kurê 'Ubade

Navê bavê wî Ubade û navê dîya wî jî Amre ye. Se'd kesekî xwende bûye ji ber vê yekê yek ji wan kesên kamil e. Se'd serokê şaxa Lawênsaîde yê qebîleya Hezrecê bûye. Yek ji wan misilmanên ewil yê Medîneyê ye. Beşdarî her du biâtên Akkabeyê bûye. Se'd piştî hicretê li dor pêxember bûye û wezîfeyên girîng anîye cih. Ji ber nexweşiyê beşdarî herba Bedrê nebûye wekî din beşdarî hemû herban bûye. Se'd

²⁶³ Mustafa Fayda, "Abbas b. Mirdas", *DÎA*, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 1988, c. 1, r. 27.

piştî ku bûye misilman tedarika xwarina artêşê kiriye. Se‘d yek ji wan sehabîyan ne ku pêxember girîngîyê daye gotina wî. Dema Hz. Muhemmed di herba Uhudê de birîndar bûye bi alîkarîya Se‘d vegerîyaye Medîne yê. Di serdema xelîfetîya Hz. Omer de ji Medîneyê veqetîyaye û çûye li Dimeşqê bi cih bûye. Di sala 635-636an de li Dimeşqê wefat kiriye.²⁶⁴ Di metna cengnameyê de wisa derbas dibe.

Ew Se‘dê ‘Ubad e

Re ‘îsê Medîne

Cubbe ji zêr sade

Ez dikim enîne

(123)

2.6.2.12. Se‘d Kurê Ebû Weqqas

Di sala 592yan de li Mekkê hatiye dinyayê. Derdora 17-19 salîya xwe bûye misilman. Ji ber ku dibe misilman dîya wî pê re xeber nedaye û jê re gotiye heta ji dînê xwe venegerî dê pê re xeber nede, lê Se‘d ji dînê xwe venegerîyaye. Se‘dê kurê Ebû Weqqas yek ji wan sehabîyan e ku bi cennetê hatiye mizgînkirin. Kesê ewil e ku ji bo Îslamê xwîn rijandîye. Berî Hz. Muhemmed (s.x.l.) hicretê Medîneyê kiriye, bi Hz. Muhemmed re beşdarî hemû şeran bûye. Di serdema Hz. Omer de di wezîfeyên çalak de cih girtiye. Hz. Omer berî wefata xwe tevî Se‘d şeş kesan ji bo xelîfetîyê pêşnîyaz kiriye. Li cepheya Iraqê bûye serfermendar. Di salên dawî yê jîyana wî de çavên wî kor bûne. Se‘d di navbera salên 675-578an de wefat kiriye.²⁶⁵ Di metna cengnameyê de Se‘d weha hatiye behskirin:

Kanê ‘Ebbas Ibnî Mirdas

Kan Zubeyr Ibnî ‘Ewwam

Kanê Qeys û Se‘dê Weqqas

Ev mirin cumle tamam

(310)

²⁶⁴ Mehmet Azimli, “Se‘d b. Ubade”, **DÎA**, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 2008, c. 35, n.r. 377-378.

²⁶⁵ İbrahim Hatipoğlu, “Se‘d b. Ebû Vakkas,” **DÎA**, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 2008, c. 35, n.r. 372- 374.

2.6.2.13. Ebû Sufyan

Ebû Sufyan di sala 565an de li Mekkê hatiye dinyayê. Ji ber ku di herba Bedirê de kurê wî dimire weke Ebû Hanzala jî hatiye naskirin. Navê dîya wî Safiyye bint Hazn el- Hilalîye û bavê wî jî Harb b. Ummeye ye. Ebû Sufyan weke bavê xwe bi bazirganîyê re mijûl bûye. Yek ji wan kesên Mekkê yê bûye ku xwendin û nivîsandina wî hebûye. Piştî ku Hz. Muhammed (s.x.l.) pêxemberîya xwe îlan kiriye weke piranîya pêşîyên qebîleya Qureyşîyan li dijî Îslamê sekinîye. Di herbên weke: Bedir, Uhud û Xendekê de li dijî misilmanan şer kiriye. Piştî ku Mekkeyî peymanê ku bi misilmanan re kirine xera dikin wî dişînin Medîneyê da ku peymanê nû bikin, lê kes guhdarî pê nake. Piştê li ser israra Ebbasê kurê Abdullmuttalîb tê cem pêxember û dibe misilman. Ebû Sufyan piştî ku dibe misilman beşdarî herba Huneynê bûye, lê dema ku dibîne misilman têk diçin kêfa wî hatiye. Li ser vê bûyerê Hz. Muhammed ji xenîmetên herba Huneynê 100 hêştir û 40 ûqîyeyên zîv dide wî. Ebû Sufyan beşdarî dorpêçkirina Taîfê jî bûye û di vê maweyê de çavekî wî kor bûye. Her çiqas di destpêkê de xelîfetîya Hz. Ebû bekir nepejirandibe jî paşê biatê wî kiriye. Tê gotin ku Ebû Sufyan katibîya pêxember kiriye û ji wî çend hedîs rîwayet kiriye. Ebû Sufyan di navbera salên 651-652yan de li Medîneyê wefat kiriye.²⁶⁶ Di metna cengnameyê de weha derbas dibe:

Fezl û Zubeyr Şufyan

Hatin bi ala`ê

Dunya hejya j' ne`ran

Selewat veda`ê

(156)

2.6.2.14. Ebû Sufyan el-Haşimî

Ebû Sufyan li Mekkê hatiye dinyayê û şîrbirayê pêxember e. Ji ber ku bi pêxember re hemsal e zarokatî û ciwanîya wan bi hev re derbas bûye. Piştî ku Hz. Muhammed (s.x.l.) pêxembertîya xwe îlan kiriye bûye neyarê Hz. Muhammed û nêzîkê 20 salan pê re xeber nedaye. Berî fetha Mekkê yê ew û Ebdullahê kurê Ebû Umeyye çûne Medîneyê û ji pêxember re gotine ku em dixwazin bibin misilman, lê ji

²⁶⁶ İrfan Aycan, "Ebû Sufyan," *DİA*, İstanbul 1994, c. 10, n.r. 230-232.

ber tevgerên wan yê berê pêxember ji wan şikestî bûye. Ji ber vê yekê Ummu Seleme ji pêxember rica kiriye li ser vê yekê pêxember wan efû kiriye. Di herba Huneynê de û di dorpêçkirina Taîfê de cih girtiye. Di herba Huneynê de ji cem pêxember veneqetîyaye û wî parastiye. Li ser vê yekê pêxember ji bo wî dia kiriye. Piştî ku pêxember wefat kiriye li ser wî mersîye nivîsîye. Ebû Sufyan di sala 641ê de li Medîneyê wefat kiriye. Di metna cengnameyê de weha derbas dibe:

Min dî 'Ebas şûr di destan

Kafirana cellad dikir

Çepê wî Şufyan sekinye

Kafirana pur xûn dikir

(211)

Kanê ew Muğdad û Xalid

Kan 'Emmar Şufyan kiram

Kanê ew pişt û penahê

'Eskerê te xaş û 'am

(311)

2.6.2.15. Qetadê Kurê Nu'man

Qetade di sala 579an de li derdora Medîneyê hatiye dinyayê, mensûbê qebîleya Ews e. Qetade di serdema hicretê de bûye misilman û beşdarî bîata duyem a Akabê bûye. Qetade di serî de şerên weke: Bedîr, Uhud, Xendek û beşdarî hemû şerên ku pêxember beşdar bûye. Di serdema fetha Mekkê de senceqa Benî Zafer wî hilgirtiye.²⁶⁷ Di metna cengnameyê de çavên Qetade kor dibim û ji pêxember rica dike ku ji Xwedê re dia bike da ku çavên wî baş bibin. Di pirtûka *Mektubatê* de jî bal kişandine ser vê bûyerê, lê li gor berhema navborî çavên Qetade di herba Uhudê de kor dibin. Di herba Uhudê de rimek li çavên Qetade dikeve û çavên wî ji cih derdikevin, Hz. Muhemmed (s.x.l.) bi destên xwe yê bi şifa çavên wî dixe cihê wî, çavên wî weke ku tiştêk pê nehatibin sax bûne.²⁶⁸ Her çiqas di metna cengnameyê de behsa herba Huneynê bike jî, em rastî hin bûyerên ku di herbên din de pêk hatine jî tên. Mucîzeyê başbûna çavên

²⁶⁷ Ali Toksarı, *Katade b. Nu'man*, **DİA**, Ankara 2002, c. 25, r. 24.

²⁶⁸ Bediüzzaman Said Nursi, **Mektubat**, Zehra Yayıncılık, İstanbul 2019, r. 189.

Qetade jî yek ji wan bûyerane ku ne di herba Huneynê de, lê di herba Uhudê de pêk hatibû. Helbestvan di nav berhema xwe ya ku behsa herba Huneynê dike de cih daye vê bûyerê jî. Di metna cengnameyê de Qetade weha derbas dibe:

Resûl got ya Qetadet

Çavê bibit şehîd e

Yeqîn ke qelbê sade

Xêra wî pur mezîd e

(264)

2.6.2.16. Enesê Kurê Malik

Enes deh salan (612) berî hicretê çê bûye û ji qebîleya Hezrecê ye. Ji ber ku deh salan xizmeta pêxember kiriye jê re weke: Xadimu'n-Nebî hatiye gotin. Bavê wî Malik b. Nadr ji ber ku jina wî dibe misilman aciz bûye û çûye Şamê. Dîya wî Ummu Suleym e. Dema ku Hz. Muhemmed (s.x.l.) koçî Medîneyê kiriye Enes 10 salî ye û zarokê biaqil û xwende bûye. Enes di bin terbiyeya pêxember de perwerde bûye. Bi pêxember re beşdarî: peymana Hudeybîye, Sefera Heyberê, Umretu'l-Qeza, Fetha Mekkê, Herba Huneynê, dorpeçkirina Taîfê û beşdarî heca xatirxwestinê bûye. Her çiqas di herba Bedîrê de zarok be jî ji cem pêxember veneqetîyaye. Enes piştî wefata pêxember di serdema Hz. Ebûbekir de weke tehsîldarê bacê çûye Bahreynê. Di serdema Hz. Omer de weke walîyê Basrayê hatiye tayînkirin. Enes ji sed salî zêdetir emir kiriye, li ser dîroka wefata wî li hevkirinek tune ye, Enes di navbera salên 711-714an de li Basrayê wefat kiriye.²⁶⁹ Di berhema Mela Yasînê Alikî de Enes weha derbas dibe:

Nagah hat ji wê da

Kurê Malik Enes

Birîndar xûnê da

Anceq dertê nefes

²⁶⁹ İbrahim Candan, "Enes b. Malik", **DİA**, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 1995, c. 11, n.r. 234-235.

Pêgember suwal kir

Şahê Merdan kanê

Enes hikayet kir

Go bikim beyanê

(230-231)

2.6.2.17. Şeybe Kurê Osman

Li Mekkê hatiye dinyayê. Bavê wî Osman b. Ebû Talha ye dîya wî jî Ummu Cemîl Hind bint Umeyr e. Piştî fetha Mekkê yê ji ber ku berê jî ew karê wan bû Hz. Muhemmed (s.x.l.) mifteya Ke‘bê dide Osman b. Talha û kurapê wî Şeybe b. Osman. Hz. Muhemmed piştî fetha Mekkê çûye ku bi qebîleya Hewazînê re şer bike. Her çiqas Şeybe nebûbe misilman jî ew jî tevlî şer dibe da ku alîkarî bide qebîleya Hewazîn û derfetekê bibîne û pêxember bikuje. Li gor ku Şeybe bi xwe neqil dike. Di herba Huneynê de maweya ku misilman terka Hz. Muhemmed dikin, Şeybe dike ku pêxemeber bikuje, lê Hz. Muhemmed bangî wî dike û destê xwe dide ser sînga wî û Şeybe dibe misilman. Şeybe di sala 679an de li Mekkê wefat kiriye.²⁷⁰ Di *Cengnameya Huneynê* de Şeybe wisa derbas dibe:

Ibnî Şeybe got tenê min

Dît Muhemed şahê dîn

Bab û ‘emmê min ‘Elî

Ĥemze ku kuştin bûye kîn

(209)

Gote min ya Ibnî Şeybe

Tu here cengê heman

Sem ‘e ta ‘e got û min

Fîlhal ji wî ez bûm rewan

(216)

²⁷⁰ Salih Karacabey, “Şeybe b. Osman”, *DİA*, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 2010, c. 39, r. 48.

2.6.2.18. Xalidê Kurê Welîd

Komandanekî bi nav û deng e, Hz. Muhemmed (s.x.l.) nasnavê “Seyfullah” daye wî. Dordora salên 583-587an de li Mekkê hatiye dinyayê. Bavê wî Welîd b. Mugîr e û kesekî girîng yê qebîleya Qureyşîyan bûye. Dîya wî Lubabe es-Sugra Esmâ bint Xarîs e. Xalid weke kesên di yê qebîleya Qureyşîyan bi bazirganîyê re mijûl bûye. Bi kerwanan re çûye welatên weke: Surî, Iraq, Medaîn, Misir û Yemenê. Di ciwanîya xwe de fêrî xwendin û nivîsandinê bûye û tê gotin ku yek ji wan katîbê pêxember bûye. Xalid di destpêke de neyartîyeke tund li hemberî misilmanan kiriye. Li hemberî misilmanan beşdarî şerên weke: Bedîr, Uhud û Xendekê bûye. Birayê wî jê re nameyek şandîye da ku bibe misilman, piştî xwendina nameyê biryar daye ku bibe misilman. Bi Osman b. Talha û Emr b. Es re çûye cem pêxember û bûye misilman. Xalid yekem car di herba Mûteyê de li alîyê misilmanan beşdarî şer bûye. Di herba Huneynê de birîndar bûye, lê birînen wî ne giran bûne. Piştî demekê tevî dorpêçkirina Taîfê bûye. Herba dawî ya ku di bin hikimdariya pêxember de pêk hatiye herba Tebûkê bûye û Welîd beşdarî vê herbê jî bûye. Piştî wefata pêxember Xalid beşdarî gelek herban bûye û serkeftinên baş bi dest xistiye. Gelek qebîle, mirov û dever bi saya wî tevî Îslamê bûne. Herwiha wî li dijî pêxemberên sexte û kesên ku nedixwestin zekatê bidin têkoşîn kiriye. Derheqê zarokên wî de agahîyên berfireh li ber destên me tune ne, lê tê gotin ku nêzîkî 40 zarokên wî ji ber nexweşîya webayê rehmet kirine. Di nav zarokên wî de yê herî navdar walîyê Humusê Ebdurrehman e. Xalid li Humusê di sala 642yan de wefat kiriye û qebra wî jî li wê derê ye.²⁷¹ Xalid herwiha weke Farîsê Îslamê jî tê zanîn ango Farîsê Îslamê leqaba wî ye. Di cengnameyê de Xalid hem bi vê leqeba xwe hem jî weke Xalid derbas dibe.

Hewhewa Xalid e

Hespê xo rikêb kir

L' kafîran şedîd e

'Esker şef bi şef kir

(153)

²⁷¹ Mustafa Fayda, “Halîd b. Velîd”, **DÎA**, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 1997, c. 15, n.r. 289-292.

Farisê Islamê
Zubeyrê 'Ewam e
Izin ji Imamê
Xwestî wî tamam e

(163)

2.6.2.19. Mîqdadê Kurê 'Ebdullah

Mîqdad bi cesareta xwe navdar bûye. Yek ji wan misilmanên ewil ê Medîneyê ye. Bi keça Zubeyr, bi Dubayê re zewicî ye. Beşdarî şerên weke Bedîr, Uhud, Xendek, Heyber û herbên din bûye. Mîqdad yek ji wan tîrkevanên pêxember bûye. Di herba Uhudê de bi Hz. Hemze re serleşkerîya alîyê sereke kiriye. Di herba Bedîrê de bi hespa xwe Sebha re beşdar bûye û di vê herbê de destê wî jê bûye. Tê gotin ku pêxember di herban de hem ji bo wî hem jî ji bo hespa wî xenîmet veqetandiye. Li ser mirina wî du rîwayet tê gotin. Tê gotin ku ji ber ku qelew e ji xulamê xwe xwestiye ku rûnên zikê wî derbixe û ji ber vê yekê rehmet kiriye. Rîwayeta din jî tê gotin ku wî rûnê giyakî bi navê xirwa vexwarîye û ji ber wê rehmet kiriye. Mîqdad li Cufê wefat dike cenazeyê wî anîne Medîneyê û li wir hatiye veşartin.²⁷²Mîqdad di metnê de weha derbas dibe:

Go ewa Muğdad e
Lawek 'Erebî ye
L' kafîran cellad e
Libsê wan sipî ye

(119)

Malik heman rikêb kir
Xwe l' 'eskerê Muğdad da
Du heb li wê şehîd kir
Cardin zivirîn paş da

(283)

²⁷² Mustafa Ertürk, "Mikdad b. Abdullah", **DİA**, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 2005, c. 30, n.r. 49-50.

2.6.2.20. Bilalê Hebeşî

Di sala 581ê de li Seratê an jî di nav qebîleya Cumahê de weke xulam hatiye dinyayê. Navê bavê wî Rebah e û navê dîya wî jî Hamame ye. Bilal xulamê Ummeye b. Xelef bûye û bi saya Hz. Ebûbekir bûye misilman ji ber ku bûye misilman rastî gelek zordestîyan hatiye. Xwediyê wî Ummeye b. Xelef di bin germahîya nîvro de latekî mezin danîye ser sînga wî û jê re gotiye “bawerî bi Lat û Uzza bîne”, lê Bilal gotiye “Rebbê min Ellah e”. Hz. Ebûbekir xulamekî bi hêztir ku ne misilman e daye Ummeye b. Xelef û Bilal azad kiriye. Bilal di sala yekem a Hicretê de azana ku pêxember fêrî wî kiriye xwendiyê, Bilal yekem muezînê pêxember e û di hemû jîyana xwe de muezîntîya pêxember kiriye. Bilal di serî de herba Bedirê û beşdarî hemû herbên pêxember bûye. Bilal li ser fermana pêxember derketiye ser banê Ka’beyê û azana fethê xwendiyê. Bilal di temamê jîyana xwe de ji pêxember qet veneqetîyaye û yek ji wan kesan e ku bi cennetê hatiye mizgînkirin. Li gor rîwayetan wî piştî wefata pêxember qet azan nexwendiyê. Bilalê Habeşî di 60 salîya xwe de li Dimeşqê wefat kiriye û li goristana Babûssagirê hatiye veşartin.²⁷³ Di berhema Mela Yasînê Alikî de Bilal weha derbas dibe:

Bilal Dundul kar kir

Pêgember suwar bû

Dema ku hemle kir

Melek lê ber hev bûn

‘Umer Ebûbekir

Wan ‘elem hilda bûn

(190)

2.6.2.21. Qeysê Kurê Se‘d

Ji qebîleya Hezrec e kurê Se‘d b. Ubad e, di zarokatîya xwe de ketiye bin xizmeta pêxember û deh salan xizmeta wî kiriye. Hz. Muhammed (s.x.l.) piştî ku jî herba Huneynê vegeîyaye Cî‘ranê, Qeys di serê 400 serîyyeyan de şandiye bi ser

²⁷³ Mustafa Fayda, “Bilalê Habeşî”, **DÎA**, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 1992, c. 6, n.r. 152-153.

qebîleya Suda'ê ve. Li ser vê yekê ji qebîleyê 15 kes hatine bûne misilman. Qeys beşdarî herba Qedîsyeyê û fetha Misirê bûye, piştî ku Hz. Elî dibe xelîfe bûye walîyê Misirê. Piştî ku ji Misirê vegeŕiyaye beşdarî bûyera Cemelê bûye. Her çiqas weke walî ji bo Azerbaycanê hatibe tayînkirin jî li cihê xwe Ebdullah b. Şebîl weke wekîl hiştiye û beşdarî şerê Siffinê bûye. Qeysê kurê Se'd paşê vegeŕiyaye Medîneyê û di sala 680yan de wefat kiriye.²⁷⁴Di *Cengnameya Huneynê* de weha derbas dibe:

Kanê 'Ebbas Ibnî Mirdas

Kan Zubeyr Ibnî 'Ewwam

Kanê Qeys û Se'dê Weqqaş

Ev mirin cumle temam

(310)

2.6.2.22. Eşter-Ejder

Navê wî Malik b. el- Harîs b. Abdîyegûs el- Eşter en- Nehaî ye. Her çiqas berî bî'setê hatibe dinê jî Hz. Pêxember nedîtîye. Nasîna Ejder bi herbên ku bi Bîzansê re hatiye kirin çêbûye. Ji ber ku di herba Yermûkê de çavekî wî kor bûye jê re Eşter hatiye gotin. Eşter qûmandarekî girîng ê Hz. Elî bûye. Di serdema xelîfetîya Hz. Elî de bîatê wî bûye û piştgirîya wî kiriye. Ji aliyê Mûawîye ve di sala 657an de hatiye jehrkirin. Hz. Elî leqaba "Seyfullah" ji bo wî gotiye. Di dewra xwe de katib û helbestvanekî hêja bûye.²⁷⁵

Malik Ejder her çiqas beşdarî şerê Huneynê nebûbe jî di metna cengnameya Alikê de em rastî navê wî jî tên. Di metnê de Malik Ejder weha derbas dibe.

'U&man 'Elî Heyder

Zubeyrê 'Ewam e

Muğdad Xalid Ejder

Hatin bit-temam e

(182)

²⁷⁴ Abdülhalik Bakır, Qeys b. Sa'd", **DİA**, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, Ankara 2002, c. 25, r. 93.

²⁷⁵ Abdülkerim Özaydın, "Eşter", **DİA**, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 1995, c. 11, r. 486-487.

2.6.3. Kesayetên ku Paşê Bûne Misilman

2.6.3.1. Malikê Kurê 'Ewf

Agahîyên derheqê jîyana wî ya berî herba Huneynê li ber destê me tune ne. Malik dema beşdarî şerê Huneynê dibe 30 salî bûye. Dema Hz. Muhemmed (s.x.l.) bi artêşeke mezin ji Medîneyê derketiye Malik texmîn kiriye ku dê bi ser wan de werin. Ji ber vê yekê Malik li Ewtasê artêşek ava kiriye û bi piştgirîya Seqîfûnîyan li hemberî misilmanan şer kirine. Lê li hemberî misilmanan têk çûne Malik jî ji ber vê yekê revîyaye çûye xwe spartîye kelehêkê piştî ji wir jî çûye Taîfê. Pêxember dema xenîmetên herba Huneynê ku li Ci'ranê ne, belav kiriye mal û malbata Malik maweyekî li cem Ummu Ebdullah bint Ebû Ummeye hiştiye û xeber ji Malik re şandîye û jê re gotiye ger ku bibe misilman dê mal û malbata wî ji bo wî were dayîn. Li ser vê yekê Malik bûye misilman û pêxember jî sozê ku dayê anîye cih û bi ser de jî sed heştir jî daye Malik. Malik piştî ku bûye misilman li hemberî Seqîfûnîyan ketiye têkoşînê, Seqîfûnê ji van seferan aciz bûne û di dawîyê de Seqîfûnî bi saya Malik bûne misilman. Malik di serdema Hz. Ebûbekir de beşdarî herba Qedîsîyeyê û fetha Sûrî bûye piştî li Dimeşqê bi cih bûye. Malik helbestvan bûye û hin beyt bi alîyê wî vê hatine nîsbetkirin. Tê rîwayetkirin ku di sala 641an de li Dimeşqê wefat kiriye.²⁷⁶ Di cengnameyê de Malik weha derbas dibe:

Malik Binê 'E[w]f bû

'Esker lê berhev bû

Bi zirna û def bû

Bi kîn û hem gef bû

Malik çû sera 'ê

Xweş tertîbek da 'ê

Ji bona şefa 'ê

'Esker hat geha 'ê (28-29)

²⁷⁶ Mustafa Sabri Küçükaşçı, "Malik b. Evf", **DİA**, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, Ankara 2003, c. 27, n.r. 504-505.

Malik ahîn rada
Kulma l' singê xo da
'Eqlê wî bû şeyda
Bihna xo girt berda

(45)

2.6.3.2. 'Urweyê Kurê Mes'ud

Bavê wî yek ji wan fermanarên herba Ficarê bûye û ji qebîleya Seqîfê bûye. Dîya wî Subey e û ji qebîleya Qureyşîyan bûye. Bi keça Ebû Sufyan bi Amîne re zewicîye hevlingê pêxember bûye. 'Urwe yek ji wan reîsên qebîleya Seqîfîyan bûye û li Mekkê jî baş hatiye naskirin. Têkîliya pêxember û 'Urwe cara ewil di peymanê Hudeybîyê de çêbûye. 'Urwe weke elçiyê mişrîkan hatiye cem pêxember. 'Urwe ji bo fêrî çêkirina menceniqê bibe çûye Yemenê da ku di dorpêçkirina Taîfê de li hemberî misilmanan bi kar bîne. Piştî ku pêxember dorpêçkirina Taîfê rakirîye û vegeyîyaye Medîneyê 'Urwe jî hatiye gihaştîye wî û bûye misilman. 'Urwe ji pêxember destûr xwestîye ku biçê Taîfê û qebîleya xwe dawetî Îslamê bike. Lê pêxember jê re gotîye dê te bikujin û destûr nedayê. Lê 'Urwe gotîye endamên qebîleyan min ji min hez dikin li ser vê yekê pêxember destûrê didê ku vegere Taîfê. Dema 'Urwe vedigere Taîfê ji kesên ku serdana wî dikin re behsa misilmanbûna xwe kirîye, lê li wî guhdar nekîrîne. Roja din 'Urwe serê sibehê derketîye ser banê xanîyê xwe û azan xwendîye. Ji ber xwendina wî ya azanê xelk aciz bûne û wî bi tîrê birîndar kirîne. 'Urwe kesê ku wî birîndar kirîye efû kirîye û ew jî mirîye. Hz. Muhemmed li ber mirîna wî ketîye.²⁷⁷

Her çiqas 'Urwe piştî herbê demek şûnde bûbe misilman jî di metna cengnameyê de ev yek piştî herbê di dopêçkirina Taîfê de weke ku pêk hatibe hatiye neqilkirin. 'Urwe û Malik tevî qebîleyên xwe piştî herbê dibin misilman. Di metnê de 'Urwe wisa derbas dibe:

Malik got ey 'Emra
Jin û zaran hev ra

²⁷⁷ Habil Nazlıgöl, "Urwe b. Mes'ud", *DİA*, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 2021, c. 42, r. 183.

*Em biherin xo ra
Kes nereve j' pa ra*

(51)

Di çavkanîyan de ev kesayet 'Urwe b. Mes'ud e, lê di Cengnameyê de weke 'Emra hatiye nivîsîn.

*Hem 'Urwe bû musulman
Digel qewmê xo carek
Teslîm kirin malê wan
Paşva kirin tedarek*

(368)

2.6.4. Kesayetên ku Nebûne Misilman

2.6.4.1. Nacî

Derheqê vî kesayetî de ti agahî li ber destê me nînîn, lê li gor ku di metna cengnameyê de derbas dibe Nacî xulamê Malik e. Di metna cengnameyê de weha derbas dibe:

*Nacî çav dûrbîn e
Du roj rê dibîne
Gote Malik b' kîn e
Min got nebêj dîn e*

(111)

*Nacî kir hewar e
Min dî komek 'esker
Na'ête hejmar e
Li dora pêgember*

(133)

2.6.4.2. Sebî'eyd

Di çavkanîyan de agahîyên deheqê wî de zêde nînîn tenê di pirtûka *Türk Edebiyatında Hz. Ali Cenknameleri* de weke Sebeyî' derbas dibe û zavê Dureyd e²⁷⁸ b. Es-Simme el- Cuşemî ye. Di metna cengnamayê de wekî Sebî', Sebî'eyd û Sebî'ed derbas dibe. Di herba Huneynê de li hemberî misilmanan şer kiriye, li gor ku di metna cengnameyê de derbas dibe gelek misilman kuştine. Di dawîyê de ji alîyê Hz. Elî ve hatiye kuştin. Di metna cengnameyê de Sebî'eyd weha hatiye qalkirin.

Pehlewanek wan hebû

Digotinê Sebî'eyd

Heman cihê xo rabû

Ez im wana bikim qeyd

(285)

Sekinê ew Sebî'eyd

Muqabilê Islamê

Gazî kir ya Muhemmed

Pehlewanê te kanê

(309)

2.7. MOTÎFÊN SEREKE YÊN DI CENGNAMEYÊ DE

2.7.2. Unsûrên Dînî

2.7.2.1. Unsûrên Îslamî

Îtîqad di ferhengê de tê maneya, girêdana bi tiştêkî, bawerî, bawerîya ji dil.²⁷⁹ Esasên îtîqadê xwe dispêrin ahagîyên teqez û ev esas naguherin. Îtîqad bawerîya bi Xwedê, bi pêxemberan, bi pirtûkên pîroz, bi melekan, bi qeza û qederê, bi axiret û bawerîya û bi xêr û şerran e ku hemû ji Xwedê ne.²⁸⁰

²⁷⁸ Çetin, 1997, r. 298.

²⁷⁹ Develioğlu, 2017, r. 538.

²⁸⁰ Çetin, 1997, r. 328.

2.7.2.1.1. Bawerîya bi Xwedê

Cengnameyê Hz. Elî ew metn in ku behsa cengên misilman û xeyrîmisilmanan dîkin. Ev metn ji ber ku ji bo teblîxkirina dînê Îslamê hatine nivîsîn bi zimanekî sade hatine nivîsîn da ku gel ji wan fêhm bike. Armanca wan ji ber ku teblîxkirina dînê Îslamê ye em tê de rastî bawerîyeke xurt ya ji bo Xwedê tên. Di cengnameya Mela Yasînê Alikî de jî em vê yekê dibînin. Xwedê bi nav û sifetên xwe gelek caran di *Cengnameya Huneynê* de cih girtiye. Di cengnameyê de Xwedê bi nav û sifetên xwe weha derbas dibe: Heq, Xaliq, Henan, Mennan, Rehîm, Rehman, Settar, Padîşah, Ğeffûr, Xudawend, Xuda, Xaliq, Celîl, Ellah, Girdigar, Ekber, Ellah Ekber, Ya Reb, La-yenam, Muste‘an, Heq Te‘al, La-Yezal, Barî, Zûl-Celal, Ilahî û Ğeffar.

*Lewra ew **H**enan e*

***H**ennan û **M**ennan e*

***R**ehîm û **R**ehman e*

***Ĝ**effûrê zenban e*

***Ĝ**effûr û **Ĝ**effar î*

***R**ehîm û **S**ettar î*

*Mudam tu **h**îşyar î*

***X**udawend û **m**ar î*

(11-12)

*Bi emrê **C**elîl e*

*Nazil bû **C**ebrîl e*

*Hate cem **X**elîl e*

Bi se‘y û te‘cîl e

(55)

Guh bidin wan mu‘cizatê

*Wî Resûlê **Z**u‘l-celal*

Ev dibe carî ji tilyan

*Hem bi emrê **L**a-Yezal*

(268)

2.7.2.1.2. Melek

Ferîşteh, melek ji nûrê hatine afirandin û bêzayend in. Naxwin, venaxwin û ranakevin. Rewşa wan naşibe ti afirdeyên din. Ji pêkanîna fermanên îlhahî mesûl in. Her tim di nav tesbîh û zikrê de ne. Di nav melekan de çar melekên mezin hene: Cebraîl, Mikaîl, Îsrafil û Azraîl. Metna *Cengnameya Huneynê* ji ber ku behsa herbeke dînî dike di nav de melek jî derbas dibin. Di metnê de ji bo melekan ev nav derbas dibin: Cebraîl, melek.

Musulmanan hem melek

Ellah Ellah wan gotin

Hucûm dan wan bi carek

Wana kafir raxistin

(356)

Cebraîl

Cebraîl yek ji wan çar melekên mezin e. Di çavkanîyên Yahûdî û Xiristîyanan de weke Gabrîel derbas dibe. Cebraîl melekê wahîyê ye, emrên Xwedê ji pêxember re tîne. Di Erebi de jê re weke: Cebraîl, Cebreîl, Cebrîl, Cibrîn û Cibrîl jî hatiye gotin. Tê gotin di dirûvê insanan de xwe nîşanî pêxember daye. Tê gotin ku Cebraîl di navbera dinya û axîretê de elçiyê Xwedê û evdan e.²⁸¹

Di cengnameyê de jî Cebraîl gelek caran derdikeve hemberî me, Cebraîl di vê metnê de alîkarî daye artêşa misilmanan û tertîb daye wan. Di cengnameyê de Cebraîl weha derbas dibe:

Pêgember melûl bû

J' revîna Islamê

***Cebraîl** nazil bû*

Xuda kir selamê

(179)

²⁸¹ Yusuf Şevki Yavuz & Zeki Ünal, “Cebraîl”, **DİA**, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 1993, c. 7, n.r. 202-204.

*Rawîyî got **Cebra'îl**
Hatiye cem Imam e
Selam kiriye Celîl
Hâzîr bin hûn tamam e*

(273)

***Cebrîl** gote pêgember
Şê hezar û sê şed car
'Elî got Ellah Ekber
Wek wî kafîr anî xar*

(275)

2.7.2.1.3. Pirtûkên Pîroz

Qur'an yek ji wan pirtûkên pîroz yên dînê semawî ye û ji bo misilmanan xwedî cihekî taybet e. Metnên cengnameyan ji ber ku behsa herbên misilman û ne misilmanan dikin, gelek caran behsa Qur'ana pîroz jî kirine. Di *Cengnameya Huneynê* de jî em rastî hikmê Qur'anê tên û bawerîyeke xurt ligel Qur'anê di cengnameyê de heye. Di *Cengnameya Huneynê* de Qur'an weha derbas dibe:

*Ne heb qûmandar in
Serdarê cinan in
Bi zîkr û **Qur'an** in
Meşgûlê dersan in*

(85)

*Zubeyr got ey kafîr
Qebûl ke îmanê
Yan jî bibe hâzîr
Qeş meke dewranê
Dê tu biçî agir
Bi hukmê **Qur'anê***

(167)

Xemr û 'esel û şîr in
Xuda gotye d' Qur'anê
Kewa 'ib û Etrab in
Ew hûrîyê Cînanê

(294)

2.7.2.1.4. Pêxember

2.7.2.1.4.1. Hz. Muhammed (s.x.l.)

Hz. Muhammed di sala 571ê de li Mekkeyê hatiye dinyayê, navê bavê wî Ebdullah e û navê dîya wî jî Amîne ye. Navê kalê wî Ebdulmutalîb e. Ji ber ku ji nesla Hz. Îbrahîm e jê re weke Îsmailî jî hatiye gotin. Di 25 salîya xwe de bi Hz. Hatîce re zewicîye û ji vê zewacê heft zarokên wî çêbûne. Hz. Muhammed di 40 salîya xwe de di sala 610an de bûye pêxember û dest bi belavkirina dînê Îslamê kiriye. Hz. Muhammed ji bo belavkirina Îslamê beşdarî şerên weke: Bedir, Uhud, Zatu'r-Rika, Benî Nadîr, Xendek, Qureyza, Benî Mustalîq, Heyber, Mute, Fetha Mekkê, Huneyn û Tebuk bûye. Hz. Muhammed di sala 632yan de li Medîneyê wefat kiriye.²⁸²

Bûyera ku di cengnameyê de derbas dibe li dor Hz. Muhammed hatiye hûnandin ji ber vê yekê di gelek cihan de nav û sîfatên ku ji bo Hz. Muhammed hatine gotin derbas dibin. Nav û sîfatên ku ji bo Hz. Muhammed hatine gotin ev in: Muhammed, Muhammed Mustafa, Ehmed, Pêxemberê Nûranî, Xalis Nûra Ekber, Nebî, Babê Fatma'ê, Nebîyê Serwer, Xetm'ul-Murselîn, Resûlê Kibirya, Şahê Cihan, Fexru'l-Umem, Fexrê 'Alem, Hezretê Resûl, Resûlellah, Resûlê Girdigar, Pêgember, Resûlê Zûl-Celal, Resûlê Ins û Can, Hebîbûllah, Resûlê Nûranî û Resûlê Heq.

Muhammed Muştefa

'Esker kir bi şefa

Dîtin cewr û cefa

Çaryarê pur-wefa

(21)

²⁸² Mustafa Fayda, "Hz. Muhammed", **DİA**, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 2005, c. 30, n.r. 408-423.

*Navê wî **Muḥemmed***
Eşlen ji Mekke`ê
Şewatan bê hed
*Li **Babê Faḩma`ê***

(128)

Rawiyî got Ibnî Mirdas
*Hate cem **Fexru`l-umem***
*Jê suwal kir **Fexrê`Alem***
Kanê ew ru`yet`elem

(221)

2.7.2.1.4.2. Hz. Nuh

Hz. Nûh kurê Lamek û Kaynûş e, Lamek kurê Metûşalih e û ew jî kurê Îdrîs e. Piştî Hz. Îdrîs bawerîya di nav gel de kêmbûye û bawerîya bi pûtan zêdetir bûye. Di nav qebîleya Hz. Nûh de kesên ku bawerîya xwe bi pûtan dianîn her ku çûye zêdetir bûye. Lê malbata Hz. Nûh bawerîya xwe her bi Xwedê anîye. Hz. Nûh di ciwanîya xwe de bi şivantîyê re mijûl bûye. Di pêncî salîya xwe de bûye pêxember û dest bi îrşadê kiriye. Hz. Nûh 450 salan xelkê vexwendî îmanê kiriye. Piştî dest bi çêkirina keştîyekî kiriye û li ser fermana Xwedê ji her ajelê cotek xistiye keştîyê. Tevî Hz. Nûh di keştîyê de bi tevahî 80 mirov cih girtine. Hz. Nûh cara dawî çûye qewmê xwe vexwendî îmanê kiriye, lê kes bawerî pê neanîye, piştî av bilind bûye û tofan dest pê kiriye. Piştî ku tofan xelas bûye ji keştîyê peya bûne. Pêxemberîya Hz. Nûh 950 salan domîyaye û demeke dirêj piştî tofanê jî jîyaye.²⁸³ Di cengnameyê de Hz. Nûh weha derbas dibe:

*Çiqasa tû bikî dewran bi`umrê **Nûh** bi pey behrê*

Axir dê em bikin riḩlet biborî tu ji dunya`ê

(3)

²⁸³ **Peygamberler Tarîh Ansiklopedisi-1**, (Koma Amd. Türkiye Gazetesi Yayınları Ansiklopedi Grubu) Türkiye Gazetesi Yayınları, İstanbul 2004, n.r. 71-138.

2.7.2.1.5. Bawerîya Bi Axiretê

Di dînê Îslamê de bawerîya bi jîyana piştî mirinê heye. Li gor dînê Îslamê piştî pêk hatina qiyametê dê mirov li mehşerê berhev bibin û li gor kiryarên xwe dê biçine bihuşt û dogehê. Piştî mehşerê jîyaneke bêdawî dê ji bo mirovan dest pê bike. Di metna *Cengnameya Huneynê* de jî em rastî bawerîya axiretê tên. Di metnê de bawerîya bi axiretê weha derbas dibe:

Hemû dê fena bin

Paşê dîsa rabin

Muhtacê Xuda bin

Li heşrê berhev bin

Wê herne dîwanê

Paş wezna mîzanê

Şa bin bi ihsanê

Li ehlê îmanê

(16-17)

*Ez **bimirim** ya ‘Elî*

Halê min wê çewan be

Gote wî Şahê Welî

*Dê **cehnem û ‘ezab be***

*Lê tu **bimirî** ‘eceb*

Çewan be wê halê te

Gote wî Şahê ‘Ereb

*Xuda hez ke **Cennet e***

(333-334)

2.7.2.1.6. Îbadet

Nimêj

Şeva ku Hz. Muhemmed (s.x.l.) çûye Mîracê, ew şev rojê pênc wextan nimêj li ser misilmanan ferz bûye. Di dînê Îslamê de nimêj yek ji wan îbadetê herî girîng e. Di metna *Cengnameya Huneynê* de jî nimêj weha derbas dibe: Hz. Elî ji bo ku pêxember nimêj bike diçe avê û li wir bi kafiran re şer dike:

Pêgemberê mêj ke
Jê ra bînin av e
Wî hilda yek meşk e
Em çûn gav bi gav e
...
Ber bi qiblê mêj kir
Du'a bû tamam e
Meşka avê rakir
Me j' Wî kir qiyam e

(233-235)

2.7.2.1.7. Ayet û Hedîs

Ayet di ferhengê de tê maneya her hevokek ji Qur'anê.²⁸⁴ Em di metna cengnameyê de jî rastî van ayetan tîn:

Ayet

Bi zahir "ehsenê teqwîm"
Dihatne nava meclisa
Me nefsa xwe dikir teslîm
Di baîtin xab û hem desa

(4)

²⁸⁴ Develioğlu, 2017, r. 61.

Sûreya Tînê, ayeta 4em. Ayeta “أَحْسَنَ تَقْوِيمٍ” û me‘neya wê wiha ye: “Me mirov bi awayê herî xweşik xuliqand.”

Ewwil bismillahî

Elhemdulillahî

La`iq Padişah î

Bê mesken û cah î

(11)

Leqed neşerekûmû Ellahû fi mewâtine kesîreten we yewme huneynin iz e‘cebetkum kesretukum.

Sûreya Tewbe 9/2. Lê ayet bi tamamî nehatiye dayîn. Tevahîya ayetê û maneya ayetê weha ye: “لَقَدْ نَصَرَكُمُ اللَّهُ فِي مَوَاطِنَ كَثِيرَةٍ وَيَوْمَ حُنَيْنٍ إِذْ أَعْجَبَتْكُمْ كَثْرَتُكُمْ فَلَمْ تُغِنِ عَنْكُمْ شَيْئاً وَضَاقَتْ” “Sond be, Xwedê di gelek cihan de alîkarîya we kir. Roja Huneynê jî (alîkarîya we kir): wê dema piranîya we hûn germ kirin, vêca piranîya we tu feyde negihande we û tu tişt ji we neda paş. Erd digel firehîya xwe jî li we teng bû û paşê we pişta xwe da şer û hûn revîyan”.

Hûn werin ya ehlê Qur`an

Hamilê sirr`ul-Beqer

Bizvirin ya ehlê `urfan

Bayi`ê tehtê şecer

(195)

Sûreya Fethê ayeta 18an e. Ayet û me‘neya wê weha ye: “يُبَايِعُونَكَ تَحْتَ الشَّجَرَةِ” “Ew kesên ku di bin darê de biat kirine.”

Sûreya Yasînê ayeta 56an. Ayet û me‘naya wê weha ye: “*hum we ezwacuhum fi zîlalîn ‘ele`l-e`ra`iki mutteki`un*” “هُمُ وَأَزْوَاجُهُمْ فِي ظِلَالٍ عَلَى الْأَرَائِكِ مُتَّكِرُونَ” Ew jinên ku di binê sîyan de li ser textan paldayî ne.

Hedîs

Hedîs jî tê maneya gotinên pîroz yê pêxember û herwiha ilmê ku behsa hedîsan dike. Di *Cengnameya Huneynê* de ev Hedîs derbas dibin:

*“La feta îlla ‘Elî
La şeyfe îlla Zulfeqar”*
Nabî wek wî şeca‘et
Ne kesekûn wek Zulfeqar

(350)

Hedîs û maneya wê: “لا فتى الا على لا سيف الا ذوالفقار”. “Weke ‘Elî egît û weke Zulfeqar jî şûr tune ye.”

Hedîs û me‘neya wê: *We qale’l-Nebî: “Ena medînetul’l-‘ilm we ‘Elîyyun babuha.* “أنا مدينة العلم و عليّ بابها”. Ez bajarê ilmê me, Elî jî derîyê wê ye. Lê hedîs bi awayekî kêr hatiye nivîsîn û dewama wê jî heye.

2.7.2.2. Unsûrên Bawerîyên Din

Di cengnameyê de ji ber ku behsa belavbûna dînê Îslamê dike em rastî bawerîyên berî Îslamê jî tên, wekî Pûtperestî. Berî herba Huneynê qebîleyên Hewazînê û Seqîfûnê bawerî bi pûtan dianîn û em hêmayên vê bawerîyê di destpêka metna cengnameyê de jî dibînin, weke:

*Xweş-kalek zana î
‘Arif û dana î
Pût-latan tu da’ î
Beyan ke de ‘wa’ê*

(37)

*Bi **pût û latan** kim
Serê ‘Elî jê kim
Muhemmed ber pê kim
Şugulê wan çêkim*

(47)

2.7.3. Unsûrên Menqibewî

2.7.3.1. Mu‘cîze

Mu‘cîze ew tiştê harîqulade ne ku ji aliyê Xwedê ve ji bo pêxemberan hatiye dayîn da ku dewaya xwe pê tesdîq bikin.²⁸⁵ Mu‘cîze elemetên pêxembertîyê ne û ji aliyê Xwedê ve ji bo ew kesê ku dê bibe pêxember tê dayîn. Di *Cengnameya Huneynê* de jî em rastî mu‘cîzeyên cenabê pêxember tîn. Di cengnameyê de Hz. Muhemmed ji eshabîyan qabeke avê dixwaze û dema Hz. Muhemmed destê xwe dixe nava qabê ji pênc tilyên wî pênc kanîyên avê derdikevin.

Di maweya şer de Hz. Elî birîndar dibe û bi saya tûka pêxember Hz. Elî baş dibe. Herwiha dîsa ensarîyek di maweya herbê de kor dibe û tê cem Hz. Muhemmed ku çavên wî dîsa baş bibin. Hz. Muhemmed hinek ax û tûka xwe li çavên wî dixe û çavên wî baş dibin. Herwiha piştî ku Hz. Elî Sebî‘ed dikuje Hz. Muhemmed çengek xwelî bi ser aliyê dijmin ve dike û dijmin bi vî awayî têk diçin. Çend mînak ji mu‘cîzeyên pêxember ku di metna *Cengnameya Huneynê* de derbas dibin, weha ne:

Wana lez li pan kir

Filhal wana meşk anî

Resûl qabek daxaz kir

Destê xwe nav da danî

Eşhaban av l' desta kir

Tilyan kişya pênc kanî

Şirîn şar e wek bûzê

Emir dane ‘eskerî

(258-259)

Pêgember dest hilanî

Danî devê mubarek

²⁸⁵ İsmâil İbn Yusuf Nebhani, **Peygamber Efendimizin Mûcizleri 1**, Milli Gazate Yayınları, İstanbul 1997, r. 19.

*Li birînê şah danî
Şağ bûn birîn bi carek*

*Nagah yekî enşarî
Ji wê de hat bi zarî
Çavê yekî enşarî
Rijyabû hatbû xarî*

*Gote Resûl bi zarî
Du 'a bike ji Barî
Çavê min şubhê berê
Cardin bibe diyarî*

*Resûl got ya Qetadet
Çavê bibit şehîd e
Yeqîn ke qelbê sade
Xêra wî pur mezîd e*

*Şedeq weye dibêjê
Ez 'aşiq im ji mêjê
Qîz-apa min 'Ezîzê
Dişirsim nebe razî*

*Pêgemberê nûranî
Xweş xweş halê wî kenî
Hindek xwelî hılanî
Tûka mu 'cuz weranî*

*Şûna çavê wî danî
Du 'a kir wî nihanî*

*Ji mu 'cizê wî Xanî
J' ewwil çêtir bû ronî*

(261-267)

2.7.3.2. Dirûvguherîn

Çi di menqibeyên dînî de, çi jî di yên wekî din de em rastî dirûvguherînan tên. Ew kesê ku dirûv diguherîne bi awayekî tevî nava bûyerê dibe û dibe honakekî bûyerê. Hin caran lehengê çîrokê dikeve dirûvê ajelan, pîremêr an jî pîrejînan û bi awayî rola xwe ya di çîrokê de pêk tîne. Di cengnameyê de dirûvguherîn bi vî awayî derdikeve pêşberî me:

*Yek hatî ji der da
Di şiklê kalan da
Darek di destan da
Go gelî ewlada*

*Ji Mekke'ê tême
Deh roj e li rê me
Dilê min xûn kême
Bi şîn û girî me*

(33-34)

*Kalê 'Ezazîl bû
'Ekrût û xebîs bû
Muzawer telbîs bû
Tu nabê Iblîs bû*

(43)

*Pêgember rewan bû
L' ejdiha numa bû
Ew ji ber va rabû
Ser boçkê qiyam bû*

*Filhal da cewab e
Herroj bîn şelwat be
Ji heq ew hida be
Li ser zatê pak be*

*Ewwel bibe agah
Ew e yek Padişah
Tû' î Resûlellah
Em in 'ibadullah*

*Neh hezar cinî ne
Îman b' te anîne
Xuda yek zanîne
L' filan cezîrê ne*

*Ne heb qûmandar in
Serdarê cinan in
Bi zîkr û Qur'an in
Meşgûlê dersan in*

(81-84)

2.7.3.3.Sihr

Sêr, efsûn. Sêr pêkanîn rewşên derasayî ne. Di edebîyata klasîk de sêr yar bi xwe ye.²⁸⁶Di metna cengnameyê de jî em rastî vê hêmayê tîn. Di bawerîya Îslamê de sêr heram e, ji ber vê yekê di nav misilmanan de nayê pejirandin. Di metna cengnameyê de melek û cin tîn alîkarîya misilmanan ji ber vê yekê Malik vê rewşa alîkarîyê weke sihrê dibîne. Dibêje dixwazin bi vî awayî me bitirsînin. Di metnê de sihr weha derbas dibe:

²⁸⁶ İskender Pala, **Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü**, Kapı Yayınları, İstanbul 2007, r. 404.

*Malik gote qûl da
Ewana tev **sihr** in
Sihrê dikin peyda
Da me biñirsînin*

(143)

*Mu 'cizatê Muştefa ye
'Eliyê Heyder Kerrar
Bil- 'umûm fe 'lê di **sihrê**
Wî beçal kir b' zulfeqar*

(352)

2.7.4. Usûrên Efsanewî

2.7.4.1. Hûrî

Li gorî ku tê gotin hûrî keçikên xweşik yên cennetê ne. Di edebîyata klasîk de ji bo yarê hatiye gotin, helbestvan ji bo ku delalîya yara xwe bide teswîrkirin bêjeya hûrî bi kar tîne. Carinan bêyî şibandîne rasterast ji bo yarê hatiye gotin.²⁸⁷ Di cengnameyê de hûrî weke unsûreke teşwîkkirina şer hatiye bikaranîn. Hûrî weke dîyarîyê ew kesê ku ji bo dîne xwe şehîd bikeve hatiye dayîn, dema ew kes li herbê şehîd dikeve hûrî tèn wî hambêz dikin. Carinan eshabî ji pêxember hûrî û qesrek ji cennetê dixwazin û diçin dikevin şer û şehîd dibin. Ev yek di *Cengnameya Huneynê* de weha derbas dibe:

*Ĥazir bin tamamê
Xuda Cennet vekir
Ĥûrî tev xemilîn
J' wur da wan nezer kir*

***Ĥûrî** hatne xarê
Ji bona şehîdan*

²⁸⁷ Gencay Zavotçu, *Klasik Türk Edebiyatı Sözlüğü*, Umuttepe Yayınları, İzmir 2018, r. 324.; İskender Pala, *Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü*, Kapı Yayınları, İstanbul 2007, r. 212.

Rûh bikin îsarê
Qetil kin pelîdan

(149-150)

2.7.4.2.Şeytan

Bi navên weke Ehrem, Ehrîme, Ehrîmen, Ehramen û Îblîs tê nasîn. Ji ber ku pozbilindî kiriye ji alîyê Xwedê ve hatiye naletkirin. Berê melek bûye û navê wî Haris bûye, lê ji ber ku ji Âdem re secde nekiriye hatiye qewirandin. Li ser vê yekê Şeytan lavayî li Xwedê dike ku wî heta qiyametê bihêle da ku xeynî evdê Xwedê yê qenc hemû evdê wî ji rê derbixe.²⁸⁸ Di metna *Cengnameya Huneynê* de jî em rastî hêmaya Şeytan tên. Di cengnameyê de Şeytan dikeve dirûvekî mirovekî kal û tê nav eskerên Hewazîn û Seqîfûnê û gilî û gazinan li wan dike ku pêxember pûtên wan yên li Ke‘beyê şikandiye û divê ew tola wan hilbidin. Herwiha di maweya şer de tê di nav misilmanan de dibêje ku Hz. Muhemmed hatiye kuştin. Li ser vê gotina Şeytan eskerên misilman belav dibin û kêmkes li derdora Hz. Muhemmed dimînin. Di metnê de Şeytan weha derbas dibe:

Kalê ‘Ezazîl bû
‘Ekrût û xebîs bû
Muzawer telbîs bû
Tu nabê Iblîs bû

(43)

Dengek bû ‘eyan e
Ew deng ji şeytanê
Seh kir eşhaban e
Hatne ber îmanê
Wî got bi efğan e
Way Muħemed kanê

²⁸⁸ Zavotçu 2018, r. 670.; Pala, 2007, r. 431.

*Muḥemed şehîd bû
Gazî kir **mel'ûn** e
Islam nabadîd bû
Kafir bûn dev-xûn e
Dest li wana sar bû
Revîne çiya ne*

(175-176)

2.7.4.3. Cin

Cin bi çav nayên dîtin û afirdeyên letîf in. Cin hebûnên giyanîne û ji agir hatine afirandin. Ew jî weke mirovan ji bo ku evdîtîyê ji Xwedê re bikin hatine wezîfedarkirin. Di nav cinan de jî cinên misilman û Kafîr hene, herwiha cinên baş û xerab jî hene.²⁸⁹ Di metna cengnameyê de cin bi awayekî baş derdikevin hemberî me. Cin ji bo alîkarîya misilmanan bikin dirûv diguherînin û tèn hewara misilmanan. Di metnê de cin weha derbas dibin:

*Go heçî Islam e
Qetlam lê heram e
Serdarê **cina** me
Ez dikim i'lam e*

(78)

*Neh hezar **cinî** ne
Îman b' te anîne
Xuda yek zanîne
L' filan cezîrê ne*

*Ne heb qûmandar in
Serdarê **cinan** in
Bi zîkr û Qur'an in
Meşgûlê dersan in*

²⁸⁹ Pala, 2007, r. 92.

Cewab da me dêwek
Malik kir tedarek
Top kir çil hezarek
Diçe ser mubarek

Cinan ku bihîstin
Ji hev du ra gotin
Musulman ku bêtin
Em jî dê biçitin

(84-87)

2.7.4.4. Ejderha

Marê mezin, heyvaneke tirsnak û xeyalî ye.²⁹⁰ Li gor bawerîyekê mar e û bi ecela xwe namire, teqez bi destê hinekan hatiye kuştin. Marên ku sedsal dijîn dibine ejderha. Mar piştî ku dibin ejderha agir ji devê wan derdikeve û bi nefesa xwe hemû mexlûqatan talan dikin.²⁹¹ Di metna *Cengnameya Huneynê* de jî ejderha derbas dibin, lê ne weke unsûreke xerab. Di metnê de ejderha bi eslên xwe cin in û ketine dirûvê ejderhayan û hatine alîkarîya artêşa misilmanan. Di metna cengnameyê de ejderha weha derbas dibin:

El-qişşe çû rê da
Bi deşt û qûmê da
***Ejdêhak** bû peyda*
‘Esker revî paş da

‘Esker kir firar e
Bû gazî hewar e

²⁹⁰ Develioğlu, 2017, r. 240.

²⁹¹ Pala, 2007, r. 136.

Ejdihak gedar e
Agir j' dev dibare

(72-73)

Ejdihak me diye
Newal kir teji ye
Carek hû kiriye
Çiya lerîziye

(75)

2.7.4.5. Dêw

Dêw peyveke Hîndo-Îranî ye. Dêw ew afirdeyên ku di şiklê mirovan de ne û mirovan dixwin, ew hebûnên pir mezin in ku sisê, heft an jî duwazdeh serî ne û rengên wan reş û zer in.²⁹²Di cengnameya Mela Yasînê Alikî de dêw weha derbas dibin:

Mirîdê şeytan in
'Elem ser milan in
Her yek wek dêwan in
Bi şûr û merçal in

(27)

Cin û dêw û hem melek
Ketne nava kafîran
Bû roja qiyametê
'Erd hatiye hejyanê
Toz bi 'esmanan ketê
Serî hol bûn l' meydanê

(281)

Qed û qamet burca nûrê
Dêw dibin jê sehminak

²⁹² Bahaeddin Ögel, **Türk Mitolojisi II**, Türk Tarih Kurumu Yayınları, Ankara 2002, r. 561.

*Deng weke re 'dê biharê
Çû meydanê zatê pak*

(318)

2.7.5. Heywan

Hin heywanên ku di metna cengnameyê de derbas dibin ev in: Mar, masî, hesp, şêr, hêştir, gur, bilbil û se/qocig (kûçik).

2.7.5.1. Mar

Ajeleke xişok e û gelek cûreyên wê hene. Di metna cengnameyê de mar wiha derbas dibe:

*'Elî çû ser **mar** e
Kêşa zulfekar e
Qetil ke yek car e
Ziya kir hewar e*

(77)

*Hindek şubhê şêran
Dêlê ew hiltînin
Hindek şubhê maran
Xo l' hev dialînin*

(140)

2.7.5.2. Masî

Masî, ajeleke ku di avê de dijî. Gelek cûreyên wê hene. Di berhemên klasîk de jî derbas dibe. Di berhemên de dilê aşiq, xeyalên aşiq û canê aşiq bi bal masîyî ve hatiye şibandin.²⁹³ Di metna cengnameyê de masî weha derbas dibe:

*Hin hût û **neheng** in
Hin şêr û piling in*

²⁹³ Pala, 2007, r. 294.

*Şed heybet bi deng in
Hem bi perr û çeng in*

(96)

2.7.5.3. Hesp

Hesp, ajeleke girîng yê metnên edebî ye. Hem di metnên klasîk de hem jî di metnên gelêrî de em gelek caran rastî motîfa hespê tên. Di edebîyata Kurdî de jî hesp xwedî cihekî girîng e û gelek hespên bi nav û deng di edebîyaya Kurdî hene, weke: Bozê Rewana Memê Alan, Rexşa Rustemê Zal, Deybilqirana Sîyabend, Hedbana Dewrêşê Evdî û hwd.²⁹⁴ Di metna cengnameyê de jî em rastî sê hespan tên ku du ji wan hespan gelekî navdar in û di nav edebîyata Îslamî de xwedî cihekî girîng in. Di metnê de hespa Hz. Muhemmed (s.x.l.) Dundul û hespa Hz. Elî ‘Uqab û hespa Sebî‘eyd Muhal weha derbas dibin:

*‘Eskerek ‘ecêb e
Hespê wan belek in
Rengê wan gerîb e
Rawî got melek in*

(134)

*Bilal **Dundul** kar kir
Pêgember suwar bû
Dema ku hemle kir
Melek lê ber hev bûn
‘Umer Ebûbekir
Wan ‘elem hilda bûn*

(181)

*Ew li **Muhal** bû suwar
Şi ‘ir xwend wî kir cewlan*

²⁹⁴ Edîp Polat, “**Di Çend Pexşanên Kurmancî de Evînên Efsanevî**”, (Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî Yê li Tirkiyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî), Mêrdîn 2015, r. XVI.

Bi ne 're û bi hewar
Meşhûr e Şahibqiran
(287)

Zulfeqar bend kir li puştê
Li 'Iqab ew kir suwar
Hem du 'ayek kir ji bo wî
Wî Resûlê Kirdigar
(317)

2.7.5.4. Şêr

Şêr, esed, xezenfer, heyder û leys.²⁹⁵Di metna cengnameyê de şêr hem weke ajel derbas dibe hem jî weke leqebekî Hz. Elî derbas dibe:

Qewlê te l' vê derê
Sebebê nezerê
Gehiştê 'eskerê
*Şubhê **gezenferê***
(71)

*Hindek şubhê **şêran***
Dêlê ew hiltînin
Hindek şubhê maran
Xo l' hev dialînin
(140)

2.7.5.5. Hêştir

Hêştir ajeleke ku hem goştê wê tê xwarin hem jî ji bo bar birin û anînê tê bikaranîn. Di metna cengnameyê de weha derbas dibe:

Dengê ney-naqoran
Dengê wan bilûran

²⁹⁵ Develioğlu, 2017, r. 1166.

Şeda`ê nefîran
‘Irrînê be ‘îran

(50)

L' devekê suwar e
Nûra wî diyar e
Bi xo namudar e
Ġayet keremkar e

(126)

2.7.5.6. Gurg

Gur, cenawir.²⁹⁶Di metnê gurg weha derbas dibe:

Hinek şubhê gurgan
Pencan l' hev dixînin
Hinek şubhê teyran
Peran dihejînin

(141)

2.7.6. Amûrên Cengê

Di edebîyata klasîk de amûrên ceng û herbê cihekî girîng digirin çî metnên herbê be çî jî wekî din ev amûr di nav metnên edebî de cih girtine. Metna cengnameyê jî ji ber ku metneke cengê ye tê de gelek amûrên cengê derbas dibin. Di metnê de amûrên weke: şûr, mertal, tîr, Zufeqar, gurz, ahên, zergan, super, gurzê xeleq, rim, çomaq, xencer, cewşen, gurzê polad, û sindan derbas dibin.

²⁹⁶ Develioğlu, 2017, r. 344.

2.7.6.1. Şûr

Şûr amûrekî cengê ye heman demê de di edebîyatê de unsûreke girîng e di navbera aşiq û maşûq de. Mijangên yarê, xemzeya wê, cewr û cefa ya wê li ser aşiq weke şûr tesîr dike.²⁹⁷ Di metna cengnameyê de şûr weke amûreke girîng cih girtiye û herwiha şûrê Hz. Elî Zulfeqar di metnê de xwedî cihekî taybet e, weke:

Mirîdê şeytan in

'Elem ser milan in

Her yek wek dêwan in

Bi şûr û merçal in

(27)

'Elî çû ser mar e

Kêşa zulfeqar e

Qetil ke yek car e

Ziya kir hewar e

(77)

2.7.6.2. Gurz

Di Kurdî û Farisî de weke gurz, di Tirkî de weke topuz û bozdağan, di Erebi de jî debbûs, amûa û weke mîtrîqa tê zanîn. Gurz berî dîtina çekan di herban de hatiye bikaranîn. Sîleheke ku yê li hemberî xwe dieciqîne, perçe dike. Sîleheke êrîşê ye. Li gor dirûv û giranîya xwe navê cuda werdigire weke: gurzê jêkirinê, gurzê daleqandinê û gurzê bi dirî. Ji bo gurzê ku giranîya wan zêde ye “gurzê giran” hatiye gotin.²⁹⁸ Di metna *Cengnameya Huneynê* de “gurz” weha derbas dibe: gurz, gurzê xeleg û gurzê polad.

Hewhewa Muğdad e

Reqisî cewlan kir

²⁹⁷ Pala, 2007, r. 269.

²⁹⁸ Tülin Çoruhlu, “Gürz”, *DİA*, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 1996 c. 14, n.r. 327-328.

Bi gurzê polad e
'Eskerê xo rast kir

(152)

Zubeyr çû meydanê
Reqisî cewlan kir
Ne 're ji dil danê
Gurzê xwe dewran kir

(164)

Ji hay û hû mêran
Seh nekirin deng e
Şed heb ji dilêran
Tenê kirin ceng e
Wana kafîr hêran
Bi gurzê xeleg e

(187)

2.7.6.3. Ahên

Hesin, zincîr, şûr, hişk.²⁹⁹ Ahên di metna cengnameyê de weha derbas dibe:

Kafîran ku dîtin
Ji hev du ra gotin
Muhammedî hatin
Ahên wan rahiştin

(102)

2.7.6.4. Cewşen

Zirxê honandî, cilûbergê herbê.³⁰⁰ Di metnê de cewşen weha derbas dibe:

Malik ku suwar bû
Du cewşen li xo kir

²⁹⁹ Develioğlu, 2017, r. 17.

³⁰⁰ Develioğlu, 2017, r. 156.

*Du hezar ayrî bû
Di pûsê punhan kir*

(147)

*Wî dît **cewşen** parepar
Anîn ji [ser] derxistin
Heftê du birîn hejmar
Resûl ahên rahiştin*

(262)

2.7.6.5. Super/Merçal

Berî dahênana çekan super di herban de weke amûreke parêzîyê hatiye bikaranîn. Bi saya superê ew kesê ku di herbê de ne xwe ji derbeyên tîr, rim, gurz û şûrî parastine.³⁰¹ Di metnên edebî yên şer de gelek caran hatiye bikaranîn. Di metna *Cengnameya Huneynê* de jî weha derbas dibe:

*Gurzek l' Zubeyr bar kir
Wezna wî giran bû
Super wî îhzar kir
Di bin da punhan bû
Ew li Zubeyr bar kir
Şed û çil batman bû*

(168)

*Heman kafir dest-sivik
Şûrek danî wî Şahî
Merçal da ber wî çapik
Şûr-demir talda ma `î*

(337)

*Kafir **sîper** bilind kir
Filhal bin da punhan bu*

³⁰¹ Tülin Çoruhlu, "Kalkan", **DİA**, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 2001, c. 24, n. r. 260-261.

Zulfeqar merrtal şeq kir
Hesinek bêasas bû

(347)

2.7.6.6. Rim

Ew amûra herbê ye ku destîyê wê dirêj û serê wê hesinekî tûj e.³⁰² Di metna cengnameyê de weha derbas dibe:

Hat 'elemek hêşîn
Di bin da eslanek
Rimê ew dihejîn
Kinc hêşîn in carek

(120)

Rimmê di rimbazan
Ciger qul dikirin
Bi derbê çomağan
Serî hûr dikirin

(186)

2.7.6.7. Zergan

Zergan tê maneya şîş û serê rimmê. Di cengnameyê de weke amûreke şer derbas dibe. Pêncê ejderheyên mîna zergan hatiye terîfkirin, weke nimûne:

Hinek şubhê gurgan
Pencê wan wek zergan
Ketne reqş û firgan
Diran wek qocigan

(95)

³⁰² Develioğlu, 2017, r. 747.

2.7.6.8. Çomağ

Çomağ di *Cengnameya Huneynê* de weke amûreke herbê hatiye bikaranîn.

Rimmê di rimbazan

Ciger qul dikirin

Bi derbê çomağan

Serî hûr dikirin

(186)

2.7.6.9. Xencer

Ew kêra ku serê wê tûj û xware û her du alîyên wê jî tûj in. Di helbesta klasîk de birû ji ber xwarbûna xwe, çav, xemze û mijang ji ber ku li ser aşîq birînê vedikin ber bi xencerê ve hatine şibandin.³⁰³ Xencer di metnê de weha derbas dibe:

Ez bistînim xûna wana

Ji Muḩemed bê ḩuman

*Dest avêtime **xencerê***

Hatim l' alyê rast heman

(210)

Ez hatim piş da sekinîm

*Dest avête **xencerê***

Derbekê wisan ku lê xim

Ew şehîd be l' wê derê

(212)

2.7.6.10. Sindan

Bi Kurdî sindan e û bi Tirkî jê re “örs” tê gotin. Ew amûrê ku ji polad e û li ser wî metal têne kutandin. Amûreke hesin e.³⁰⁴ Di *Cengnameya Huneynê* de sindan weha derbas dibe:

³⁰³ Pala, 2007, r. 190.

³⁰⁴ Dema gihandinê (23.09.2021)(<https://sozluk.gov.tr>)

*Ger bikim ne`re bi carek
Dêw dibin l' erdê rimam
Hem lêxim derbê li **sindan**
Wê bibitin xurd û xam*

(313)

2.7.6.11. Alem-Senceq

Nîşan, elamet, beyreq, senceq, îşareta sînor.³⁰⁵ Di metna cengnameyê de al bi gelek navên cuda derbas dibe, weke: ‘elem, liwa’, ru’yet, nîşan û beyreq.

*Mirîdê şeytan in
‘**Elem** ser milan in
Her yek wek dêwan in
Bi şûr û merçal in*

(27)

*Ġulam gote Malik
Ey mîrê bala`ê
Min dî siyarek l' nik
Xudanê **liwa`ê***

(130)

*Rawiyî got Ibnî Mirdas
Hate cem Fexru`l-umem
Jê suwal kir Fexrê ‘Alem
Kanê ew **ru`yet`elem***

(221)

*Min ‘**elem** têk kir li ser
Serê çiya`ê ya Resûl*

³⁰⁵ Develioğlu, 2017, r. 30.

*Da ji bo qewmê nîşan be
Ew ku şer kin pur usûl*

(222)

*Ew Muğdadê 'Erebî
Beyraqdarê pêgember
Ji 'Elî ayrî nabê
Dike cewlan bi huner*

(254)

2.7.7. Amûrên Muzîkê

2.7.7.1. Def

Amûreke ku bi lêdanê tê xebitîn. Def, alavek e ku çermekî li dora xelekê bi zengil an bi pûl ve girê didin. Gelek cûreyê wê hene. Di edebîyatê de pîranî di şûna dilê aşîq û rûyê hezkiriyê de tê bikaranîn.³⁰⁶Di metna *Cengnameya Huneynê* de def weha derbas dibe:

*Malik Binê 'E[w]f bû
'Esker lê berhev bû
Bi zirna û **def** bû
Bi kîn û hem gef bû*

(28)

*Kafîr zor û ze'f in
Bê tîrs û bi xef in
Bi zirna û **def** in
Bi kîn û hem gef in*

(57)

³⁰⁶ Hayrullah Acar, *Dîwana Şêx Ehmedê Feqîr (Metn û Lêkolîn)*, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2016, r. 190.

2.7.7.2. Zirne

Zirne, amûreke muzîkê ye ku bi jendinê tê xebitîn. Ji darê hatiye çêkirin û bi gelemperî bi dahol û defê re tê bikaranîn.³⁰⁷ Di metnê de zirne her tim bi defê re hatiye bikaranîn weke:

Malik Binê 'E[w]f bû

'Esker lê berhev bû

Bi zirna û def bû

Bi kîn û hem gef bû

(28)

Kafir zor û ze'f in

Bê tirs û bi xef in

Bi zirna û def in

Bi kîn û hem gef in

(57)

2.7.7.3. Ney

Ney, giyayekî şax rast, dirêj û hundirvala û par par e ku li cihên avî şîn dibe. Ji bo sergirtina malan û hûnadina hesîran bi kar tê. Jê re nay, nal û na jî tê gotin. Ney wekî aleteke muzîkê jî bikar tê, bi dev tê lêxistin.³⁰⁸ Bi taybetî di nav Mewlewîyan de xwedî cihekî taybet e.³⁰⁹ Di metna cengnameyê de wehe derbas dibe:

Dengê ney-naqoran

Dengê wan bilûran

Şeda'ê nefîran

'Irrînê be'îran

(50)

³⁰⁷ Dema gihandinê (24.09.2021) (<https://sozluk.gov.tr/>).

³⁰⁸ Acar, 2016, r. 188.

³⁰⁹ Pala, 2007, r. 358.

2.7.7.4. Bilûr

Amûrekî jenî yê muzîkê ye. Di metna *Cengnameya Huneynê* de weha derbas dibe:

Dengê ney-naqoran

*Dengê wan **bilûran***

Şeda`ê nefîran

‘Irrînê be ‘îran

(50)



BEŞA SÊYEM

DANASÎNA NUSXEYÊN CENGNAMEYA MELA YASÎNÊ ALIKÎ

CENGNAMEYEKE ÎMAMÊ ELÎ: “ĞEZWETU HUNEYN”A MELA YASÎNÊ ALIKÎ

Di vê beşê de em dê nusxeyên metna cengnameya Mela Yasînê Alikî bidin naskirin. Heta niha em hay ji sê nusxeyan hene, lê me xwe gihandiye du nusxeyan. Nusxeyek li cem malbata Yusif Yaşar e, ev nusxe weke fotokopî li ber destê me ye û ev nusxe ji bo vê xebata me nusxeya bingeh e. Ji ber ku mustensîxê vê nusxeyê ne dîyar bû me ew weke “Nusxeya Yusif Yaşar” (NYY.)ê bi nav kir. Nusxeya duyem jî me li ba keça Mela Yasînê Alikî Husna Atasevenê³¹⁰ (ç. 1933-) peyda kir. Wê ev nusxe da me û niha di arşîva me de muhafize kiriye. Ev nusxe li gorî qeyda temetê ji aliyê Muhemmed Emînê kurê Xelîfe Ehmedê Mîlanî ve hatiye nivîsîn. Me ev nusxe jî weke “Nusxeya Muhemmed Emîn” (NME.)ê bi nav kir. Nusxeya sêyem jî li ba Mela Nezîf Katılmış e, nusxe ji aliyê bavê Mela Nezîf Katılmış, Mela Huseynê Botî (w.1999) ve hatiye nivîsîn. Lê ji ber ku Katılmış tevahîya nusxeyê bi me re parve nekir û ev nusxe bi tamamî ne li ber destê me ye malûmatên derheqê vê nusxeyê de jî di destê me de kêr in. Me ev nusxe jî weke “Nusxeya Mela Huseynê Botî” (NMHB.) bi nav kir.

Di vê xebata xwe de em dê li gor agahîyên ber dest van nusxeyan bidin naskirin. Her çi qas sê nusxe hebin jî ji ber ku ya sêyem ne li ber destê me ye em dê xebata xwe li gor her du nusxeyên ku li ber dest in bikin.

³¹⁰ Hüsna Ataseven niha li gundê Ziyareta Panosê niştecîh e.

3.1. Nusxeya Yusuf Yaşar (NYY.)

Mustensîxê vê destxetê ne dîyar e. Lê li gor ku Kutbettin Uygur digot nivîsa vê destxetê dişibe ya Mela Yasînê Alikî.³¹¹ Ev nusxe li cem malbata Yusuf Yaşarê Berjêrî³¹² tê parastin. Me ev nusxe bi rêya Abdurrahman Adak ji nevîyê Yusuf Yaşar ji Taha Yaşar wergirt. Nusxe destxet e û ji 61 wereqan pêk tê û bergê nusxeyê keske û çermîn e.

Li gorî benda duyem ya metna cengnameyê ya di nusxeya Yusuf Yaşar de ev berhem di sala 1934an de hatiye nivîsîn.³¹³

*Ji hicreta Resûlê Heq
Hezar sê şed ku derbaz bû
We pêncî &ê bikin lahiq
Ji bo vê nezmê tarîx bû*³¹⁴

(2)

Metn ji alîyê nivîsê ve hatiye midaxalekirin, lewra ji ber ku bi demê re hibra resen jê çûye bi pênuşeke şîn li ser hibrê hatiye derbaskirin. Yanî bi destekî duyem hin cihê wê dîsa hatine nivîsîn. Di destxetê de derheqê dîroka îstînsax, xwedî û cihê îstînsaxê de agahî nînin. Lê hin nivîsên Erebi ji alîyê malbata Yusuf Yaşar ve lê hatiye nivîsîn û ev berhem weke ya Mela Yusif³¹⁵ hatiye qeydkirin. Herwiha di cihên ku mexles tê de derbas dibin midaxale çêbûne û navê “Yasîn” jê hatiye birin û ji dêvla “Yasîn” navê “Yusif” hatiye nivîsîn. Lê dîsa jî navê “Yasîn” di bin de tê xuyakirin.

Wereqên vê destnivîsê hatine reqemkirin lê di hemû rûpelan de reqem cih nagirin. Ji rûpela 5an pê ve li destxetê reqem hatine dayîn. Di vê destxetê de di dawîyê

³¹¹ Hevpeyvîna bi Mela Kutbettin Uygur re (Dema hevpeyvînê: 06.04.2020).

³¹² Ji ber ku malbat ji herêma Mêrdînê koçî Serhedê kiriye ji wan re weke “Berjêrî” hatiye gotin, (Hevpeyvîna me ya bi Hasan Yaşar re: 18.12.2020).

³¹³ Lê li gorî talebeyê Mela Yasînê Alikî, Muhemmed Emîn jî Mela Yasîn ev berhema xwe di sala 1930yî de nivîsîye. Binêrin: Pêvek: 5.

³¹⁴ 1353yê hicrî beranberî 1934ê miladî tê. Li gorî agahîya di vê bendê de em fêhm dikin ku ev metn di vê dîrokê de hatiye nivîsîn.

³¹⁵ Li gorî agahîyên ku me bi destxistiye ev kes melatî nekiriye. Lê zarokên wî ji bo wî digotin ku melatî kiriye.

de helbesteke³¹⁶ bi Tirkîya Osmanî cih digire. Di vê nusxeyê de tenê 15 malikên vê helbestê hene.

Ev destxet ji serî heta dawî bi heman hibrê hatiye nivîsîn lê pişt re ji ber hin midaxeleyan rengên dîtir jî tê de xuyan dikin.³¹⁷

3.1.1. Taybetîyên Nusxeya Yusif Yaşar

Li gorî şêweya navnetewî ya danasîna destxetan, em ê li jêr danasîna destxeta malbata Yusif Yaşar bikin. Me ev nusxe ji bo xebata xwe re kiriye bingeh, lewra ev nusxe di nav nusxeyan de ku li ber destê me ne ya herî kamil e. *Cengnameya Huneynê* bi awayekî herî dirêj di vê nusxeyê de cih digire.

1. **Navê Berhemê:** Gezwetu Huneyn
2. **Te'lîf, Tercume, Şerh:** Te'lîf.
3. **Navê Muellîf:** Seyda Mela Yasînê Alikî
4. **Navê Mustensîx:** Nedîyar e.
5. **Tarîxa Îstinsaxê:** Nedîyar e.
6. **Cihê Îstinsaxê:** Tune ye.
7. **Navê Xwedî:** Taha Halît Yaşar
8. **Zimanê Nusxeyê:** Kurdîya Kurmancî
9. **Serbixwe-Mecmû'e:** Serbixwe.
10. **Menzûm-Mensûr:** Menzûm
11. **Qeyda Temetê:** Nehatiye nivîsîn.
12. **Zanyarîyên li Ser Bergê:** Piştî nusxeyê ango cihê şîrazeyê bi potikekî hatiye qewîkirin. Berga ewil û ya dawî hatine texrîbkirin. Bergê ku xuya dike rengzere ye û li ser jî hin xêz hene. Piştî li nusxeyê bergekî çerm hatiye zêdekirin, rengê wî çermî jî keskekî girtiye.
13. **Rengê Kaxezê:** Rengê kaxizê zere ye û tê de xêz hene.

³¹⁶ Di encama lêkolîna me de hat dîtin ku ev helbesteke munacaet e û ji aliyê kesekî bi navê Bilal Nûrî ve hatiye nivîsîn û bi tevahî ji 51 malikan pêk tê. Di nusxeya li ber destê me de jî tenê 15 malik derbas dibe. Xuyaye helbesta li ber destê me ji serî ve kêma e. Ji bo agahîyên berfirehtir binêr; <https://www.malikaya.com/amp/m%C3%BCnacat-i-bi-lal-nuri> (Dema Gihandinê; 22.07.2021); Meliha Yıldırım Sarıkaya, Halk Dilinde Bir Duâ Mecmûası: Bilâl Nûrî Münâcâtı, **İstanbul Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi**, 2012, 27, n.r. 113-146.

³¹⁷ Ji bo hemû nusxeya destxet bnr. Pêvek: 3.

14. Jimara Wereqan: Ev nusxe bi tevahî ji 61 wereqan pêk hatiye. Di rûpela ewil de nivîseke bi Erebî heye, lê ji nivîsê tê fêmkirin ku ev paşê lê hatiye zêdekirin. Herwiha di rûpelên 2 û 3yan de ti nivîs nînîn, di rûpela 4em de dîsa nivîseke bi Erebî heye û ev nivîs jî piştê lê hatiye zêdekirin. Lewra hem şêweya nivîsî cuda ye hem jî rengê hibra wê cuda ye. Metnên nusxeyê ji rûpela 5an dest pê dike û heta rûpela 61ê dewam dike.

15. Jimara Rûpelan: 103 rûpel ji alîyê mustensîx ve hatiye nimarekirin. Nusxe ji wereqa sisêyan pê ve hatiye nimarekirin. Ev nusxe bi tevahî ji 120 rûpelan pêk tê.

16. Jimara Stûnan: Di bergê de stûn cih nagirin.

17. Jimara Xêzan: Di her rûpeleke nusxeyê de 13 xêz cih digirin.

18. Jimara Rêzan: Di vê nusxeyê de metna cengnameyê ji 1556 risteyan pêk hatiye û xezeleke 9 malikî jî di nav metna cengnameyê de cih digire. 15 malikên xezeleke Tirkî jî di dawîya destnivîsê de cih digire. Di her rûpelî de hejmara risteyan ne wek hev e, lê bi gelemperî di navbera 6-9an de diguhere.

19. Cûreya Xetê: Nesîx.

20. Îmla: Îmlaya wê xweş e û bi hereke ye.

21. Rengê Hibrê: Di nusxeyê de du cûre hibir xuya dikin, metna resen bi hibra reş hatiye nivîsîn. Lê ji ber ku di hin rûpelan de bi demê re nivîsê jê çûne bi hibreke şîn li ser wan nivîsên ku jê çûne hatine derbaskirin.

22. Serenav: Serenav heye. Herwiha di nav nusxeyê de jî ji bo beşan serenav hatine bikaranîn. Ev serenav bi Kurdî, Erebî û bi Farisî ne. Hemû serenav û nivîsên metna resen bi heman rengê hatine nivîsîn. Serenav di nav çarçoveyekê de hatine nivîsîn. Di hin cihan de ev çarçove stûrtir e.

23. Peyva Te'qîbê: Di dawîya her rûpelî de peyva te'qîbê tune ye. Peyva te'qîbê di rûpelên cot yên: 6, 8, 22, 24, 28, 30, 32, 36, 38, 42, 44, 46, 48, 54, 60, 62, 64, 68, 72, 76, 78, 80, 82, 86, 88, 92, 96, 98, 100, 102 û 106an de hatiye bikaranîn.

24. Hecma Wê: 7,8 x 11,1 cm.

25. Zanyarîyên Derkenarê: Di nusxeyê de derkenar nehatiye bikaranîn.

26. Benda Destpêka Nusxeyê: Di nusxeyê de nivîsên di rûpelên 1 û 4an de pişt re lê hatine zêdekirin. Herwiha rûpelên 2-3ê jî vala ne. Destpêka metna cengnameyê di rûpela 5an de dest pê dike (w. 3, r. 5). Destpêk weha ye:

YA ELLAHÛ TE‘ALA BISMÏLLAHÎREĤMANIRREĤÎM

Leqed neşerekumullahû fî mewatine kesîretin we yewme Ĥuneynin îz e'cebetkum keşretukum.

ĜEZWETU ĤUNEYN BIMENNÎHÎ TE‘ALA

Bibin guhdar ku ez bêjim

Beyan kim ez hikayatê

Ji geman hûn bibin azad

Ku seh kin vê ‘ibaratê

27. Malika Dawî ya Nusxeyê:

Oquyani hem yazani rahmetiñle yarlıĝa

Diñleyenleri dahi hem yâ Ĝanî Perwerdigâr

Benda dawî ya metna *Cengnameya Huneynê* jî weha ye:

Hem digel wî fatiħe

Ji şehabiyê kiram

Bi ezmanek feşîħe

Ji umetê ra tamam

3.2. Nusxeya Muhemmed Emîn (NME)

Mustensîxê vê nusxeyê Muhemmed Emînê kure Xelîfe Hecî Ehmedê ji eşîra Milan û ji gundê Erûsê ye.³¹⁸ Li gorî agahîyên ku di dawîya nusxeyê de hatiye dayîn Muhemmed Emîn talebeyê Mela Yasînê Alikî bûye û li gundê Şîwekarê³¹⁹ jê ders wergirtiye. Ji ber ku agahîyên derheqê wî de li ber destê me kêman em nizanin vî kesî melatî kiriye an nekiriye. Muhemmed Emîn di vê nusxeyê de Mela Yasînê Alikî weha daye nasîn; Yasîn bîn Molla Ebdullah el-Alikî el-Xalidî el-Neqşî. Li gor agahîyên ku di rûpela dawî de hatine dayîn ev berhem di sala 1349an (1930ê Miladî) de ji aliyê Mela Yasînê Alikî ve hatiye nivîsîn û herwiha di sala 1379an³²⁰ (1959ê Miladî) de ji

³¹⁸ Bi navê Erûsê gundekî Xinisa Erziromê jî heye. Îhtîmal e ku heman gund be.

³¹⁹ Bi Tirkî navê vî gundî “Ovapınar” e û girêdayî navçeya Muradiye (Bêgirî) ya Wan ê ye.

³²⁰ Ev tarîx di nusxeyê de weke “1279” hatiye nivîsîn. Îhtîmaleke mezin ev yek ji ber xeteyeke teknîkî pêk hatiye û reqema sisêyan “٣” weke reqema dudan “٢” hatiye nivîsîn. Ev tarîx li gorî me 1379 e.

alîyê Muhammed Emîn ve hatiye îstînsaxkirin.³²¹ Me ev nusxe ji keça Mela Yasîne Alikî ji Husna Ataseven wergirt û ev destxet niha li bal me ye.

Nusxe destxet e û ji 22 wereqan pêk hatiye û 44 rûpel e û herwiha bergên wê tune ne. Di vê nusxeyê de rûpel nehatine nimarekirin. Metn ji rûpela ewil dest pê dike heta rûpela 26an dewam dike. Rûpelên di navbera 27 û 43yan de vala ne û di rûpela dawî ya 44an de tenê hevokek cih digire.

3.2.1. Taybetîyên Nusxeya Muhammed Emîn

1. **Zimanê Nusxeyê:** Kurdîya Kurmancî
2. **Navê Muellîf:** Seyda Mela Yasîne Alikî
3. **Qeyda Temmetê:** Heye: “Tarîxu’n-nezmi fî sene 1349 nazime Yasîn Bîn Ebdullah el-Alikî. Ketebe Muhammed Emîn Îbnî Xelîfe Hacı Mela Ehmed min eşîret Milanî ‘Erûsî sakinî qurîyet. Fî Hicrî 1279³²²Şîwekar Rehmetullahî ‘eleyhî we ‘ela eqarîbe we ‘ela amîn. Bi hurmetî Seyyidi’l-Murselîn. el-xetau’l-baqî we’l-‘umir fanî. Qed ferexe min ketebete Muhammed Emîn (fî şehri Receb) min Xelîfe Hecî Molla Ehmed Bîn zade hesben li’l-ustad Yasîn Bin Molla Ebdullah el-Alikî el-Xalidî el-Neqşî. Ah min el-mewt we’l-halatihi”.
4. **Dîroka Îstînsaxê:** Hicrî 1379/Mîladî 1959.
5. **Mustensîx:** Muhammed Emînê kurê Xelîfe Hecî Mela Ehmed ku ji eşîra Milan e.
6. **Cihê Îstînsaxê:** Şîwekara gundê Miradîyeyê.
7. **Navê Berhemê:** Navê berhemê li ser nehatiye nivîsîn.
8. **Te’lîf, Tercume, Şerh:** Te’lîf.
9. **Navê Xwedî:** Husna Ataseven, keça Mela Yasîn (Niha nusxe li cem me tê parastin).
10. **Serbixwe-Mecmû’e:** Serbixwe.
11. **Menzûm-Mensûr:** Menzûm.
12. **Jimara Wereqan:** Ev nusxe bi tevahî ji 22 wereqan pêk hatiye. Metn di navbera rûpela ewil û ya 26an de cih digire. Ji rûpel 27an heta 43yan rûpelên vala

³²¹ Ji bo agahîyên nusxeyê bnr. Pêvek: 4-5.

³²² Îhtilmaleke mezin ev tarîx bi şaşî hatiye nivîsîn, divê ev tarîx 1379 be û ev jî teqabûlê 1959an dike.

ne. Di rûpela dawî ya nusxeyê de tenê ev hevoka “Heciyê qesta Hicazê mal û ewlad terk kirin” cih digire.

13. Zanyarîyên li Ser Bergan: Di nusxeyê de berg tune ne.

14. Rengê Kaxezê: Rengê kaxizê berê weke ku spî bûye, lê bi demê re guherîye bûye zer û di rûpelan de xêz hene.

15. Jimara Rûpelan: Ev nusxe bi tevahî ji 44 rûpelan pêk tê.

16. Jimara Stûnan: Di bergê de stûn cih nagirin.

17. Jimara Xêzan: Di her rûpeleke nusxeyê de 21 xêz cih digirin.

18. Jimara Rêzan: Di vê nusxeyê de bi tevahî 719 riste cih digirin. Di her rûpelî de hejmara risteyan ne yek e, lewra di vê berhemê de riste weke tefîle hatine nivîsîn.

19. Cûreya Xetê: Nesîx.

20. Îmla: Îmlaya wê xweş e û bi hereke ye.

21. Rengê Hibrê: Di nusxeyê de yek cûre hibir xuya dike. Metn ji serî heta dawî bi rengê reş hatiye nivîsîn.

22. Serenav: Serenav heye. Herwiha di nav metnê de jî ji bo beşan serenav hatine bikaranîn. Ev serenav bi Kurdî û Erebî ne. Serenav di nav çarçoveyekê de hatine nivîsîn.

23. Peyva Te'qîbê: Peyva te'qîbê tenê di rûpelên 4 û 10an hatine nivîsîn.

24. Hecma Wê: 22x16 cm.

25. Zanyarîyên Derkenarê: Di nusxeyê de derkenar tune ye.

26. Benda Ewil ya Nusxeyê: Nivîs ji rûpela ewil dest pê dike û heta rûpela 26an dewam dike. Di vê nusxeyê de tenê metna cengnameyê cih digire. Destpêka nusxeyê weha ye:

Ewwel bismillah î

Elhemdulillah î

La'iq padişah î

Bê mesken û cah î

27. Benda Dawîya Nusxeyê:

Hem digel wî fatiḥe

Ji şehabê kîram

Bi ezmanek feşîhe

Ji ummetê ra temam

3.3. Nusxeya Mela Huseynê Botî (NMH)

Ev nusxe ji alîyê Mela Huseynê Botî ve hatiye îstînsaxkirin. Mela Huseynê Botî di sala 1927an de li gundê Binêrvê (Emekçiler) ku girêdayî Eruha Sêrtê ye hatiye dinê. Heta dersa Camî li cem Mela ‘Ebdurrehmanê Şawirî xwendiyê. Demekê li medreseya Şêx Me’sûm xwendiyê. Bi keça Kamilê kurê Feqe Reşîd re zewicîye. Li çendîn gundê Panosê melatî kiriye. Helbestên wî yên Kurdî ku nehatine çapkirin hene. Di sala 1999an de li Axtepeya (Aktepe) girêdayî Panosê rehmet kiriye.³²³ Mela Huseyn di sala 1954an de ev berhema *Cengnameya Huneynê* îstînsax kiriye.³²⁴

Tevahîya nusxeyê niha li cem Mela Nezîf Katılmışê kurê Mela Huseyn e. Ji vê nusxeyê pênc rûpel di destê me de ye û ji ber ku tevahîya nusxeyê ne li ba me ye malûmatên derheqê nusxeyê de jî kêr in. Herwiha li gorî agahîyên ku me bi dest xistine di nusxeyê de di cihên mexlesê de nivîs hatiye texrîbkirin û navê Feqe Reşîd weke mexles lê hatiye zêdekirin. Li gorî Mela Nezîf Katılmış û malbata Feqe Reşîdê Alikî ev berhem ne ya Mela Yasînê Alikî ye ya Feqe Reşîd e. Lêbelê di temet û rûpelên li ber destê me yên vê nusxeyê de îbareyeke ku em bibêjin ev berhem ya Feqe Reşîde tune ye. Herwiha di du nusxeyên ku di destê me de ne ev berhem bi zelalî weke ya Mela Yasînê Alikî xuya dike û herwiha di van her du nusxeyan de ku li ba me ne, tenê mexlesa Mela Yasînê Alikî heye. Herwiha mustensîxê nusxeya NMEê ku talebeyê Mela Yasînê Alikî bûye di nusxeya xwe de dibêje nazimê (muellîf) vê berhemê Mela Yasînê Alikî ye. Ji ber van delîlan em jî vê berhemê weke ya Mela Yasînê Alikî qebûl dikin.

³²³ Ji bo agahîyên berfirehtir bnr.: Reşîd, 2020, n.r. 17-18.

³²⁴ Ji bo agahîyên nusxeyê bnr.: Pêvek: 6-7.

3.3.1. Taybetîyên Nusxeya Mela Huseynê Botî

1. **Zimanê Nusxeyê:** Kurdîya Kurmancî
2. **Navê Muellif:** Nedîyar e.
3. **Qeyda Temmetê:** Heye: “Temmet ‘ele’ş-şeytanu’l-le‘net we ‘ela katib el-rehmet. El-asan ji destê heşir neşir di roja qiyametê li ser pira siratê şefî‘ bibe Muhammed. Me xelas ke ji narê cehennem. Amîn ya Reb el-‘alemîn. La îlahe îllalah Muhammed Resulellah. Sene ‘Erebî 1373. Sene Romî 1369. Sene ‘Îsewî 1954. Sene Şemsiyî 1331”.
4. **Dîroka Îstînsaxê:** Hicrî 1373/Mîladî 1954.
5. **Mustensîx:** Mela Huseynê Botî.
6. **Cihê Istînsaxê:** Ne dîyar e. Lê ihtîmaleke mezin Panos e.
7. **Navê Berhemê:** Ne dîyar e.
8. **Te’lîf, Tercume, Şerh:** Te’lîf.
9. **Navê Xwedî:** Mela Nezîf Katılmış e.
10. **Zimanê Nusxeyê:** Kurdîya Kurmancî.
11. **Serbixwe-Mecmû’e:** Serbixwe.
12. **Menzûm-Mensûr:** Menzûm.
13. **Taybetîyên Kaxezê:** Rengê kaxizê zer e û tê de xêz hene.
14. **Jimara Wereqan:** Em nizanin (Nusxe bi tevahî ne di destê me de ye).
15. **Zanyarîyên li Ser Bergan:** Em nizanin, çunkî nusxe bi tevahî ne li ber destê me ye.
16. **Rengê Kaxezê:** Rengê kaxizê berê weke ku spî be, lê bi demê re guherîye bûye zer û tê de xêz hene.
17. **Jimara Rûpelan:** Em nizanin, çunkî nusxe bi tevahî ne li ber destê me ye.
18. **Jimara Stûnan:** Stûn tune ye.
19. **Jimara Xêzan:** Di her rûpeleke nusxeyê de 22 xêz cih digirin.
20. **Jimara Rêzan:** Ji ber ku hemû nusxe ne li ber destê me ye, em nizanin çend rêz tê de hene.
21. **Cûreya Xetê:** Nesîx.
22. **Îmla:** Îmlaya wê xweş e û bê hereke ye.

23. Rengê Hibrê: Di nusxeyê de yek cûre hibir xuya dike. Li gorî rûpelên li ba me metn ji serî heta dawî bi vê hibrê hatiye nivîsîn.

24. Serenav: Serenav heye. Herwiha di nav nusxeyê de jî ji bo beşan serenav hatine bikaranîn. Ev serenav bi Kurdî û Erebî ne. Serenav di nav çarçoveyekê de hatine nivîsîn.

25. Peyva Te' qîbê: Em nizanin. Çunkî hemû nusxe li ber destê me nîne.

26. Hecma Wê: Em nizanin.

27. Zanyarîyên Derkenarê: Li gor rûpelên li ber destê me di nusxeyê de derkenar xuya nake.

28. Benda Ewil a Nusxeyê: Malûmatên derheqê nusxeyê de li ber destê me kêr in. Lê li gor rûpela ewil ku li ber destê me ye, nusxe weha dest pê dike:

Ewwel bismillah

Elhëmdulillah

La'iq padişah

Bê mesken û cah

29. Benda Dawîya Nusxeyê:

Hem digel wî fatihe

Ji bo şehabê kîram

Bi zimanek feşîhe

Ji ummetê ra tamam

3.4. Taybetîyên Îmlaya Nusxeyan

3.4.1. Îmlaya Nusxeya Yusif Yaşar

Di vê nusxeya Yusif Yaşar (NYY) de gelek kêmasî hene û di gelek cihan de jî xeletî hatine kirin, lê tevî vê yekê jî ji nusxeyên din berfirehtir û kamiltir e. Di nusxeyê de di danîna herekeyan de xeletî derketine holê, di nivîsîna bêje û qertefan de xeteyên teknîkî hene. Di nivîsîna hin herfan de xeletî hatiye kirin, xalên wan kêr hatine nivîsîn. Mustensîx li cihekî ser du rûpelan xêz kiriye û ew rûpel dîsa ji nû ve berfirehtir nivîsiye. Ev yek jî bi me dide zanîn ku ev nusxe weke muswedde hatiye bikaranîn û ne halê kamil û dawî ye. Li jêr em dê van şaşî û kêmasîyan bi hûrgilî pêşkêş bikin.

1. Di metnê de dengên “ê” û “î”yê carinan bi kesreyê “î” carinan jî bi “y”yê hatine nîşandan. Ji ber vê yekê di latînzekirina metnê de di gelek bêjeyan de xeletî derketiye holê. Nivîskar bi yek îşaretê (kesreyê) xwestiye sê dangan îfade bike, ev yek jî di latînzeya nusxeyê de weke pirsgirêk derdiket hemberî me. Di metna rexneyî ya berhemê de me ev xeletî li gorî standartê rast kirin.

- Di vê nusxeyê de ev bêje bi awayekî xelet weha hatine nivîsîn: şiwir (شور), şilîn (شَلِين), çî nabe (چ نابه), pince (پنج), jîn (ژین), hatîn (هَاتِين), kîr (کیر), diwê (دوی). Lê divê ev bêje weha bihatina nivîsîn: Şêwr (شیور), şêlîn (شیلین), çê nabe (چی نابه), pêncî (پینجی), jin (ژن), hatin (هاتن) kir (کر) û dêwê (دیوی). Hin ji wan bêjeyan di van bendan de bi vî awayî derbas dibin:

Şiwra wan giran bû
’Işretek tamam bû
Qelbê wan wêran bû
Dewran ew dewran bû

(31)

Bişilînim sûkan
Aza kim piçûkan
Bînim qîz û bûkan
Deng biçê mulûkan

(46)

Tevdîra xo dîtîn
’Esker tev suwar bû
Milê xo vemiştîn
*Tam **pincê** hezar bû*

(144)

*Ji wan **çî nabe** quşûr*
Emir-berê mêran in

Kes nabîne wechê wan
Temam b' qeşr û xiyam în

(304)

2. Nivîskar di gelek cihan de lêkerên ku divê 'i kesreyê ango bi dengê “**î**”yê bihatina nivîsîn bi dengê “**ی - y**”yê nivîsîye. Yanî di metna nusxeyê de dengê “**î**”yê bi tîpa “**ی - y**”ê hatiye nîşandan. Lêbelê diviyabû ev lêker bi kesreyê “**î**” bihatina nivîsîn, ne bi “**î**” (**ی - y**)yê. Ev xeletî dibe ku ji mustensîx jî pêk hatibe û dibe ku nivîskar bi awayekî şaş jî nivîsîbe. Herwiha dibe ku ev yek ji ber îmlaya nivîsîna Erebi ya ku nivîskar tercîh kiriye jî pêk hatibe. Me ev lêkerên bi vî awayî li gorî bikaranîna îro guherand. Çend mînak ji wan lêkerên ku nivîskar bi “**î**”yê nivîsîye weha ne: “dihatîn, bihîstîn, bêtîn, biçîtin, nebîn, nizanîn, difirîn, bibît, gotîn, nazvîrim, bimîrim, (bi)kîn, lafkirîn, girtîn û hatîn”. Divê ev lêker weha hatibûna nivîsîn: “dihatin, bihîstin, bêtin, biçitin, nebin, nizanin, difirin, bibit, gotin, nazivirim, bimrim, (bi)kin, lafkirin, girtin û hatin.

*Cinan ku **bihîstîn***

*Jî hev du ra **gotîn***

*Musulman ku **bêtîn***

*Em ji dê **biçîtin***

(85)

*Em **hatîn** vê derbê*

Jî şerqê ta gerbê

Da em bikin herbê

Şifa bike qelbê

(86)

Malik ku suwar bû

*Du cewşen li xo **kîn***

*Du hezar ayrî bû
Di pûsê punhan kir*

(145)

*Wan ku dî şağ e şelamet
Ew Resûlê Kibriya
Em **nizanîn** em çi bêjin
Şermesar in bê riya*

(195)

*Serê wan zêrê zer î
Xalxal ji nûra 'erş î
Weke teyran **difirîn**
Dûrlû dûrlû bi neqş î*

(309)

*Ez **bimîrim** ya 'Elî
Halê min wê çewan be
Gote wî Şahê Welî
Dê cehnem û 'ezab be*

(340)

- Di metna nusxeyê de di piranîya daçekan de ji dêvla dengê “**î - i**”yê dengê “**î - y**”yê hatiye bikaranîn. Weke nimûne:

*Ferdeq **jî** insanan // Hebek **jî** heywanan (فَرْدُكُ **ژێ** **ئِنْسَانَانْ** **حَبَكُ** **ژێ** **حَيَوَانَانْ**)
Cin ger **jî** şeytanan // Melek **jî** as'manan (عِنْ كَرُ **ژێ** **شَيْطَانَانْ** **مَلَكُ** **ژێ** **أَسْمَانَانْ**)*

(15)

- Ev yek di qertaflêkeran de jî tê xuyakirin. Piranîya “**in**”ên di dawîyê bêje û risteyan de weke “**în**” hatine nivîsîn. Weke mînak:

Mîrîdê şeytan î

'Elem ser milan î

Her yek wek dêwan î

Bi şûr û merçal î

(26)

Got em bê şimar in

Pêk ve namidar in

Temam pehlewan î

Genîmê kufar in

(66)

- Bi heman awayî ev yek di çend bêjeyên cuda de jî hatiye kirin weke: jîn (ژین), mîrîd (میرید), zîrna (زیرنا), bîra (بیرا), mezîn (مزین), hîşt (ههشت) wîsa (ویسا). Nivîskar bêjeyên ku divê bi tîpa "î"yê hatibûna nivîsandin mistensîx bi tîpa "i"yê nivîsîye. Ev tişt di metnên destxetan de weke şêwazeke nivîsînê jî dikare bê dîtin. Divê ev bêjeyên borî weha hatibûna nivîsîn: jin (ژن), mirîd (میرید), zirna (زیرنا), bira (بیرا), mezin (مزن), hîşt (هشت), wisa (ویسا). Em dê li jêrê çend mînakên jî van bêjeyan bidin:

Malik got ey 'Emra

***Jîn** û zaran hev ra*

Em biherin xo ra

*Kes nereve **jî** pa ra*

(49)

Kafir zor û ze'f in

Bê tirs û bi xef in

*Bi **zîrna** û def in*

Bi kîn û hem gef in

(55)

3. Di metnê de carinan heman bêje bi tîpên cuda hatine nivîsîn weke: bêjeya “esker” di metnê de bi piranî bi tîpa “sîn”ê (س) hatiye nivîsîn, lê di cihekî de bêjeya “eşker” bi tîpa “sad”ê (ص) hatiye nivîsîn.

Muḥemed Muştefa // ‘Esker kir bi şeffa (مُحَمَّدٌ مُصْطَفَا عَسْكَرٌ كِرٌ بِصَفَا)

Dîtin cewr û cefa // Çaryarê pur-wefa (دِيتِنُ جَوْرُو جَفَا چَارِ يَارِ پُرِ وِفَا)

(21)

Eşker şef bi şef bû // Bi zirna û def bû (عَسْكَرٌ شَفٌّ بِي شَفِّ بُو بِي زِرْنَا وَ دَفِّ بُو)

Jin û zar jî tev bûn // Çend roja sefer bûn (جِنٌ وَ زَارِ جِي تَعَبُو بُونُ چَند رُوژَا سَفرِ بُونُ)

(50)

- Herwiha dîsa di nivîsîna bêjeya “asiman”ê de jî heman xeletî hatiye kirin. Bêjeya “asiman”ê hem bi tîpa “elîf”ê “ا” û hem jî bi tîpa “eyn”ê “ع” hatiye nivîsîn.

Temamê insanan // Melek j'asimanan (تَمَامُ اِنْسَانَانِ مَلَكٌ جِي اَسِمَانَانِ)

Desta cin û canan // Ew tên pey insanan (دَستَا جِنُّ جَانَانِ اَوْتِيْنِ پِي اِنْسَانَانِ)

(110)

Bû roja qiyametê // ‘Erd hatiye hejyanê (بُوْرُوژَا قِيَامَتِ عَرْدِ هَاتِيَهَ هَژِيَانِ)

Toz bi ‘esmanan ketê // Serî hol bûn l'meydanê (تُوژِ بَعْسْمَانَانِ كَتِ سَرِي هَوْلِ بُونَلِيْدِيَانِ)

(288)

- Di nusxeyê de bêjeya “sê” bi du tîpên cuda hatiye nivîsîn weke: “sê” “سى” û weke “sê” “ث” hatiye nivîsîn.

Ji ḥicreta Resûlê Heq

Ḥezar sê şed ku derbaz bû

Û pêncî sê bikin laḥiq

Ji bo vê nezmê tarîx bû

(2)

Cebrîl gote pêgember

Şê hezar û sê şed car

- Ji ber kêma nivîsîna xalan di navbera tîpên “ف-ف” û “ف-ف” yê de tevlihevî çê bûye. Di nusxeyê de bêjeya “hev” weke “hef” (هف) hatiye nivîsîn.

Peygamberê kubar e

Wî gote çarûyar e

Bicne herba kufar e

Bi emrê Kirdigar e

(59)

Lewra pur gedar bûn

Hindek şubhê mar bûn

*Dirêj wek **cinar** bûn*

Ûayet ew dujwar bûn

(92)

*Di **biştê** ihsanan*

Desta cin û canan

Ketne pey insanan

Dûrî musulmanan

(96)

*Min dî li alyê **cepê***

Mîna hîva çarda

Kincê wan tev reş bûn

'Elem jî zêr kilda (120)

- Tevî ku di nusxeyê de di cihên cuda de bi awayekî rast jî hatine nivîsîn di hin bêjeyan de xeteyên teknîkî hatine kirin û ev bêje bi awayekî xelet hatine nivîsîn weke: zivîrî (زفیر), cardîn (جاردین), dubûm (دبوم), ‘Erbek (عربك) û nû’ê (نوي). Divê ev bêje weha bihatina nivîsîn: zivîrîn (زفیرین), cardîn (جاردین), dibûm (دبوم), nûr (نور), ‘Erebek (عربك). Çend nimûne ji bo van xetayên teknîkî ji *Cengnameya Huneynê* weha ne:

Ya Naciye hûş be
J' navê me ra 'eyb e
Cardîn binêr paşve
Çend 'elemê wan be

(107)

Cardin ew **zivîrî**
Li deştê nezer kir
Hindî ku fikirî
Rabû jê firar kir

(135)

Wekî nerre-şêran
Bîst pehlewana kûştin
Ez lê **dubûm** heyran
Ne 're radihêştin

(243)

- Di nusxeyê de bêjeya hêsirê de tîpên “i” û “ê” cih guhertine û weke hisêr (هیسیر) hatiye nivîsîn. Divê ev bêje weha hatibûya nivîsîn: hêsir (هیسیر).

Pêgember dil dişotî
Gava ku lê nezer kir
Hisêr jî çava hatî
Rabû wî dîde pûs kir

(253)

5. Mustensîx di çendîn cihan de bêjeyên ku bi “u”yê tîpê nivîsandin bi “û”yê nivîsiye weke: kûştin (کۆشتین), dû (دو), tû (تو), gûh (گوه), gûrg (گورگ), kûm (کوم), kûr (کور), hûş (هوش), dûjwar (دوژوار). Divê ev bêje weha hatibûna nivîsîn: Kuştin (کُشتین), tu (ت), du (د), guh (گه), gurg (گُرگ), kum (کُم), kur (کُر), huş (هَش), dujwar (دُژوار). Herwiha me jî di metna rexneyî de ev bêje li gorî standartê roja me nivîsîn.

Tû bike beyan e
Çend 'elemê wan e
Kincên wan çewa ne
Şef tîn yan bela ne

(108)

Nacî çav dûrbîn e
Dû roj rê dibîne
Gote Malik b' kîn e
Min got nebê dîn e

(109)

Ibnî Şeybe got tenê min
Dît Muḥemed şahê dîn
Bab û 'emmê min 'Elî
*Hemze ku **kûştin** bûye kîn*

(213)

- Nivîskar bêjeya “Zûlfeqar”ê hem bi “u” yê hem jî bi “û”yê nivîsiye. Weke mînak Zulfeqar (زُلْفَقَار), Zûlfeqar (ذُولْفَقَار). Mînakên vê bêjeyê weha ne:

Ew şahê Heyder e
Meşka xo l'wê danî
*Kêşa **Zulfeqar** e*

Yek qeṭ kir l'meydanê
Yek jî kir gelṭan e
Kafir hat gihanê

(241)

Zûlfeqar bend kir li puştê

Li 'iqab ew kir suwar

Hem dû'ayek kir ji bo wî

Wî Resûlê Kirdigar

(324)

6. Di nusxeyê de hin bêjeyên ku divê bê şedde (ّ) hatibûna nivîsandin bi şeddeyê hatine nivîsîn. Bêjeyên weke: şeffa, Hewwazîn û ewwa me weke: şefa, Hewazîn û ewa di metna rexneyê de rast kir.

Muḥemed Muştefa

*'Esker kir bi **şeffa***

Ditin cewr û cefa

Çaryarê pur-wefa

(21)

*Cab çû **Hewwazînê***

Şahê Hewazînê

Malik di wê ḥînê

Kir karê qêrînê

(23)

*Go **ewwa** Muğdad e*

Lawek 'Erebî ye

L'kaḫîran celad e

Libsê wan sipî ye

(117)

7. Ji ber xeteyên teknîkî di nivîsîna hin bêjeyan de di navbera nusxeyan de ferq derketine holê. Di nivîsîna wan bêjeyan de me forma herî berbelav tercîh kir. Weke bêjeyên: “piyan-peyan”, me awayê “piyan” tercîh kir.

Cengek wisan 'ecêb e
*Serî hol bûn ber **piyan***
Xûnê girtî rikêb e
Buxarê xwe da ciyan

(364)

8. Di nusxeyê de ji bo pêkanîna weznê hin bêje hatine kurtkirin. Me ew bêje bi awayê kurtkirî nîşandan. Çend bêjeyên ku nivîskar kurtkirine weha ne:

Eşhaban hilîne
Jî Meke 'ê derîne
*Xo pê ra **bighîne***
Nuşret ya wan nîne

(56)

Fîlhal da cewab e
*Heroj bîn **şelwat** be*
Jî heq ew hida be
*Li ser **zate** pak be*

(80)

Xemr û 'esel û şîr in
*Xuda **gotye** d'Qur'anê*
Kewa 'ib û Etrab in
*Ew **hûrîyê** cinanê*

Şî sê sal in 'umir wan
*Memik weke **fîncanê***
*Dîwarê wan j' **yaqûtan***
*Bi zêr **hatye** kildanê*

(301-302)

3.4.2. Îmlaya Nusxeya Muhemmed Emîn

Em dê di vir de li ser îmlaya nusxeya Muhemmed Emîn (NME) bisekinin û em dê taybetîyên vê nusxeyê tevî mînakên wê li jêr destnîşan bikin.

1. Di metna *Ġezwetu Huneynê* de dengê “ê” carinan bi kesreyê “î” carinan jî bi “y”yê hatiye saz kirin. Ji ber vê yekê di latînzekirina metnê de di gelek bêjeyan de xeletî derdiket holê. Hin ji wan bêjeyan ev in: şiwir (شور), wira[n] (ورا) şilîn (شيلين), mirê (مير), çî nabe (چ نابه), pince (پنج), mirê (مير), şir (شیر). Divê ev bêje weha hatibûna nivîsîn: Şêwr (شيور), wêran (ويران), şêlîn (شيلين), mîrê (ميري), çê nabe (چي نابه), pêncî (پنجي) mêr (مير) şêr (شير). Çend nimûne ji metna nusxeya duyem jî weha ne:

Xweyê gurzê gira[n] bûn

Qelbê wana wira[n] bûn

Dewran li wan dewran bû

Kalek li wan ‘eyan bû

(21)

Ġulam gote Malik

Ya ey mirê bala`ê

Min dî suwarek li nik

Hem xudanê liwa`ê

(115)

Hindek şubhê şiran

Dêlê ew hiltînin

Hindek şubhê maran

Xo li hev dalînin

(125)

2. Di metna vê nusxeyê jî de di çendîn cihan de ji dêvla tîpa “i- ِ”yê tîpa “yê”yê hatiye bikaranîn. Hin bêje û daçekên ku wisa hatine nivîsîn ev in: Lî (لي), jîn (ژين), gotîn (گوٿين), dîran (ديران), dîde (ديد), bîn (بين), hişt (ههشت) û mizîn (ميزين). Divê ev bêje û daçek weha hatibûna nivîsîn: Li (ل), jin (ژن), gotin (گوٿن), diran (دِران), dide (دِد), bin (بِن), hişt (هَشْت) û mezin (مَزِن).

Wê herne dîwanê

Paş wezna mîzanê

Şa bin bi îhsanê

Lî ehlê îmanê

(7)

Wan dît komek `esker

Çêbûn tev seranser

Eşhabê gerden-zer

***Gotîn** Ellah Ekber*

(78)

Hindek şubhê gûrgan

Pencê wan wek zergan

Ketne reqş û fîrgan

***Dîran** wek qocigan*

(81)

Li pişya suwaran

Yekî `elem reş e

*Tertîb **dîde** yaran*

Hûr hûr xweş dimeşe

(99)

3. Di metnê de di hin bêjeyan de dengê “î”yê bi kesreyê “î” hatiye sazkirin. Weke: “mir” (میر). Di vê ev bêje weha hatibûna nivîsîn: “mîr” (میر).

Ġulam gote Malik
*Ya ey **mîrê** bala`ê*
Min dî suwarek li nik
Hem xudanê liwa`ê

(115)

- Ev yek di qertaflêkeran de jî tê xuyakirin. Piraniya “in”ên di dawîyê bêje û risteyan de weke “în” hatine nivîsîn. Weke mînak:

*Kafir zor û ze **fîn***
*Bi tîrs û bi **xefîn***
*Bi kîn û hem **gefîn***
*Bi zirna û **defîn***

(43)

4. Di metnê de heman bêje bi awayên cuda hatine nivîsîn weke: suwar-siyar, sûwar, ruwayet-riwayet, ejdihayek-ejderhak- ejdîha, se- seg.

*Ser şubhê ew **sûwar** bûn*
Bi gazî hewar bûn
Fewc û fewc rewan bûn
Çil hezar hejmar bûn

(37)

Hat `elemek şor e
*Ser milê **suwarek***
Cubbê wan tev şor e
Qamet wek çinarek

(102)

Her terefan ceng e

Kes ha ji kesî nîne

Hay û hûy û deng e

Quwet kes tûnîne

'Elî s'yarek şeng e

Kesek ha jê nîne

(211)

Rawî kir riwayet

Bi delîl û ayet

Yasîn kir hikayet

Ewha kir dirayet

(10)

Rawîyan kirye ruwayet

Tu bizanê ey 'ezîz

Mu`min û kafîr bi carek

Hatine herbê şubhesîz

(189)

Malik pur 'enîrî

Dûjûnek dûjwar kir

Go ey kurê şe'ê

Te dest li me sar kir

(123)

Ji alyê kafîran

Derket şegê şor e

Desda teyr û bazan

Çi mel'ûnek zor e
Qamet wekî çinaran
Ji 'aqilan dûr e

(150)

5. Di metnê de heman bêje bi tîpên cuda hatine nivîsîn weke: biṭîrs (بِطْرَسُن), diṭîrsim (دِطْرَسِيم), bitîrsînin (بِطْرَسِين). Her sê jî heman bêje ne, lê di du cihan de bêjeya “tîrs”ê bi tîpa “ط” yê “ت” hatiye nivîsîn û di cihekê de jî bi tîpa “t”yê “ت”ê hatiye nivîsîn.

Malik gote qûl da
Ewana tev sihr in
Sihrê dikin peyda
*Da me **bitîrsînin***

(128)

Cehd bike nefsê bavêjî
Ew cihada ekber e
*Wî **biṭîrsînî** bi mewtê*
Şewat l' pêgember e

(202)

- Di nusxeyêde bêjeya zulfekar dîsa bi du “z”yên cuda hatiye nivîsîn. Di nusxeyêde bêjeya zulfekar hem bi vê “z”yê “ز” hem jî bi vê “z”yê “ذ” hatiye nivîsîn. Zûlfeqar (زولْفَقَار), Zûlfeqar (ذولْفَقَار). Em ê li jêrê nimûneyên vê bêjeyê bidin:

Ew şahê Heyder e
Meşka xo l'wê danî
*Kêşa **zûlfeqar** e*
Yek qeṭ kir li meydanê

(219)

Zûlfeqar bend kir li puştê

Li 'Iqab ew kir suwar

Hem dû 'ayek kir ji bo wî

Ew Resûlê Kirdigar

(299)

6. Nivîskar di çendîn cihan de bêjeyên ku bi “u”yê tên nivîsandin bi “û”yê nivîsîye weke: kûştin (كُوشْتِن), dû (دُ), tû (تُ). Divê ev bêje weha hatibûna nivîsîn: kuştin (كُشْتِن), tu (تُ), du (دُ).

Zubeyr got ey kafîr

Qebûl ke îmanê

Yan jî bibe hâzîr

Qeş meke dewranê

Dê tû biçî agir

Bi hukmê Qur'anê

(152)

Ibnî Şeybe got tenê min

Dît Muḥemed şahê dîn

Bab û 'emmê min 'Elî

Ḥemze ku kûştin bûye kîn

(191)

3.4.3. Îmlaya Nusxeya Mela Huseynê Botî

Ji ber ku nusxeya Mela Huseynê Botî bi temamî ne li ber destê me ye hem jî ji ber ku çavkanîya vê nusxeyê û ya Muhemmed Emîn (NME) heman e, me hewce nedît ku em bikevin nav hûrgilîyên îmlaya nusxeya Mela Huseynê Botî. Lewra tiştên em ê ji bo nusxeya NMEê bibêjin ji vê nusxeyê jî derbasdar e.

3.4.4. Ferqên Di Navbera Nusxeya NYY û NMEê de

Dema em li nusxeya Yusif Yaşar û Muhemmed Emîn mêze dikin em dibînin ku di navbera wan de ferq hene. Nusxeya NYYê ji aliyê qewareya xwe ve ji ya NMEyê mezintir e. Destpêkên her du nusxeyan ji hevûdu cuda ne. Di nusxeya NYYê de beşa dîbaceyê cih digire, lê di nusxeya NMEê de beşa dîbaceyê tune ye.

Destpêka nusxeya NYYê weha ye:

Bibin gûhdar ku ez bêjim

Beyan kim ez hikayatê

Ji geman hûn bibin azad

Ku seh kin vê îbaratê

(1)

Destpêka nusxeya NMEyê weha ye:

Ewwil bismillah î

Elhêmdulillah î

La'iq Padişah î

Bê mesken û cah î

(1)

Di her du nusxeyan de terkîb, bêje û bendên ne wek hev hene ji ber vê yekê di navbera her du nusxeyan de cudahî derketine holê. Çend cudahî û ferqên di navbera her du nusxeyan de weha ne:

Hetikandin pût e

Bi agirê bîzoq e

Qelbê min disote

Ne aferîn j' bo te

(30)

Ev Benda li jor di nusxeya NYYê de cih nagire, lê di ya NMEê de cih digire.

Wan dî bi rê va newalek

Me`mûr kiribû kalek

Tê de koşk û sera`ek

Derbaz kiribû dewranek

Wî gote wan kafiran

Ya begler û emîran

Yaniş we kirye dewran

Zeman bi wî ra yar e

(53-54)

Di nusxeya NMEê de ev her du bendên li jor cih nagirin, lê di ya NYYê de ev bend hene.

Di navbera nusxeyan de ji aliyê heman bêjeyan ve jî cudahî heye ango heman bêje bi tîpên cuda û bi awayên cuda hatine nivîsîn weke: hilvirandin-hilfirandin, gûhûrîn-gûhirîn, muşrî-misrî û hwd.

Nusxeya NYY:

Tirsa me tûnîne

Minet bi kes nîne

Xelqê em pûr dîne

*Bi şûrê **muşrî** ne*

(69)

Eşhabe fikirîn

Qaşek lê heyirîn

*Berî jê **gûhûrîn***

Çûn paşda sekinîn

(93)

Zubeyr şûr kişandî

Carek lê hewar kir

*Serî **hilvirandî***

Ew lahiqê nar kir

(178)

Nusxeya NME:

Eşhabe fikirîn

Qaşek lê heyirîn

*Berî jê **gûhirîn***

Çûn paşda sekinîn

(79)

Zubeyr şûr kişandî

Carek lê hewar kir

*Serî **hilfirand***

Ew lahiqê nar kir

(154)

Xofa me tûnîne

Minet bi kes nîne

Xelqê em pûr dîne

*Bi şûrê **mişrî** ne*

(55)

Herwiha ji bilî mînakên li jorê di nivîsîna çendîn bêje, daçek û qertafan de jî cudabûn di navbera her du nusxeyan de hebûn. Ji ber van cudabûnan me forma standart bi kar anî. Ango forma ku niha herî berbelav e me tercîh kir.

3.5. Amadekirina Metna Rexneyî

3.5.1. Rê û Rêbazên Amadekirina Metna Rexneyî

Me di amadekirina metna rexneyî ya *Gezwetu Huneynê* de nusxeya Yusif Yaşar ji xwe re kir bingeh. Me lêkolînên xwe li gorî vê nusxeyê kirin û di jêrenotan de cudahîyên nusxeya Muhemmed Emîn jî nîşan dan. Di vê metna rexneyî de em li ser du nusxeyan sekinîn û me ev nusxe berawird kirin û ferqên di navbera wan de nîşan dan.

Di xwendina nusxeyan de em rastî gelek zehmetî, pirsgirêk û tevlihevîyan hatin, lewra ji ber ku di gelek cihan de xeteyên teknîkî hatibûn kirin xwendina nusxeyan dijwar bû. Herwiha ji ber ku nivîskar li hin cihan li dewsa tîpa “î”yê tîpa “î”yê bi kar anîye û dîsa bi tîpa “î”yê tîpa “ê”yê îfade kiriye. Ji ber vê bikaranîna îmlayê tevlihevî derketine meydanê. Me ev yek bi awayekî berfireh di beşa “Îmlaya Nusxeyan” de rave kir. Ji ber vê yekê em dê li vir zêde nekevin vê mijarê.

Di alfabeya Erebi de tîpa ye “ع”yê hem dengê “î”yê, hem dengê “ê”yê û hem jî dengê “y”yê dide. Dîsa tîpa wawê “و” jî dikare hem dengê “û-u”yê hem dengê “o”yê hem jî ye “w”yê bide. Me jî di metnên nusxeyan de ev her du tîp li gorî ihtiyacê bi van awayan xwendin.³²⁵

3.5.2. Alfabeya Transkrîpsiyonê

Gezwetu Huneyna Mela Yasînê Alikî jî bi tîpên Erebi hatiye nivîsîn. Hin tîpên weke **p** (پ), **ç** (چ), **j** (ج) û **v** (ف) ku di berhema Mela Yasînê Alikî de hene di alfabeya

³²⁵ M. Zana Karak, “*Dîwançeya Şêx Îsmetullahê Karazî (Metn û Lêkolîn)*”, (Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî Yên li Tirkiyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî), Mêrdîn 2020, r. 254.

Erebî de tune ne. Me di latînîze û transkrîpsîyonê de alfabeya navneteweyî bi kar anî û metna xwe li gorî wê nivîsî.

Alfabeya ku me di latînîzekirina metna rexneyî de bi kar anî ev e:

Tablo 5: *Tabloya herfên transkrîpsîyonê.*

| Herfên Transkrîpsîyonê yê Navneteweyî | | | |
|--|---------------------|--------------|---------------------|
| Erebî | Kurdî Latînî | Erebî | Kurdî Latînî |
| ا | a | ط | t |
| ب | b | ظ | z |
| پ | p | ع | ' |
| ت | t | غ | g |
| س | s | ف | f |
| ج | c | ق | v |
| چ | ç | ك | k |
| ه | h | گ | g |
| د | d | ل | l |
| ذ | z | م | m |
| ز | z | ن | n |
| ر | r | ه | h |
| ژ | j | و | û-u-o-w |
| س | s | ی | y-î-ê |
| ش | ş | ع | ' |
| ه | ş | Apostrof | ' |
| ن | ž/đ | | |

3.5.3. Latînîzekirin û Rêbaza Amedekirina Metna Ğzewtu Huneynê

❖ Metna *Ğzewtu Huneynê* li gorî alfabeya transkrîpsîyonê ya navneteweyî hat latînîzekirin.

❖ Nusxeya Yusif Yaşar ji bo vê xebatê weke bingeh hatiye qebûlkirin. Di latînîzekirina nusxeyê de di metna rexneyî de hejmara rûpelan di nav kevaneka çargoşe ([]) de hatiye dayîn. Ji bo her rûpelekî hejmarek hat dayîn û bi tevahî 115 rûpel hatine latînîzekirin.

❖ Di cengnameyê de malik û bend yeko yeko hatine nimarekirin.

❖ Di latînzekirina metna rexneyî ya cengnameyê de li gorî metnên nusxeyan midaxele hatine kirin. Bêjeyên ku divîyabû bi herfên kurt bihatina nivîsîn hatin sererastkirin. Di amadekirina metna rexneyî de her du nusxeyên li ber dest hatin bikaranîn. Li gorî karîne û hewcedariyê hin bêje, terkîb, riste, malik û bend ji nusxeya dirusttir hatin wergirtin û di metna rexneyî de hatin bicîkirin.

❖ Di jêrenotan de cudahiyan di navbera nusxeyan de hatine destnîşankirin.

❖ Ravek û hevokên Erebî û Farisî bi awayekî îtalîk hatin nivîsîn û me'neyên van îbareyan di jêrenotan de bi Kurdî hatine dayîn.

❖ Di metnê de ji bo pêkanîna kêşê hin tîpên dengdêr ketine ango hin kite hatine daqurtandin. Ev bêje ji aliyê nivîskar ve ji bo weznê hatine kurtkirin. Hin bêjeyên ku ji bo kêşê hatine daqurtandin ev in: hatne, kirye, bicne, zikr, kişyane, selwat, ketne, alyê, girtye, hukmê, kirne, bibne, tilyan, vekirye, gotye, deryê.

❖ Di gelek bêje, terkîb û îzafeyên Erebî de tîpa "hemze"yê hebû û ev tîp bi vê nîşaneyê (') hat nîşandan.

Ew Se'dê 'Ubad e

Re'îsê Medîne

Cubbe ji zêr sade

Ez dikim enîne

(123)

'Ebd got ya Mewla'ê

Şexşek bû numa'ê

Nûrek birq veda'ê

Ew nûr çû sema'ê

(125)

❖ Di navbera du bêje an jî terkîb û ravekên ku divê bi hev re bihatina xwendin nîşaneyê xêzika kin (-) hat danîn.

Weke: pur-wefa, pût-latan, xweş-kalek, gerden-zer, ney-naqoran, cundu's-seqeleyn, kûr-apê, La-yenam, nere-şêran, şinge-şingê, gûjje-gûjê, Xetmu'l-Murselîn,

bit-temam, sirr'ul-beqer, cumle-temam, La-yezal, Fexru'l-umem, Zûl-Celal, Teb'et-xweş, şûr-demir, Bil-'umûm.

❖ Di serê bêjeyan de di nîşandayîna bêjeya te'rîfê de nîşaneyê xêzika kin (-) hat bikaranîn: weke:

El-qîşşe çû rê da
Bi deşt û qûmê da
Ejdêhak bû peyda
'Esker revî paş da

(58)

Hûtan di nava behran
Wana serî hilanî
Cenawiran li berran
*Gazî dan **el-emanî***

(359)

❖ Di navbera nusxeyan de di bikaranîna şeddeyê de hev girtin tune bû. Ji ber ku di Kurdî de şedde tune bû di metna rexneyî de ji bo bêjeyên Kurdî forma bê şedde hat tercih kirin.

*Go **ewa** Muğdad e*
Lawek 'Erebî ye
L' kafîran cellad e
Libsê wan sipî ye

(119)

Ellah Ellah gotin
*Wan şed **nere-şêran***
Xûn j' kafîran rêtin
Weke tavê baran

(184)

- Herwiha ji bo bêjeyên Erebi jî forma bişedde hat tercih kirin.

*'Eskerê **kuffar** in*
Peya û suwar in

Wekî şe'ê har in
Hatin bê şumar in

(26)

3.5.4. Rastnivîs û Xalbendî

Di metneke rexneyî de nîşandayîna xalbendîyê gelekî girîng e. Bi saya xalbendîyê metn bi awayekî zelal tê fêmkirin. Di amadekirina metna cengnameyê de me ev xal li ber çavan girtin û me ew bi kar anîn.

1- Me di serê hemû risteyan de û di navên taybet de tîpên mezin bi kar anî.
Mînak:

Bibin guhdar ku ez bêjim
Beyan kim ez hikayâtê
Ji geman hûn bibin azad
Ku seh kin vê îbaratê

(1)

Ji hedîsan dikir ixrac
Beyan kir Cenga Huneynê
Bi Kurmancî wî kir idrac
Ku du'an bo wî bixwînin

Eger Kurmancî mewzûn bû
We nîne bê hedîs ayat
Yasîn perwanê narê bû
Beyan kir hal û ehwalat

(8-9)

2- Ji bo ayet û hedîsan nîşaneyên dunikê (“ ”) hat bikaranîn.
Nimûne:

Bi zahir “ehsenê teqwîm”
Dihatne nava meclisa

*Me nefsa xwe dikir teslîm
Di baîin xab û hem desa*

(4)

3- Terkîb, îzafet û hevokên bi Erebî û Farisî bi awayê *xwar* ango *îtalîk* hat nîşandan. Wateya wan jî di jêrenotan de hat dayîn.

*Bi zîkrullahê 'eynê
Ew çûn li wê mabeynê
Wan **cundu's-seqeleynê**
Bi hewar hatne Huneynê*

(101)

*Wî digot ya ehlê Riðwan
Ehlê **bey'et hûn** werin
Ez dikim qesem ji bo we
Sag e **Xetmu'l-Murselîn***

(202)

4- Me kevaneka çargoşe ([I]) jî ji bo midaxale û sererastkirinên di metna rexneyî de bi kar anî.

Mînak:

*Malik Binê **E[w]f** bû
'Esker lê berhev bû*

*Bi zirna û def bû
Bi kîn û hem gef bû*

(28)

*Kêf kirin feqîra[n]
Bû şewra wezîran
Şuhbetê emîran
Şeda'ê nefîran*

(31)

5- Nîşaneyên slaşê (/) di jêrenotan de di navbera risteyên bendan de hat bikaranîn.

‘Eskerê kufar e // Peya û suwar e // Wekî şe’ê har e // Hatîn bê şumar e
(26)

6- Di cengnameyê de ji bo ku metn ji alîyê weznê ve li hev were di hin bêjeyan de kite hatin daqurtandin. Ew kiteyên ku hatin daqurtandin bi vê nîşaneyê “” hat nîşandan. Weke mînak:

Ferdeki insanan
Hebek ji heywanan
Cin ger ji şeytanan
Melek ji as'manan

(15)

Qewlê te l' vê derê
Sebebê nezerê
Gehişte 'eskerê
Şubhê gezenferê (71)

3.5.5. Ferhengoka Ğzewetu Huneynê

Berhema Mela Yasînê Alikî her çiqas ji alîyê ziman ve bi zimanekî sade û xwerû hatibe nivîsîn jî gelek bêje û terkîbên ku ji zimanên weke Erebî û Farisî hatibûn girtin nedihatî fêmkirin. Ji ber vê yekê me hewce bi amadekirina ferhengokekê ji bo vê xebatê dît. Ferhengoka metna *Cengnameya Huneynê* di dawîya xebatê de weke pêvek hatiye dayîn.

3.6. METNA REXNEYÎ YA ĞEZWETU HUNEYNÊ

[r. 1]

*Hel cezau 'l-ihsan ille 'l-ihsan.*³²⁶

*Înne 'llahe camî 'u 'l-munafiqîne we 'l-kafirîne fi Cehenneme cemî 'en.*³²⁷

*Wela tenkîhu 'l-muşrîkate hetta ye 'mîn.*³²⁸

*Înne 'l-munafiqîne fi 'd-dereke esfele mîne 'n-nar.*³²⁹

[r. 2]

[r. 3]

[r. 4]

Şahibehu we malikehu Yûsif ibnî Hecî Mela Qasim fi qeryetî we beled Erciş

*Şahibe we malike emced ibnî Yûsif fi qeryetî Kirakom min wîlayetî...*³³⁰

[r. 5]

YA ELLAHÛ TE 'ALA BISMÛLLAHÛRREĤMANIRREĤÎM

*Leqed neşerekumullahû fi mewatine kesîretin we yewme
Huneynin îz e'cebetkum keşretukum.*³³¹

ĞEZWETU ĤUNEYN BIMENNÎĤÎ TE 'ALA³³²

1. Bibin guhdar ku ez bêjim

Beyan kim ez hikayatê

Ji geman hûn bibin azad

Ku seh kin vê 'ibaratê

³²⁶ Sûreya Rehmanê 55/60. “هَلْ جَزَاءُ الْإِحْسَانِ إِلَّا الْإِحْسَانُ” Maneya ayetê: “Mukafata (karê) qenciyê nîne ku ne mukafata qenc be (padaşa qenciyê bes qenci ye)”.

³²⁷ Bêguman Xweda minafiq û kafiran bi teyayî dê têxe Cehennemê.

³²⁸ Sûreya Beqera 2/221. “وَلَا تَتَّبِعُوا الْمُشْرِكِينَ حَتَّىٰ يُؤْمِنُوا” Maneya ayetê: “(Gelî Misilmanan!) Jinên mişrîk, heta ew îmanê neyînin bi wan re nezewicin”.

³²⁹ Sûreya Nîsa 4/145. “إِنَّ الْمُنَافِقِينَ فِي الدَّرَكِ الْأَسْفَلِ مِنَ النَّارِ وَلَنْ تَجِدَ لَهُمْ نَصِيرًا” Maneya ayetê: “Bêguman munafiq, di cehennemê de di qata herî jê de ne”.

Di nusxeya NYYê de ji nivîsê tê xuyakirin ku ev ayet û hevok pişt re li nusxeyê hatine zêdekirin. Herwiha hubra nivîsê jî şin e û ji nivîsên dinê nûtir xuya dike. Hubra eslî ya destxetê reş e.

³³⁰ Ev bêje nehat xwendin.

³³¹ Sûreya Tewbe 9/2. Lê ayet bi temamî nehatiye dayîn. Tevahiya ayetê û maneya ayatê weha ye; “لَقَدْ نَصَرَكُمُ اللَّهُ فِي مَوَاطِنَ كَثِيرَةٍ وَيَوْمَ حُنَيْنٍ إِذْ أَعْجَبَتْكُمْ كُنُوزُكُمْ فَلَمْ تَغْنَعَنَّكُمْ شَيْئًا وَصَافَتْ عَلَيْكُمُ الْأَرْضُ بِمَا رَحُبَتْ ثُمَّ وَلَّيْتُم مُّدْبِرِينَ”. “Sond be, Xwedê di gelek cihan de alîkarîya we kir. Roja Huneynê jî (alîkarîya we kir); wê dema piraniya we hûn germ kirin, vêca piraniya we tu feyde negihande we û tu tişt ji we neda paş. Erd digel firehiya xwe jî li we teng bû û paşê we pişt xwe da şer û hûn revîyan”. Heman ayet di nav metnê de dîsa hatiye dayîn.

³³² Bimennîhî Te'ala: “Bi alîkarîya Xwedê”.

[r. 6]³³³

2. Ji hîcreta Resûlê Heq
Hezar sê şed ku derbaz bû
We pêncî & ê bikin lahiq
Ji bo vê nezmê tarîx bû³³⁴

3. Tema hemdem di wî weqtî
Şîfatê şer'a şerîf da
Bi kê ra me fikir ulfet
Rezîl bûn em di 'amê da

4. Bi zahir “*ehsenê teqwîm*”³³⁵
Dihatne nava meclisa
Me nefsa xwe fikir teslîm
Di baîin xab û hem desa

5. Nagah Xaliq 'inayet kir
Hişyar kir ew ji gefletê
Libasê xilîtetê rakir
Rûniştî ew di 'uzletê

[r. 7]

6. Ji nasan wî fikir 'uzlet
Dinalya ew wekî bilbil
Vebû ber wî gulistanek
Temamê wê gul û sunbil

7. Ji Xaliq wî fikir daxaz
Işareta Resûlullah

³³³ Di serê vê rûpelê de îfadeyên “۲ lahiq”, “۳ teqwîm” hatine nivîsîn.

³³⁴ 1353yê hicrî beranberî 1934ê miladî tê. Li gorî agahîya di vê bendê de em fêhm dikin ku ev metn di vê dîrokê de hatiye nivîsîn.

³³⁵ Sûreya Tînê, 95/4. “أَحْسَنُ تَقْوِيمٍ”. Mane: “Bi rastî jî me însan di şîklê herî rind û tekûz de afirandiye”.

Wekî bilbil bike perwaz
Bi wan methê Hebîbullah

8. Ji hedîsan dikir ixrac
Beyan kir Cenga Huneynê
Bi Kurmancî wî kir idrac
Ku du'an bo wî bixwînin

[r. 8]

9. Eger Kurmancî mewzûn bû
We nîne bê hedîs ayat
Yasîn perwanê narê bû
Beyan kir hal û ehwalat

10. Bikin hemd û &ena'ê Heq
Digel wî jî şewatan
Bidin ser wî Reşûlê Heq
Bi 'ededê zerreyatan³³⁶

HEMD ŞELEWAT PIŞTÎ BISMILLAHE³³⁷

Ewwil *bismillahi*³³⁸

*Elhemdulillahi*³³⁹

La'iq Padişah î

Bê mesken û cah î

[r. 9]

11. Lewra ew Henan e
Hennan û Mennan e
Rehîm û Rehman e
Gefûrê zenban e

³³⁶ Ev deh bendên serê menzûmeyê di her du nusxeyên din de tune ne, tenê di NYYê de hene.

³³⁷ Bismillahîrrehmanîrrehîm: NME.

³³⁸ Bi navê Xwedê.

³³⁹ Ji Xwedê re şikir.

12. Ğeffûr û Ğeffar î
 Rehîm û Settar î³⁴⁰
 Mudam tu hişyar î
 Xudawend û mar î
13. Xudawend û mûr e
 Xudawend û nûr e
 Xudawend û tûr e
 Ji kafiran dûr e
- [r. 10] 14. Ferdek ji insanan
 Hebek ji heywanan
 Cin ger³⁴¹ ji şeytanan
 Melek ji as'manan
15. Hemû dê fena bin
 Paşê dîsa rabin
 Muhtacê Xuda bin
 Li heşrê berhev bin³⁴²
16. Wê herne dîwanê
 Paş wezna mîzanê
 Şa bin bi ihsanê
 Li ehlê îmanê
17. Her çî ku kuffar e
 Bê dîn û egdar e³⁴³

³⁴⁰ Kerîm û Settar î: NME.

³⁴¹ Cin eger: NME.; Cin kir: MHB.

³⁴² Şamê ew berhev bin // Muhtacê Xuda bin: NME.

³⁴³ Bê dîn û gedar e: NME.

Îman nebû yar e
Muṭleq ehlê nar e³⁴⁴

[r. 11]

18. Em taze beyan kin
Mexfiyan ‘eyan kin
Meclisê şadan kin
Pê def‘a ğeman kin³⁴⁵

19. Rawî kir riwayet
Bi delîl û ayet
Yasîn kir hikayet
Ewha kir dirayet

20. Muḥemmed Muştefa
‘Esker kir bi şefa
Dîtin cewr û cefa
Çaryarê pur-wefa³⁴⁶

[r. 12]

21. Li Mekke’ê zor kir
‘Elem lê zuhûr kir
Pût û şenem hûr kir
Ji Ke‘be’ê dûr kir

22. Hetka wan pût-latan
Hetka wan Menatan
Qetla wan sadatan
Cewab çû welatan³⁴⁷

³⁴⁴ Muṭleq ehlê nar e // Wê înkâr û mekar e: NME.

³⁴⁵ Pê def‘a ğeman kin // Cemaetê şa kin: NME.

³⁴⁶ Çaryarê pur-wefa // Dîtin cewr û cefa: NME.

³⁴⁷ Ev bend di NYYê de tune ye.

23. Cab³⁴⁸ çû Hewazînê
Şahê Hewazînê
Malik di wê hînê
Kir karê qêrînê
24. Cewab dane Çînê
Digel Seqîfûnê
Begler hatne kînê
Bo xêrata dînê³⁴⁹
- [r. 13] 25. ‘Eskerê kuffar in
Peya û suwar in
Wekî şe’ê har in
Hatîn bê şumar in³⁵⁰
26. Mirîdê şeytan in
‘Elem ser milan in
Her yek wek dêwan in
Bi şûr û mertal in³⁵¹
27. Malik Binê ‘E[w]f bû
‘Esker lê berhev bû
Bi zirna û def bû
Bi kîn û hem gef bû³⁵²
28. Malik çû sera’ê
Xweş tertîbek da’ê

³⁴⁸ Cewab.

³⁴⁹ Cewab dane Çînê: NME.

³⁵⁰ ‘Eskerê kuffar e // Peya û suwar e // Wekî şe’ê har e // Hatîn bê şumar e: NME.

³⁵¹ Ev bend di NMEê de tune ye.

³⁵² Malik Binê ‘Ef bû // Bi kîn û hem gef bû // Bi zirna û def bû // Begler lê berhev bûn: NME.

Ji bona şefa'ê
'Esker hat geha'ê³⁵³

[r. 14]

29. Go gelî gulaman
Hazar kin te'aman
Wan meşkê şeraban³⁵⁴
Hem şerbet û caman

30. Kêf kirin feqîra[n]
Bû şêwra wezîran
Şuhbetê emîran
Şeda'ê nefîran³⁵⁵

31. Şêwra wan giran bû
'Işretek tamam bû
Qelbê wan wêran bû
Dewran ew dewran bû³⁵⁶

32. Yek hatî ji der da³⁵⁷
Di şiklê kalan da
Darek di destan da
Go gelî ewlada³⁵⁸

[r. 15]

33. Ji Mekke'ê tême
Deh roj e li rê me

³⁵³ Li çardağ û hewa'ê // Ji bona şefa'ê: NME.

³⁵⁴ Hem bînin kebaban: NME.

³⁵⁵ Lafkirin xenzîran // Bi gurz û şûr û tîran: NME.

³⁵⁶ Xweyê gurzê gira[n] bûn // Qelbê wana wêra[n] bûn // Dewran li wan dewran bû // Kalek li wan 'eyan bû: NME.

³⁵⁷ Kalê hatî ji der da: NME.

³⁵⁸ Go ey gelî ewlada // Derdek li min bû peyda: NME.

Dilê min xûn kême
Bi şîn û girî me³⁵⁹

34. Lewra ez hezîn im
Bi şîn û girîn im
'Ecêban dibînim
Bi ah û nalîn im³⁶⁰

[r. 16]

35. Rabûn istiqbal e
Vewestan li bal e
Bibêj çi ehwale
Çi kalek delal e

36. Xweş-kalek zana î
'Arif û dana î
Pût-latan tu da' î
Beyan ke de'wa'ê

37. Kalê got ey serwer
'Esker kir pêgember³⁶¹
Digel 'Elî Heyder
Ji Medîne çûn der

38. Mekke fetih kirin
Şena metih kirin
Ke'be paqij kirin
Ji pûtan dûr kirin

[r. 17]

³⁵⁹ Ji wan mîrê Çisîm e: NME.

³⁶⁰ Bi ah û nalîn im // 'Ecêban dibînim: NME.

³⁶¹ 'Esker [kir] pêgember: NYY.

39. Muhemmed pur zor kir
Pût û şenem hûr kir
Çavê wan tev kor kir
Ji Ke‘be’ê dûr kir³⁶²

40. Hetikandin pût e
Bi agir bizoç e
Qelbê min disote
Ne aferîn j' bo te³⁶³

41. Hetka wan pût-latan
Hetka wan şenatan
Qetla wan sadatan
Cewab çû welatan³⁶⁴

42. Kalê ‘Ezazîl bû
‘Ekrût û xebîs bû
Muzawer telbîs bû
Tu nabê Iblîs bû

43. Te‘na xo beyan kir
Fesadî ‘eyan kir
Kînek wisan kar kir³⁶⁵
Qelbê wan wêran kir

[r. 18]

44. Malik ahîn rada
Kulma l' singê xo da

³⁶² Ev her du risteyên dawî di NYYê de tune bû.

³⁶³ Ev bend di NYYê de tune bû.

³⁶⁴ Ev bend di NMEê de tune bû.

³⁶⁵ Ev bêjeya “kir” di NYYê de tune bû.

‘Eqlê wî bû şeyda³⁶⁶
Bihna xo girt berda

45. Ev nav l' min heram be³⁶⁷
Hubel ber piyan be
‘Alem bi me şa be
Muhemmed terxan be

46. Bi pût û latan kim
Serê ‘Elî jê kim
Muhemmed ber pê kim
Şugulê wan çêkim

[r. 19]

47. Bişêlînim sûkan
Aza kim piçûkan
Bînim qîz û bûkan
Deng biçe mulûkan

48. Şubhê ew suwar bûn³⁶⁸
Bi gazî hewar bûn
Fewc û fewc rewan bûn
Çil hezar hejmar bûn³⁶⁹

49. Dengê ney-naqoran
Dengê wan bilûran
Şeda'ê nefîran³⁷⁰
‘Irrînê be ‘îran

³⁶⁶ ‘Eqîl wî bû şeyda: NME.

³⁶⁷ Go ev nav l' min heram be: NME.

³⁶⁸ Ser şubhê ew suwar bûn: NME.

³⁶⁹ Fewc û fewc rewan bû // Çil hezar hejmar bû: NYY.

³⁷⁰ neqîran: NME.

50. Malik got ey ‘Emra³⁷¹
Jin û zaran hev ra³⁷²
[r. 20] Em biherin xo ra³⁷³
Kes nereve j' pa ra

51. Eşker şef bi şef bû
Bi zirna û def bû
Jin û zar jî tev bûn
Çend roja sefer bûn

52. Wan dî b' rê va newalek
Me‘mûr kiribû kalek
Tê de koşk û sera‘ek
Derbaz kir' bû dewranek

53. Wî gote wan kafiran
Ya begler û emîran
Yaniş we kirye dewran
Zeman bi wî ra yar e³⁷⁴

[r. 21]

54. Bi emrê Celîl e
Nazil bû Cebrîl e
Hate cem Xelîl e
Bi se‘y û te‘cîl e

55. Gotê ya Iname
Xuda kir selam e

³⁷¹ Di berhema *Sîretü'n-Nebî* ya Muhemmed Efendî (s.s. 15em) de ev nav weke “Urwe” derbas dibe.

³⁷² Jin û zaran bi hev ra: NME.

³⁷³ Em biherin bi xo ra: NME.

³⁷⁴ Bendên di rêza 53-54an de di NMEê de tune ne.

Hażir bin tamam e
Ez bikim i‘lam e³⁷⁵

56. Kafır zor û ze‘f in
Bê tirs û bi xef in
Bi zirna û def in
Bi kîn û hem gef in³⁷⁶

[r. 22]

57. Eşhaban hilîne
Ji Mekkê derîne
Xo pê ra bighîne
Nuşret ya wan nîne

58. Eskerê Hewazîn³⁷⁷
Begê Seqîfûnê
Ew tîn bi yeqînê
Wê werne Huneynê³⁷⁸

59. Ellah Ellah tebarek
Navê Xuda mubarek
Hûn bînin tev bi carek
Hażir bikin tedarek

[r. 23]

60. Pêgemberê kubar e
Wî gote Çarûyar e³⁷⁹
Biçne herba kuffar e
Bi emrê Kirdigar e

³⁷⁵ Hażir bin tamam e // Bi emrê ‘elame: NME.

³⁷⁶ Bi kîn û hem gef in // Bi zirna û def in: NME.

³⁷⁷ Eskerê Hewazînê: NYY.

³⁷⁸ Danîne li Huneynê // Hûn bikin yeqînê: NME.

³⁷⁹ Wî gote Çariyar e: NME.

61. Wana da wî cewab e
Ev teklîfa şewab e
Qurban be da û bab e
Rûhê me tev fida be

62. Pêgemberê nûranî
Eşhabe xo ra anîn³⁸⁰
'Elem ji cih hilanî
Ji Mekke'ê deranî[n]

[r. 24]

63. Bi rê ketî 'esker e
Meymen e hem meyser e
Rastê Şidîq Ekber e³⁸¹
Li çep 'Emîr 'Umer e

64. Li pêş 'Elî Heyder e
Li ortê pêgember e
Xaliş nûra Ekber e
Ji wechan nûr çû der e

65. Dengê zîkr û tehlîlan
Hayûhûyê emîran
Li deştê bûne leylan
Kişyane ser rezîlan

66. Çol û çolistan e
Derb û derbustan e
Mewc dan wek behran e
Ebas kir beyane

[r. 25]

³⁸⁰ Eşhabe bi xo ra anîn: NME.

³⁸¹ Li rast Şidîq Ekber e: NME.

67. Got em bê şîmar in
Pêk ve namidar in
Temam pehlewan in
Ĝenîmê kufar in

68. Tîrsa me tûnîne³⁸²
Mînet bi kes nîne
Xelqê em pur dîne
Bi şûrê Mişrî ne

69. Pêgember got ya 'em
Ev çi hezn û matem
Qewlê te got ev dem
Şubhê tîra Rustem

[r. 26]

70. Qewlê te l' vê derê
Sebebê nezerê
Gehîşte 'eskerê
Şubhê gezenferê

71. El-qîşşe çû rê da
Bi deşt û qûmê da
Ejdêhak bû peyda³⁸³
'Esker revî paş da

72. 'Esker kir firar e
Bû gazî hewar e

³⁸² Xofa me tunîne: NME.

³⁸³ Ejdîhayek bû peyda: NME.

Ejdihak gedar e³⁸⁴
Agir j' dev dibare³⁸⁵

[r. 27] 73. Pêgember sual kir
Bo çi we firar kir
'Elî aşîkar kir
Nebî xeberdar kir

74. Ejdihak me diye³⁸⁶
Newal kir tejî ye
Carek hû kiriye
Çiya lerîzîye

75. Şande wî Heyder e
Ew Şêrê Ekber e
B' emrê pêgember e
Hucûm kir li ser e

76. 'Elî çû ser mar e
Kêşa zulfeqar e³⁸⁷
Qetil ke yek car e
Ziya kir hewar e³⁸⁸

[r. 28] 77. Go heçî Islam e³⁸⁹
Qetlam lê heram e
Serdarê cina me
Ez dikim i'lam e

³⁸⁴ Ejderhak gedar e: NME.

³⁸⁵ Ager j' dev dibare: NYY.

³⁸⁶ Ejderhak me diye: NME.

³⁸⁷ Kîşand zulfeqar e: NME.

³⁸⁸ Zîha kir hewar e: NME.

³⁸⁹ Got her çi Islam e: NME.

78. Lewra musulman im
Ji ehlê iman im
Xuda yek dizanim
Resûl umîdwar im
79. ‘Elî paşda ğar kir
Nebî xeberdar kir
Ev ‘ecêb îzhar kir
Eşhabe tev şa kir
- [r. 29] 80. Pêgember rewan bû
L' ejdiha numa bû³⁹⁰
Ew ji ber va rabû
Ser boçkê qiyam bû
81. Fîlhal da cewab e
Heroj bîn şelwat be
Ji heq ew hida be
Li ser zâtê pak be
82. Ewwel bibe agah
Ew e yek Padişah
Tû' î Resûlellah
Em in ‘ibadullah
83. Neh hezar cinî ne
Îman b' te anîne

³⁹⁰ Li ejderha ‘eyan bû: NME.

Xuda yek zanîne
L' filan cezîrê ne³⁹¹

[r. 30]

84. Ne heş qûmandar in
Serdarê cinan in
Bi zîkr û Qur'an in
Meşgûlê dersan in³⁹²

85. Cewab da me dêwek
Malik kir tedarek
Top kir çil hezarek
Diçe ser mubarek

86. Cinan ku bihîstin
Ji hev du ra gotin
Musulman ku bêtin
Em jî dê biçitin

87. Em hatin vê derbê
Ji şerqê ta gerbê
Da em bikin herbê
Şifa bike qelbê

[r. 31]

88. Qelbê me şifa ke
Lûtfen me daxaz ke
Li bal xo îhzar ke³⁹³
Rûhê me fida ke

³⁹¹ L' filan cezîrê ne: NME.

³⁹² Meşgûl bi dersan in: NME.

³⁹³ Li bal xo hazir ke: NME.

89. Resûl got ey serwer³⁹⁴
Navê te bû 'Umer
Mizgîn de seranser
Bira bêne ev der

90. Heman 'Umer şa bû
Fîlhal ew punhan bû
Sa'etek winda bû
Cardin hat 'eyan bû³⁹⁵

[r. 32]

91. Wan dît komek 'esker
Çêbûn tev seranser
Eşhabê gerden-zer
Gotin Ellah Ekber

92. Eşhabe fikirîn
Qaşek lê heyirîn
Berî jê guhurîn
Çûn paşda sekinîn

93. Lewra pur gedar bûn
Hindek şubhê mar bûn
Dirêj wek çinar bûn
Gayet ew dujwar bûn

94. Hinek şubhê gurgan³⁹⁶
Pencê wan wek zergan³⁹⁷

³⁹⁴ Resûl go ey serwer: NME.

³⁹⁵ Dîsa hat 'eyan bû: NME.

³⁹⁶ Hindek şubhê gurgan: NME.

³⁹⁷ Pencê wan wekî zergan: NME.

[r. 33] Ketne reqş û firgan
Diran wek qocigan

95. Hin hût û neheng in
Hin şêr û piling in
Şed heybet bi deng in
Hem bi perr û çeng in

96. Gehane Resûl e
Bi se' yû te' cîl e
Kîşyan wekî seyl e
Erđ kirin teqbîl e

97. Di piştê îhsanan
Desta cin û canan
Ketne pey insanan
Dûrî musulmanan

98. Pêgember ferman kir
'Esker bi nizam kir
Mîran³⁹⁸ 'elem rakir
Bi rê da wan ğar kir³⁹⁹

[r. 34]

99. Bi rê ketî 'esker e
Meymen e hem meyser e
Delġê wan wekî behr e
Toz û 'ucac û ġebr e⁴⁰⁰

³⁹⁸ Ev bêje dibe ku "mêran" be.

³⁹⁹ Bi rê da wan xar kir: NME.

⁴⁰⁰ Bi rê ketî 'esker e toz û 'ucac û ġebr e // Delġê wan wekî behr e da'im zikir ekber e: NME.

100. Bi zikrullahê ‘eynê
Ew çûn li wê mabeynê
Wan *cundu’s-seqeleynê*⁴⁰¹
Bi hewar hatne Huneynê⁴⁰²

101. Kafiran ku dîtin
Ji hev du ra gotin
Muhemmedî hatin
Ahên wan rahiştin

[r. 35]

102. Tedbîr dît kuffar e
Derbaz bû êvar e
Şefeq bû diyar e
Temam bûn suwar e

103. ‘Esker girt tağbûr e
Rojê veda nûr e
Tazî kirin şûr e
‘Eskerê me dûr e⁴⁰³

104. Malik kir teftîş e
‘Ebdek anî pêş e
Ġayet wî kir coş e
Rabû bi endîşe⁴⁰⁴

105. ‘Ebdê xo hilanî
J’ ordiyê deranî

⁴⁰¹ “Koma leşkerên cin û insan”.
⁴⁰² Wan got Ellah eynê // Ew çûn li wê mabeynê // Cundu’s-seqeleynê // Danîne li Huneynê: NME.

⁴⁰³ Zahir kirin şûr e // Lakin Islam dûr e: NME.

⁴⁰⁴ Xûna wî kir coş e // Rabû bil endîşe: NME.

Çûne yek mekanî
Binhêr wek dizanî⁴⁰⁵

[r. 36] 106. Xo dane çiya'ê
'Ebd nezerek da'ê
Wî dît li sehra'ê
'Eca'ib numa'ê

107. 'Ewtiya wek' kelban
Kumê xo l' 'erdê dan
Xwelî li 'Ereban
Islam na'ê wesfdan⁴⁰⁶

108. Ya Naciye huş be
J' navê me ra 'eyb e
Cardin binêr paşve
Çend 'elemê wan be

109. Tu bike beyan e
Çend 'elemê wan e
Kincê wan çewa ne
Şef tên yan bela ne

[r. 37] 110. Nacî çav dûrbîn e
Du roj rê dibîne
Gote Malik b' kîn e
Min got nebêj dîn e

⁴⁰⁵ Ku binhêr wek dizanî: NYY; Ku binhêr wek dizan e: NME.

⁴⁰⁶ 'Ewtiya wekî kelban // Kumê xo l' 'erdê da[n] // Xolî li 'Ereban // Islam na'ê wesfdan: NYY.

111. Temamê insanan
Melek j' asimanan
Desta cin û canan
Ew tèn pey insanan

WEZNEHU ELA DERBEYNE⁴⁰⁷

112. Li pişya suwaran
Yekî 'elem reş e
Tertîb dide yaran
Hûr hûr xweş dimeşe

113. Bejna wî bilind e
Ew sekinye pêş e⁴⁰⁸
Porê wî vehûnd e
Cubbe wî dirêj e

114. Malik go 'Ebbas e⁴⁰⁹
Ew 'emmê Resûl e
Hiner bê qîyas e
Kafir j' dest melûl e

[r. 38]

115. Hat 'elemek sor e⁴¹⁰
Ser milê siyarek
Cubbê wan tev mor e
Qamet wek çinarek

116. Ew kurê Mirdas e
Galib qûmandar e

⁴⁰⁷ Ev serenav tenê di NMEê de heyê.

⁴⁰⁸ Ew sekinye li piş e: NME.

⁴⁰⁹ Malik go ew 'Ebbas e: NYY; Malik gote 'Ebbas e: NME.

⁴¹⁰ Hat 'elem yek şor e: NYY.

Pehlewanek xaş e
Ġayet ew dujwar e

117. Hat ‘elemek spî
Binda pehlewanek⁴¹¹
Hespê wan tev boz in⁴¹²
Digel kinca carek

118. Go ewa Muğdad e⁴¹³
Lawek ‘Erebî ye
L' kafiran cellad e
Libsê wan sipî ye

[r. 39] 119. Hat ‘elemek hêşîn
Di bin da eslanek
Rimê ew dihejîn⁴¹⁴
Kinc hêşîn in carek

120. Wî gote ğulam e
Ew suwarê heybet
Zubeyrê ‘Ewam e
Kur-apê Muħemmed

121. Min dî l' alyê çepê
Mîna hîva çarda
Kincê wan tev reş bûn
‘Elem ji zêr kil da⁴¹⁵

⁴¹¹ Hilda pehlewanek: NYY.

⁴¹² Hespê wana boz bûn: NME.

⁴¹³ Malik got Muğdad e: NME.

⁴¹⁴ Rim ew dihejîne: NME.

⁴¹⁵ Min dî l' al'yê çepê // Kincê wan şû'le dan // Tûx û 'elem hespê // Taxim ji zêr kildan: NME.

122. Ew Se'dê 'Ubad e⁴¹⁶
Re'îsê Medîne
Cubbe ji zêr sade
Ez dikim enîne⁴¹⁷

123. Ez dikim hewar e
'Elem min hejmar e
Tam dazdeh hezar e
Temam tîn bi ğar e⁴¹⁸

[r. 40]

124. 'Ebd got ya Mewla'ê
Şexşek bû numa'ê
Nûrek birq veda'ê
Ew nûr çû sema'ê⁴¹⁹

125. L' devêkê suwar e
Nûra wî diyar e
Bi xo namudar e
Ġayet keremkar e⁴²⁰

126. Malik got ey ğulam
Ew siyarê devê
De'wê dike mudam
Ji bona şehde'ê⁴²¹

127. Navê wî Muħemmed
Eşlen ji Mekke'ê

⁴¹⁶ Malik got ew Se'd e: NME.

⁴¹⁷ Ez dikim nalîne: NME.

⁴¹⁸ Nacî 'elem hesab kir // Danzdeh hezar tamam kir // Ahîneke ğedar kir // ... : NME.

⁴¹⁹ Gote Malik Mewla'ê // Zatek li min nema'ê // Nûra wî birq veda'ê // Ew nûra çû sema'ê: NME.

⁴²⁰ Ew zat l' devê suwar e // Nûr ji wechan dibar e // Wekî şaha wiqar e // Bi lutfâ namidar e: NME.

⁴²¹ Malik da wî cewab e // Go ey Nacî se-bab e // Ew Ehmedê e'rab e // Terk kirye dînê bab e; Dînê qewmê terkkirî // We hucwa pûta kirî // Ew in şelî'ê ikrî // We'zê wî yek e Barî: NME.

Şewatan bê hed
Li Babê Faţma'ê⁴²²

128. Şellû 'ela Muħemmed
Gelî ehlê civatê
W' 'ela alî Muħemmed
Guh bidne hikayatê⁴²³

[r. 41]

129. Ğulam gote Malik
Ey mîrê bala'ê
Min dî siyarek l' nik
Xudanê liwa'ê⁴²⁴

130. Qelb jê dibin halik⁴²⁵
Şubhê ejdiha'ê
Lakin nûr û işiq⁴²⁶
Ji hedê weşf na'ê

131. Malik gote kafir
Ew e 'Elî Heyder
Hubel Ke' bê rakir
Hilda avête der⁴²⁷

132. Nacî kir hewar e
Min dî komek 'esker⁴²⁸

⁴²² Di destxetê de weke “Şewatan bidin bê hed li Babê Faţma'ê” derbas dibe. Lêbelê xuyaye ku ew bêjeya “bidin” paşê lê hatiye zêdekirin. Herwiha ev li gorî kêşê jî ne rast bû.

⁴²³ Bendên 128-129 di NMEê de tune ne.

⁴²⁴ Min dî suwarek li nik // Hem xudanê liwa'ê: NME.

⁴²⁵ Qelb ji wî dibin halik: NME.

⁴²⁶ Lakin bi nûr û işiq: NME.

⁴²⁷ Malik wegote Nacî // Ew 'Eliyê Heyder e // Hubeyl ji Ke' bê rakir // Hilda avête der e: NME.

⁴²⁸ Min dî komek 'esker e: NME.

Na'ête hejmar e
Li dora pêgember⁴²⁹

[r. 42] 133. 'Eskerek 'ecêb e
Hespê wan belek in
Rengê wan gêrîb e
Rawî got melek in

134. Hatine imdadê
Kincê wan hêşîn in
Sema heta 'erdê
'Elem dihejînin

135. Malik got nas nakim
Wan siyarê d' bînê
Halê xo çewan kim⁴³⁰
Ez dikim enînê

136. Cardin ew zivirî
Li deştê nezer kir
Hindî ku fikirî
Rabû jê firar kir⁴³¹

137. Malik pur 'enîrî
Dujûnek dûjwar kir
Got ey kurê şe'ê
Te dest li me sar kir

[r. 43]

⁴²⁹ Li dora pêgember e: NME.

⁴³⁰ Ji halê xo çewan kim: NYY.

⁴³¹ Rabû ji wê firar kir: NME.

138. Qûl got ya mewla'ê⁴³²
'Ecêbek min diye
Li nava sehra'ê
Cenawer tijî ye

139. Hindek şubhê şêran
Dêlê ew hiltînin
Hindek şubhê maran⁴³³
Xo l' hev dialînin

140. Hinek şubhê gurgan
Pencan l' hev dixînin
Hinek şubhê teyran
Peran dihejînin

141. Hinek şubhê hûtan
Agir dibarînin
Dûman girtye deştan
Êdî em nemînin

142. Malik gote qûl da
Ewana tev sihr in
Sihrê dikin peyda
Da me bişirsînin

[r. 44]

143. Nacî gote wî da
Ez bi xo dibînim
Şondê duxum pûtan⁴³⁴
Ber çava dibînim

⁴³² Gotî ya mewla'ê: NME.

⁴³³ Hinek şubhê maran: NYY.

⁴³⁴ Şondê duxum bi pûtan: NME.

144. Ew ji çiyê hatin
Her çi ku wan dî bû
Ji 'esker ra gotin
Serê wan mezin bû

145. Tevdîra xo dîtin
'Esker tev suwar bû
Milê xo vemiştin
Tam pincî hezar bû

146. Malik ku suwar bû
Du cewşen li xo kir⁴³⁵
Du hezar ayrî bû
Di pûsê punhan kir

147. 'Esker şef bi şef bû
Wan de' wa herbê kir⁴³⁶

[r. 45]

Li alyê Islamê
Pêgember emir kir

148. Hâzir bin tamamê
Xuda Cennet vekir
Hûrî tev xemilîn
J' wur da wan nezer kir

149. Hûrî hatne xarê
Ji bona şehîdan

⁴³⁵ Du cewşen li xo kîn: NYY.

⁴³⁶ Wî de' wa herbê kir: NME.

Rûh bikin îsarê
Qetil kin pelîdan

150. Rikêb kir 'Ebbas e
Ew 'emmê Resûl e
Her kes wî dinase
Kafir j' dest melûl e⁴³⁷

151. Hewhewa Muğdad e
Reqisî cewlan kir
Bi gurzê polad e
'Eskerê xo rast kir

[r. 46] 152. Hewhewa Xalid e
Hespê xo rikêb kir
L' kafiran şedîd e
'Esker şef bi şef kir⁴³⁸

153. Hewhewa 'Ebbas e
Ġayet pehlewan e
Ew kurê Mirdas e
'Elem ser milan e

154. Rikêb kir 'Emmar e
'Esker kir tertîb e
Ġayet namudar e
Cewlan wî gerîb e

⁴³⁷ Kafir bûne melûl e: NME.

⁴³⁸ 'Esker şef bi şef bû: NYY.

155. Fezl û Zubeyr Şufyan
Hatin bi ala'ê
Dunya hejya j' ne'ran
Selewat veda'ê

156. Se'd û 'Umer 'U&man
Digel Ebûbekir
Hatin wekî şahan
Wana 'elem vekir⁴³⁹

[r. 47]

157. Hat şahê merdane
Ne're ji dil danê
Du 'elem hildane
Ew hate meydanê

158. Di nav orta wan da
Muhemmed Muştefa
Mîna hîva çarda
Nûra wî çû qafa
'Ewran sîwan veda
Melek hatin şefa⁴⁴⁰

159. Nagah cenet vebû
Hûrî j' wir da hatin
ĠulĠul peyda bû
Xortan mil vemiştin⁴⁴¹
Herçî ku mêrxaş bûn⁴⁴²
Qelbê wan avêtin

⁴³⁹ Piştî vê bendê ev riste hatine tekrarkirin: “Hati(n) wekî şahan // Wana 'elem vekir”.

⁴⁴⁰ Melek hatin bi şefa: NME.

⁴⁴¹ ĠulĠul e peyda bû // Mêran mil vemiştin: NME.

⁴⁴² Herçî ku mêrxaş bû: NYY.

[r. 48]

160. Herçî 'eware bûn⁴⁴³
Ziman hate girtin
Şelewat l' me ferz bû
Lewra em 'ummet in

161. Meclis taze xoş bû
Ya ehlê civatê⁴⁴⁴
Qelbê xo şafî kin
Hûn bigrin 'ibretê⁴⁴⁵

Fa'îlatun fa'îlatun fa'îlat
Ruhê Fexru'l-Murselîn ra şelewat⁴⁴⁶

Mefa'îlun / Mefa'îlun / Mefa'îlun / Mefa'îlun
+ - - - / + - - - / + - - - / + - - -

1. Eya **Yasîn** bibe hişyar tu ketî l'benda dunya'ê
Bi zewq û hem şefaya wê nebe hevalê dunya'ê

2. Bi zahir mal û hem serwed wekî hingiv û şîr tèn ew
Di bañin da yeqîn jeħr e nebe meyyalê dunya'ê

[r. 49]

3. Çiqasa tu bikî dewran bi 'umrê Nûħ bi pey behrê
Axir dê em bikin riħlet biborî tu ji dunya'ê

4. Kanê şahê li ser textan muzefferr bûn di cengan da
Ji bo wan jî nebû fayde fanî bûn ew ji dunya'ê

⁴⁴³ Herçî 'ewra bûn: NME.

⁴⁴⁴ Meclis taze xoş bû // Em bidin selawatê: NME.

⁴⁴⁵ Ev her du risteyên dawîya bendê di NME'ê de tune ne.

⁴⁴⁶ Ev malik di NME'ê de tune ye.

5. Kanî ew ‘alimê e‘lem ku meşhûr bûn di ‘ilmê da
Bitûn Islam bi ‘ilmê wan dikin ‘emel di dunya’ê

[r. 50]

6. Kanî ew ‘Elî û Hemze di cengê da ku xûn-rêjin
Ji ne‘rê wan dilerzîn dêw revîn tev çûn ji dunya’ê

7. Kanî ew Nebîyê serwer Ebûbekr û kanî ‘Umer
Ku ew bûn hasilê îcad şerî‘et anî dunya’ê

8. Di destan şûr û dev-Qur’an digot hûn werne îmanê
Bi zora şûrê wan kafir Musulman bûn li dunya’ê

[r. 51]

9. Wiha dunya ku bêkêr e ji xeyrê ‘ilm û Qur’anê
Yasîn da‘im bigir ‘ibret ji dest vê qehbe dunya’ê⁴⁴⁷

WERNE SERÊ HİKAYETÊ⁴⁴⁸

162. Farisê Islamê
Zubeyrê ‘Ewam e
Izin ji Imamê⁴⁴⁹
Xwestî wî tamam e

163. Zubeyr çû meydanê
Reqisî cewlan kir
Ne‘re ji dil danê
Gurzê xwe dewran kir

[r. 52]

164. Ji alyê kuffaran⁴⁵⁰
Derket şegê şor e

⁴⁴⁷ Ev helbesta neh malikî di NMEê de tune ye. Ev weke xezelekê di nav vê cengnameyê de hatiye nivîsîn.

⁴⁴⁸ Ewsafê Herbê: NME.

⁴⁴⁹ Izin ji Îmame: NME.

⁴⁵⁰ Ji alyê kafiran: NME.

Destâ teyr û bazan⁴⁵¹
Çi mel'ûnek zor e
Qamet wek çınaran⁴⁵²
Ji 'aqilan dûr e

165. Hespê xo ilgâr kir
Go ne ez Qeytûr im
Methê nar û nûr kir
Di cengê meşhûr im

166. Zubeyr got ey kafir
Qebûl ke îmanê
Yan jî bibe hâzîr
Qeş meke dewranê
Dê tu biçî agir
Bi hukmê Qur'anê

[r. 53]

167. Gurzek l' Zubeyr bar kir
Wezna wî giran bû
Super wî îhzar kir
Di bin da punhan bû
Ew li Zubeyr bar kir⁴⁵³
Şed û çil batman bû

168. Zubeyr şûr kişandî
Carek lê hewar kir
Serî hilfirandî⁴⁵⁴
Ew lahiqê nar kir

⁴⁵¹ Desda teyr û bazan: NME.

⁴⁵² Qamet wekî çınaran: NME.

⁴⁵³ Ew li Zubeyr bar kir: NME.

⁴⁵⁴ Serî hilfirand: NME.

169. Cardin ku rikêb kir
Xwe l' nava kafir da
Yek jî li wî hol kir
Cardin hate paş da⁴⁵⁵
Xûna Malik coş kir
Li kafiran hay da

[r. 54]

170. Kafir Islam carek
Ser û binê hev bûn
Navê Heq mubarek
Temam li hev qam bûn
Wan şer kirin qaşek⁴⁵⁶
Serî l' 'erdê hol bûn

171. Toz çû asimanan
Dunya bû zulmat e
Rojê girtî sîwan
Çi şerek heybet e
Xûnê da rikêban
Te d'got qiyamet e

172. Hûrî hatne xarê
Ji bona şehîdan
Melek kirne zarî
Tespîh ji dev berdan
Ya Reb tu hişyarî
Resûl bike xendan

[r. 55]

⁴⁵⁵ Heman hate paş da: NME.

⁴⁵⁶ Wana şer kir qaşek: NME.

173. 'Erd hate hejyanê
Din bin pê hespan da
Xûn hat wekî kanî
Kişya di 'erdê da
Rawî kir beyanê
Di nava herbê da

174. Dengek bû 'eyan e
Ew deng ji şeytanê⁴⁵⁷
Seh kir eşhaban e
Hatne ber îmanê
Wî got bi efğan e
Way Muḥemed kanê

[r. 56]

175. Muḥemed şehîd bû
Gazî kir mel'ûn e
Islam nabeîd bû
Kafir bûn dev-xûn e⁴⁵⁸
Dest li wana sar bû⁴⁵⁹
Revîne çiya ne

176. Pêgember neda kir
Ya ehlê Islamê
Bo çî we firar kir
Ez dikim i'lamê
Şeytan iftira kir
Heqê La-yenamê

⁴⁵⁷ Ew dengek jî Şeytan e: NYY.

⁴⁵⁸ Kafir bûne dev-xûn: NME.

⁴⁵⁹ Destê wan tev şar bûn: NME.

177. Ji hay û hû⁴⁶⁰ mêran
Seh nekirin deng e
Şed heb ji dilêran⁴⁶¹
Tenê kirin ceng e
Wana kafir hêran
Bi gurzê xeleg e

178. Pêgember melûl bû
J' revîna Islamê⁴⁶²
Cebraîl nazil bû
Xuda kir selamê⁴⁶³

[r. 57]

179. Cihad li wî ferz bû
Ku bêje Îmamê⁴⁶⁴
Bira rabe herbê
Ji 'eksa şeytanê⁴⁶⁵

180. Bilal Dundul kar kir
Pêgember suwar bû
Dema ku hemle kir
Melek lê ber hev bûn
'Umer Ebûbekir
Wan 'elem hilda bûn⁴⁶⁶

181. 'U&man 'Elî Heyder
Zubeyrê 'Ewam e

⁴⁶⁰ Ji hayhayê: NME.

⁴⁶¹ Şed heb ji wan dilêran: NME.

⁴⁶² Ev her du risteyên serê vê bendê tenê di NMEê de heye.

⁴⁶³ Xuda kir selam e: NYY.

⁴⁶⁴ Ku bêje Imam e: NYY.

⁴⁶⁵ Ev her du risteyên dawiya bendê tenê di NMEê de heye.

⁴⁶⁶ Wana 'elem hilda bûn: NME.

Muğdad Xalid Ejder
Hatın bit-temam e

182. Ne' re ji çi ra dan
Bû gazî hewar e
Şed heb ji wan merdan
Qir kirin kufar e

183. Ellah Ellah gotin
Wan şed nere-şêran
Xûn j' kafiran rêtin
Weke tavê baran⁴⁶⁷

[r. 58]

184. Şinge-şingê şûran
Tijî bû dunya'ê
Gujje-gujê fîran
Ji heddê qeṭ na'ê

185. Rimmê di rimbazan
Ciger qul dikirin
Bi derbê çomağan⁴⁶⁸
Serî hûr dikirin

186. Herb e herb e herb e
Danîn hev du derb e
J' ber gurzê dilêran
L' kafran çê bû kerb e

⁴⁶⁷ Wek tavîyê baran: NME.

⁴⁶⁸ Bi derbê çomağan: NME.

187. Kafir we hatne kîn
J' bo herba Mekke'ê
Islam dîkin nalîn
Ev herba l' wan na'ê⁴⁶⁹

[r. 59]

188. Zemanek wiha bû⁴⁷⁰
Pêgember got ya 'em
Ev emrê Xuda bû
Şahî li me bû gem

189. Tu bike nida'ê
Ji bona eşhaban
Imdad ji Ilahî
Cardin bibin şadan⁴⁷¹

GAZIYA 'EBBAS E JI BO MU' MINAN⁴⁷²

Gote 'Ebbas ya 'emê⁴⁷³
Rabe serî'en vê demê
Tu here serê çiya'ê
Def' bike narê gemê

190. 'Ebas çû serê çiya'ê
Gazî kir wî kir nida
Xaliqê 'alem çê kir j' wî
Şewtek bilind hem şeda⁴⁷⁴

[r. 60]

⁴⁶⁹ Bendên 187-188 di NMEê de tune ne.

⁴⁷⁰ Zeman wiha bû: NME.

⁴⁷¹ Benda 190î di NMEê de tune ye.

⁴⁷² Gazîkirina 'Ebbas ji bona Mu'minan û 'Emrê Pêgember: NME.

⁴⁷³ Gote 'Ebbas ya 'emû: NYY.

⁴⁷⁴ Xaliqê 'alem çê kir // Şewtek bilind şewt û şeda: NYY.

191. Wî digot ya ehlê Riđwan
Ehlê bey' et hûn werin⁴⁷⁵
Ez dikim qesem ji bo we
Şağ e *Xetmu 'l-Murselîn*⁴⁷⁶

192. Hûn werin ya ehlê Ye&rîb
Ehlê Xezrec bit-temam
Ez dikim qesem ji bo we
Îftira bû ev kalam

193. Hûn werin ya ehlê Qur'an
Hamilê sirr'ul-Beqer
Bizvirin ya ehlê 'urfan
Bayi'ê tehtê şecer⁴⁷⁷

194. Rawî kirye riwayet
Emrê ba'î kir Xuda
Ba'î ew denga hilanî
Seh kirin mîr û geda

[r. 61]

195. Seh kirin wan dengê 'Ebas
Ew hatin cumle-temam
Rê girtin hatin temamen⁴⁷⁸
Ew şehabê xaş û 'am

196. Wan ku dî şağ e şelamet
Ew Resûlê Kibriya

⁴⁷⁵ Wî digot ya ehlê bey' et // Ehlê Riđwan hûn werin: NYY.

⁴⁷⁶ Xetm'ul-murselîn: "Pêxemberê dawî Hz. Muhemmed".

⁴⁷⁷ Sûreya Feth 48/18. "لَقَدْ رَضِيَ اللَّهُ عَنِ الْمُؤْمِنِينَ إِذْ يُبَايِعُونَكَ تَحْتَ الشَّجَرَةِ" Mane: "Sond be, wê dema ku mumînan li binê darê peyman dane te Xwedê ji wan razî bûye.

⁴⁷⁸ Rê ketin hatin temamen: NME.

Em nizanin em çi bêjin
Şermesar in bê riya

197. Tu Hëbîbê Muste‘an î
Ya Resûlellah meded
Em dîkin zarî ricakê
Tu ji Xaliq bê ‘eded

198. ‘Uzrê wan filhal qebûl kir⁴⁷⁹
Hem ji Xaliq kir du‘a
Cebra‘îl ev ayet anî
Got qebûl bû ew du‘a

Leqed neşerekumullahû fî mewatine kesîretin

we yewme Huneynin îz e'cebetkum keşretukum⁴⁸⁰

[r. 62]

199. Me‘na ayetê ev e
Hûn guh bidin
Hem ji xaba gefletê
Hişyar bibin

200. Ye‘nî her mekana
Da⁴⁸¹ ew Heq Te‘al
Nuşret da we her⁴⁸²
Cenga da La-yezal

201. Hal ew roja Huneynê
We kir beyan

⁴⁷⁹ ‘Uzra wan filhal qebûl kir: NME.

⁴⁸⁰ Sûreya Tewbe 9/25an e. Lê ayet bi temamî nehatiye dayîn. Me li jor maneya wê daye.

⁴⁸¹ Dî: NYY.

⁴⁸² Nuşret da ye we her: NME.

Bê hesab e 'eskerê
Me j' her weqtan

[r. 63] 202. Cardinê we dît ji me
Quwwet meded
Fa'ide nekir ji bo
We pur 'eded

203. We Muhemmed
Cî da hişt paş da revîn
Me sekîne da Muhemmed
Hem ewan Yarê Guzîn⁴⁸³

204. Hem mela'ik me şihandin⁴⁸⁴
Bê hisab
Şûr li kafiran hejandin vekirin wan
Fethê bab⁴⁸⁵

SÛ'Ê QEŞDA KIRÎ ŞEYBE YE LI HEBÎBÊ XUDA⁴⁸⁶

205. Rawiyan kirye riwayet
Tu bizanî ey 'ezîz
Mu' min û kafir bi carek
Hatne herbê şubhesîz

206. Ew qeder wana li hev da
Hem dûman çêbû gubar⁴⁸⁷
Şingînê şûran dihatin
Ne 'rînê hem zarezar

⁴⁸³ yar guzîn: NME.

⁴⁸⁴ nazil kir: NME.

⁴⁸⁵ Di NMEê de bendên 205 û 206an bi hev re cih guhertine.

⁴⁸⁶ Sû'ê Qesta Kirî Şeybe li Hebîbê Xuda ji bo Qetilkirina 'Utbe Şeybe Welîd Şerê Bedir da: NME.

⁴⁸⁷ Hem dûxan çêbû gubar: NME.

[r. 64]⁴⁸⁸

[r. 66]

207. Ibnî Şeybe got tenê min
Dît Muḥemed şahê dîn
Bab û 'emmê min 'Elî
Hemze ku kuştin bûye kîn

208. Ez bistînim xûna wana
Ji Muḥemed bê ğuman
Dest avêtime xencerê
Hatim l' alyê rast heman

209. Min dî 'Ebas şûr di destan⁴⁸⁹
Kafirana cellad dikir⁴⁹⁰
Çepê wî Şufyan sekinye
Kafirana pur xûn dikir⁴⁹¹

210. Ez hatim piş da sekinîm⁴⁹²
Dest avête xencerê

[r. 67]

Derbekê wisan ku lê xim
Ew şehîd be l' wê derê

211. Şu'leyek çêbû li puştê⁴⁹³
Min yeqîn kir şewiîm
Çavê min ku hate girtin
Heman ez paş da revîm

⁴⁸⁸ Ev rûpel ser hatiye xêzkirin û di rûpelên pişt de ev heft beytên vê rûpela serxêzkirî ji nû ve hatine nivîsîn. Ji ber vê yekê me ji vir ew rûpel jê bir.

⁴⁸⁹ Min dî 'Ebas şûr di desta: NYY.

⁴⁹⁰ Kafirana cellad dike: NME.

⁴⁹¹ Kafirana pur xûn dike: NME.

⁴⁹² Ez hatim pişt sekinîm: NYY.

⁴⁹³ Şu'leyek çû ji puştê: NME.

212. Gazî min kir ez ku çûm
Çê bû li min xewf⁴⁹⁴ û xeşer
Dest li singê min malandî
Kir di 'ayek mu 'teber

213. Cezbeya 'îşqê li min da
Ez kirim 'aşiq li xwe
Ez dikim qurban ji bo wî
Bab û 'em hem rûhê xwe

[r. 68]

214. Gote min ya Ibnî Şeybe
Tu here cengê heman
Sem 'e ta 'e got û min⁴⁹⁵
Fîlhal ji wî ez bûm rewan

215. Ez dema gehame herbê
Min fida kir rûh û can
Ew qeder kafir ku hol kir
Razi bû şahê cihan

216. Xwezîya roja wişalê
Da bi xwe ew şehde be
Ew bi xûn e rûh û canê
Hem **Yasîn** sazende be⁴⁹⁶

217. 'Aşiqê şadiq ew e
Da 'im dike zîkrê geza

⁴⁹⁴ xof.

⁴⁹⁵ Sem 'e ta 'e gote min: NME.

⁴⁹⁶ Di nusxeya NYYê de li ser vê îfadeya "Yasîne sazende" midaxele hatiye kirin û li şûna vê îfadeyê îfadeya "Yûsifê şefek" hatiye nivîsîn.

[r. 69] Ne wekî min pîs û kîslan
Hem bibêje naseza⁴⁹⁷

218. Cehd bikî nefse bavêjî⁴⁹⁸
Ew cihada ekber e
Wî biîrsînî bi mewtê
Şelewat l' pêgember e

**KAFIRÊ DI PÛSÎYÊ DA QIR DIKIN CABÊ DIDINE
PÊGEMBER⁴⁹⁹**

219. Rawiyî got Ibnî Mirdas
Hate cem Fexru'l-umem
Jê suwal kir Fexrê 'Alem⁵⁰⁰
Kanê ew ru'yet 'elem

220. Min 'elem têk kir li ser
Serê çiya'ê ya Resûl
Da ji bo qewmê nişan be⁵⁰¹
Ew ku şer kin pur uşûl

[r. 70]

221. Hatime mizgîn bidim te⁵⁰²
Ya Resûlê ins û can
Nagihan me dît di pûsê
Du hezar kafir heman

222. Min emir da 'eskerê xwe
Qir kirin cumle tamam

⁴⁹⁷ Hem bêje naseza: NYY.

⁴⁹⁸ Cehd bike nefse bavêjî: NME.

⁴⁹⁹ Du Hezar Kafir di Pûsê Qır Kirin Eskerê Kurê Mirdas: NME.

⁵⁰⁰ Jê suwal kir Fexri'l- 'Alem: NME.

⁵⁰¹ Da bibe nişan ji bo qewmê: NME.

⁵⁰² Hatime mizgîn bidim we: NME.

Cendekê wana li 'erdê
Tejr duxwun cumle tamam⁵⁰³

223. Tebesum kir Resûlullah
Bi vê mizgîniyê şa bû
Du'ayek kir Hebîbullah
Kurê Mirdas ku 'Ebas bû

224. Bikin hemd û &ena'ê Heq
Digel wî jî şewatan
Bidin ser wî Resûlê Heq
Nebin hûn şubhê 'uşatan

[r. 71]

FEZİL BINÎ 'EBAS BI BE'ŞE'L-NEBÎ⁵⁰⁴

225. Fezil kir riwayet
Di nava herbê da
Bû germ û heraret
Êdî na'ê weşf dan

226. Begler bû melûl e
Di nava meydanê
Sûal kir Resûl e
Şahê Merdan kanê⁵⁰⁵

227. Her terefan ceng e
Kes haj kesî nîne
Hayûhûy û deng e
Quwet kes tunîne

⁵⁰³ Tejr duxwun da'îm mudam: NME.

⁵⁰⁴ Ruwayeta Fezil Binî 'Ebas: NME.

⁵⁰⁵ 'Elî Heyder kanê: NME.

‘Elî s'yarek şeng e
Kesek ha jê nîne

[r. 72] 228. Nagah hat ji wê da
Kurê Malik Enes
Birîndar xûnê da
Anceq dertê nefes

229. Pêgember suwal kir⁵⁰⁶
Şahê Merdan kanê
Enes hikayet kir
Go bikim beyanê

230. Weqta ku bû nîvro
‘Elî hat bi gar e
Ġayet germ e îro
Bînin ava sar e

231. Pêgemberê mêj ke
Jê ra bînin av e
Wî hilda yek meşk e
Em çûn gav bi gav e⁵⁰⁷

[r. 73]

232. Me dît çiyak ‘alî
Kanîk bû diyar e⁵⁰⁸
Kinc ji xûnê malî
Ġayet birîndar e

⁵⁰⁶ Pêgember emir kir: NME.

⁵⁰⁷ Piştî van her du risteyên dawiya bendê du risteyên bi vî rengî jî heye ku bûye mîna tekrarê: “Me hilda yek meşk e // Em çûn gav bi gav e”.

⁵⁰⁸ Me dît çiyayek ‘alî // Kaniyek bû diyar e: NME.

233. Ber bi qiblê mêj kir
Du 'a bû tamam e
Meşka avê rakir
Me j' Wî kir qiyam e⁵⁰⁹

234. Me dît cotek kafir
Wekî şe'ê har in
Li me bûne zahir
Kafir pehlewani

[r. 74]

235. Ew şahê Heyder e
Meşka xo l' wê danî
Kêşa zulfeqar e
Yek qeç kir l' meydanê
Yek jî kir gêtan e
Kafir hat gihanê

236. Hatî pêda pêda
Kafir bûn hezarek
'Elî ne 're rada
Rikêb kir mubarek

237. Wekî nere-şêran
Bîst pehlewani kuştin
Ez lê dibûm heyran
Ne 're radihêştin

[r. 75]

238. Çar hezar kafrê dujwar
Temam li wî berhev bûn⁵¹⁰

⁵⁰⁹ Me j' Wî kir qiyam e: NYY.

⁵¹⁰ Temam li min berhev bûn: NYY.

Ne‘re dida wek her car
Kafirek bê hesab bûn⁵¹¹

239. ‘Ebas kurê Mirdas e
Wî gote Xalid Zubeyr
Dê em bikin sewaş e
Ji bo ‘Eliyê Heyder
Nav l' me bibe pîroz e
Ger şa bikin pêgember

240. Haydanê wan bi hev ra
Her &ê ji wî rewan bûn
Kafir dane ber şûran
Ne‘rê ‘Elî diyar bûn⁵¹²

[r. 76]

241. Ew çûne pêda pêda
Wan dît ew Şahê Heyder
Du şûr hene destan da
Dibêj Ellahû ekber⁵¹³
Wan şûran kafir dida
Ev in şûrê pêgember⁵¹⁴

242. Ellah Ellah dibêje
Weke re‘dê biharê
Cenaze kirne rêz e
Êdî na‘ê hejmarê

⁵¹¹ Kafirek bê hesab: NYY.

⁵¹² Ne‘rê ‘Elî diyar bû: NYY.

⁵¹³ Du şûr hene destan // Dibêj Ellahu ekber: NME.

⁵¹⁴ Wana şûran kafir da // Ev in şûrê pêgember: NME.

243. Ew Muğdadê 'Erebî
Beyraqdarê pêgember
Ji 'Elî ayrî nabê
Dike cewlan bi huner
244. Wî 'elem têk kiriye
Li ser serê çiya'ê
[r. 77] Cewlan wî 'Erebî ye
Dike deng û şeda'ê
245. 'Ebas Xalid hem Zubeyr
Wana kafir qir kirin
Heta gehane Heyder
Wana kafir las kirin
Selam dike pêgember
Ji bo te intizar in
246. Heman şah got seme'na
Ji nav kafir rewan bû⁵¹⁵
Xûn dikişya j' birînan
Cewşen wî parepar bû
247. Pêgember dil dişotî
Gava ku lê nezer kir⁵¹⁶
[r. 78] Hisêr⁵¹⁷ ji çava hatî
Rabû wî dîde pûs kir⁵¹⁸

⁵¹⁵ ji nava kafiran rewan bû: NME.

⁵¹⁶ Dema ku lê nezer kir: NME.

⁵¹⁷ hêsir.

⁵¹⁸ Hisêr ji çavan hatî // Rabû çavê wî pûs kir: NME.

248. Merheba ya Şêrê Heq
Ev çi herbek giran e
‘Elî gotê muheqeq
Izinde bim rewan e

249. Cardin ‘Elî rikêb kir⁵¹⁹
‘Ebas gote pêgember
Min li ‘Elî nezer kir
Birîndar e serteser

250. Resûl ‘Ebbas irsal kir
Wî xwe gihande Heyder
‘Ebas ‘Elî ricû‘ kir
Anî li nik pêgember

[r. 79]

251. Wî dît cewşen parepar
Anîn ji [ser] derxistin
Heftê du birîn hejmar
Resûl ahên raşiştin⁵²⁰

252. Du‘a kir go ya ‘Elî⁵²¹
Fexr dikin bi te melek
Nabin şubhê te welî
Te‘eccub bûye felek⁵²²

253. Xuda Cennet wacib kir
Ji bo te tu bizane

⁵¹⁹ ‘Elî heman hemle kir: NME.

⁵²⁰ Benda 253yan di NMEê de tune ye.

⁵²¹ Resûl gotî ya ‘Elî: NME.

⁵²² Te‘eccub bûye melek: NYY.

Avê bînin emir kir
'Elî derxist qeftan e

[r. 80] 254. Eşhaban gote Resûl
Av li vira tunîne
'Elî got nebin melûl
Ya Enes meşkê bîne
Enes got Heqê Resûl
Quweta min tunîne

255. Pêgember gote Xalid
Digel Zubeyrê çapik
Bînin wê meşka avê
Hûn her du bibne salik ⁵²³

256. Wana lez li pan kir
Fîlhal wana meşk anî⁵²⁴
Resûl qabek daxaz kir
Destê xwe nav da danî

[r. 81] 257. Eşhaban av l' desta kir
Tilyan kişya pênc kanî
Şîrîn şar e wek bûzê
Emir dane 'eskerî

258. Ha dikişe li dûzê
'Esker hespan ji xarî

⁵²³ Xalid Zubeyrê çapik // Her du tev bûne salik // Wana çapik meşk anî: NME.

Ji bo weznê me cihê tef'îleyên nusxeya NYYê guhert. Her du risteyên di dawiya bendê de di destxetê de weha bû; "Hûn her du bibne salik // Bînin wê meşka avê".

⁵²⁴ Ev her du risteyên serê bendê di NMEê de tune ye.

Eşhabe bûne razî
Wan şukur kir ji Barî⁵²⁵

259. Pêgember dest hılanî
Danî devê mubarek
Li birînê şah danî
Şağ bûn birîn bi carek⁵²⁶

260. Nagah yekî enşarî
Ji wê de hat bi zarî⁵²⁷
Çavê yekî enşarî
Rijyabû hatbû xarî⁵²⁸

[r. 82] 261. Gote Resûl bi zarî
Du‘a bike ji Barî
Çavê min şubhê berê
Cardin bibe diyarî

262. Resûl got ya Qetadet
Çavê bibit şehîd e
Yeqîn ke qelbê sade
Xêra wî pur mezîd e⁵²⁹

263. Şedeq weye dibêjê
Ez ‘aşiq im ji mêmê
Qîz-apa min ‘Ezîzê
Diñirsim nebe razî

⁵²⁵ Ev her du risteyên dawiya bendê di NMEê de tune ye.

⁵²⁶ “Tev bûne şadûmanî // Êw Resûlê nûranî // Tûka mu‘ciz deranî // Li birînê şah danî // Şağ bûn birîn bi carek // Ji mu‘cizê wî Xanî”: Ev bend di NMEê de weha ye.

⁵²⁷ Ev her du risteyên serê bend di NYYê de tune ye.

⁵²⁸ Du‘a bike ji Barî // Çavê wî hatbû xarî: NME.

⁵²⁹ Resûl got ya Qetade // Yeqîn ke qelbê sade // Çavê bibite şehîd e // Xêra wî pur mezîd e: NME.

264. Pêgemberê nûranî
Xweş xweş ھalê wî kenî⁵³⁰
[r. 83] Hindek xwelî hilanî⁵³¹
Tûka mu'cuz weranî

265. Şûna çavê wî danî
Du'a kir wî nihanî
Ji mu'cizê wî Xanî
J' ewwil çêtir bû ronî

GOFTE'Ê YASÎN FÎ HEQÎ MU' CIZATI'L-MUŞTEFA⁵³²

Guh bidin wan mu'cizatê
Wî Resûlê Zû'l-celal
Ev dibe carî ji tilyan
Hem bi emrê La-Yezal

266. Red dike çavan li xelqê
Hem selamet min remed
'Eynê Heyder bûme Xeyber⁵³³
Ya Resûlellah meded

[r. 84]

267. Mu'ciza wî ya mezin
Ew e d' roja meşerê
Wê xilaş ke me gunehkaran
Ji cehnem seqerê

⁵³⁰ Xaş xaş ھalê wî kenî: NME.

⁵³¹ Hindek xalî hilanî: NME.

⁵³² Der Gofteyî Yasîn Derheqê Mu'cizê Resulellah (Eleyhî Weselam): NME.

⁵³³ 'Eynê Heyder roja Xeyber: NME.

268. Ya Ilahî umeta Eħmed
Temamen řa bikî
Hem digel wan da û baban hem
Yasîne Alikî

269. Ger dixazin ku bibînin
Hûn cemala La-yezal
Hûn bidin l' Eħmed řelatan
Hêj nebûrî mah û sal

**GOTINA CEBRA'ÎL JI EBÎBÊ XUDA RA MIZGÎNIYA
ERBÊ⁵³⁴**

[r. 85]

270. Rawîyî got Cebra'îl⁵³⁵
Hatiye cem Imam e
Selam kiriye Celîl
azîr bin hûn tamam e

271. Bi her qetrek xûna wan
Melekek min çekirî
Tebîh dikin ji bo wan
Heta roja meħşerî

272. Cebrîl gote pêgember⁵³⁶
Şê hezar û sê řed car
'Elî got Ellah Ekber
Wek wî kafir anî xar

⁵³⁴ Ewsafê Herbê: NME.

⁵³⁵ Rawî gotê Cebra'îl: NME.

⁵³⁶ Cebrîl gote pêgember: NME.

273. Ji geyrê xerdexûr da
Temam şerekî kuffar
[r. 86] ‘Elî tekbîr vedida
Heta ku bûye êvar

274. Êvar li wan derbaz bû
Şefeq ku bû diyar e
Her du teref suwar bû
Şef girtin bû hewar e

275. Cebra’îl ‘esker rast anî⁵³⁷
Digel kerr û biyonan⁵³⁸
Şef girtin wan ‘eyanî
Sekinîn wek cindiyan

276. Malik jî ‘esker rast kir
Meymen e hem meyser e
Qelb û cenaḥ wan çê kir
Hatî ew beranber e

[r. 87]

277. Rûyê xwe vekir jinan
D’ pişt ordiyê kafîr da⁵³⁹
Qêrîn kirin bi şûran
Kî bireve wan lê da
Mu’min kafîr bi carek
Hucûm kirin bi hev ra

278. Cin û dêw û hem melek
Ketne nava kafîran

⁵³⁷ Cebra’îl ‘esker rast kir: NYY.

⁵³⁸ Digel kerr û buyyonan: NME.

⁵³⁹ D’ pişt ordiyê kafîran: NYY.

Bû roja qiyametê
'Erd hatiye hejyanê
Toz bi 'esmanan ketê
Serî hol bûn l' meydanê⁵⁴⁰

[r. 88]

279. Şer bû heta êvarî
Her du 'esker ayrî bûn
Şefeq ku bû diyarî
Cardin tamam suwar bûn

280. Malik heman rikêb kir
Xwe l' 'eskerê Muğdad da
Du heb li wê şehîd kir⁵⁴¹
Cardin zivirîn paş da

281. Malik gote kafiran
Kî ye here meydanê
Cewlan bike wek şêran
Xûnê rêz ke wek kanî⁵⁴²

[r. 89]

282. Pehlewanek wan hebû
Digotinê Sebî'eyd
Heman cihê xo rabû
Ez im wana bikim qeyd

283. Bi qiyasê heft hezar
Hîsab dibû ew kafir
Hem beg bû hem namidar
Hespê wî kirne hâzîr

⁵⁴⁰ Serî hol bûn meydanê: NME.

⁵⁴¹ Du heb hemen şehîd kir: NME.

⁵⁴² Xûn rêz ke wekî kanî: NYY.

284. Ew li Muhal bû suwar
Şi'ir xwend wî kir cewlan
Bi ne're û bi hewar
Meşhûr e Şahîbqiran

285. Kete nava Islamê
Şefê wana li hev da
Weke dêwê zulamê
Cardin zivirî paş da

286. Li meydanê sekinî
Laf dike çar terefan
Pêgember got yeqînî
Hûrî hatin bi refan

[r. 90]

287. Nagah yekî enşarî
Rikêb kire meydanê
Her du bûn beranberî⁵⁴³
Kafir rimek lê danî
Ji hespê⁵⁴⁴ anî xarê
Rûh şa bû bi cinanê

288. Yek jî hat wî kir şehîd
Çiqas hebûn namudar
Birîndar in wek qerîr
Meğrûr bû ew şe'ê har

⁵⁴³ Her du bûne beranber: NME.

⁵⁴⁴ J'hespê da: NME.

**PÊGEMBER TEHRÎS DIKE MU' MÎNAN LI CIHADÊ BI
WESFÊ CENNETÊ HÛRÎYAN⁵⁴⁵**

Qalellahu Te'ala: hûrû meqşûratûn fil-xiyam⁵⁴⁶

We qalellahu Te'ala we kewa'ibu'l-etrabûn⁵⁴⁷

*Qale "hum we ezwacuhum fi zîlalîn 'ele'l-e'ra'iki
mutteki'un"⁵⁴⁸*

[r. 91]

289. Pêgember got ey mus'lman

Bo çi nakin dewranê

Cennet vekirye Rîdwan

Hûrî dikin seyranê

290. Di nava qeşr û bağan

Kanî dikin ceryanê

Ji selsebîl rehîqan

Carî dibin ew kanî⁵⁴⁹

291. Xemr û 'esel û şîr in

Xuda gotye d' Qur'anê

Kewa'ib û Etrab in

Ew hûrîyê Cînanê

292.  î s  sal in 'umir wan

Memik weke fîncanê

Dîdarê wan j' yaqûtan

Bi z r hatye kildanê

[r. 92]

⁵⁴⁵ Ev serenav di NME  de heye.

⁵⁴⁶ S reya Rehman 55/72. " ur  m   ur t  fi al- iy m". Hor y n ku di konan ni tecih in   j  demay n (yan j   av n wan her li m r n wan e).

⁵⁴⁷ S reya Nebe 78/33. " k w  b   tr b ". Mane: (Hor y n) n gihay , hevsa i   yek dest.

⁵⁴⁸ S reya Yas n 36/56 "  m  w r w  h m  fi z l l   l  al r  k  m nk   n ". Mane: Ew jin n ku di bin  siyan de li ser textan palday  ne.

⁵⁴⁹ Ev her du ristey n di daw ya bend  de, di NME  de tune ye.

293. Hûrî tamam ji nûrê
Bi naz dîkin meşyanê
Teb'et-xweş in ew hûrî
Ew nîzanin xeydanê
Misk û 'enber û kafûr
Dindan wekî mircanê⁵⁵⁰

294. Ji wan çê nabe quşûr
Emirberê mêran in
Kes nabîne wechê wan
Temam b' quşr û xiyam in

295. Li ber çeman ser textan
Heftê hulle li wan in
'Aşiq in ba dil û can
Ji bo mêr intîzar in

[r. 93]

296. Ellah Ellah dibêjin
Gazî dîkin ya Deyyan
Sirişkan ew dirêjin⁵⁵¹
Ji bona ehlê Qur'an

297. Kesê xulûş emel ke
Xulûş here meydanê
Ev we'da min ji wan ra
Teşdîq bikin îmanê⁵⁵²

298. 'Erbek gote peyğember
Cennet 'ecêb mekan e

⁵⁵⁰ Ev her du risteyên di dawîya bendê de, di NMEê de tune ye.

⁵⁵¹ Hêstiran ew dirêjin: NME.

⁵⁵² Ev benda di rêza 300î de di NYYê de tune ye.

Bi hûrî û bi Kewser
'Eceb deve tê hene

299. Resûl gotê ya 'Ereb
Deve hene l' cennetê
Rengê wan celeb celeb
Temamê wan j' yaqûtê

300. Serê wan zêrê zer in
Xalxal ji nûra 'erş in
Weke teyran difirin
Durlu durlu bi neqş in

[r. 94]

301. 'Ereb gote pêgember
Yek deve û yek hûrî
Hem qeşreke mu'teber
Rica bike ji Barî
Fida bikim rûh û ser
Ji bo te bibim gorî

302. Heman ew çû meydanê
Wek 'aşiqan cewlan kir
Sebî' şûrek lê danî
Naftengê da du şeq kir⁵⁵³

303. Filhal hûrî gehanê
Yek hûrî ew hemêz kir
Wî can da şadimanî
Xuda miraz haşil kir

[r. 95]

⁵⁵³ Sebî' şûr lê deranî // Naftengê du şeq kir: NYY.

304. Yek dî hate meydanê⁵⁵⁴
Ew apê ê kuştî bû
Kafir derbek lê danî
Ew jî li wê şehîd bû

305. Cardin yekî rikêb kir
‘Aqîbet ew bû şehîd
Yekî dîsa hucûm kir
Şehîd kir cardin pelîd

306. Sekinî ew Sebî‘eyd
Muqabilê Islamê
Gazî kir ya Muḥemmed
Pehlewanê te kanê

[r. 96]

**LAFKIRINA SEBE‘E DI MUQABILÊ ISLAMÊ Û HEM
QETILKIRINA WÎ⁵⁵⁵**

307. Kanê ‘Ebbas Ibnî Mirdas
Kan Zubeyr Ibnî ‘Ewwam
Kanê Qeys û Se‘dê Weqqaş⁵⁵⁶
Ev mirin cumle tamam

308. Kanê ew Muğdad û Xalid
Kan ‘Emmar Şufyan kiram⁵⁵⁷
Kanê ew pişt û penahê
‘Eskerê te xaş û ‘am

[r. 97]

309. Kanê ew Şêrê Şikarî
‘Elî Heyder ew bi nam

⁵⁵⁴ Yek jî hate: NYY.

⁵⁵⁵ Ev serenav di NMEê de tune ye.

⁵⁵⁶ Kanê Qeys û Se‘d û Weqqaş: NME.

⁵⁵⁷ Kanê ‘Emmar Şufyan kiram: NME.

Ew kî ye were ku îro
Ez bikim ew î zimam

310. Ger bikim ne're bi carek
Dêw dibin l' erdê rimam
Hem lêxim derbê li sindan
Wê bibitin xurd û xam

311. Lê Şiddîq gote Resûl da
Ji geyr Heyder ya Îmam⁵⁵⁸
Ew bike cengê digel wî⁵⁵⁹
Def' bike derban mudam

[r. 98]

312. Hem qetil ke wî le'înî
Ew neke êdî kelam
Şahê Heyder li wê der bû
Muntezir emrê himam⁵⁶⁰

313. Hezretê Resûl emir kir
Lê kirî cewşen 'emam
Şa dibe here meydanê
Şeq bike kafir zulam

314. Zulfekar bend kir li puştê
Li 'Iqab ew kir suwar
Hem du'ayek kir ji bo wî
Wî Resûlê Kirdigar⁵⁶¹

⁵⁵⁸ Ji geyr Imam Heyderî: NYY.

⁵⁵⁹ Kû bike cengê digel wî: NME.

⁵⁶⁰ Ilah: NYY. Dibe ku ev bêjeya "himam"ê "hîmam" be. Hîmam tê maneya mewt û mirinê.

⁵⁶¹ Wî ew Resûlê Kirdigar: NME.

315. Qed û qamet burca nûrê
Dêw dibin jê sehminak
[r. 99] Deng weke re'ê biharê
Çû meydanê zâtê pak

316. Kafiran j' hev du ra gotin
Hat 'Elî Şêrê Xuda
Pehlewanê Eħmeda ye
Beg dibin l' ber wî geda

QETILKIRINA SEBÎ'ED E⁵⁶²

317. 'Elî çû meydanê
Reqisî cewlan kir
Ne're ji dil danê
[r. 100] Haşimî dewran kir
Wek re'ê Nisanê⁵⁶³
Gurîne hewar kir

318. Kafiran ku dîtin hat
Şêrê Muħemmed
Can û ciger şotin
Li wan çê bû heybet

319. Malik got ya Sebî'eyd
Ev e 'Elîyê Heyder
Eger tu wî bikî qeyd
Wê bê gotin bi defter

⁵⁶² Qetilkirina Sebî'eyd: NME.

⁵⁶³ Weke 'ewrê Nisanê: NME.

320. Sebî‘ wegote Malik
Bi heyata qîza te
Heta wî nekim halik
Ez nazvirime bal te

[r. 101]

321. Sebî‘ kişya meydanê
Muqabilê wî şahî⁵⁶⁴
Go nav bike beyanê
Cewab da wî wî mahî

322. Ez im ‘Eliyê Heyder
Meşhûr im ez di ‘amê
Ez ê te bikim ebter
Êdî neke kalamê

323. Weqta kafir ku seh kir
Derbek danî Imamê
Imam ew derb meni‘ kir⁵⁶⁵
Cardin hatî bi rimê

324. Rimek danî wî Şahî
Elî heman xuyan kir
Hafîz bûye Ilahî
Di bin mil da rim zebt kir⁵⁶⁶

[r. 102]

325. Ew î kaş kir wî kaş kir
Islam kafir ‘ecêb bûn
Wana ew rim dirêj kir
Heta ortê da qeş bû

⁵⁶⁴ Muqabil bû wî şahî: NME.

⁵⁶⁵ Îmam ew derb meni‘ kir: NME.

⁵⁶⁶ Di bin mil da rim zebt kir: NYY.

326. Kafir ku dît ma 'eceb
Şewiî can û ciger
Wî gote Şahê 'Ereb
Te rakir deryê Xeyber

327. Ğurab Kela Qureyzê
Ew 'Umerê me'd û kerb
Weke wan teyrê bazî
Te alt kirin ew 'Ereb

[r. 103]

328. Şah gote wê da belê
Min alt kirin serteser
Cardin hucûm da 'Elî
Ew kafirê pur Qecer

329. Bû qîl û qal meydanê
Di tozê da winda bûn
Kafir gote wî Xanî
Su'aleke min mabû

330. Ez bimirim ya 'Elî
Halê min wê çewan be
Gote wî Şahê Welî
Dê cehnem û 'ezab be

331. Lê tu bimirî 'eceb
Çewan be wê halê te
Gote wî Şahê 'Ereb
Xuda hez ke Cennet e

[r. 104]

332. Hırhır kenî ew kefer
Hukum dikî ji bo xwe
Tu cenetê ya Heyder
Dixazî hem ji bo xwe

333. Meqşeda wî kafirî
Ku ew bêhnê bistîne
Mu‘min kafir dinhêrî⁵⁶⁷
Temam li wan heyrîne

334. Heman kafir dest-sivik
Şûrek danî wî Şahî
Merţal da ber wî çapik
Şûr-demir ʔalda ma‘î

[r. 105]

335. Zor da‘ê şûr derneket
Heman wî kir firar e
Şûrek hilda bi heybet
Ku d‘kim te parepar e⁵⁶⁸

336. ‘Elî gotê ya mel‘ûn
Lafan meke ya revek
Ez ê te bikim zebûn
Xuda hez ke bi derbek

337. Kafir dîsa hemle kir
Heta milê wî westa
Cardin wî hîlekar kir
Zivirî gote Şah da

⁵⁶⁷ Mu‘min kafir dinhirin: NME.

⁵⁶⁸ Ev her du risteyên di dawîya bendê de bi vî rengî bû “Şûrek hilda ha bi heybet // Ku dikim te parepar e”. Lê Ji bo weznê me midaxele kir.

338. Tu çira inşaf nakî
Du heban hatin herbê⁵⁶⁹
[r. 106] Di pişt xo da punhan kî
Da ew li min xin derbê

339. 'Elî gotê ya kafir
Te dest avête hîlan
Çi heye bike şadir
Qet meke qal û qîlan

340. Kafir xwe anî geyret
Hemle kire wî Şahî
Gah bi derbê gah heybet
Wan şer kirin teva'î⁵⁷⁰

341. Kafir û mu'min tamam
Li wan dikin seyranê
[r. 107] 'Eceb Sebî' yan Imam
Kî galib be l' meydanê

342. Pêgember lê du'a kir
Ya Reb bidî nuşretê
Nagah 'Elî hemle kir
Anî weqtê fursetê

343. Got hilde xwe vê derbê
Ji dest Heyderê Kerrar

⁵⁶⁹ Du heban hatî herbê: NME.

⁵⁷⁰ Wana şer kirin teva'î: NME.

Şah rabû ser rikêbê
Hewale kir Zulfekar

344. Kafir sîper bilind kir
Filhal bin da punhan bu
Zulfekar merţal şeq kir
Hesinek bêasas bû

[r. 108]

345. Ser ranegirt heya zîn
Digel hespê bi carek
Du qeţ kir ew Şahê Dîn
Şûr çû ‘erdê buhustek

346. Melekan hem mu’munan
Tekbîr vedan xaş û ‘am
Temam bûne şaduman
Cebra’îl got ev kelim

347. “*La feta îlla ‘Elî*
La seyfe îlla Zulfekar”
Nabî wek wî şeca‘et
Ne kesekûn wek Zulfekar⁵⁷¹

⁵⁷¹ La feta îlla ‘Elî ye aşikar la seyfe îlla Zulfekar: NYY. “لا فتى الا على لا سيف الا ذوالفقار” “Weke ‘Elî egît û weke Zulfekar jî şûr tune ye.”

**WEL-‘ELÎYU KANE MU‘CIZ’ EN-NEBÎ
ŞALLALLAHÛ ‘ELEYHÎ WE SELLEM⁵⁷²**

We qale’l-Nebî: “Ena medînetul’l-‘ilm we ‘Elîyyun babuha”⁵⁷³

[r. 109]

348. Her nebîyek mu‘cizatê⁵⁷⁴
Wan di desta zahir e⁵⁷⁵
Ew weqta lizûm bixesta⁵⁷⁶
Wan dikirin şadir e
349. Mu‘cizatê Muştefa ye
‘Eliyê Heyder Kerrar
Bil-‘umûm fe‘lê di sihrê
Wî beçal kir b' zulfeqar⁵⁷⁷
350. Şahê Heyder ku qetil kir
Mel‘ûnê şerîr kefer
Le‘netellahî‘ eleyhî
Lañiqê narê seqer
351. Kafîrê muşrik ku ditin
Ew le‘în bûye du şeq
Wan hewar kirin bi carek
Dengê wana çû felek⁵⁷⁸

⁵⁷² Silava Xwedê li ser wî be; “صلى الله عليه و سلم”. Ev îfade di NMEê de tune ye.

⁵⁷³ Hedîs û me‘neya wê; “أنا مدينة العلم و عليّ بابها” Ez bajarê ilmê me, Elî jî derê wê ye. Lê hedîs bi awayekî kêr hatiye nivîsîn û dewama wê jî heye. Ev îfade di NMEê de tune ye.

⁵⁷⁴ Her nebîyek mu‘cizê wan: NME.

⁵⁷⁵ Wana di desta zahir e: NYY.

⁵⁷⁶ Çi weqta lizûm bixesta: NME.

⁵⁷⁷ Çi hebûn sihrê sahiran // Tev beçal kir zulfeqar: NME.

⁵⁷⁸ Ev bend di NYYê de tune ye.

**XÎTAMU'L-HERB WE ĞELEBETU'L-ISLAM 'ELE'L-
KAFIR WE'S-SELAM**⁵⁷⁹

[r. 110]

352. 'Eskerê Hewazînê
Dîtin ku kafir bû mat⁵⁸⁰
Suwar peya bezînê
'Elî veda şelewat

353. Musulmanan hem melek
Ellah Ellah wan gotin
Hucûm dan wan bi carek
Wana kafir raxistin

354. Bû 'eca'ib karûzar
Hewar meded ya Ellah
Mêran kirin zarûzar
Imdad ya Resûlellah

355. Cengek wisan 'ecêb e
Serî hol bûn ber piyan
Xûnê girtî rikêb e
Buxarê xwe da çîyan

[r. 111]

356. Hûtan di nava behran
Wana serî hilanî
Cenawiran li berran
Gazî dan el-emanî

357. Ew Resûlê nûranî
Ji Dundulê peya bû

⁵⁷⁹ Ev serenav di NMEê de tune ye.

⁵⁸⁰ Dîtin kafir kû bû mat: NME.

Çengek xwelî hilanî⁵⁸¹
Li kafiran wera bû

358. Kafir revîn temamet
Çûne Kela Ta'ifê
Li wan çê bû qiyamet
Û hem çêbû ze'îfî⁵⁸²

[r. 112]

359. Hinek ji wan esîr bûn
Hinekan kir firar e⁵⁸³
Hinek ji wan qetil bûn
Ew çûne nava nar e

360. Dora gelî girêdan
Bû gazî yû hewar e
Islamê ne're radan
Hal kafira firar e

361. Malik revî şişarê
Yehûdan ew xilaş kir
Cardin hatne şîrarê
Wan tevbîra xwe dîkir

362. Resûlallah emir da
Wana hucûm da kelê
Bi roj û şev karûzar
Ji herbê nabin belî

[r. 113]

⁵⁸¹ Çengek xalî hilanî: NYY.

⁵⁸² Malik girtin li Teyfê: NME.

⁵⁸³ Ev her du risteyên serê bendê di NMEê de tune ye.

363. Musulmanan bi gulbeng
Şer dikin çar terefan
Malik girtin kirin bend
Himmeta pêgemberan

364. Pêgember gote Malik
Qebûl bike îmanê
Filhal ew bû[ye] salik
Musulman bû l' meydanê

365. Hem 'Urwe bû musulman
Digel qewmê xo carek
Taslîm kirin malê wan
Paşva kirin tedarek⁵⁸⁴

366. Ku ew hatne îmanê
Temam şa bûn reqîsîn
Berî dane Medînê
Yasîn tamam nivîsî[n]⁵⁸⁵

[r. 114]

367. Ya Reb ehlê îmanê
Bi cennetê şa bikî
Wan dûr bikî j' şeytanê
Cemalê neşîb bikî

368. Hem **Yasînê** gunehkar
Digel wî da û baban
Ger 'efû kî ya Ğeffar
Rehma te nabit nuqşan

⁵⁸⁴ Bendên di rêza 363-364-365-366-367-368an de di NMEê de tune ne.

⁵⁸⁵ Ev Bend di NMEê de weha ye; "Hinan got el emanê // Bira li birê nepirsî // Malik anî îmanê // **Yasîn** tamam nivîsî".

369. Şelewat bidin bira
Hûn xilaş bin nîranê⁵⁸⁶
[r. 115] Li Muḥemmed aşkera
Şefî‘ roja mîzanê

370. Hem digel wî fatiḥe
Ji şehabiyê kiram⁵⁸⁷
Bi ezmanek feşîhe⁵⁸⁸
Ji umetê ra tamam

*Şahibuhu we Malikuhu Yûsif bin Hecî Mela Qasim Min qeryeti
Kirakom Ceng el-Huneyn.*⁵⁸⁹

⁵⁸⁶ Di NYYê de ev her du risteyên serê bendê wiha bû “Şelewata bidin ey bira // Hûn xilaş bin nîranê”. Me ji bo kêşê midaxele kir û me ew kurt kir.

⁵⁸⁷ Ji bo şehabê kiram: NME.

⁵⁸⁸ Bi zimanek fesîhe: NME.

⁵⁸⁹ Li vir jî hubra nivîsê şîn e û nûtir xuya dike. Hubra eslî ya destxetê reş e. Ji nivîsê jî tê xuyakirin ku ev hevok pişt re lê hatiye zêdekirin.

ENCAM

Mela Yasînê Alikî di sala 1891/1901ê? de li Panosa Agirîyê hatiye dinyayê. Navê bavê wî Mela Ebdullah e û navê dîya wî Heyat e. Mela Yasîn ji eşîra Alikan bûye bavê wî û Feqe Reşîdê Alikî jî pismamên hev bûne.

Mela Yasînê Alikî alimekî dewra xwe bûye û li ber destê çendîn kesan xwendina xwe tamam kiriye. Mela Yasîn li cem kesên weke Feqe Reşîdê Alikî, Mela Qasimê Poz Reş, Şêx Nesîmê Kufrewî, Şêx Muhemmedê Erwasî, Mela Ehmedê Kurumzade û Mela Zahirê Tendurekî yê Memanî xwendiyê.

Mela Yasînê Alikî pêgirtîyê terîqeta Neqşebendîyê bûye û li medreseyên Neqşebendîyê xwendiyê. Em di helbestên wî de rastî pesn û medhên ji bo şêxên terîqetê tên.

Heta niha em gihastin berhema Mela Yasînê Alikî ya bi navê *Ġezwetu Huneyn* û pênc helbestên wî. Me sê ji wan helbestên wî bi saya bandên teyîbê ku ji alîyê malbata wî ve hatibûn tomarkirin bi dest xist. Ji ber ku pirtûkên wî ji alîyê malbata wî ve hatibûn belavkirin em negihastin berhemên dîtir. Mela Yasînê Alikî zimanên weke: Kurdî, Erebî, Farisî û Tirkî zanîbûye û berhema xwe ya bi navê *Ġezwetu Huneynê* bi Kurdî nivîsîye.

Di destpêkê de li ser xwediyê *Ġezwetu Huneynê* tevliheviyek hebû. Malbata Yusif Yaşar ev berhem weke ya kalê xwe dizanîbûn û malbata Feqe Reşîd jî ev berhemê weke ya Feqe Reşîd qebûl dikirin. Lê di encama lêkolîna me de û li gor nusxeyên ku li ber destê me bûn em gihastin vê qeate ku ev berhem ya Mela Yasînê Alikî ye û ne yê Yusif Yaşar û ne ya Feqe Reşîdê Alikî ye. Lewra di du nusxeyan de jî em rastî mexlesa Yasînê Alikî hatin. Herwiha ti belgeyek ku em bibêjin ev berhem ya Yusif Yaşar e an jî ya Feqe Reşîdê Alikî ye di destê me de tune ye.

Berhema wî ya bi navê *Ġezwetu Huneyn* menzûmeyê li ser cenga Huneynê ye. Ev ceng di serdema Hz. Muhemmed de pêk hatiye û di dawîyê de misilman bi ser ketine û mişrîk têk çûne. Berhem bi bendan hatiye nivîsîn û bi tevahî ji 373 (27 jê şeşîne ne) bendan pêk hatiye.

Di *Ĝezwetu Huneyna Mela Yasînê Alikî* de beşên weke dîbace, beşa sereke û xatîmeyê cih digirin. Di beşa dîbaceyê de Alikî cih daye sebebê telîfê, dîroka nivîsînê û tewhîdê. Di beşa serekede behsa Cenga Huneynê hatiye kirin û di beşa xatîmeyê de jî dawî li berhema xwe anîye.

Berhem bi kêşa birgeyî ya kiteyên cûrbicûr hatiye nivîsîn û di hin bendên wê de qisûrên kêşê hene. Di hin bendên cengnameyê de ji aliyê kêşa birgeyî ve hevsengî di nav risteyên wê de tune ye, lê serwaya xwe parastiye.

Mela Yasîn di berhema xwe ya bi navê *Ĝezwetu Huneynê* de û di helbestên xwe de navê xwe û navê eşîra xwe “Yasîn” û “Yasînê Alikî” weke mexles bi kar anîne.

Me li gor nusxeyên ber dest metna rexneyî ya cengnameyê derxist holê. Cudahî û ferqên di nusxeyan de di jêrenotan de da nîşan dan. Bi vî awayî metna rexneyî ya cengnameyê me bi dest xist û xebata xwe li ser metna rexneyî kir.

Berhema Mela Yasînê Alikî ji aliyê unsûrên kulturî û hunerên edebî ve jî dewlemend e. Bi taybetî unsûrên ceng û cengewariyê tê de gelekî cih digirin. Kesayetên serdema cengê di berhemê de gelekî derbas bûne.

ÇAVKANÎ

PIRTÛK

- ACAR, Hayrullah **Dîwana Şêx Ehmedê Feqîr (Metn û Lêkolîn)**, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2016.
- AÇA, Mehmet, Haluk Gökalp, İsa Kocakaplan, **Başlangıçtan Günümüze Türk Edebiyatında Tür ve Şekil Bilgisi**, Kesit Yayınları, İstanbul 2012.
- ADAK, Abdurrahman, **Destpêka Edebîyata Kurdî ya Klasîk**, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2015.
- ADAK, Abdurrahman, **Teşeyên Nezmê di Edebîyata Kurdî ya Klasîk de**, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2019.
- AKKUŞ, Metin, **Klasik Türk Şiirinin Anlam Dünyası**, Femomen Yayınları, Erzurum 2007.
- APAK, Adem, **Ana Hatlarıyla İslam Tarihi 1. Cild (Hz. Muhammed Dönemi)**, Ensar Yayınları, İstanbul 2020.
- ARTUN, Erman, **Dini-Tasavvufi Halk Edebiyatı**, Karahan Kitabevi, Adana 2013.
- BARAN, Bahoz, **Rêzimana Kurmancî**, Weşanên Wardoz, Amed 2018.
- BEŞİKÇİ, İsmail, **Doğu'da Değişim ve Yapısal Sorunlar Göçebe Alikan Aşireti**, İsmail Beşikçi Vakfı, İstanbul 2014.
- CEGERXWÎN, **Sewra Azadî**, Weşanên Avesta, Stenbol 2014.
- CELİL, Celîlê, **Keşkula Kurmancî**, Weşanên Doğa, Wîen 2004.
- ÇETİN, Ahmet Mûcteba, **Şimdi: Hayatım, Hicretim Şeyh İsmail Çetin Hazretleri**, Dilara Yayınları, Isparta 2020.
- ÇETİN, İsmail, **Edeble Varış Lütüfla Dönüş**, Dilara Yayınları, Isparta 2014.
- ÇETİN, İsmet, **Türk Edebiyatında Hazret-i Ali Cenknâmeleri**, Kültür Bakanlığı Yayınları, Ankara 1997.
- DEMİR, Ahmet, **Qewlê Newala Sîsebanê**, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2012.
- DİLÇİN, Cem, **Örneklerle Türk Şiir Bilgisi**, Türk Dili Kurumu Yayınları, Ankara 2013.
- EFENDİ, Muhammed, **Sîretü'n-Nebi (Cilt 1)**, (Amd. Bayram Özfirat), Türkiye Yazma Eserler Kurumu Başkanlığı, İstanbul 2019.

- EFENDİ, Muhammed, **Sîretü'n-Nebi** (Cilt 2), (Amd. Bayram Özfırat), Türkiye Yazma Eserler Kurumu Başkanlığı, İstanbul 2019.
- ÊSÎ, M. Huseyn, M.Seîd GİRDARÎ û M. Muhammed BÊRKEVANÎ (amd) **Qur'ana Pîroz û Wergera Sê Ser Zimanê Kurdî**, Weşanên Şura, Stenbol 2014.
- İŞİK, İbrahim S., **A'dan Z'ye Kürtler- Kişiler, Kavramlar**, Weşanên Nûbiharê, Stenbol 2017.
- KAPLAN, Yaşar, **Beyt û Destanên Kurdî**, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2019.
- KESKİN, Necat, **Foklor û Edebîyata Gelêrî**, Weşanên Avesta, İstanbul 2019.
- KESKİNOĞLU, Osman, **Siyer-i Nebî (Hazret-i Peygamberin Hayatı)**, DİB Yayınları, Ankara 2017.
- KOCAKAPLAN, İsa, **Açıklamalı Edebî Sanatlar**, Türk Edebiyatı Vakfı Yayınları, İstanbul 2017.
- KOXÎ, Mela Ehmed Hilmîyê, **Dîwana Camî'**, Weşanên Ihsan, Diyarbakır 2004.
- LEVEND, Agâh Sırrı, **Gazavatnameler ve Mihaloğlu Ali Beyin Gazavatnamesi**, Türk Tarihi Kurumu, 2. Baskı, Ankara 2000.
- MATTEİ, Jean-Louis, **Hz. Ali Cenknâmelerî**, Kitabevi Yayınları, İstanbul 2004.
- NEBHANÎ, İsmâil İbn Yûsuf, **Peygamber Efendimizin Mûcizleri 1**, Milli Gazete Yayınları, İstanbul 1997.
- NURSÎ, Bediüzzaman Said, **Mektubat**, Zehra Yayıncılık, İstanbul 2019.
- OĞUZ, M. Özcal, **Türk Halk Edebiyatı El Kitabı**, Grafiker Yayıncılık, Ankara 2008.
- ÖGEL, Bahaeddin, **Türk Mitolojisi II**, Türk Tarih Kurumu Yayınları, Ankara 2002.
- REŞİD, Feqe, **Sırru'l Mehşer**, (amd. Ahmet Gemi, M. Nezîf Katılmış), Weşanên Peywend, Wan 2020.
- SARAÇ, Yekta, **Klâsik Edebiyat Bilgisi; Belagat**, Gökkubbe Yayınları, İstanbul 2014.
- SARIÇAM, **İbrahim Hz. Muhammed ve Evrensel Mesajı**, Diyanet İşleri Başkanlığı Yayınları, Ankara 2011.
- SURUÇ, Salih, **Kâinatın Efendisi Peygamberimizin Hayatı**, Nesil Yayınları, İstanbul 2012.
- ŞULUL, Kasım, **Ana Hatlarıyla Siyer-i Nebî**, Ensar Yayınları, İstanbul 2015.
- TOPRAK, İsmail, **Hazret-i Ali Cenklere**, Büyüyenay Yayınları 2. Baskı, İstanbul 2016.

VALİ, Shahab, **Şahnameya Kurdî Rustemê Zal û Heft Xana Wî**, Weşanên Avesta, Stenbol 2021.

XOŞNAW, Hêmin Umer **Behnesa**, Weşanên Grafik, Diyarbekir 2017.

XOŞNAW, Hêmin Umer, **Re'sul-Xul**, Weşanên Grafik, Diyarbekir 2017.

YILDIRIM, Kadri **Kürt Medreseleri ve Alimleri: Tekkelere Bağlı Medreseler**, Cilt. 2, Avesta Yayınları, İstanbul 2018.

YILDIZ, Ayhan, **Qewlê Hespê Reş Lêkolîn û Metn**, Weşanên Peywend, Wan 2021.

ZAPSU, Abdurrahim, **Büyük İslam Tarihi Hz. Muhammed Dönemi**, Risale Yayınları, İstanbul 2006.

ZAVOTÇU, Gencay, **Klasik Türk Edebiyatı Sözlüğü**, Umuttepe Yayınları, İzmir 2018.

ANSİKLOPEDİ

ALGÜL, Hüseyin, "Hamza" **DİA**, c. 15, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 1997.

AYCAN, İrfan, "Ebû Sufyan", **DİA**, c. 10, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 1994.

AZİMLİ, Mehmet, "Se'd b. Ubade", **DİA**, c. 15, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 2008.

BAKIR, Abdülhalik, "Qeys b. Sa'd", **DİA**, c. 25, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, Ankara 2002.

CANIM, Rıdvan, "Sâkînâme", **DİA**, c. 36, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, Ankara 2009.

ÇORUHLU, Tülin, "Gürz", **DİA**, c. 14, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 1996.

ÇORUHLU, Tülin, "Kalkan", **DİA**, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 200.

DİA "Ebbas" **DİA**, c. 1, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 1988.

EFENDİOĞLU, Mehmet, "Zubeyr b. Evvam", **DİA**, c. 44, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 2013.

ERKAN, Mustafa, "Gazavatname", **DİA**, c. 13, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 1996.

ERTÜRK, Mustafa "Mikdad b. Abdullah", **DİA**, c. 30, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 2005.

- FAYDA, Mustafa “ Ömer”, **DİA**, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 2007.
- FAYDA, Mustafa, “ Halîd b. Velîd”, **DİA**, c. 15, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları İstanbul 1997.
- FAYDA, Mustafa, “Abbas b. Mirdas” **DİA**, c. 1, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 1988.
- FAYDA, Mustafa, “Bîlalê Habeşî”, **DİA**, c. 6, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 1992.
- FAYDA, Mustafa, “Ebûbekir”, **DİA**, c. 10, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 1994.
- FAYDA, Mustafa, “Hz. Muhammed”, **DİA**, c. 30, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 2005.
- FAYDA, Mustafa, “Sîyer û Megazî”, **DİA**, c. 37, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 2009.
- FIĞLATLI, Ethem Ruhi, “Hz. Alî”, **DİA**, c. 2, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 1989.
- HAMİDULLAH, Muhammed, “Huneyn”, **DİA**, c. 18, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 1998.
- HATİPOĞLU, İbrahim, “Se‘d b. Ebû Vakkas”, **DİA**, c. 35, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 2008.
- KARACABEY, Salih “Şeybe b. Osman”, **DİA**, c. 39, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 2010.
- KÜÇÜKAŞCI, Mustafa Sabri, “Malik b. Ewf”, **DİA**, c. 27, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, Ankara 200.
- NAZLIGÜL, Habil, “Urwe b. Mes‘ud” **DİA**, c. 42, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 2021.
- ÖZAYDIN, Abdülkerim, “Eşter”, **DİA**, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 1995.
- Peygamberler Tarihi Ansiklopedisi-1**, (Koma Amd. Türkiye Gazatesi Yayınları Ansiklopedi Grubu) Türkiye Gazatesi Yayınları, İstanbul 2004.
- SAVAN, Ahmet, “Düreyd b. Sımme”, **DİA**, c.10, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 1994.
- TOKSARI, “Ali Katade b. Nu‘man”, **DİA**, c. 25, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, Ankara 2002.

YAMAN, Ahmet, “Siyer”, **DİA**, c.37, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 2009.

YAVUZ, Yusuf Şevki & Zeki ÜNAL, “Cebrail”, **DİA**, c. 7, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 1993.

YİĞİT, İsmail, “Osman”, **DİA**, c. 33, Türkiye Diyanet Vakfı Yayınları, İstanbul 2007.

GOTAR

ATALAN, Mehmet, “Anadolu’da Cenknâmelerin Toplumsal Yansımaları”, **Kelam Araştırmaları**, c. 9,1, n.r. 45-56.

ATALAN, Mehmet, “Türk Kültüründe Hz. Ali Cenknâmeleri”, **e-Makalat Mezhep Araştırmaları Dergisi**, c.1, n.r. 7-27.

DEMİR, Rugeş, "Hz. Ali cenknâmelerinden “Yemâme Cengi”nin yeni bir nüshası", **İslam Medeniyeti Dergisi**, hej. 7 (2021, n.r.50-64

ERTEKİN, M. Zahir & Zafer Açar, Di Kurmancî de Cotepeyv û Cûreyên Wan, **Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi**, c. 1, n.r. 82-92.

GALOTTA, Aldo, “ Ğazavât-ı Ğareddîn Pâşâ, (Wer. Salih Akdemir)”, **Beleten Dergisi**, c. 47, n.r. 473-500.

GÜMÜŞKILIÇ, Mehmet, “Bir Gazavat-Nâme Etrafında Hz. Ali’nin Halk Muhayyilesindeki Yeri”, **The Journal of Academic Social Science Studies**, c. 5, n.r.145-155.

GÜMÜŞKILIÇ, Mehmet, “Cumhur-name’de Hz. Ali’nin Özellikleri”, **Uluslararası Sosyal Araştırmalar Dergisi The Journal of International Social Research**, c. 6, n.r.142-152.

KIRAN, İsmail, “Aristokrat Kürt Aileler: Kufreviler”, **Kovara Kurdîyat**, hej. 4, n.r. 81-104.

KOYUNCU, Zeynep, “Edebî Türlerden Cenk-name/Gazavat-name karşılaştırması ve Muhammed Hanefî- Tabut Cengi’nin Yeni Bir Nüshası”, **Alevilik-Bektaşilik Araştırmaları Dergisi**, hej. 21, nr. 137-138.

SARIKAYA, Meliha Yıldırım, “Halk Dilinde Bir Duâ Mecnûası: Bilâl Nûrî Münâcâtı”, **İstanbul Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi**, hej. 27, r. 113-146.

TEK, Ayhan, “Şeyh-Mürît İletişiminin Yazma Geleneğine Katkısı: Mela Zahirê Tendûrekî’nin Dîwan’ı”, **Nüşa Dergisi**, c 18. Hej. 47, n.r. 83-108.

YONAT, Mehmet, “Di Devokên Kurdîya Kurmancî de Zayenda Rewşên Morfolojîk (Mînakên Devokên Bakur, Başûrê Rojhilat û Başûrê Rojavayê)”, **Mukaddime**, hej. 11, n.r. 410-445.

TEZ

- BÜLBÜL, Eda, “**Hazret-i Ali Cenklere Üzerine Bir Tektik (İnceleme-Metin)**”, (Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi, Cumhuriyet Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Lisansüstü Eğitim, Öğretim ve Sınav Yönetmeliğinin Türk Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı), Sivas 2008.
- CEYLAN, Esra, “**Siyerü'l-Ekrad Adlı Yazma Eserin Çevirisi ve Değerlendirmesi**”, (Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi, Mardin Artuklu Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Tarih Ana Bilim Dalı), Mardin 2017.
- ÇALIŞIR, Rojbir, “**Destana Rustemê Zal**”, (Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê Beşa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî) Mêrdîn 2019.
- DEMİR, Rugeş, “**Manzum Hz. Ali Cenklereinden Yemâme Cengi Üzerine Bir İnceleme**”, (Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi, Kastamonu Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Türk Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı), Kastamonu 2019.
- DUISENOV, Nurgissa, “**Sebeup ve Sonuçlarıyla Huneyn Gazvesi**”, (Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi, Selçuklu Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü İslam Tarihi ve Sanatları Anabilim Dalı İslam Tarihi Bilim Dalı), Konya 2011.
- ERMURAT, Ahmet “**Muhammed'in Manzum Siyer-i Nebî'si (İnceleme-Metin)**”, (Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi, Erciyes Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü İslam Tarihi ve Sanatları Anabilim Dalı Türk İslam Edebiyatı Bilim Dalı), Kayseri 2019.
- FİLİZ, Mehmet Şirin, “**Xebatek li Ser Destana Dewrêşê Evdî**”, (Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî), Mêrdîn 2014.
- KAPLAN, Yıldırım, “**Erzurumlu Kadı Mustafa Darîr'in Kitâb-ı Siyer-i Nebî'si**”, (Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi, Ankara Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü İslâm Tarihi ve Sanatları (İslâm Tarihi) Anabilim Dalı), Ankara 2006.
- KARAK, M. Zana, “**Dîwançeya Şêx İsmetullahê Karazî (Metn û Lêkolîn)**”, (Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî), Mêrdîn 2020.
- POLAT, Edîp, “**Di Çend Pexşanên Kurmancî de Evînên Efsanevî**”, (Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtûya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî), Mêrdîn 2015.
- ŞAHİN, Kürşat Şamil, “**Gazavatnamelerde Edebi Savaş Tasvirleri**”, (Yayımlanmamış Doktora Tezi, Kırıkkale Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Türk Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı), Kırıkkale 2015.

TAŞKESEN, Metin **Seyyid Abdülhakîm el-Hüseynî'nin Hayatı ve Tasavvuf Anlayışı**, (Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi, Ankara Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Temel İslâm Bilimleri Tasavvuf Anabilimdalı), Ankara 2007.

TİTİZ, Fahrî, “**El-Cewahîru’r Reşadiye fi Sîretî’n-Nebewîyye ya Mela Nûrûllahê Godişki (Metn û Lêkolîn û Ferheng)**”, (Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Bîngolê Enstîtuya Zimanên Jîndar Makezanista Ziman û Edebîyata Kurdî) Bingol 2020.

TURAN, Cîhan, “**Dîwana Fethî (Edîsyon, Metn, Krîtîk)**”, (Teza Lîsansa Bilind a Çapnebûyî, Zanîngeha Bîngolê Enstîtuya Zimanên Jîndar Makezanista Ziman û Edebiyata Kurdî), Bîngol 2017.

FERHENG

DEVELİOĞLU, Ferit, **Osmanlıca-Türkçe Ansiklopedik Lûgat**, Aydın Yayınları, Ankara 2017.

PALA, İskender, **Ansiklopedik Divan Şiiri Sözlüğü**, Kapı, İstanbul 2007.

ÇAVKANİYÊN DÎJÎTAL

Dema gihandinê: (23.09.2021), (<https://sozluk.gov.tr/>)

Dema gihandinê: (24.09.2021), (<https://sozluk.gov.tr/>)

Dema gihandinê: (01.08.2021), (<https://www.etimolojiturkce.com/kelime/gaza>)

Dema gihandinê: (25.08.2021), Ertuğrul Ertekin, İbn Hüsâm'ın Haveranname'si, (Dema weşanê: 25.09.2014), (<http://siilikarastirmalari.blogspot.com/2014/09/cenkname-ibn-husamn-haverannamesi.html>)

Dema gihandinê: (15.07.2022.); Eş-Şeyh İsmail Çetin Hazrovi (K.S.) (<https://www.biyografya.com/biyografi/9768>)

Dema gihandinê: (19.07.2021) (<https://www.biyografya.com/biyografi/9768>)

Dema gihandinê: (15.09.2021.) (<http://rahiask.com/index.php/tetebbuat/124-naksibendiler/muceddidiler/725-es-seyh-ismail-cetin-hazrovi-k-s>)

Dema gihandinê: (19.07.2021) (<https://islamansiklopedisi.org.tr/cetin-ismail>, <http://kemal-ersozlu.net/medenidusuncetarihi/ismailcetin.htm>)

HEVPEYVÎN Û HEVDÎTIN

- Abdullah Akbaş, Mersin, (2021).
- Abdullah Aytaç, Çanakkale/Biga, (2021).
- Abdulvahap Çelebi, Kocaeli (2021).
- Emrah Erol, Mersin, (2021).
- Esad Yıldız, Kırşehir, (2021).
- Fesih Yıldız, Kırşehir, (2021).
- Hüsna Ataseven, Patnos/Agirî, (2021).
- Mela Kutbettîn Uygur, Patnos/Agirî (2021).
- Mele Nezif Katılmış, Patnos/Agirî, (2021).
- Kutbettîn Yılmaz, Patnos/Agirî (2021).
- Şahab Vali, Mêrdîn (2022).
- Yaşar Kaplan, Colemêrg (2022).
- Seyda Mela Omerî Didêrî yê Biçûk (Ömer Nas) (2022).

PÊVEK

Pêvek 1: Ferhengoka Ğezwetu Huneynê.

Ferhengoka Ğezwetu Huneynê

-A-

Ahên: Hesin, demir, zincîr, şûr.

‘**Alî:** Berz, gewre.

-B-

Başman: Ew pîvana ku li gor cih û li gor ku tiştê ku tê pîvan diguhere. Pîvaneke giranîyê yê berê ye.

Başin: Ew tiştê di hindûr de, ne dîyar nexwîya û tiştê ku ne li ber çav e.

Bayî: Firoşkar, yê difiroşe.

Be‘îr: Hêştira nêr.

Bey‘et: Pesend kirin, qebûl kirin.

Bil-‘umûm: Hemû, tev.

-C-

Cenah: Perr, bask.

Cewlan: Gerîn, zivirîn, geryan.

Cezîr: Girav.

Cund: Koma leşkeran.

Çaryar: Çar hogir, ji bo Hz. Ebûbekir, Hz. Elî, Hz. Osman û Hz. Omer tê gotin.

-D-

Delğê: Pêl, pêlên avê.

Dirayet: Hiş, zanîn, têgihiştin.

-E-

‘**Ekrût:** Hîlekar, fêlbaz, zana, qurnaz.

Ebter: Ew heywanê ku dûvê wê jêkiriye, bê kimçik.

Eğdar-Eğder: Xedartir, herî xedar.

Ehlê ‘urfan: Xwedî îrfan. Zana.

E‘lem: Herî zana, yê herî alim.

‘**Ellame-‘Ellam:** Alim, yê herî herî zana. (Sifetekî Xwedê ye)

‘**Emam:** Pirjimariya peyva ap e.

E‘rab: Ereben Çolê.

‘**Esel:** Hingiv.

Etrab: Lîstîkên şahiyê, şahî.

-F-

Fexrê ‘alem: Sifetekî Hz. Muhammed e. Ew kesê ku hemû alem pesnê wî dide.

Fexr’ul-umem: Sifetekî Hz. Muhammed e.

Fewc: Tîm, kom, cemeat.

Fi'l-hal: Niha, demildest, di wê gavê de.

-G-

Geda: Parsek, xulam, berdestik, xizan, feqîr.

Gulbeng: Ew ilahiya ku bi yek dengêkî tê xwendin. Ango diaya ku bi yek dengî tê xwendin.

Gurz: Amrazeke ku berê weke sîleh hatiye bikaranîn. Topûza mezin a hesin.

-Ĝ-

Ĝar: Şikeft. Xwar, jêr.

Ĝelţan: Yê ku digindirîne, yê ku tê gindirîn, gêrbûn.

Ĝezenfer: Şêrê gir.

Ĝulgul: Xirecir, heytehol, qêrîn û qarîn, gazî kirin.

Ĝurab: Qijik.

-H-

Hamilê Qur'an: Ew kesê ku Qur'anê ji ber dike. Hafiz.

Ĥamil: Hilgir. Yê bar kirî, avis. Xwedî.

Ĥennan: Ew kesê ku pir birehme e. Navekî Xwedê ye.

Ĥeyazîn: Navê qebîleyeke mişrîkan e.

Ĥeyder: Şêr, Hz. Elî.

Ĥeyderê Kerrar: Ew kesê ku dizivire hemle dike, ew kesê ku êrîş dike. Hz. Elî.

Ĥimmet: Xebat, hewl û cehd.

Ĥîn: Wext, dem.

Ĥubel: Ew pûtê herî mezin ê Qureyşîyan e ku berî Îslamê li Kabeyê bû.

Ĥulle: Cil û berg, cilê cennetê.

-I-

Idrac: Bi cih kirina nivîsekî di kovar, rojname û hwd.

Ilgar: Hespa ku bi çar gavan dibeze.

Intizar: Dereng xistin.

Iqab: Navê hespa Hz. Elî.

Irrîn: Awayê qêrîna heywanên weke hêştir û dewaran.

Ibnê/binê: Kur, law.

I'lam: Dan zanîn, hat ragihandin, vegotin.

-Î-

Îsar: Fedakirina xwe ji dêvla kesekî din.

Îşret: Mey, vexwarina meyê, bikaranîna vexwarinê.

Îxrac: Derketina derve, derxistin. 2. Şandina malê zêde derveyî welêt.

Îzhar: Nîşandayîn, derxistina meydanê. Nimayîşa ji derewa.

-K-

Karûzar: Şer, ceng, herb, meydana herbê.

Kewa'ib: Ew keçên memik xonçe.

Kiram: Ew kesê ku eslê wan paq in, yên mezin, ew kwsên ku ji nesla kerîm tên.

Kibrîya: Ezamet, Mezinahîya Xwedê.

Kislan: Sistî, tîralî, şemirîn, bêhalî.

-L-

Lañiq: Ew kesê ku digihije, yê ku hatiye zêdekirin, yê ku piştî hatiye tayînkirin.

Lams: Zeliqandin, girtin, dest dayîn.

La-yenam: Ew ê ku ranazê û çavdêrîyê dike. Xwedê.

La-yezal: Ew kesê ku tune nabe. Xwedê.

Liwa': Al, senceq.

-M-

Mabeyn: Ew tiştê di navbera du tiştan de, navber.

Mem'mur: Çêkirî, dirist.

Me'd: Yê hazirkirî, seferber, yê bitertîb.

Meğrûr: Bi xurûr, ew kesê ku bawerîya wî bi tiştê heye, ew kesê ku divê tiştê mirov pê ewle nebe ewle bûbe, ew kesê ji xwe qaîl.

Mel'ûnek: Ew kesê ku hatiye naletkirin.

Mennan: Navekî Xwedê ye. Ew kesê ku pir alîkarî dike, isana wî pir e.

Menat: Navê pûteke ku li Mekkeyê bû.

Meth: Pesn, medhîye.

Mewzûn: Yê bi wezn, yê pîvandî. 2. Tiştê ku bi wezin hatiye nivîsîn.

Mexfî: Veşartî, nepenî.

Meymene: Perê rastê yê artêşê, milê rastê.

Meysere: Perê çepê yê artêşê, milê çepê.

Mezîd: Zêdebûn, zêdekirin, yê zêdebûye, yê hatiye zêdekirin. Yê mezin bûye.

Mudam: Tiştê ku berdewam e. Didome, her tim heye. Bê navber e.

Muhal: Navê hespa Sebî'eyd e.

Muntezîr: Ew kesê ku jê bendewarî dihat kirin. Ew kesê ku li benda wî hatine sekinîn, ew kesê ku li hêviya hatina wî ne.

Muste'an: Ew kesê ku jê alîkarî tê hêvikirin. Ew kesê ku jê alîkarî tê xwestin.

Mu'teber: Xwedî qedir, xwedî xatir. Bi bawer, bi ewle.

Muzawer: Derewkirin, li hev anîn, sexte.

-N-

Nabedîd: Nexuya, nedîyar, wenda.

Naqor: Zengil, çan.

Naseza: Lê nayê, nelayik.

Nefîr: Cema'et, civat.

Neheng: Hût, masîyê mezin.

Nîda: Bangkirin, gazîkirin.

Nîran: Ronahî, şewq. 2. Cehnem, dojah. 3. Agir.

Numa: Nişandayîn, dan zanîn.

Nuşret: Alîkarî. Alîkarîya Xwedê.

-P-

Pelîd: Pîs, mirdar, rezîl, riswa. Şeytan, xerab.

Penah: Ew cihê xwe spartinê, xwe spartin.

-Q-

Qerîr: Bextewar.

Qerîr: Şad, bextewar, dilşad.

Qîl û qal: Paşgotinî, kurtûpist.

Qocik: Li herêma Serhedê ji bo kûçikan qoçik jî tê gotin.

Quşûr: Pirjimarîya bêjeya qesrê ye. Koşk, seray.

-R-

Rayet: Senceq, al.

Re'd: Gure gure esman.

Ridwan: Melekê dergevanê bihuştê. Maneya wê qaîl bûn, razî bûn.

Rihlet: Koç, koç kirin, mirin.

Rikêb: Siwarbûn, li tiştêkî siwarbûn. (rukûb)

Ru'yet: Dîtin, nêrîn, hatin dîtin, amraza dîtinê.

-S-

Sadat: Serwer, kesê bi hurmet û mezin. Pirjimarîya bêjeya Seyîd e.

Şadir: Ew ê derketî, derketî.

Şahîbqiran: Ew hikimdarê ku hertim bi ser dikeve û serdestiyê bi dest dixê.

Salik: Ew kesê ku dikeve rêyekê, ew ê ku di rêyekê de dimeşe.

Sazende: Çêker. Sazbend, lêder.

Se'yu: Xebat, hewildan.

Sehm-nak: Tirsnak, xeternak.

Sem´: Bihîstin.

Selsebîl: Ew ava sivik. Navê kaniyeke cennetê.

Sera: Qesr.

Serî´en: Sivik, bi destsivikî, ecele.

Settar: Ew kesê ku vedişêrê: Xwedê

Şeqeleyen: Mirov û Cin.

Seyl: Lehî û tiştên ku bi şîddet tèn û diherikin.

-Ş-

Şeca´et: Egîdî, mêrxasî, wêrekî.

Şikarî: Ew ê mensubê nêçîrê, teyra nêçîrê, xizmetkarê padîşah yê nêçîrê.

Şimar: jimar, hejmar.

Şuphesîz: Bêguman, bêşik.

-T-

Ṭa´: Guhdayîn, guhdarîkirin.

Te´cîl: Ecele kirin, lezandin.

Te´na: Dijûn kirin, lome kirin, xeyb kirin, zem kirin.

Te´ecub: Ecêpmayîn.

Tehlîl: Dubare gotina peyva La Îllahe Îlallah e.

Teḥrîs: Lê sorkirin, qehirandin.

Telbîs: Bi awayekî sexte veşartina qisûran. Hîle.

Teqbîl: maç kirin, ramûsandin.

-U-

‘Ucac: Toz û duman.

‘Uşat: Gunehkar, bêîteat, zordest. Yên bi esil.

‘Uzlet: Bi tenê jiyîn, xwe ji herkesî dûr kirin û jiyaneke tenê û تنها.

-W-

Wezn: Giranî, kişandin.

-X-

Xab û desa: Hîle, xab, dek û dolab.

Xebîs: Namerd, pîs, bê´esl.

Xendan: Ew kesê ku dikene. Kenîn. Bextewar.

Xetm´ul-murselîn: Pêxemberê dawî Hz. Muhammed.

Xezece: Navê qebîleyeke Medîneyê ye.

Xilţet: Beşdarîya jîyana civakî û xwedûrnexistina ji mirovan.

Xiyam: Kon, çadir.

Xudawend: Efendî, xwedî, malik, hikimdar. (Sifetekî Xwedê).

Xulûs: Xalisbûn, safibûn, paqijîya dil.

Xûrd û xam: Perçe perçe kirin, lêdana bi şiddet û eciqandin.

-Y-

Yad: Biyanî, dijmin.

Yeşrîb: Navê kevn yê bajarê Medîne ye.

-Z-

Zebûn: Qelsî, zeîfî, tengazerî.

Zenban: Guneh, curm.

Zergan: Şîş, serê rimmê.

Zimam: Hefsar lê girêdan.

Zulfeqar: Şûrê Hz. Elî.

Zîn: Marek, berdeh

Pêvek 2: Sê Helbestên Mela Yasîne Alikî.

-1-

1. Sersed sema'ê çaran⁵⁹⁰
Da'im dike deweran⁵⁹¹
Çare dadan demeran
Teqdîra Rebbê deryan

2. D' sala heştê heftan da
Di pişt hezar û sê sed⁵⁹²
Roj hate mîzanê da
Dirêj kirin ya Ehed

3. Bê roj û bê hembêz kirin
Jar û ze'îf û zer kirin
Muhtacê destê eban kirin
Birca mîzanê ya Semed

4. Roj hate birca 'eqrebê
Rûh û cesed taze dibî
Wek zarokan radbe girî
Nalîn ku tê Ellah meded

5. Navê Ellah xweş şêrîn e
Ew birînan dikewîne
Dibîne⁵⁹³ halê **Yasîn** e
Ahîn ku tê bila 'eded

⁵⁹⁰ Ser sed sema'ê çaran (bir yilda dort mevsim)

⁵⁹¹ Duwazdeh mehan

⁵⁹² Hezar sê

⁵⁹³ Birîna.

6. Ahîn kû tê qelb zakir e⁵⁹⁴

Bêhn e newayek sakir e

Me'yûs û melca'a sirr e

Nalîn ku tê Ellah Ehed

7. Nalîn kû tê j' riha dile

Aşiqê gulan bilbil e

..... e

..... ed

8. Meded Ellah birîndar im

Ji rehma te umîdwar⁵⁹⁵ im

Bi tewbe û îstîxfar im

Çiqet (çile?) tamam bû el-meded

9. Meded ya Şahê Bexda'ê

Pê min bi ser hev da na'ê

Nalîn li min têne rayê

Tebîbê derdan el-meded

10. Meded ya Xews birîndar im

Qiyam li min bûye fu'ûd

Min dî eynek şaxek dar im

Me j' bîr nekî Rebbê sucûd

11. Me j' bîr nekî tebîbê min

Enîs û rehnuma'ê min

Hekîmê derd û qelbê min

Meded ya Şahê Qesrevî

⁵⁹⁴ Ahîn ku tê qewza dil e.

⁵⁹⁵ Umîdkar.

12. Ev derd li min dibe sulûk
Çil roj tamam bû ez xulûk
Bi qey û zincîra mulîk
Şahê Xebîrê el-meded

13. Sinnet gibi birîndar im
Bi cerha Naciyê Kutlay
Bi ... ⁵⁹⁶ bê cî û war im
Şahê Xebîrê el-meded

14. Bêroj kirim bi derzîyê
Wek dirindê li ser mîhê
Mezin dibin hestiyê piyê
..... ed

15. a
Sebr û tebata min nema
Ez bê hal im wekî zara
Şahê Xebîrê el-meded

16. Ya Rebbena tu Qadîr î
Hem ewwel î hem axir î
Hem batin î hem zahir î
Heyy û Qeyyûm î el-meded

17. Heyy û Qeyyûm î ya Ellah
Şikrê te da derd û bela
Li cinnetê bin el cila
Xewsê Xebîrê el-meded

⁵⁹⁶ Bê cî û bê war im.

18. Ya Cabirê 'ezmê kesîr
Ya Rahimê şêxê kebîr
Ya Raziqê tîflê sebîr
Bêtir binal ya Reb meded

19. Lazim dibe gazind Nebî
Derd û bela 'emrê te bî
Qalûbela hêj çênebî
Bêtir binal ya Reb meded

20. Gazin nîne şîkrê te ye
Rûh û cesed milkê te ye
Nalîn ji min bê fayde ye
Bêtir binal ya Reb meded

21. Nalîn li min çê bûn gelek
Ya malîkê çerxa felek
Aciz dibin ins û melek
Melhem tine ya Reb meded

22. Te çêkirin ev rûh û can
Derd û bela ev êş û jan
Nalîn li min çûn asîman
Ya Şafi'ê derdan meded

23. Şafi' tu yî Kafî tu yî
Dafi'ê her derdan tu yî
Xelasê binê mewcan tu yî
Bi rehma xwe weqtê seher

24. Weqtê seher carî dikim
Cirm û xeta tev par dikim

Rewş û xopan îzhar dikim
Bêtir binal ya Rebb meded

-2-⁵⁹⁷

1. Beram zadê derê qesrê
Lillahul hemd û el-ehwal
..... di îmamê
Bi serkêşî muala kir
2. Maşaallah yara şêrîn
Murşîdê qewî halî
Temamê ‘alim û şêxan
Bi saya wî girîftar kir
3. Girîftar in bi qeyda te
Temamê ‘alim û ‘abid
Bi rifaka muqatala
Bi ‘urfanî temenna kir
4. Bi sema enbiya remzun
Bi ya seyîd û ya murşîd
We ‘uzra min tebîbê heq
Bi hifza te tecala kir
5. Melûkê rehmetê da‘îm
Digel wanê muqerrebîn
Wele çare huzura te ye
Bi şîbhê wan beşaret kir

⁵⁹⁷ Mela Yasîn ev helbest li ser Seyîd Şêx Abdulhekîm nivîsîye.

6. Resuallah ya digel 'ala
Ji bo teq û req-ul 'eynê
Kezarîkun li sadatan
Asarê wan te ihya kir

7. Bibin seyîd bibin lavan
Xweda gotye di Qur'anê
Sirate'l-musteqîn qa'îm
Ji wanê korê înan kir

8. Lahiqê Qubbê Xewsî
Ji bo wanê ku siddîq in
Temenna me ji Qur'anê
Sifatê Xewsî l' te îzhar kir

9. Tu Xewsî li me 'ala sidqê
Li ser textê tu sultan î
Munîsê melîkê derya
Weha qelbî îşaret kir

10. Melîkê muktedîr el'an
Welîdê wî gelek zahf in
El 'amên enbiyayên wî
Li hevpara û îmdad kir

11.
Sed û bîst çar hezar in ew
Li batin da dîkin xizmet
Ku Şi'ranî riwayet kir

12. Di fikra xwe deweran kir
Wî yek ferdên ji wan ferdan

Eceb ew qutb û ferd î tu
Ji beytullahê îstîkrar kir

13. Ji Hezretî Xizir her dem
Qutbul ferdî hildida dersê
Du wezîrê wî îmameynê
Mekanê wan heram-sar kir

14. Wela kesî nizanî tu
Mekanê wan me dî
Ku her tim hildidin dersê
Ji îmameyn ‘uzaran kir

15. Ji wan kirklarê qursê
Ew in her dem ricaullah
Ewanan hildidin dersê⁵⁹⁸
..... mixabin kir

16. Wele ew tê serê Misrê
Bi emrê te tu haqan î
Ji Xewsê hildidin dersê
Li dinyaye eha te kir

17. Wele ew tac in ew çarê
Ûmud in ew ji erdê ra
Muqebayî yar mucebayî
Li qelbên wan tu melhem kir

18. Di ilmê de binî behrî
Terîqa wahdetê bedrî

⁵⁹⁸ Piştî vê risteyê kesê ku vê helbestê dixwîne diguhere.

Bi nisbet leyletu' l qedrî
Xizir Nebî bîra te d' kir

19. Ji vê 'amê tu Geylanî
Ji neqş û bend 'alaban î
Bi nisbet tu rizdewanî
Wekî rojê tecalla kir

20. pê re ban î
Zul-cenaheyn terîqanî
Sîraceddînê Mewlanî
Li Hekkarî 'elem rakir

21. Tu yî Seyîd wekî Taha
Bi nisbet Xewsê Hîzanê
Bi neytê nisbeta Seyda
Li etrafan elem rakir



22. Mucedded wekî Fethullah
Bi rewneq wek Zîyauddîn
Bi nisbet Şahê Xiznayê
Ew nisbeta tamam top kir



23. 'E'urûnî be.... ullah
Ricaullah 'ibadullah
Ya Qutbellah ya Resulellah
Qelbê **Yasîn** tebarek kir



-3-

1. Eya ey dîlbera nazik hebîba ber dilê yarê
Te çil rojan li min şewtand wekî daxê li ser darê

2. Te ‘alem tev ji xew rakir hêsîr mane li vê warê
Çiqas xelqê derket rûyê ey sultanê li Botanê
3. Ela ey dîlbera ekber tu mehbûbê tu hêja yî
Di roja tu hêja yî
4. Belê bûne tu Leyla yî
Ay çiqas xelqê derket rûyê wekî bazê li Bexda’ê
5. Li ber teva te Bexda ye ji hubba te dihat dîlber
Sohbeta te ji xelqê re wekî miskan wekî enber
6. Çiqas xelqê dibê îro
Çiqas ela ey serwer û dîlber
7. Gelo îro ji ber vê aşiqê şêrînê em pur dîne
Were rake ji wê birca şiklê şêrîn em bibînin
8. Şerme çêbû
Li min bike rehmê îro ay Kurdo derdo ez bi şîn im
9. Li dinyayê min kes nedî wek te rehber
Gelo sanî gelo Barî were carek biger
10. Ne Îskender û ne derya ne seyîd ne Xalîd/Talîb
Ax cîgera te çi ye Cemşîd bi qurbana te bin dilber
11. Eva çend meh çend ro te serî danîbû li palê
Ez dexîl **Yasîn** îro evdal îro maye li zîndanê
12. Gunehkar ew feqîr e lê bike îstîxfarê
Ay mirin çêtir e ji halê wî dilêm







بیتر چه احواله چه کالک دلاله
 خوش کالک زنا عارف دانی
 بوت لانا نودیه بیانکه دعوی
 کال کوه ای سرور عسکر پیغمبر
 دکل علی صید نری مدینه چوه در
 مکه فتح کرن شامخ کرن
 گعبه باغیر کرن نری پوتان دور کرن

محمد پر زور کرن پوتوصم حور کرن
 هتکاوان پوتان هتکاوان صانان
 فتلاوان سادانان جوار چوولانان
 کالی عزایلیو عکرو تو خیشو
 مزاور تلیسو تونای ایلسو
 طفا خونیکان فساد عیانگر

کینک وسان کار قلبوان و پرتار
 مالک آهین ردا کومالینتی خودا
 عقلوی بوشید بهنا خودک بردا
 ان ناقین حرمبه جمل پر پیا نیه
 عالم به شبابه محمد تر خانیه
 بیوت لانا نغم سری علی نری کم
 محمد بر بیکم شغور او ای صکم

یشلیم سوکان ازکم چدرکان
 بیتم قیزو بوکان دنک بجه ملوکان
 دنکجه
 ضیح او سوار بون بکازی صوار بون
 قوج قوج روانبو چل حزار حزار بو
 دنکی ننی ناقران دنکی وات پلوران
 صلده نفیران عترین بچران
 مالک کوه ای عمرای نری نوزاران

۱۶

ام بهرن خودا کس نرف نری پارا
 عسکر صف بظفر بذر ناه دقبو
 زنده نرف تبقونا چند روز اسفربون
 وان دی بر شاتو لک مصور کربو کالک
 تپدا کوشکوسراک در باز کربودو رانک
 وی کوته وان کافران یا بکلرو امیرات
 یانش و کریه دوران زمان بوی ریاره

۱۷

یا امر جلیل ناز لبو جبر پله
 حاتنه جم خلیله بسعی تعجیله
 کوئی یا امامه خدا کرسلامه
 حاضرین تمامه از یکم اعلامه
 کافر زور زعفرنی بی ترسو بخنینه
 بز نرنه دقین بکین هم کفین

۱۷

اصحابان علینه نه مکئی درینه
 خوی پرایه هینه نصره یا وان پینه
 عسکر هوزین بکی سقیفونی
 او تین بیقین وی ورته حنین
 الله الله تبارک نای خدا مبارک
 حون بیان تفجارت حاضرین تدارک
 پیغمبری

۱۸

پیغمبری کباره وی کوته پاریاره
 جنته حرب الفار یا امر پیغمبری کرد کار
 وانا دایه جوابه اقی تکلیفنا ثوابه
 قور بانبه دانو بابه روح مه تشقدا به
 پیغمبری نورانی اصحابه خورا آینه
 علم نروجه حلالی نری مکئی درانی

۲۹

برو کتی عسکر مینه هم هیسره
 راست صدیق اکبر پچا امیر خره
 لیش علی حیدر لاوری پیغمبره
 خالص نور اکبر شه و جهران نوپوره
 دنگی دگرو تهلا پلان حایو هوپی امیران
 لدشت بونه لیلان کشیانه سرزیلان
 چو او چو لوستانه در بودر بوستانه
 موج

۳۰

موج دان و نه بخرانه عباس کر بیانته
 کوه ام بی شمارن بگفته نامداره
 تمام پهلوانین غنیم کفارت
 تر سنامه توین منت بکسی نینه
 خلق ام پور دینه بشور مضرینه
 پیغمبر کوه باقم افرجه خزنو ماقم
 قول ته کوه اقم شبه طبرازستم

۳۱

قول ته لیدر سببی نظری
 کهنه عسکر شبه غظنغری
 القصد چو پیدا بدشت قومیدا
 اثر دها و بو پیدا عسکر دخی پاشندا
 عسکر کز فراره بو کازر هواره
 از دها و خذره اگر شه دق دیاره
 پیغمبر سوال کو بوچه و فرار کن

۳۲

علی اشی کار کن نبی خبر دز کن
 اثر دها و مه دیه نوال کن تر نیه
 جازد هو کپی چیا لریزیه
 شانده و حیدره او شهری اکبره
 بامری پیغمبره هجوم کر لسه
 علی چوسر اقم کیشاد و لفقار
 قبل که یکنجاره زیبا کر هواره



48
 كَوْحِ اِسْلَامِهِ قِتْلَامِ فِي حَرَامِهِ
 سِرْدَانِ جَنَامِهِ اَزْدِيكُمْ اِعْلَامِ
 نُوْرِ اِسْلَامِ نَبِيْ اَهْلِ اِيْمَانِ
 خُدَيْكِ وَرَافِعِ رَسُوْلِ اَمِيْدِ وَاوَانِ
 عَلِيٍّ يَا سَدِّ خَاكِرِ بَنِي خَبَرِ دَارِ كِرِ
 اَفْعَجِيْبِ اَظْهَارِ اَصْحَابِهِ تَشَاكِرِ
 بِيْعَرِ رُوْتُوْ لَلْاَزْهَارِ اَتْمَانِ
 اَوْ

47
 اَوْ تَرُوْ بِرَفَائِدِ سِرِّ نُوْجِ قِيَامِ
 فِي اَلْحَالِ اَزْجُوْبِهِ هَرُوْرِيْنَ طَلُوْتِيْ
 نَمِ حُوَادِ هِدَايَةِ لِسِرِّيَّةِ بِاَلِكِ
 اَوَّلِيْهِ اَمَاءِ اَوْ دِيْكَ بِاَدِيْشَاءِ
 تُوْبِ رَسُوْلِ اللهِ اِمِنْ عِبَادِ اللهِ
 نَمِ حَزْرِيَّةِ اِيْمَانِيَّةِ اَنْبِيَا
 خُدَيْكِ زَيْنَةِ لِيْلَانِ جَزِيْرِيَّةِ



49
 نَهَبِ قَوْمَانْدَارِ سِرْدَانِيْنَا نِيْنَا
 بِدَكْرِ قُرْآنِيْنَا مَشْغُوْلِ دَرْ سَانِيْنَا
 جَوَابِ دَامَةِ دِيُوْكَ مَا لِيْكَ كَرْتِدَارِ
 تُوْبِ كِرِيْمِ حَزْرِيْنَا دِيْجِهَ سِرْمَبَارِ
 جَنَانِ كُوْبِهِيْسَانِ نَزْجِ حَفْدُوْرِ كُوْتِيْنَا
 سَلْمَانِ كُوْتِيْنَا اَمْرُوْ دِهَ بِيْجِيْتِيْنَا
 اَصْحَابِيْنَا فِي دَرْبِ نَهْ شَرْقِ تَاغْرِبِ
 دَامِ

48
 دَا اَمِ يَكِيْنِ صِرِيْنَا نِيْنَا بِكَ قَلْبِيْنَا
 قَلْبِيْنَا مِيْنَا كَدِ لُطْفَامِهَ دَا خَاكِرِ
 لِيْلَانِ حُوَادِ اَضْرَاكِرِ دِيْجِهَ فِدَاكِرِ
 رَسُوْلِ كُوْتِ اَوْ سِرُوْرِ نَا فِي تَابُوْ حُرِ
 مِرْ كِيْنَا دِهَ سِرْسِرِ بِيْرِيْسِيْنِهَ اَوْ دَرِ
 هِيْمَانِ حُرْ شَابُوْ فِي اَلْحَالِ اَوْ بِيْرِيْسَانِيْنَا
 سَاخْتِكِ وَنَدِيُوْرِ جَارِ دِيْنَا هَاتِ عِيَانِيْنَا

۴۷
 وَان دیت کومدک عسکر چمن بون تفسر انسر
 اصحابی کردن زر کویین الله اکبر
 اصحابه فکرین تاصدک فی حیرین
 بری نری کوهورین چون پاشد اسکین
 لور بر غدار بون هندک شبیه مار بون
 در بر وک جنار بون غایت اود زوار بون
 هندک شبیه کورگان پنج وان وک زرگان
 کتبه

۴۸
 کتبه رقصو فرکان دران وک قوج کان
 من صوتق وینکین هن نشیرو بلنکین
 صدحیت بدنکین هم بیرد چنکین
 کهانته رسوله بسعی تعیل
 کیشان وکی سله ارضی کرن تقبله
 دیشتی اصنانا دستاجن جانان
 کتبه بی انسانا دوری مسلمانان
 یغیر فرما نکر عسکر بنزیم کر

۴۹
 میران علم را کر برید وان غار کر
 بریکتی عسکره میمنه هم میسر
 دلفی وان وکی بخت توز و عجاج خبر
 بذر الله عین اوچون لوی مایین
 وان چونداستقلین بهوار هانتنه خین
 کافران کودیتن نری جفد ورا کویین
 بر طاعتن آهین وان رهشتن

۵۰
 تدبیر دیت کفاره در باز بواپقار
 نشقی ایزد یاره در باطل ایتقار تمام بون سوار
 عشق بو دیاره عسکر کره تاغور روزی قدانور
 طاری کرن نشوره عسکر مه دور
 مالک کر نقشینه عبدک آنی سفید
 غایت وی کویوشه رلیو یانندیش
 عبد خوهلا فی نری اوردی درانی
 پشور نه یک کلان کویتهیز وک درانی
 خودانه چیا فی عبد نظر وک دلی

۲۱
 وی دین سحرانی بجایب نمانی
 عویا وکی کلان کوم خولهر د
 خولی لهریان اسلام نای و صفدان
 یاناجیه هوشیه زینای مراعیسه
 چار دین بنیر پاشته چند علم و انسه
 توبکه بیله چند علم و انسه
 کنج وان چوانه صف تین یان بلانه
 ناجی چای دورین دوروزی دین
 کو

۲۲
 کوته مالک بکین من کوه نبی دینه
 تمام انسانان ملک نری اسمانان
 دستاجن جانان اوین پی انسانان
 لیشا سوران یکی علم رسته
 قرتیب د دیاران هوهور خوش رسته
 بر ناور بلنده او سکینه پسته
 بزوری ده نمونده جبه وی درین
 مالک کوا و عبا او عم رسول
 حزی قیاسه کافر نری دست ناول

۲۳
 هان علم پت صور سمرلی سیارک
 جچی وان تف غوره قامت وک چنارک
 او کرم مزدا سه غالب قوم انداره
 بهلواند خاصه غایت او دوزواره
 هان علم سپی هلد پهلواند
 هسی وان تف بوزر وک کجا چارک
 کو او مقداره لاورد عریسه
 لکافر ان جلاده لسی وان سیه
 هان علم هشتین دیند اسلامک

۲۴
 دمی او دهنین کنج هشتین چارک
 وی کوه غلامه او سوار هیت
 زبیر عوامه کوه آبی صحرا
 منده لای جبی مینا هیف چارک
 کنج وان تف رشتو علم زبیر کلد
 او مسعد عباده رئیس ممدین
 جبه زبیر ساده از دیم امین
 از دیم حواره علم من هر مار
 نام زبیر هزار تمام تین بخاره

۸۵
 عیب کوه یا مولای شخصتک بونما
 نور برتقدی اولوز چوسما
 لدقلم سوار نوروی دیاره
 بخونامداره غایت کرم کاره
 مالک کوه اچلام او سبارد قوی
 رعود که مدام نری بونا شهادت
 نانی و سجد اصلاری مکئی
 صد امانتین خدایا باب فاطمائی
 صاعده علی محمد کلی اهل جنات
 و علی محمد کوه برونه حکایاتی

۸۶
 غلام کوه مالک ای صیار بالائی
 مند سیار دکنک خدرن لوانی
 قلبی دین حالک شبه از دهائی
 لاکن نور ایشق شه حده وصف نانی
 مالک کوه کافر اوه علی حیدر
 هبل کعبه راکر هلد اینه در
 ناجی کر هوار منده کومد عسکر
 نایب هزماره لدور پیغمبره
 عسکر حجیه هسی وان بالکن

۸۷
 رندوان غریبه راوی کوه ملک
 هارنه امدد کینچ وان هشین
 سماحی عرد علم د هزین
 مالک کوه ناسناک وان سیار د بین
 رحال خوبونکم اذ دیم آیین
 جاردن او ز فیر لدشت نظر کره
 هنده کوفکر رابو نری فرار کره
 مالک پز غنیر دوزونک دوزوا کره
 کوه ای کوی صبی تده دست یله سار کره
 قو کو

۸۸
 قول کوه یا مولای عیبک من دیه
 لنا فاسخرای جناور ترشیه
 هندک شفه شیران دیل او هلبن
 هندک شملان خول هف د آلین
 هندک شفه کورگان بیجان لهفد خین
 هندک شفه طبرانه پوان د هزی نین
 هندک شفه خوتان اکر دباری نین
 دو مان کرتیه شتان ایبه ام نه مین
 مالک کوه قولدا او انا تقه سحر
 سحر دکن پید دامه بطیر سینان

۴۹
 ناهی کوه ویدا از بخود پینم
 صوندی دشوم پوتان بر چاقاد پینم
 او نه چپ هاتین هر چی کوه و آن ده بو
 شوی عسکر را کوه تین سری وان مزین بو
 تف در خودی تین عسکر تف سوار بو
 ملی خوقه مشتین نام پیخ حرار بو
 مالک کوه سوار بو دو جوشن خوکی
 دو حرار آیری بو ریوئی پنهانگر
 عسکر صف بصفبو ان دعوی حری کر
 لای

۴۷
 لای اسلام پیغمبر از کر
 حاضرین تمام خدا جنت فکر
 حوری تف خیلین زوردا وان نظر کر
 حوری هاتنه خار شری پوتان شهیدان
 روح بکن ایناری قتل کن پلیدن
 رکیب کر عباسه او عم رسول
 هر کسی وی دناسه کافر نه دست مالوم
 هو هوا مفدا ده رقیس جولا تکر
 بگر نه بولاده عسکر خور است کر
 هو هوا خالده هستی خور است کر

۴۸
 لاکران شدیده عسکر صف بصفبو
 هو هوا عباسه غایت پهلوانه
 او کر مزداسه علم سر میلانه
 رکیب کر عمار عسکر کر ترتیبه
 غایت نامداره جولان وی غریبه
 فضل زبیر صفیان هاتین بالائی
 دنیا هزیا نری نقران صلوان فدائی
 سعد عمر عثمان دکل ابوبکر
 صابین رکی شاهانه وانا علم فکر
 ها

۴۶
 هات رکی شاهان وانا علم فکر
 هات نغاه مردان نقر شری دل دانی
 دو علم هلدانه او هاتنه صیدانی
 دناق اور تاوندنا محمد مقطقی
 مینا هیفاجارزا نور او چو قافا
 عودان سیوان قد ملک هاتین صفا
 ناکاه جنت قیو حوری زوردا هاتین
 علفل بید بو خورزان میل فیه مشان
 هر چی کوه خاقبو قلب و آن آفتاب

۲۷

فَرِحِي عَوَارِبُونَ زِمَانِ هَاتِه كَرِينِ
 صَلَوَاتِ لَه فَرِحُوا لَوْرَامِ اَمْتِيبِ
 صَلَسِن تَارِ حَوْبُو يَا اَهْلِ اِحْتِابِ
 قَلْبِ حَوْصَا فَيَكِينِ هُونِ بَكْرِنِ عِبْرِي

فاعلات فاعلا فاعلات روح فخر للسلطان

اَلَا يَوْمِي يَا هَضِيَارُ تَوَكَّلِي بِمَلَا دُنْيَايِ
 بَدَوْتِ هَمَّ صَفَا يَا وَيْ نَبَهْ هَقَالِ دُنْيَايِ
 بَطْهَرِ مَالِ هَمَّ سَرُوْدِ وَيْ هَتَاكِه شَرِيْفِي

۲۸

دِ بَا طَنْدِيقِي نَخْرَه نَبَهْ مِيَالِ دُنْيَايِ
 جَقَا سَا تَوِيكِي دَوْرَانِ بَغْرِ نُوْحِ سِي هَمَّ
 اَخْرَه دَامِ بَكْرِنِ رَحْمَتِ بِيورِ نُوْرَه دُنْيَايِ
 كَانِ تَطْلَه لِسْرَقْتَانِ مَطْفَرِ بُونِ دَجْكَانِ
 نَبِي بُوَا نَرَه نَبُو فَايْدِ فَاي بُونِ اَوْ دُنْيَايِ
 كَانِ اَوْ عَالِمِ اَعْلَمِ كُوْمِسُوْرِ حَوْلِ عِلْمِ
 مَسْتَوْنِ اِسْلَامِ مَهْلُوْنِ دَكْرِي عَمَلِ دُنْيَايِ
 كَانِ اَوْ اَحْلُوْرَه دَجْكَانِ كُوْمِسُوْرِ دُنْيَايِ

۲۹

نَبِي نَعْرِي وَلْتَا دَلِزِيْنِ دِيُوْرِيْنِ تَقَبُّوْرِيْنِ
 كَانِ اَوْ نَبِي سَرُوْرِ اَبُو بَكْرِ كَانِ مَهْرِ
 كُو اَوْ بُونِ حَا صِلِ اِيْجَادِ شَرِيْفَتِ اَنْ دُنْيَايِ
 دَسْتَانِ شُوْرِ وَدَقْ قُرْآنِ
 دِكُوْرَه هُونِ وَرَنَه مِيْدِيْخِ اِيْمَانِي
 بَزُوْرِ اَسُوْرِ وَاَنْ كَا فَرِهْ
 مَسْمَانِ بُونِ لَدُنْيَايِ

۳۰

دِهَادُنْيَا كُو بَكْرِي نَغِيْرِ عِلْمِ قُرْآنِ
 بِيُوْرِي دَامِ بَكْرِي عِيْرَه نَزْدَسْتِ قُوْمَتِه دُنْيَايِ

وَرَنَه سَرِي حِكَايَتِي

فَارِسِ اِسْلَامِ زَبَايِعِ عَوَا مَهْ
 اِزْنِ نَبَهْ اِمَامِ حَوْسَقِي وَيْ شَمَامَهْ
 زَبِيْرِ جُوْمِيْدَانِي رَقْمِ جَوْلَانِي نَكْرِ
 نَعْرَه نَه دِلِ دُنْيَايِ كُوْرُوْرِ خُوْدُوْرِ رَانِي

۴۷
 نری الی کفارن درکت صلی صور
 دستا طبر و بازن چه ملعونک دور
 قامت و چنان نری عاقله دور
 صیغ و الفارگر کونه از قطورم
 میج نازورگر رجنک مشهورم
 زیز کوه ای کافر قبول که ایمان
 یانری به حاضر قطمکه درین
 دین پی اکره بحکم قرآن

۴۸
 کوزنک لیز بارگر وز نای کرانو
 سیر وی احضارگر دیند پنهان
 اولز لیز بارگر صد و چل باطنیو
 زیز شور کشاندر جارت بی حوارگر
 سری هلقوانده اولاصق نارگر
 جاردن کور کیتگر خونقا کافر
 یک ز لوی هو لگر جاردن حاتد پاشد
 خونامالک جو شکر لکافران هاندا

۴۹
 کافر اسلام جارت سرور بنی صقبون
 نش صق مبارک تمام لهق قامبون
 وان شر کن قاصک سری لغرد هولبون
 توز چو آسمان دنیا بو ظلمانه
 روزی کرب سیوان چه شرک هیبه
 خوبی دار کبیان ته دگون قیامت
 خوبی حاتنه خاری نری بو ناشهیدان
 ملک حاتنه خاری نری بو ناشهیدان
 ملک کز نه زاری تسبیح نزدی پروران

۵۰
 یارب تو عشیارک رسول بکه خذت
 عرصانه عزیزیان دین پی صیپاندا
 خون حات و کی گانی کشید عرردا
 روی کربیا فب و نا قاضب را
 دنگو بو عیانده او دنگو نری شیطان
 سدر ک اصحابنه هاتنه بریمانی
 وی کوه یافانده وای محمد کافی
 محمد شهیدو کازی کر ملعونک

۵۱

اسلّم نابدیدبو کافر یون دقا خونده
 دست لو انا سار بو رفیق چنانده
 پیغمبر ند کن یا اهل اسلام
 بوجه و فریاد از دکم اعلام
 شیطان افریز حق لا ینا م
 زو عابو هو میزن سه تکیرن دنتکه
 صدح بر دلیران تنی کرن جنکه
 وانا کافر میزن بکوزی خلقه
 جبریل نازیبو خدا کر سالد م

۵۲

جهار لوی فرضی بو کویتر امام
 بلال دوندول کاکر پیغمبر سوار بو
 دما کر عمل کر ملک بر خشیو
 عمر ابو بکر وان علم هلد ابو
 عثمان علی حدید زبیر عوامه
 مغداد خالد اذرد هلدن بالتمام
 نعر تر چه رادان بو کازو هوان
 صدح زو وان مردان تر کز کفار
 الله الله کوین وان صد تر نشین

۵۳

خون تر کافر و تنی و که طاقی باران
 بنکه بشکی نشوندن تر بو دنیای
 کوثر کوزی طیران تر حله قطنائی
 رزم دریم باران جگر قولد دکرین
 بضر چو باغ سرب هور دکرین
 غریبه حربه حربه دانسته هقدو دریه
 زو بر کوزی دلیران کافران چو کونیه
 کافر دهانتنه کین زو بو حربه با مکنی
 اسلام دکن نالین اقی حربا لون نار

۵۴

زمانک و هابو پیغمبر کوه یا عم
 اقی امر خلد ابو شاه سله بو غلم
 تو بکه ندای زو بو نا انصا بان
 امانا زنی الهی جازدن بین مشادان
 کازیا عباس زو بو مؤمنان
 کونه عباس یا عوزابه سر صاف دم
 وهر سر چیا دقع بکه نار غم
 عباس چو سر چیا کازو کزود کرین
 خالق عالم چیکر صوتک بلد هون صلا

۵۰

وی دگونی یا اهل بیعت اهل رضوان هون ورن
از دلم قسم نوبوه سماع ختم لکرسین
هون ورن یا اهل بقره اهل خزرج یا تمام
از دلم قسم نوبوه افتربواق کلام
هون ورن یا اهل قرآن حامل بستر البقر
بقرین یا اهل عرفان با بیع تحت شجر
راوی کریمه روایت امریاء کر خد
بانی او دنیا هلاک سهر کر مهر و کما

۵۱

تسه کن وان دنک عیاش اوجات جمل
ریکن هاتق تما ما او صحابی خاص عام
وان کوبه صاعه سلامت او رسول کبریا
ام زاین ام جبین شوه ساره بربیا
نوجیب مستعان یا رسول الله مدد
ام دکن زار رجاک نونه خانق بی عدد
عذر وان فی الحال قبول کریم زه خان کر دعا
جبریل ان آیت ان کوه قبول او دعا
لقد نصرکم الله فی موطن کثیره یوم یوم

۵۲

اذا عجبتکم کثرتکم
معنا آیتاته هون کوه بدنه
هم زه خابا غفلت هشیا بین
یعنی هر مکنادی او حق تعالی
نصرة داوه هر جنه کارا لایزل
حالا او روشا حسین و کربیان
ی صابیه عسکری مه زه هون و قان
جاری دین و دیت زه هون مدد

۵۳

قائده نکر تر بوه و پیره عدد
وه محمد جیده هشت یا شند رفیق
مه سکین دا محمد هم او ان یار کرین
هم ملائک مشهاندی عدد حساب
شور لکا قران هون اندن فکر و ان فرج بید
سوه قصد کر نشیه خدا
راویان کریمه روایت نوریزان ای عزیز
مؤمن کار فرج جبارک هاشمه تر شسته سین
او قد وانا له قدام دومان جیبو حاتم
شکلینی مشوران ده پایت نفرین هم زاره



۶۷

کوته من یا ابن نبیه تو هر جنای همان
 سمع طماع کو تو من فی الحال زود از بوم روان
 از دما گهام حریف من خدا کر روح جانت
 او قدر کافر کو هو لکر کر ایضو شاه جهان
 خون بیار روز وصال دایچه او شهیدیه
 او بخونده روح جهان هم یک سرف ^{شعرا}
 عاشق صادق اوه دائم دکه ذکر عشق

۶۸

نه و کی من پیو کسلف هم بیرون ناسزا
 جهد یکی نفسی با قشر او جهاد اکبر
 وی بطرسین بموت صلوات لیغیر
 کافری و بوسین و از کمن جاید دره پیچید

راوی کوه ابن مرداس هاتدهم قرآنم
 در سوال کر فرجام کان او شیت علم
 من علم تیک کر لیسر سر جیای یار رسول
 دافید قوم نیشانبه او گوشترین پیر اصول

۶۹

هاتمه میر کین بدیم ته یار رسول انسی جهان
 ناکه هان مه دیت ریوشی دوه زور کافر همان
 من امیرا عسکر خوتو کر که جمل تمام
 جند کی و نال العرد طیر حضوره جمل تمام
 بسم کر رسول الله بی من کین یی شایون
 رحایت کر حبیب الله کر مردان کر جهان
 یکم خد نثار حق بکر ای تر صلوات
 بیه سرور رسول حق بین هو شیه فصلا

۷۰

فضل بر عباس یقصر لبین

فضل کر ولایت و ناقا ضربا دا
 بو کرم حرارت ایدنه نای و عقدا
 یکنز بو موله دناقامید فی
 سؤل کر رسوله شاه مردان کان
 هر طمر فانه جنکه کسره از کسینت
 هاید هو بودنکه قوه کس تو نیند
 علم سیار و شنگه کسک هاری نیند
 ناکاه هان زود کور مالک انسی

۱۵

بریندازونید آنچه در حق نفس
 پیغمبر سوا کرد شاه مردان کافی
 انس بجز حکایت کر گویم بیا فی
 وقتا کو بویغرو علی هات بغاره
 غایت گرمه پرو بین آفا ساره
 پیغمبر میتر که نه زمین آفا
 وی هلداید مشکه ام چون کاف بکافه

۱۶

مه هلداید مشکه ام چون کاف بکافه
 مه دیت چیاک عالی کاندک بودیاره
 کینج ز خون مالی غایت بریندازه
 بر بقبله میتر کر دو عابو تمام
 مشکا اثر کر مه شه وید کر تمام
 مه دیت چونک کافر وکی صنی هارن
 لید بونه ظاهر کافر پهلوانین

۱۷

او شاه حیدره مشکا خولوی دانی
 کیشاد انفقاره یک قط کر ملیدانی
 یک نه کر غطانه کافزهات کهانی
 هاتن پید پیدا کافر بون خز راک
 علی نوره دارا رکیب کر مبارک
 وکی تر شیران پیست پهلوان گوشتن
 از لید بون حیران نهر راد هشتن

۱۸

چار جزر کافر دوزوار تمام لین بر هفتون
 نهر دوا وک هر جار کافر و حساب
 عباس کر مرداسه وی کونه خالد زین
 وی ام سینه سوشه نری بو علی حیدر
 ناقه لیه بیه پروزه کر شا بکن پیغمبر
 هایدانی وان مهر حرثی نره ودر وانبونه
 کافر داند بر شوران نهر علی دیار بو

74
 او چونه پید پید وان دیت او شاه حیدر
 دوشور هنده رشتا دیش الله اکبر
 وان شوران کافرودا ائین شور پیغمبر
 الله الله دیشره وکدر عد بهار
 چنان کر نه زره ایدی نائی هژمار
 او مقدر عربی دکه جولا بهنر
 وی عام تیک کره لیسری صای
 جولا

75
 جولا وی عربیه دکه نیکو صید ای
 عباس خالدم زبیر وانا کافر کره
 حتی کهانه حیدر ونا کافر لاسکره
 سلام دکه پیغمبر زبیرته انتظار
 همان شامه کوه سیمفا نوناق کافر و زبیر
 خون دکشیا زبیران جوشن وی پار پار
 پیغمبر دل دصوق کانا کول نظر کره

76
 هسیر زبیر چاقا هات و بوی دید پور کر
 مزجایا شریحق اقیچه حریک کرانه
 علی کوبه محقق ازنده بزم روانه
 جاز دین علی کبیر عباس کوبه پیغمبر
 من کمالی نظر کره برنداره سر شتر
 رسول عباس از سال کره وی خو کهانه حیدر
 عباس علی جوم کره ائی لیک پیغمبر

77
 وی دیت جوشن پار پار اینه زبیر در خستین
 صفی دوبرین هژمار رسول آهین رضایت
 دوعا کر کونا علی فخر دکن بته ملاک
 ناین نشبه نه وکی نجیب بویه ملاک
 خدا جنت واحب کر زبیر بونه تو بزانه
 آوا بین امیر کر علی در خست قفانه
 اصحابان کوبه رسول ان لفرانوشین

۷۸

علی کوه نین ملول یا انسی مشکینه
 انسی کوه حق رسول قوتامین تو نینه
 پیغمبر کوه خالد دکل زبیر چایک
 صون سردوبینه سالک به نه وی مشکاتی
 وانا لولیا نکر - فی الحال ونامشک انی
 رسول تابک دغا نکر دست خون اقدردانی
 اصحابان انی دوشاکر تلیان کشایک کانی
 شونه

۷۹

بشرین صاروک بوزی امر دانه عسکری
 هارکشه لادزی عسکر هسپان زوخاری
 اصحابه بونه رازی وان شکر کز زبیری
 پیغمبر دست علانی دانی دغ مبارک
 لیرین شاه دانی صاخ بون بون بچارک
 چاق یکی انصاری رتیر یا بوهابو خاری
 کوه رسول زبیری دوغایکمه زبیری

۷۵

چاقی من شبه بری جاردنیه دیاری
 رسول کوه یاقاره چاقی بیت شهید
 یقین که قلب ساره خیر وی بز مزید
 صدق وید دیریم از عایشیم زبیری
 قین آیامه عزیز دطرسم نینه رازی
 پیغمبر نورانی خوش خوش حال و کبی
 هندک

۷۶

هندک خولی هلالی تو کامعجز و رانی
 شنا چاق وی دانی دعا کرد و نهایی
 شری معجز وی خانی شه اول چیر بوزونی
~~کنه سلسله حق المعجزاتی~~
 کوه بدیه وان معجزان وی رسول ذوالجلال
 آن دینه جاری زبیر تلیان هم با مولا نزل
 زرد که چاقان خلق هم سلامت من رمد
 عین صیدر یوم صیر یار رسول الله مدد

۷۸
 مَجْرُوبِ يَابُزْنَ اَوْ دِرُوزِ مَحْشَرِي
 وَيِ خَلَا مَكَّهُ مَهْ كَنَهْ كَارَانْ نَرْ جَهَنَّمِ سَقَرِ
 يَا اَللهِ اُمَّتَا اَحْمَدُ تَمَامًا شَا بَكِي
 هُمْ دِكَلْ وَاَنْ دَانُو بَابَانْ هُمْ جُوسِ مَلِكِي
 كَرْدِ عَارِزَنْ كُو سِي بِي هُوَنْ جَمَالًا لَّا بَزَلْ
 هُوَنْ بِي دِي لَّا اَحْمَدُ صَلَاتَانْ هِي زَنْبُورِ اَسْلَامِ
 كُو تَنَاجِبِ اِيْلِ نَرْ حَسِبِ خَلَا اَمْرًا لِيَا حَرِي

۷۹
 رَاوِي كُوْتَهْ جَبْرِ اِيْلِ هَاتِ بِي هِمِ اِمَامِ
 سَلَامِ كَرِي بِيهْ جَلِيْلِ حَا ضَرِي نِي هُوَنْ تَمَامِ
 بِي هَرْ قَطْرَهْ خُونَاوَانْ مَلِكْ عِنْ چِي كَرِي
 تَسْبِيحْ دِكْنِي زَنْبُورَانْ حَقِ اَرَا نَزَا مَحْشَرِي
 جَبْرِ اِيْلِ كُو تَهْ بِي غَيْرِ رَهْ زَارِ رُو سَهْ دِ جَارِ
 عَلِي كُو تَهْ اَللهِ اَكْبَرِ وَكَ وَفِي كَافِرِ اَنِي خَارِ
 نَرْ غَيْرِ خَرْدِ هُوَرْدَا تَمَامِ شَرِكِي كَغَارِ

۷۹
 عَلِي تَكْبِيْرُ شَدِيْدَا حَقِي كُو بُوِيَهْ اِيْقَارِ
 اِيْقَالُوَانْ دِيْرِي اَرْبُو شَفَقْ كُو بُوِي دِيَارِ
 هَرْدُو طَرَفِ سُوْرَبُو صَفَا كَرِي بُو هُوَارِ
 جَبْرِ اِيْلِ عَسْكَرِ اَسْتَكْرِ دِكَلْ كَرُو بِيُوَانِ
 صَفَا كَرِي وَاَنْ عِيَانِ سَكِيْنِ وَدِ جَدِيَانِ
 مَالِكِ نَرْ عَسْكَرِ اَسْتَكْرِ مِي جَهْتِ هُمْ مِي سَرِ
 قَلْبِ جَنَاحِ وَاَنْ چِي كَرِ هَاتِي اَوْ رَا نِي

۸۰
 رُوِي خُو فَا كَرِ زَنْبَانِ دِي سِتْ اَوْرِدِي كَافِرَانِ
 قِيْرِي كَرِي بِي شُوْرَانِ كِي بَرْقَهْ وَاَنْ لِدَا
 مَوْعِنِ كَافِرِ جَارِ كِ هَجْرَمِ كَرِي بِي هَشْرَا
 جِي دِيُو وِصْمِ مَلِكِ كَتَنَهْ نَاقَا كَافِرَانِ
 بُوْرُو زَا قِيَا مِتْ عَرْدِ هَاتِيَهْ هَرِيَانِ
 تُوْرِ بِي سَمَانَا كِتِ سَرِي هُو كُو تَهْ مَلِيْدَانِ
 مَشْرُو حَقِي اِيْقَارِ هَرْدُو عَسْكَرِ اِيْرِي

۸۱
 شفق کو بودیاری جازدی تمام سوار بود
 مالک همان رکیب کن خون عسکره مقلد
 دوجب لوی شهیدگر جازدی ز قریب پاشد
 مالک کوته کافران کیه صره منیدی
 جولان بیکه و دشپاره خون ریزه و کی کاف
 پهلوانک وان هبو دگوتی بیعی
 همان جرم خود بود از من و انا بکم قید
 بیاس

۸۲
 بیاس حقت هرز حساب دیو او کافر
 هم بگویم نامناز هسی وی کز نه حاضر
 اولههال بوسوار بشع خونده و کرمه
 بشع تو بهوار مشهور صاحب قرن
 کته ناقا اسلام صیف و ناله مند
 و که دیوی ظلام جازدی ز قریب پاشد
 لیدان سکنی لاف و که چار طرفان
 پیغمبر کوه یقین حور هاشم برهان

۸۳
 ناکاه یکی انصاری رکیب کر میدانی
 هر دو بون بر اینره کافر و مک لادانی
 نری هسی اتی خاره روج شایو مجتانی
 میث شمان و در کشید چقاس هبو نامند
 بر بندن و ک قید مفرور بو او صحران
 فدا الله تعالی حور مقصودا فی الحیا
 در حال انصاری و لوعب اترا ب
 حور در او صحران غلطی ادر اینک سکنان

۸۴
 پیغمبر کوه ای مسلمان بوجه نالین دورای
 جنت فکویه رضون حوری دکن سیرانی
 دنا قاصرو باخان کانی دکن جریانی
 ز سلسیل رصیقا جاک دین او کانی
 حور غسل نشین خدا کوشیه دقرانی
 کواعب انزین او صوری جنانی
 فی سالیق برده خدا صمک و کفنجانی
 دیوار و ان زیارتی بز صغاتیه کلدانی

۸۵
 حور تمام زه نوری بنار دکن مشایق
 طبعت خوشین او دور او ز ابن خندان
 مسکو عنبر و کافور دندان و کی مر جان
 ز روان چنابه تصور امز بری میر این
 کس نابینه وجهه وان تمام بقصر خیامین
 لیر جان سرقتان حتی خل لوانین
 عاشق باد لوجان ز می بویست انتظارین
 الله

۸۶
 الله الله دیزین کازه دکن یادیان
 سرشکان او دیزین زبوناهل قران
 عرب کوته پیغمبر جنت عجب مکانه
 بحر یو پاکوثر عجب دقه بی هنه
 رسول کوی یاعز دقه صنه لجنه
 زکمه وان جلیب تمام وان ز باقون
 سری وان زوزین خانجال ز نور عیشین

۸۷
 زکده طبره دفرین در لود ز کوبنشین
 عرب کوته پیغمبر یک دفسوید حوری
 هم قصر معتبر رجایکه زه باره
 ند یکیم روح سر زبوته بیم کوری
 همان او چو میدان وک عاشقان جولا نگر
 سبع شوره زنی ناطق کوی روشکر
 فی الحال حور کهای یک حور را جیز کر

۸۸
 وی جانند شادمان خدام ز حاکم
 یک زه خانه میدانی او اب ای کوشی بو
 کافر در بدی دانی او زه لور شهید بو
 جاز دین یکی رکت کر عاقبت او بو شهید
 یکی دپسا هجو مگر شهید کر جازده بلید
 کنی او بیعید مقابل اسلام
 کازی کرای احمد پهلوان ته کانی

۱۹
 لاقی کرینا بیعیدہ مقابل اسلام دم فدر کرا
 کان عباس ابن مراد کان زبیر ابن عوام
 کان قیس سعد وقاص ابن مرثد جبل تمام
 کان محمد کا خالد کان عمار صفیان کر
 کان اوپشت پناه عسکر تلمخا فو عام
 کان

۱۰
 کان اوسیر شکاری علی حسین بنی
 اویکیه وده کوپرو از یکم اوی زمام
 کریم نقر جبارک دیو دین لاری رمام
 هم لیم درین سفند وین بیست صورت خام
 بی صدیق گوته رولا شغیر امام صدی
 اوی بکه جنی دکوی دوق بکه دربان صدای

۱۱
 هم قبل که وی یعنی اوزنگه ایدی کلام
 شاه حیدر لویدر بو منظر امراله
 حضرت رسول امیر کریم جوشن عام
 شاد به هر میدان شق بکه کافر ظلام
 ذوالفقار بند که لیشی لعقاب او کر سوار
 هم در غایب که بر روی دی رسول کریم کار
 در قامت بر جانوری دیو دین زینت بنیاز
 کلنا در

۱۰
 دند و که رعید بهار جو میدان ذن یک
 کافران تو صف دور کونین صات علی شیری شدا
 پهلوان احمدیہ بت دین لبر و رکدا
 قتل درینا بیعیدہ
 علی جو میدان رقیب جو لائیکر
 صوره زر دای صائم دور تکر

و در عهد پسران کورین هوار کرده
 کافران کورین هات بشیر محمد
 جانوچکر صوفی لوان پی بو هیبت
 مالک کوه یا بسید افه علی صیدر
 اگر تو بودی قید وی کورین بد قتر
 سبع و کوه مالک بیاناتی زاده
 حتی وینام هالک ازناز قیرمه یالنه
 سبع

سبع کیشا میدان مغایل و پشاهی
 گوناقیکه بیان جوان داو و پشاهی
 ازیم علی صیدر مشهورم از دعایم
 از ته بکم ابر ایله نکه کلام
 وقتا کافر کوسرکدر در بد دان امام
 اهام او در منکر جاردن هالی بر می
 وک دل و پشاهی علی همان خود انکر

حافظ بویه الهی دین ملدارم زبشکر
 او کاشکر و کاشکر اسلام کافر بویه
 وانا اویم در پشکر حتی اورشد قطر
 کافر کوهیت مالک شوط جانوچکر
 وی کوه شاه عب ته را کرد پی غیر
 غراب کلاویط او هر معدو کور
 و که وان طیران بویه الله کور او عر
 شاه

شاه کوه و بدلی من آت کور سرشکر
 جاردن هجوم داعی او کافر پشکر
 بوقیل قال میدان دتوزردا وند بون
 کافر کوه و رضای سولا که من مابو
 ازیمیرم یا علی حال من و جوانیه
 کوه و شاه وی دی جرم غنایه
 دتو عر و عجب جوانیه و بدلی ته

کونه در شاه عرب خدا عز که جنسه
 جز حرکتی او کفر حکم دکی زبوحو
 توجنت یا حیدر دخواست هم زبوحو
 مقصد او کافر کوا و پهنی بستینه
 مومن کافر دهر بر تمام لوان حیرینه
 همان کافر دست شفت شورک دانی و شاه
 مرطال نابرو و پانک شور دمرطال دما
 زور دانی شور در نکت همان وی کفر
 شورک هلداهایهیت کوریم تبار بار
 علی کوی یا ملعون لا فان مکة بارفت
 اوتاه بکم زبون خدا عز که بدربک
 کافر و ساحل کمر حتی ملود و سنا
 جازین و جل کارگر ز قیر کوند شاهد
 تو چرا انصاف ناک دو صبان هان کرم

دینت خدا پیشه انکی دا اولین جن در بی
 علی کوی یا کافر ته دست آفتبه حیلان
 چه هییه بیکه طار قطمه قال قبلان
 کافر خودی غیره حمل کرده شاه
 گاه بدرب گاه هییت وان شرک کن تشائی
 کافر مومن تمام لوان دکن سیرن
 عجب سبغ بان امام کی غالبیه طایفه
 پیغمبری دعاگر یارب به نصرتی
 ناکاه عجل کمر آبی وقت فرستی
 کوه هلد خوه درک ز دست حیدر کرر
 شاه را بوسه ریپ حواله فرود لفقار
 کافر پز بلند کمر فلان بند پزها انبو
 ذوالفقار حرطال شکر هینک با اساسیو
 عجب



هتک نه وان اسپر بو هتکان گرفتار
 هتک نه وان قلوبه او چونه نافاناره
 دور کله کربدن بو کار یوسوار
 اسلام نقره لادن حال کافر خزاره
 مالک رفی حصار یهودان او خلاصگر
 چار دن هاتنه شراب وان تدبیر خودگر
 رسول الله امردا وانا هجوم داکله


بر روز و شت کار زار نه حری نابا به
 مسلمانان بکلبنک شد کن چار طرفان
 مالک کرتا کره بند همتا پیغران
 پیغبر کونه مالک قبول یکه امانی
 فی الحال او بسایک مسلمانا بو طیبانی
 هم غروره بو مسلمانا دکل قوم خو جبارک
 تسلیم کره مال وان پاشقا کرن تدرک
 کواوهاتنه ایمان تمام شایر حسین

بری دانه مدین ^{یوسف} تمام نفسی
 یارب اهل ایمان چنت شا بکی
 وان دور بکی ز شیطان جمال نصیب بکی
 هم یوسفین کنه کار دکل وی دانو با بان
 کر غفور یا غفار رحمانه نابت نقصان
 صلواتا بره بری هون خلاصین برین

لمحمد اشکار شفیع روز امین
 هم دکل وی فاتحه نه صحای کرام
 باز ماند فصیح نه امت رتنام

SON

صلحه و ملکه یوسف بن حاجی ملا فام
 من مرتب کر کوم جمل حسین



Pêvek 5: Rûpela Dawî ya Nusxeya Muhemmed Emin.

كَرَّ عَفْوُكَ يَا غَفَّارٌ ۞ ۞ رَحْمَاتُكَ تَابَتْ نَقُصَانُ
 صَلَواتِ بَدَنِ الْأَبْلِ ۞ ۞ هَوْنُ خِلاصِ بِنِ زَيْبِرَانِ
 لِمَجْدِ أَشْكَرَا ۞ ۞ شَفِيعِ رُوْثِ مَهْرَانِ
 هَمُّ دِكْلُو فَايْحَةُ ۞ ۞ زَبُو صَحَابِ كِرَامِ
 بِأَزْمَانِكَ فَصِيحُ ۞ ۞ زَامِتِ رَاتِمَا

تاريخ النظم في سنة ١٣٤٩ هـ ناظمه حسين
 بن عبد الله الأتقي
 كتب له محمد امين ابي خليفة حاج ملا احمد
 من عشيرت ملاني عروسى سكاني قريه
 في شهر ١٢٧٩ هـ شيو كان رحمة الله على ابويه
 وعلى قاره وعليه آمين بحره سيد المرسلين
 والحمد لله رب العالمين
 قد فرغ من كتابته محمد امين بن خليفة
 حجي ملا احمد بن زاده حسيه
 لائتاده حسين بن ملا
 عبد الله الآلعي الخالدي
 النقشبي آه من الموت
 والحالات

Hem Yasîne gunehkar digel wî da û baban
Ger ‘efû kî ya Ğeffar rehma te nabit nuqşan

Şewat bidin alî yû bira hûn xilaş bin ji nîranê
Li Muħemmed aşkera şefî‘ roja mîzanê

Hem digel wî fatiħe ji bo şehabê kiram
Bi zîmanek feşîħe ji umetê ra tamam


Tarîxu'n-nezmi fî sene 1349⁵⁹⁹ nazime Yasîn Bîn Ebdullah el-Alikî. Ketebe Muhemmed Emîn Îbnî Xelîfe Hacı Mela Ehmed min eşîret Mîlanî ‘Erûsî sakînî qurîyet. Fî Hicrî 1279⁶⁰⁰Şîwekar Rehmetullahî ‘eleyhî we ‘ela eqarîbe we ‘ela amîn. Bi hurmetî Seyyidi'l-Murselîn. el-xetau'l-Baqî we'l-'umir fanî. Qed ferexe min ketabete Muhemmed Emîn (fî şehri Receb) min Xelîfe Hecî Molla Ehmed Bîn zade hesben li'l-ustad Yasîn Bin Molla Ebdullah el-Alikî el-Xalidî el-Neqşî. Ah min el-mewt we'l-halatihi.

⁵⁹⁹ Ev tarîx bi Miladî teqabulê sala 1930yî dike.

⁶⁰⁰ Îhtilmaleke mezin ev tarîx bi şaşî hatiye nivîsîn, divê ev tarîx 1379 be û ev jî teqabulê 1959an dike.

اول بسم الله به الحمد لله لا اله الا انت يا شاه به بي مكن جاء به
لورا او خانه به حنان مَنان رحيم رحمان به غفور ذنبان
غفور و غفار به كبير و ستار به مدام نو هشير اُخدا و ندمار
خداوند صور به خداوند نور به خداوند طور به شر كافرين دور به
فردك ترا انسان به حيك تر حيوان به جن كر تر شيطان به
ملك ترا اسمانان به حمود و فتاين به چاردن ديارين به شامي
برهوبين به محتاج خداين به ودهرته ديوان به پاشن و زنا ملبران به
شابن باحسان به لي اهل ايمان به هر چي كو كفار به بي دينا عذار به
مطلق اهل نار به و و كار صغار به امه تاز پياكن به تحقيران عباكن
بي دفاعان كن به جماعه شاكن به زور كر روايت به بدليل اُبت به
~~صفت كرامت~~ به محمد مصطفى به عسكر كر به قوت به ارباب و خا به
دينان جور جنا به ملكي دور كر به علم لي ظهور كر به پوتو صنم صيكر به

Pêvek 7: Rûpela Dawî ya Nusxeya Mela Huseynê Botî.



Li Muḥemmed aṣkera ṣefî' roja mîzanê
Hem digel wî fatiḥe ji bo şehabê kiram
Bi zimanek feşîḥe ji umetê ra temam

Li roja yewmi'l-qiyam
bibe şefi'ê Muhemmed selam
Ketebe Huseyn el- Buhtî

Ya Rebbî tu xelas ke Ebdulhekîmê Alikî

.....
.....⁶⁰¹


Temmet. 'Ele'ş-Şeytanu'l-le'net we 'ela katib el-rehmet

El-eman ji destê heşir neşir di roja qiyametê li ser pira siratê şefi' bibe
Muhemmed.

Me xelas ke ji narê (cehennem)
Amîn ya Reb el-'alemîn
La îlahe îllalah Muhemmed Resulellah

Sene 'Erebî 1373
Sene Romî 1369
Sene 'Îsewî 1954
Sene Şemsiyî 1331

⁶⁰¹ Ev her du riste nehatin xwendin.



⁶⁰² Bi saya vê îcazeyê em dizanin ku Mela Yasînê Alîkî jî Şêx Nesîmê Kufrewî yê Bitlisî îcazeyâ ilmî wergirtiye.

أما بعد ليعلم العبد المذنب الجهيل المفلت من عقوبته
 الجليل المشتهر بسى الذبيح الديار كرى أصلاً والإسبارطوى
 إقامة الكردى لسانا والتركى بلاغا و بياناً - لما تَلَقَدَ لدينا مدنة
 مدينة الأوحى' المتعلق بالأخلاق المحسنة المشتهر بين أرباب
 الكمال من الطلاب كإسمه حسن بن إبراهيم بن حسن
 الإسبارطوى الكيسى الفطن الصابر فى خدمتنا من العلوم
 العقلية - كالصرف والنحو والمنطق والبلاغة والكلام ومن
 النقلية أعنى الفقه من الملتقى وحاشية ابن عاب الدين على
 الدر المختار ومن الحديث مصابيح السنة وبعض متون أصول
 الحديث كالبيقونية وشرحها ومن أصول الفقه مختصر المنار
 وحاشية نسمات الأسحار وسائر الكتب المتداولة و من التفاسير
 مجمع التفاسير -

وقد كان حفظ من النحو متن الإظهار للبركوى وألفية ابن
 مالك ومن المنطق منظومة السلم المنور فى علم المنطق للشيخ
 عبد الرحمن بن سبى ومن المعانى الأربعة البلاغية لابن سحنة
 الحنفى ومن الكلام القصيدة التوتية وبعض الأحاديث و جزأ أو
 أكثر من القرآن حين ما قرأ تفسير القاضى من أصول الحديث
 منظومة البيقونية حفظه الله عز وجل من شر الحاسدين ولقد

الزمان وشتر الماقرين وأعتقه الله عن البلاء النبوى والاخرى
 المحسى و غير المحسى أمين بقاء من أرسله الله رحمة للعالمين
 جعله الله تعالى نائلاً و راضلاً بجميع الآمال و جعله الله
 تعالى إماماً للأقبياء لصالح الأعمال قرأته قابلاً للتدريس
 العلوم بأجمعها و ممارسة الكتب بأجلها فأجزته مستعنياً من
 رضى أجازة عامة مملوطة ومكتوبة فى جميع العلوم كما أجازنى
 أستاذى العلامة الحقائق و الفهامة الدقائق سريع الفكر وعظيم
 الاستحضار فى علوم العقلية والنقلية الملا بس الألبكى الحالىدى
 النقشبندى وكان مآذونا فى التصوف وعلوم الأخلاق من شيخه
 الفانى فى الله والباقى بالله والمعتمد بحبل الله الشيخ نسيم
 الكفوى البلىسى ومع هذا لما رأى القطب الفرد الغوث
 الأعظم الشيخ عبد الحكيم البلوانيسى نور الله ضرائجهم و
 أفاض الله علينا من بركاتهم ومتعنا الله بأنفسهم القدسية
 تترك لده وأخذ بيده قائلاً لازم على أن أبلغ قولاً وفعلاً
 محاسن هذا الشيخ حتى لا أكون مستولاً عند الله وعند

أساتيتى *
 باجازه العلامة الدقائق المشتهر بين الخاص والعامه فى
 العلوم العقلية والنقلية سيما علم الحديث الملقب بحكيم الامه

الإمام أحمد المشتهر بقرئته النبوية عفا عنه رب العالمين *
بإجازة أستاذ العلامة للحقائق و الفهامة للذائق
العواصم في بحر جميع العلوم لاستخراج الدرر الفوق النقى
التقى الصادق الوعد الوفي أستاذ العلماء في زمانه محمد
نجم الدين بن منلا حسين الأرجسي عفا عنه رب العرش
بحرمة النبي القريشي *

بإجازة الشيخ العلامة للحقائق و الفهامة للذائق الباسط
كفيه لعطاش رحيق العلوم الظاهرة و الباطنة بلطف ربه المحفي
المشرف بخطاب النبوي مولانا الشيخ درويش محمد فرسافي
قدس الله تعالى سره الصافي *

بإجازة البحر الزاخر السحاب الماطر و البحر الماهر في
علمي الباطن و الظاهر يعسوب أي أمير المعاصرين السالكين
مسلك الحق المبين رئيس العالمين بدر الكاملين المنيف الفائق
العفيف الموشى الحاج طيب أديب الخالدي النقي *

بإجازة رديف القدماء أستاذنا المشهور بين العلماء و
معدن العرفان المنيع المنيف وحيد عصره أفندينا الحسن رحمة
الله عليه *

بإجازة الفاضل الكامل الفاني في الله و الباقي بالله

الفاضل الباسط و المرشد الكامل وحيد عصره و مفتي دهره
المبهر في جميع العلوم بأنواعه منيع الكرامات بارقة صاحب
التألفات الفايقة المتلا خليل أفندي الأسعدي قدس سره *
بإجازة أستاذ الأجل و التحرير الأكمل المولى منلا محمود
النهديني *

بإجازة الأستاذ المذكور للعامه و الخاصة عن مكامله في
العلوم العقلية و النقلية و مرابه بالفوائد الجليلة العالم الفاضل
و البحر الكامل محمد صالح أفندي الصفوي عن والده الماجد
الفاضل النبيل إساعيل أفندي الصفوي رحمه الملك الغني *

و هذا الفاضل قد قرأ العلوم بأجمعها العقول و المنقول و
الفروع و الأصول على والده الماجد بالإلهامات الربانية إبراهيم
بن حيدر و هو على والده العلامة و البحر الفهامة صاحب
التأليفات و التقارير الركنة حيدر بن أحمد و هو على والده
صاحب المحاكمات و الكلام مفيض عوارف المعارف على
طبقات الأنام أحمد بن حيدر *

و هو قد قرأ علوم العقلية و النقلية و الفنون و الأدبية و
الصناعات العربية على والده العلامة و التحرير الفهامة حيدر
الأول رحمهم الله تعالى *

تلميذ شيخ الإسلام مولانا زين الدين الكردي البلاطي
باجازة أسنان المشهور والمذكور للعامّة والحاصّة ولي الله بلا
زراع و صفو الصفوة بلا دفاع ذي المفاخر الجليلة والمآثر العلية
الشيخ عه الكردي القادري ثمّ دمشقى بأساتيده العالية
المشهورّة وعن العالم الفاضل عبد الله الأستوي وهو قرأ على
المتخطّط بالحقن العلي المنلا على وهو على والده وهو على
مولانا زين الدين البلاطي تلميذ نصر الله الخلجالي تلميذ
مرزجان تلميذ خواجه جمال الدين محي الشيرازي تلميذ المحقّق
جلال الملة والدين محمد بن أسعد الصّدّيق الدوّاني*

و أيضاً قد قرأ شيخ مشايخنا بقية السلف الشرحين
صاحب المحاكمات أحمد بن حيدر * تمتت العقولات على
الأستاذ الكامل في الكلّ محمد بن عبد الرحمن الشّروي
تلميذ مولانا أحمد المحلي تلميذ ميرزا مخدوم تلميذ مرزاجان
الشيرازي تلميذ خواجه جمال الدين محمود الشيرازي تلميذ
المحقّق الدوّاني*

و أيضاً قرأ درسين من أوّل التفسير قاضي بيزاري على
أفضل مفاخر زمانه مولانا شيخ الكردي الأستوي وأخذ منه
الأذن في التفسير بل في مطلق التدريس * وهو تلميذ مرزا

جان الشيرازي وهو تلميذ خواجه جمال الدين محمود الشيرازي
وهو تلميذ المحقّق الدوّاني وهو قد أخذ عن والده
العالم الزباني أسعد الصديق الدوّاني تلميذ العلامة المحقّق
الشيرازي على المرحاني قدس سره

و المولى العلامة تاج الدين محمود الفاروقي في
العقليات ومولى العالم أفقه زمانه محمود ابن أبي الفتح
السروستاني في الفقهيات وسروستاني قرأ الحادي الضمير
على مولانا لسان الدين نوح السمناني صاحب حاشية الحادي و
هو قرأ على مولانا جلال الدين محمد القزويني وهو على
والده مصنف الإمام نجم الدين عبد الغفار القزويني رحمهم الله
تعالى*

وهو قد أخذ الفقه عن الإمام أبي القاسم الرافعي رحمه
الله وهو تلميذ قاضي القضاة أثر حلة المحدثين أسوت
المفسرين شيخ الإسلام محمد بن محمد الجزري بأساتيدهم
العلية المغنبة شهرتها عن ذكر البقعة*

و أيضاً قد أخذ عن مولى المتقين مظهر الدين محمد
الكارزوني وأجازه إجازة ملفوظة ومكتوبة وهو كان في
العلوم العقلية تلميذ المحقّق الشريف قدس سره وكان يروي

الحدّث من صاحب القاموس الشيخ المسند مجد الدين
الفرُّوق آبادي و هو عن الشيخ محي الدين بن الحداد و هو عن
جامع مجموع التحقيق بمنهاج يهتدى إلى سواء الطريق و أخلاق
بليغ التهذيب مبلغاً ليس لأحد بعده إلى حومة حماة تقريباً و
روضة فضله داتبة القفوف للقاصي و الداني الإمام قطب
النقاد المرجع في الفتوى الشيخ محي الدين النواوي بسنده
العلوي المعروف الجلي*

و أيضاً قد أخذ عن العالم العامل الكامل الفاضل المولى
الإمام محي السنة و الدين الكوشككناري تلميذ العلامة
الشريف المرحاني قدس سره تلميذ مبارك شاء بخاري تلميذ
المحقق قطب الدين الرازي تلميذ العلامة الشيرازي تلميذ كاتب
القرظيني تلميذ الإمام فخر الدين الرازي تلميذ حجة الإسلام
محمد بن محمد الغزالي تلميذ إمام الحرمين أبي العالی عبد
المليك بن عبد الله بن شيخ يوسف الجويني تلميذ شيخ أبو
طالب المكي*

و هو قد أخذ الإنبابة و الإرادة و ليس الحرقه من أبي
عثمان المغربي و هو من عمرو الزجاجي و هو من برهان الله و
الدين * سلطان الحقيقة و اليقين مروج الشريعة القراء محي

الطريقة البيضاء، سيد الطائفتين أبي قاسم الجنيد البغدادي و هو
من خاله ولي الله علي التحقيق و مبين مناهج الحقيقة لأهل
الطريق أبي حسن السري ابن المجلس السفطي و عن تاج الملة
و الأولياء وارث السيد الأنبياء الشيخ معروف الكرخي و هو
من أبي سلمة الطائي و هو من حبيب العجمي و هو من حسن
البيصري و هو من خضرة الإمام الهمام و لبث القدام و ثبوت
المحققين يعسوب الموحدين سراج الملة و الذين شمس العارفين
بدر الكاملين الشارب من كأس اليقين علي بن أبي طالب
القرظي الهاشمي رضی الله تعالى عنه و كرم الله وجهه و هو
من خضرة الدرر الصدقة الوجود واسطة عقد المسلمين سيدنا و
قدينا روحنا محمد المصطفى صلى الله تعالى عليه و سلم من
أمين ذي النور المبين و هو روح الأمين الممتاز من بين الملائكة
القرظيين جبرائيل عليه السلام عن رب العالمين عز وجل ***

و ليس الحرقه أيضاً الجنيد البغدادي و أخذ الإذن و
الإنبابة و النسبة من جعفر الحداد من عبد الله الإصطخري من
أبي تراب الحنثي من شقيق البلخي من إبراهيم بن أدهم من
موسى الراسي من سيد التابعين صلاحاً زاهداً أوس القرنبي
من أمير المؤمنين عمر بن الخطاب و علي بن أبي طالب

المشهور من رحيق الحزب الذين رضى الله عنهما بواد الأراك
بمرفات و هما منه صلى الله عليه وسلم و هو تلقى من
جبرائيل عليه السلام و هو عن الله تعالى عز وجل
و قرأ شيخ مشايخنا أحمد بن حيدر صاحب المحاكمات
أفاض الله عليه من شأبيب الرحمة مشكات المصابيح إلى باب
الاعتصام بالكتاب و السنة على الشيخ عبد الملك العصام و
أخذ منه الإذن و هو من والده تلميذ الشيخ شهاب الدين بن
أحمد بن حجر المكي الهنسى * تلميذ شيخ الاسلام القاضي
ذكرى الأنصاري تلميذ جلال المعلى تلميذ جلال البلقيني *
تلميذ أمير المؤمنين في الحديث شارح الصحيح البخاري ابن
حجر العسقلاني و هو أخذ الحديث كما قال أخيراً أبو علي
محمد بن أحمد بن علي بن عبد العزيز المهدي إذا مشافهة
عن يحيى بن محمد بن سعد عن جعفر بن علي الهمداني قال
أخبرنا عبد الله بن عبد الرحمن الدباج إذا عن عبد الله بن
محمد بن محمد بن علي الباهلي قال حدثنا الحافظ أبو علي
الحسين بن محمد الجبائي * قال أخيراً أبو شاذان عبد الواحد
بن موهب عن الحافظ عبد الله بن إبراهيم بن محمد بن عبد
الله بن جعفر الأصيلي و حاتم بن محمد الطرابلسي عن الإمام

أبي الحسن علي بن القاسم قال أخبرنا أبو أحمد محمد
المرجاني قال أخبرنا الحافظ أبو عبد الله محمد بن يوسف بن
مطر الغزيري قال ابن مطر الغزيري أجازنا الإمام العلامة
أستاذ الحافظ أمير المؤمنين في الحديث و شيخ مشايخ الأئمة
في الرواية و التحديث أبو عبد الله محمد بن إسماعيل بن
إبراهيم بن معبرة بن بردزبه الجعفي البخاري و هو بطرق
متعددة عن مشايخ منهم الحميدي كما قال حدثنا الحميدي قال
حدثنا سفيان قال حدثنا يحيى بن سعيد الأنصاري قال أخبرنا
محمد بن إبراهيم التيمي أنه سمع علقمة بن وقاص الليثي
يقول سمعت عمر بن الخطاب رضى الله عنه على المنبر يقول
سمعت رسول الله صلى الله عليه عنه يقول إنما الأعمال بالنيات
و إنما لكل امرئ ما نوى الحديث *
و أخذ العسقلاني الفقيه عن الإمام ذى الفضل العميم
الشيخ الجليل عبد الرحيم العراقي عن العامل الفاضل و الخير
الواصل العلاء بن العطاء عن العالم الرباني و الهيكل
الصدائقي ولى الله بلا نزاع و محرر المذهب الشافعي بلا
دفاع يحيى بن شرف الدين النووي و هو من الكمال سأل
الإمام عن الشيخ محمد بن محمد صاحب الشامل الصغير

عن الشيخ عبد الله الغفاري القرويني * صاحب الحارثي
الصغير عن الإمام العلامة شيخ الفقهاء بدر الطالع في
أفلاك مذنب الشافعي مولانا أبو القاسم الرافعي عن الإمام
محمد بن الفضل عن تاج الفضلاء و فخر العلماء محمد بن
يحيى نسابوري عن حجة الإسلام و فخر العلماء العلامة محمد
بن محمد الغزالي عن علامة الثقلين و إمام الحرمين أبي
العالي و بدر التبر المتلالي مولانا عبد الملك عن والده العالم
الجليل و سيد السبل أبي محمد عبد الله بن يوسف الحريري
عن شيخ الكبير و الخير الخبير أبي بكر عبد الله بن أحمد
الغفار الصغير إمام طريق الحرسائين عن الإمام أبي زيد بن
أحمد المروزي عن الإمام الهمام أبي العباس أحمد بن شريح
عن الفهامة أبي العباس عثمان الأتماضي عن الإمام إسحاق
المرزي عن إمام الأئمة و ناصر السنة عالم الفريشي محمد بن
إدرس الشافعي * عن الإمامين الجليلين و الشيخين الكبيرين
الوارثين عالم المدينة المنورة الإمام مالك بن أنس و الإمام ذو
المجد الزائد و الفضل الخالد الإمام الهمام مسلم بن خالد
الزنجي كلاهما عن ذي الشايع و العالم الإمام النافع التابعي
الجليل مولانا نافع عن الصحابة الجليل ذى المجد الأصيل و

الحسب الماهر السبل و السبب الفاخر ثالث الشمس و القمر
مولانا عبد الله بن عمر عن سيد الكونين و رسول الثقلين نبي
الرؤمة و دافع الرؤمة أبي القاسم محمد صلى الله عليه وسلم
عن الروح الأمين و رسول رب العالمين إلى الأتينا و المرسلين
جبرائيل عليه السلام عن الرب جل جلاله و عم نواله و لا إله
غيره اللهم يا مالك الملك و يا خير الناصرين و يا من يطفقه
بُنَجِي القاصرين أنفعه و أنفعنا بمن أنفاسنا و أنفاسهم
الطاهرة و بركة أعينهم الفاخرة و أعتنه بعنايتك و أيده
بعضمتك و خذ به إلى جناب قدسك و أرحه بتقحات الاتس و
أنفض عليه من منجّال فضلك و زلال قبضك و اجعل له التوفيق
رقيقاً و فهماً جليلاً دقيقاً و زده عمداً و علماً و بسر له الأمور
بدأ و ختاً و قارنه وإيانا بالعمل و اقطع عن غيرك منهم
العسل و زنته بالغناء و خلصه عن شين الفقر و السؤال و رشحه
بنفع الطالبين و صبره لدى الناس موثوقاً و لطالب العلم في
الأماكن معشوقاً و أوصله إلى زيارة الحرمين و شفيع فينا و فيه
سيد المرسلين و أدخله جنّة النعيم بفضلك و أسقيه ماء الكواثر
بكرمك العميم و متعه إلى نظر وجهك الكريم و انصر اللهم
جمهور المسلمين اللهم انصر عساكر الإسلام نصرًا عزيزاً قوياً

واعتصموا بحبل الله المتين الذي يمشي على الماء واليابس والسموات والأرضين
والمستدعى منا والمستدعى لنا وإخواننا الذين سبقونا
بالإيمان وكافة المؤمنين والمؤمنات والمسلمين والمسلمات
الأحياء منهم والأموات وجماعة الحاضرين وآخر دعوانا أن
الحمد لله رب العالمين والصلاة والسلام على سيدنا محمد
خاتم الأنبياء والمرسلين وعلى آله الطيبين الطاهرين و صحبه
أجمعين بفضل بسم الله الرحمن الرحيم آمين يا معين
أَصْرَتْ إِجَارَ بَعْدَ الْجَيْلِ * وَمَا أَنَا إِلَّا لَيْسَ عَلِيْلُ
فَبَارِبِ أَنْتَ الرَّحِيمُ الْكَرِيمُ * فَاحْضِنِي يَا بَخْلِي جَمِيلُ
وَأَنَا سَاعِلٌ عَبْدٌ خَفِيرٌ لِقِيْلُ * أَلَيْسَ لَطْفٌ بِرَبِّهِ الْقَدِيمُ
كتبتها في سنة هجرية ١٤١٧ في شهر شعبان ٢٤
المتقابل للسنة الملاية ١٩٩٧ في شهر اوجاق ٤ وأنا الفقير
الحقير منسوب شيخ الفاضل الكامل قطب الواصلين والسالكين
كهف الضعفاء والسالكين الشيخ عبد الحق المدني قدس الله
أسراره العلية النقشبندی القادري ابن قطب الأعظم الشيخ عبد
الغفور العباسي المهاجري الباكستاني نور الله ضريحهما و
ضريح الأستاذ ملا يس بن الملا عبد الله الألكي الحالدي نسا
و طريقة النقشبندی الباطنوسى رحمه الله تعالى

Pêvek 9: *Wêneyê Mela Yasîn û kurê wî Mela Ebdulquddus.*⁶⁰³



Pêvek 10: *Wêneyê Mela Yasînê Alikî.*



⁶⁰³ Yê milê rastê Mela Yasînê Alikî ye û yê milê çepê jî kurê wî Mela Ebdulquddus Çelebî ye.

Pêvek 11: *Wêneyê Mela Yasîn û malbata wî.*⁶⁰⁴



⁶⁰⁴ Mela Yasînê Alikî, jina wî Hemîde, kurê wî Mela Ebdulquddus, jina wî Gozel û nevîyekî Mela Yasîn.

Pêvek 12: *Gora Mela Yasînê Alikî û ya jina wî Hemîde Çelebî.*



Pêvek 13: *Kêlê gora Mela Yasînê Alikî.*





T.C.

Mardin Artuklu Üniversitesi
Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü
Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

**BİR HAZRETİ ALİ CENGNAMEŞİ: MELA YASÎNÊ ALİKÎ’NİN
“ĞEZWETU HUNEYN”İŞİ
(İNCELEME-METİN)**

Seher BİŞAROĞLU

19711003

Danışman

Doç. Dr. Hayrullah ACAR

Mardin-2022